# Ewên ku bi Heta-hetayêva Dilivin

Çapkirina bi sirê girêdayî dehsalîya çapkirina yekemînra, ya lênihêrandî û berfirehkirî




Con Bîvêr

Hevalê giranbiha,

Nava Zebûr 9O:12-da Mûsa bangî Xwedê dike: “Me hîn bike, ku… em rojên xwe bijmirin”. Rojên mêrive li ser vê dinîyayê çiqwas bin jî, yek e ew himberî heta-hetayê tu tişt nîne. Feqet emê çawa wedê li vê dinîyayêyî kurt kivşkirî bidine xebatê, wî çaxî ew heqdayîn wê bê qirarkirinê, yê ku emê bistînin, wextê ku ji sînorên wede derbikevin.

Banga kitêba *“Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin”* eyantîke ji wan eyantîyên hukumdar e, yên ku ji Ruhê Xudan min stendine. Ew civîn, rêber û merivên ku ev rastî eşkere kirine, merem, pêrspêktîv û qirarkirinên nû dest anîne, bona ku li padişatîya Xwedê qulix bikin.Derbazkirina vê bangêye li cem we bona min qedir e.

Ez vê kitêbê bona we û rêberên mesîhîye mayîne li temamîya dinîyayê çawa nîşana hizkirina min û piştgirîya biçûk dişînim. Ez hîvî dikim, vê têmayê û matêrîyalên mayîn lêkolîn bikin, yên ku întêrnêtêda hene û derbazî li cem wana bikin, kîjana hûn nas dikin. Bila bi lêkolînkirina rastîyên li ser van rûpela, hûn wê bernama mezin, wî meremî û navî fem bikin, yê ku Xwedê bona we qirar kirîye û hûn nava wanda bişuxulin.

Hevalê min, ez dua dikim bona ku jîyana we bi wî cûreyî bê guhartinê, çawa ku jîyana min hate guhartinê, wextê ku min ev bang stend.Ez gumanim ku eger hûn bicedînin anegorî vê eyantîyê bijîn, jîyana we, malbet û qulixa we wê wî cûreyî nemînin.Ez dixwezim bi hizkirin guhdar bikim ku ev banga hukumekî çawa li ser jîyana we û li ser jîyanên merivên nêzîkî we hişt.

Birayê weyî nava Mesîhda:






Con Bîvêr
JohnBevere@ymail.com

MESSENGER INTERNATIONAL
MessengerInternational.org

# Ewên ku bi Heta-hetayêva-Dilivin




## Con Bîvêr

“Roja îroyîn nava jîyana herrojeda meriv dikare usa hêsa nava xemada bê girêdanê û boy tiştê herî girîng nejî. Kitêba Con Bîvêr ya hukumdar, ya ku tê navkirinê *“Ewên ku bi heta-hetayêva* dilivin” wê piştgirîyê bide we, we ruhdar bike û we bide sîlihkirinê, bo ku hukumê jîyana we yê heta-hetayê hebe”.

— Krêyg Groyşêl, serwêrê civîna “Layf. Çrç”-ê, usa jî xudanê kitêba “Şerkarî: li dinîya navenda xwe li peyî Îsa herin”

“Eger hûn armanca jîyana xwe digerin, kitêba *“Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin”* hema bersiva we ye. Bi saya evê banga girîng, fikira we wê ji roja we ya hertimî bilindtir be. Ev kitêb bona xwendinê eseyî ye”.

— Con K. Maksvêl, xudanê bi nav û deng û terîfkir

“Çapkirina kitêbê pêşkêşî dehsalîya wê ye, xudanê kîjanê hevalê min Con Bîvêr e: bîranîneke mezine derheqa wê yekêda, wekî jîyan zêdetir e, ne ku kongira rojên me. Bi xwendina vê kitêbê, hûnê edilayê û gumanê bibînin, çimkî ew tîne bîra me, wekî em gerekê jîyana xwe navê jorin ra bidine qayîlkirinê”.

— Stîvên Fartîk, serwêrê civîna “Êlêvêyşin Çrç”-ê û anegorî rojnama “*Nyû York Tayms*”-ê xudanê bi nav û deng

“Kitêba *“Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin”*-da Con li ser hîmê Gotina Xwedê, şirove dike, ku heyîna fikirdarîya li ser heta-hetayê merkezkirî bi çiqwasîva grîng û birarkir e. Ez gumanim, wekî ewê alî bawermendên Mesîh bike, ku ew serwaxtîya diha mezin dest bînin û diha baş fem bikin, ku çawa roja îroyîn bona heta-hetayê bijîn”.

— Coys Mayêr, nivîskarê bi nav û deng û mamostayê mesîhî

“Kitêba *“Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin”* bi guman derheqa wê sureke mêrive mezinda, heta-hetayêda, gilî dike. Con Bîvêr bi nêzîkbûna xwe ya zelal û hîmdar ewê serwaxtîya nava Încîlê da lêkolîn dike û xwendevana ruhdar dike, ku bona heta-hetayê bijîn û hukumê xwe bidine berfirehkirinê, bi derketina ji sînorên jîyana xwe”.

— Brayan Hyûston, serwêrê civîna “Hîlsong”-ê

"Her yek, yê ku dixweze mîrasa heta-hetayê çê bike û nava padişatîya Xwedêda pêşda here, gerekê kitêba *"Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin"* bike nava navnîşa xwendina xwe ya hersale. Con şirovekirina giran dide, bang dike û xwendevana ruhdar dike, dewlemendtîya li ser vê dinîyayê ya here mezin ew e, ku wede bi cûrê herî baş bidine xebatê û hukumekî mezin bona heta-hetayê bihêlin. Ev kitêba wî xebata wedê niha ya klasîk e".

— Krîs Hocîs, serwêrê civîna "Çrç ov Haylênds"-ê, usa jî xudanê kitêbên "Hewa paqij" û "Çar fîncan"

Nava kitêba *"Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin"*-da Con Bîvêr ewê perdê ji heta-hetayê dûr dixe û bi cûrê baş şirove dike, ku wextê em ji vê dinîyayê dûr bikevin, qirarên me yên îroyîn wê hukumekî çawa bihêlin. Hûn nikarin destûrê bidine xwe, ku vê kitêbê hesab hilnedin".

— Mark Bêtêrson, xudanê kitêba eyan, ya bi sernavê "Dorankêş", anegorî rojnama "Nyû York Tayms"-ê, xudanê eyan û serwêrê civîna "Nêyşinil Komyûnîtî Çrç"-ê

Kitêba "*"Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin"*-da Con Bîvêr bangî xwendevana dike, ku pêrspêktîva wan ya heta-hetayêye hertimî hebe. Con hevalekî minî baş e û bona min qedir e, ku ez vê kitêbê r'aber bikim".

— Cêntêzên Franklîn, serwêrê civîna "Frî Çêypêlê"-ê, ya ku li ştata Corcîyayê, li bajarê Gêynsvîlê ye û anegorî rojnama "*Nyû York Tayms*"-ê xudanê bi nav û deng e

"K'itêba *"Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin"* wê fikirdarîya we, ya derheqa wede û xebitandina wede da, biguhêre. Con bi cûrê herî baş cêrge rastîyên Încîlê şirove dike, yên ku wê alî we bikin, ku hûn her roj bijîn, bi heyîna meremekî usa, yê ku ji rastîya weye wedelî zêdetir e".

— Serwêrê civîna Tî Dî Cêyksê, anegorî rojnama "Nyû York Tayms"-ê xudanê bi nav û deng û serkarê hevaltîya "TîDîCêy Êntêrpraysîs"-ê

"Kitêbeke hukumdar û balkêş. Min nedixwest ew kitêb dianîya alîkî. Ez dixwezim, wekî her kes wê kitêbê bixwîne. Hîvî dikim, bona wê wede başqe bikin"

— Bîll Mak Kartnî, qulixdarîya "Promîs Kîpêrs"-ê

# Ewên ku bi Heta-hetayêva-Dilivin

Çapkirina bi sirê girêdayî dehsalîya çapkirina yekemînra, ya lênihêrandî û berfirehkirî




Con Bîvêr

Driven by Eternity by John Bevere, Kurmanji Latin
© 2018 Messenger International
www.MessengerInternational.org
Originally published in English as Driven by Eternity
Additional resources in Kurmanji Latin by John and Lisa Bevere
are available for free download at: www.CloudLibrary.org
To contact the author: JohnBevere@ymail.com

“Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin”, Con Bîvêr, bi kurmancîya latînî
© 2018 Messenger International
www.MessengerInternational.org
Pêşda bi zimanê înglîzî hatîye çapkirnê, bi sernavê «Driven by Eternity».
Matêrîyalên Con û Lîza Bîvêraye mayîn, yên bi kurmancîya latînî,
hûn dikarin belaş nava vê saytêda dest bînin: www.CloudLibrary.org
Bona îzbatkirina tevgirêdanên tevî xudanê kitêbê: JohnBevere@ymail.com

*Vê kitêbê ez pêşkêş dikim...*
*Bo wana, yên ku bi kel û ced dixebitin,*
*jîyanên meriva bona heta-hetayê çê dikin.*
*Nava şuxulkarîya xwe da piştgirîyê distînin.*
*Hatina Wî eseyî ye û heqdayîna Wî tevî Wî ye.*
*"Û hema ev e jîyana heta-hetayê,*
*wekî ew Te naskin, çawa Xwedêyê rastî bê şirîkî-bê*
*heval û usa jî Îsa Mesîhê ku Te şandîye".*
YÛHENNA 17:3

# Serecem

Derheqa vê kitêbêda....11

Pêşgotin....13

Naverok....15

## Beşa Yekê

Serê 1-ê. Heta-hetayî....19

Serê 2-a. *Padişatîya Afabêlê: jîyana li Êndêlê*....35

Serê 3-a. *Padişatîya Afabêlê: roja Dîwanê A* ....55

## Beşa Duda

Serê 4-a. Mala mirîya ya heta-hetayê....77

Serê 5-a. Dîwana yên xapîyayî....95

## Beşa Sisîya

Serê 6-a. Berdaxustina mezin ....123

Serê 7-a. Bingeh ....147

## Beşa Çara.

Serê 8-a. *Padişatîya Afabêlê: roja dîwanê B* ....159

Serê 9-a. Ezman....183

Serê 10-a. Dîwana Mesîh ....201

## Beşa Pênca

Serê 11-a. Mala Xwedê ....................................................................217

Serê 12-a. Ji alîyê Xwedêda gazîkirî...............................................229

## Beşaa Şeşa

Serê 13-a. Çendbarebûn...................................................................251

Serê 14-a. Hukumê şexsî..................................................................277

Zêdekirin: çawa xilazbûnê bistînin...............................................293

# Derheqa Vê Kitêbêda

Hûn dikarin vê kitêbê ji destpêkê hetanî dawîyê mînanî kitêbên mayîn bixwînin. Çawa jî hebe, bona wan meriva, yên ku dixwezin vê kitêbê bona hînbûna şexsî, yan jî ya bi komê bidine xebatê, em bêjin, wekî ev kitêb ji şeş beşa ye û peyî her beşekîra pirsên bona gotûbêjkirinê hene. Ev hînbûn bona hînkirina şeş hevtya ye, lê hûn dikarin aza bona xwe, çawa ku hûn dixwezin, bikine anegorî xwestina xwe.

Nava her beşekîda ev serên kitêbê ne:

| | |
|---|---|
| **Beşa Yekê** | Serên 1-3 |
| **Beşa Duda** | Serên 4-5 |
| **Beşa sisîya** | Serên 6-7 |
| **Beşa Çara** | Serên 8-10 |
| **Beşa Pênca** | Serên 11-12 |
| **Beşa Şeşa** | Serên 13-14 |

Eger hûn vê kitêbê nava doranên dersên “*Ewên ku bi heta-hetayê va dilivin*” dixwînin, em pêşnîyar dikin, ku hûn vîdêyoya hînbûnê ya her hevtê temaşe bikin, yan guhdar bikin û bersivên pirsên bona her beşekî têradîtî bidin. Hîvî ji hemû endamên koma xwe bikin, ku ew serên kitêbê yên anegor hetanî berevbûna bi sirê bixwînin. Bona her hevtêkê vîdêoyeke hînbûnê têra hatîye dîtinê.

Bona ku hînbûna kitêba “*Ewn ku bi heta-hetayêva dilivin*” diha baş bînine ber çavê xwe, Con serpêhatîke hewaskar û ya mînanî poêmê, ya derheqa padişatîya Afabêlê da raber kirîye, li kîderê Cêylonê padişa serwêrîyê dike, lê xulamên wî mînanî me û merivên dora me ne. Ew bi cûrê zelal banga kitêba “*Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin*” tîne ber çava. Nenihêrî wê yekê, wekî ev serpêhatî li ber xwe hatîye derxistinê, ew mînanî merivên rastin û ewê alî we (xwendevana) bike, ku diha baş sur û şêwirên padişatîya Xwedê nas bikin û fem bikin.

Hûn dikarin serpêhatîya padişatîya Afabêlê nava serên kitêbê yên 2-a, 3-a, 8-da bibînin.

Ew bi vê nîşanê va (), nava Serecemê da hatine kifşkirinê.

Xêncî wê yekê, li ser hîmê vê serpêhatîyê şanoke (têatro) aûdîoyê hatîye hazirkirinê, kîjanê hûn nava sayta Con Bîvêr ya

«CloudLibrary. org»-da dikarin guhdar bikin.

Ev hemû tişt bona we ye.

# PÊŞGOTIN

Ew rojê bê, wextê ku ji me her yek wê li ber Xwedê bisekine. Pirs nava wê yekêda ye, ku gelo emê bona wê yekê hazir bibin?

Încîl ber dilê me da tê: “Xwîşk û birano, bicedînin, wekî hûn li ser xwe nava nav û bijartina xwe da *gumanbin*” (B Petrûs 1:10, NET).

Gelo usa qwimîye, wekî hûn nava tiştekî da gumanbin, lê paşê zelal bibe, wekî hûn şaş bûne? Ew yek ne tiştekî baş e. Mînanî gelek mêra, ez gelek cara guman bûme, wekî min rîya rast, nîşandayî, yan jî mêtod bijartine. Feqet, usa diqewime, wekî ez dikevime cîhekîşaş, yan jî ez mecbûr dibim careke mayîn plana xwe destpê bikim, lê vê carê îdî dîna xwe didime kifşkirina. Ev yek her car nerazîbûnê pêşda tîne. Min badîhewa ardûyê avtomaşîna xwe, wedê xwe, mecal û parên xwe xerc kirin. Ez *guman* bûm, wekî min rast zanibû, lê bi rastî min nizanibû.

Ez naxwezim wê şaşîyê nava pirsa heta-hetayê da biwekilînim.

Ji hemû kitêba, yên ku min nivîsîne, kitêba “Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin” nava jîyana min da hukumê herî mezin hiştîye. Cara ewlin kitêb deh sal pêşda çap bû û peyî wê yekêra ez û koma min, me gelek şedetî derheqa jîyanên guhartî da stendine. Lênihêrandin û nûkirina vê kitêbê xebata teslîmkirî nîbû, lê wextê ku me derheqa çapkirina cara duda da gotûbêj dikir, min zanibû, wekî em gerekê wê yekê bikin. Min texmîn dikir, wekî banga li ser van rûpela him ya lezgîn e û him jî gelekî girîng e. Banga me ew e, ku bi merîfetî û bi rastîyê meriva bona heta-hetayê hazir bikin. Ez dixwezim, wekî li cem we *aminaya* heta-hetayê hebe.

Rastîke usa heye, ya ku meriva tîne ser hişê wan: wextê ku em li ber Efrandarê xwe bisekinin, *wî çaxî* wê *bona destpêkirina careke mayîn gelekî dereng bibe.* Ez gumanim û dua dikim, wekî wextê ku hûn vê bangê bixwînin û careke mayîn bixwînin, Ruhê Pîroz wê ewê bide xebatê, bona ku hûn bi temamî qewata xwe ya heta-hetayê mîyaser bikin û pêra jî wê bi kerem û rehma Xwe we bigyhêre.

Bi dil:
Con Bîvêr,
Gulan, 2017 s.

# Naverok

Gelo nava xebera *“Heta-hetayî”-da çi tiştekî cuda heye*, yê ku bala me dikişîne li ser xwe û hela serbara serda jî dikare li ser dewletekê hukum bike. Serhatîk derheqa Artûr Stêys da heye. Ew destpêka sedsala 20-î li Aûstralîyayê hatîye dinîyayê, û jîyana wî bi bêgumanîyêva tijî bû. Di navbera şerê cîhanêyî ewlin û Dêprêsîya Mezin da ew bêmal bû, yê ku bi vexwerina alkoholêva mijûl dibû û dizîyên biçûk dikirin. 6-ê tebaxa sala 1930-î ew rastî Îsa hat û jîyana wî bi temamî hate guhartinê. Hindik wede derbaz bû û ewî banga serwêrê xwe bihîst: “Xwezila min bikaribûya xebera “*heta-hetayî*” li hemû soqaqên bajarê Sîdnêyê bikira gazî”. Û ewî texmîn kir ku dixweze wê bangê mîyaser bike.

Artûr her roj zû hişyar dibû. Ewî sehetekê dua dikir, lê paşê seheta O5: OO-O5:30-î ji malê derdiket û diçû li wir, li kîderê ewî texmîn dikir ku Xwedê rêberî li wî dikir. Bi seheta ewî li ser erdê soqaqên bajarê Sîdnêyê xeberek dinivîsî: “*Heta-hetayî*”, li ser her 30-î mêtrî. Ji 20 salî zêdetir kirina wî bona hemûya çawa sur ma: kî ew xebera dinivîsî, ya ku bi hezara meriv mecbûr dikirin bisekinin û derheqa wê yekêda bifikirin? Gelo evî merivê neeyan fem kiribû ku hukum û rola wê xeberê çi ye? Tenê sala 1956-a ev sura hate zelalkirinê.

Piştî wefatbûna Artûr, piştî du sala, sala 1967-a şayîrê ji Sîdnêyê Daglas Styûart ev xet çap kirin û xebera wî şikilkêşî û terîfkirî nemir kir:

> Şayîr Artûr Stêysê bêguman, veşartî,
> Şuxulê kîjanî tenê xebereke qewat bû,
> Nava kûraya wedera derbaz bû,
> Li kîderê xebera wî hate bihîstinê û ewî ew bihîst:
> “HETA-HETAYÎ, HETA-HETAYÎ”: mînanî zengilekî,
> Dengekî şîrin ji ezmîn, lê medekirî ji dojê:

Terîfa ji xeberekê li temamîya Australîyayê bela bû. Banga Artûr bona nisileta ji alîyê arxîtêktor Rîdlî Smît da hate xweyîkirinê, yê ku ew xeber li ser parçekî sifir nivîsî û xebata wî li meydana Sîdnêyê

hate cîwarkirinê. Paşê ew bona ji çar mîlyarda zêdetir temaşevanên têlêvîzyonê hate nîşandayînê. Cara ewlin ew yek wextê heytehola vekirina lîstikên Olîmpîyê yên li Sîdnêyê qewimî. Cara duda ew yek pêşîya hezarsalîya nû, bi îşiqên pira Sîdnêyê ya Harbor Brîcê hate nîşandayînê.

Heta-hetayî bala meriva dikişîne li ser xwe. Tu miletek, tu eşîrek û tu merivekî cuda nikare dijî wê derkeve. Ji çêbûna me destpêkirî, heta-hetayî dilê meda ye û em texmîn dikin, wekî ew yek mezîla heyîna me ya cuda ye. Bo wê yekê jî emê bi serwaxtî wê yekê bikin, eger diha bi kûrayî em wî hemû tiştî lêkolîn bikin, çi ku Efrandarê me derheqa heta-hetayêda dibêje. Bi kutasî ew yek Xebera wî îzbat dike: "Ji heta-hetayê û hetanî heta-hetayê Ez Xwedê me. Tu kes nikare dijî wê yekê be, çi ku Ez dikim" (Îşaya 43:13, TLB). We ev kitêba hema bona wê yekê bijartiye û ez bawarim, wekî we qirara serwaxt qebûl kirîye.

Hetanî destpêkirinê em dua bikin. Min bi dengê bilind ev dua li oda xwe ya xebatê dua kirîye û ez hîvîyê me, wekî hûnê jî niha tevî min dua bikin:

> "Xwedê yê heta-hetayê, Efrandarê hemû tiştî û Xudanê ezmîn, ez bi navê Kurê Te, Îsa Mesîh, li ber Te disekinim. Ez hîvî dikim, wekî bi qayîlbûna tevî xulamê Te Con Bîvêr, ku Tu îro çavên min rûn bikî, ku ez bibînim, usa jî guhên min, ku ez bibihêm, bona ku Tu dilekî usa bidî min, yê ku wê wî hemû tiştî fem bike û qebûl bike, çi ku Tu bi rîya vê bangê dibêjî. Ez fem dikim, wekî ez hewcê alîkarîya Ruhê Pîroz im, bona ku ez xwestina Te û rêyên bona min naskim. Ez dixwezim nava hemû rojên jîyana xwe da ez Te razî bikim, usa jî nava temamîya heta-hetayê da. Ne tenê rêyên Xwe, lê usa jî dilê Xwe nîşanî min bide, bona ku ez Te nas bikim, çimkî ev e jîyana heta-hetayê, bona ku Te, Bavê minî Ezmîn, nas bikim. Sipas bona dilsozî, kerem û rehma Te".

Werin, em bi femkirin destpê bikin, wekî Ruhê Pîroz wê femdarîke usa bide we, kîjanê hûn bi xwe nikarin dest bînin. Ew ya gelekî ruhdarkir e.

# Beşa Yekê

SERÊ 1-Ê

# HETA-HETAYÎ

*“Me hîn bike, ku em wedê xwe bi cûrê herî zêde bidine xebatê... Û cedandinên me bike yên kardar. Belê, cedandinên me bike yên kardar”.*
— Zebûr 90:12,17, NLT

Bawar bikî hemû jî dixwezin ku emirê wan girîng be. Eva hema cedandina rast e û ya ku li Xwedê xweş tê. Mûsa hema nava xeberên jorê da ew yek hîvî dikir. Ewî destpê kir serwaxtîyê hîvî bike, bona ku wedê xwe bi cûrê herî zêde bide xebatê. Gelek tişta, yên ku nava jîyanê da hatine undakirinê, dikarin bidine dasekinandinê, lê wedê ku bi cûrê şaş hatîye xebitandinê, nikarin paşda vegerînin. Ro çawa diçe ava roj jî dûr dikeve, ya ku nayê paşdavegerandinê.

Mûsa dua yê xwe ser hevda anî û hîvî kir: “Cedandinên me bike yên kardar”. Ev hîvîkirin eynî wî cûreyî tê wekilandinê û menî ew nîne, wekî Mûsa gramatîka baş nizanibû, yan jî bîra wî ya nebaş bû. Wekilandin hema cûrê dîyarkirinê ye, yê ku nava xebera Îbranî ya kevinare da nivîsar dihate xebitandinê. Roja îroyîn, wextê ku em dixwezin tiştekî bi guhdarî bidine kifşê, em dikarin çend tişta bidine xebatê. Em dikarin wê xeberê bi herfên reşkirî, yan jî bi kişandina xetê, yan jî bi temamî bi herfên mezin, yan jî nîşana binivîsin. Meremê vî hemû tiştî ew e ku guhdarîya xwendevana bikişînine li ser fikirên girîng. Nivîskarên cihû xeberek yan jî gotinek diwekilandin, ku guhdarîyê bikişînine li ser wê fikirê. Wana hîmlî tiştên li ber xwe derxistî nedinivîsîn, lê serbara serda fesal xeber dibijartin. Ew yek, wekî gotinên Mûsa Încîlê da tên wekilandinê dide kifşê, wekî açixî ne tenê xwestina Xwedê ye bona me, lê Ew bi dil wê yekê dixweze. Hema Ewî ev gotin wî cûreyî daye dîyarkirinê.

Em bona açixîya hatine çêkirinê. Xwedê dixweze, wekî jîyana me girîng be. Ev yek berê ewlin xwestina Xwedê bûye, lê ne ya me.

Ewî xwestina Xwe bi rîya Încîlê eyan kirîye. Îzinê bidin, ez tenê du mesela bînim ber çava. Ya ewlin: "Xudan Xwedê yê te wê te nava hemû karên te da werguhêzî yekî *açix* bike" (Qanûna Ducarî 30:9, NLT). Guhdarîyê bidine li ser wê yekê, wekî nivîsar e "*hemû*", lê ne nava "*hinek*" beşada.

Nava beşeke mayîn da nivîsar e: "Ev kitêba qanûnê bila ji devê te dûr nekeve, lê şev û roj li ser wê bifikirî, bona ku tu mînanî nivîsara nava wê da xweyî bikî û mîyaser bikî, çimkî tê wî çaxî *wan rêya açix bikî* û wî çaxî *tê zan ebî*" (Hêşû 1:8).

Bona texmînkirina açixîyê serwaxtîya xwedêtîyê lazim e. Încîl dibêje: "Ewê ku serwaxtîyê hiz dike, usa ye berjewandîya xwe hiz dike û ewê serkevtî be" (Gotinên Silêman 19:8, TLB). Serwaxtî zanebûna lazim û karebûna bona wededa kirina bijartina rast dide me. Serwaxtî bona merivên zane tiştekî cuda nîne. Ew ya wan meriva ye, li cem kîjana tirsa Xudan heye û ew nava Mesîh da nin. Eger hûn dicedînin jîyana heta-hetayê çê bikin, ew gerekê bi serwaxtîya xwedêtîyê bê kirinê û ev bang hema derheqa wê yekê da ne.

Ji serwaxtîyê açixî dixuliqe, ya ku sirîya xweda razîbûna dirêj û heqdayînê tîne: "Eger tu serwaxtî, wî çaxî serwaxtîya te wê heqê te bide" (Gotinên Silêman 9:12, NIV). Xudan ne tenê dixweze ku hûn serwaxt bin, lê ew dixweze bona wê yekê heq bide we. Xebereke mayîn da nivîsar e: "Xudan roj bi roj karên merivên xwedêparêz yên qenc dibîne û heqê wane heta-hetayê dide wan" (Zebûr 37:18, TLB).

Ew yek, wekî Xwedê açixîya me dixweze, nava salêne dawî da, nava beşa civînê ya mezin da hatîye kifşkirinê û ew yek rast e. Feqet, açixî anegorî civakê tê femkirinê, lê ne ku anegorî fikira Xwedê. Ew ji alîyê fikira wedelû da tê dîtinê, lê ne ku ji alîyê heta-hetayê da. Nava feydayê wê yekê da dîtin û fikirên me zelal nînin û em berbi tiştên şaş dicedînin.

Rojekê emê li ber Hakimê ezmîn Îsa Mesîh bisekinin. Eger me bi serwaxtîya xwedêtîyê jîyana xwe derbaz kirîye û em kardar bûne, emê heqê heta-hetayê bistînin. Eger em ji şuxulkarîya xwe dûrketine, emê yan bêne cezakirinê, yan jî emê zyana heta-hetayê bibînin. Bo wê yekê jî, hûnê bi serwaxtî bişuxulin, eger hûn çend seheta başqe bikin, bona ku derheqa normên Xwedê da bizanibin.

Nava vê kitêbê da emê derheqa wê yekê da xeberdin, ku hûn çawa jîyana xwe bikine ya girîng, lê ne tenê îro, lê nava temamîya heta-hetayê da. Încîl derheqa wê yekê da zelal dibêje. Eger pêrspêktîva me ya heta-hetayê hebe, wî çaxî gerekê pêşda fem bikin ku heta-hetayî çi ye.

## Heta-hetayî

Bi guhdarî van her du gotina bixwînin:

"Tu kes nikare destpê bike heta-hetayê fem bike" (Îbo 36:26, TLB).

"...heta-hetayî danî ye nava dilê wan" (Zanebûn 3:11).

Heta-hetayî... Ew çi ye? Meriv çawa dikare vê yekê şirove bike? Û meriv çawa dikare wê yekê fem bike? Ferhengek vê yekê çawa "*wedê bêsînor*" şirove dike, lê yeke mayîn çawa "*halê heyînêyî ji wede der*" şirove dike. Gelo çawa ferheng dikare heta-hetayê çawa heyîna nava wede da şirove bike, lê ya mayîn çawa heyîna ji wede der? Bona çi tu kesî derheqa vê yekê da şirove nekirîye? Gelo meyê du kitêbên ulmî yên cuda nekira bin şikberîyê, eger wan kitêba tiştekî li dinîyayê şirove bikirana û bidana kifşê, wekî ew yek nava qewilên cuda da hene. Mesele, eger kitêbek şirove bikira, wekî masî avê da dijî, lê kitêba mayîn bida kifşê, wekî ew ji avê der dijî, meyê carekêra texmîn bikira, wekî ji wana yek şaş e û meyê şirovekirina şaş qebûl nekira. Niha jî bona çi şirovekirinên van ferhenga yên derheqa heta-hetayê da em nakine bin şikberîyê û ji wana yekê înkar nakin?

Pirs nava wê yekê da ye, wekî heta-hetayî nikare bi wê fikirê bê femkirinê. Fikira me sînorkirî ye, ew nikare wan femdarîya qebûl bike, yên ku derheqa bêsînorîyê da, yan jî heta-hetayê da nin.

Îzinê bidin şirove bikim. Bicêribînin bînine ber çavê xwe, ku ezman li kîderê xilaz dibe. Derheqa sînorên wî da bifikirin. Eger hûn dikarin derheqa wê yekê da bînin ber çavê xwe, wî çaxî li kevîya ezmîn weyê çi bidîta? Dîwar? Gelo ewê ji çi çêkirî bûya? Lê qalinaya wî wê çiqwas bûya? Gelo alîyê dîwêrî mayîn wê sînorê ezmanî dawîyê bûya? Eger usa ye, wî çaxî ji wî sînorî der wê çi bûya? Dîsa cîh wê hebûya? Lê gelo ewê nikaribûya çawa dûmayîka

ezman bihata hesabê? Û dawîya wî wê li kîderê bûya? Fikira we dikare bêsînorîya ezman qebûl bike? Hinekî derheqa vê yekê da bifikirin.

Niha çela bêbinî bînine ber çavê xwe. Hûn dikarin bînine ber çavê xwe, wekî bi ketina li wê çelê hûnê tu cara nekevin? Hûnê tu cara negihîjine binê wê û hûnê wê nebînin. Hûnê heta-hetayê bikevin. Nava vê meselê da ne ku tiştek, lê du tişt hene, yên ku nikarin ji alîyê me da bên femkirinê. Ya ewlin ew e, wekî binê çelê tune û ya duda jî ew e, wekî emê bêyî dawî bikevin. Eva dijwar e bê femkirinê û mînanî fantastîka ulmî ye, feqet Încîl hevt cara derheqa cîhekî wî cûreyî da dibêje.

Lê Xwedê, Efrandarê mêriv? Qasekê derheqa destpêka Wî da bifikirin, diha rast, derheqa bêdestpêkê da. Încîl dibêje, wekî Ew “ji heta-htayê ye”. Eger Ew nexuliqîye û eger tu kesî Ew çê nekirîye, wî çaxî heyîna Wî çawa destpê bûye, û Ew çawa bûye Xwedê?

Bi rastî, Ew nebûye Xwedê, çimkî Zebûr dibêje: “Berî bûyîna çîya, berî efrandina erdê û topa dinîyayê, ji Her-Heyê heta-hetayê, Tu Xwedê yî” (Zebûr 90:2). Qasekê dora vê yekê bifikirin. Eger Hûn dîsa bifikirin, fikirên we wê li ber hesarê bisekinin, çimkî kitêba Îbo da nivîsar e: “Tu kes nikare destpê bike heta-hetayê fem bike”.

## Dilên me da danî

Ew çi ku bona fikira me femdarî nîne Efrandar danîye nava dilê me. Heta-hetayî li dilê me eyan e. Ew yek bi hemû merivîra ye, çawa ku ew tê dinîyayê. Bo wê yekê jî nivîsar e: “Merivê bê aqil *dilê* xwe da got, ku Xwedê tune” (Zebûr 14:1). Guhdarîyê bidine ser, wekî Încîlê da nivîsar nîne: “Merivê bêaqil nava *fikira* xwe da got”. Gelek atêîst hene, yên ku heyîna Xwedê înkar dikin, lê dilê xwe da ew zanin, wekî Ew heye, çimkî heta-hetayî hema li wir danî ye. Wana hela hê dilên xwe bi wê dereca bênamûsîyê berk nekirine.

Hevalekî min hebû, yê ku çend sal pêşda atêîstekî berk bû. Ewî xwe usa hesab dikir. Ewî îzin nedida tu kesî, ku şedetîya wî bidin. Carekê ewî ji destê xebatkarekî xwe Încîl jê stend, avîte erdê û destpê kir pêpes bike, paşê nifir li wî merivî û Încîlê kir. Ewî ew merivê mesîhî çawa yekî zeyîf û xêfik nav kir.

Piştî êpêce wede, bi sala ser hev piştî hebandina fikirên atêîstîyê, li cem wî merivî êşa sîngê wî destpê bû. Doxtira emelyeta sîngê wî kirin. Wana sîngê wî vekir û paşê carekêra girtin û gotin, wekî ewê 24 seheta jî nejî.

Wê şevê, li ser cîhê xwe paldayî, ewî fem kir, wekî ew berbi cîhê heta-hetayê diçe û çûyîna li wir xwestina wî nîbû. Gelo ewî çawa derheqa wê yekê da zanibû, eger îzin nedida tu kesî ku Xebera Xwedê tevî wî nîvî bikira? Diqewime menî ew e, wekî heta-hetayî dilê wî da danî bû? Încîl derheqa temamîya merivatîyêda vî cûreyî eyan dike: “Çimkî rastîya derheqa Xwedê da li wan eyan e. Xwedê ew zanebûn danîye nava dilên wan” (Romayî 1:19, TLB).

Wê şevê dilê hevalê min sekinî. Ew ji bedena xwe dûr ket û peyayî nava tarîstanê bû. Tarîstan awqasî zor bû, wekî ewî texmîn kir, ku bi xwe ewî tarîstan xwe kirîye û qet nîşaneke ronahyê jî ewî nedidît. Ketina wî gelekî dirêj kişand, paşê ewî dengên merivên ku dizêrin bihîstin. Qewateke mezin wî berbi dergê dojê dikişand, lê nişkêva ew paşda vegerîya nava bedena xwe û ew careke mayîn sax bû.

Rojtira mayîn ewî gazî ew mesîhîyê tek-tenê kir, kîjanî ewî nas dikir. Ew hevalê wî hat û Mizgînîya Îsa Mesîh ya xilazbûnê terîf kir. Çawa ku wî Îsa Mesîh çawa Xudan û Xilazkir qebûl kir, hevalê wî bona qencbûna wî dua kir. Piştî sê hevtîya ew ji nexweşxanê derket. Ewî çend dehsalîya jî emir kir, hetanî ku berbi emirê heta-hetayê çû.

Wextê ku ew atêîst bû, ewî got, wekî Xwedê tune, lê heta-hetayî dilê wî da bû. Merivê bêaqil, yan jî xêfik, yê ku ne tenê bi fikira xwe Xwedê înkar dike, lê dilê xwe da dijî wê yekê dertê, hetanî wê derecê, wekî wijdanê wî ko dibe. Meriv nikare bighîje wî merivî. Ew yek jî tiştekî başqe ye, wextê ku meriv li ser îdêlojîyayê ye û bawarîya xwe nava fikira xwe da lê tîne. Wê yekê meriv dikare biguhêre. Feqet ew tiştekî lap başqe ye, wextê ku dilê wî bi temamî berk e. “*Ferhenga Angêr ya Încîlêye nû*” xebera “bêaqil”, yan jî “xêfik” vî cûreyî şirove dike: “Încîlê da yê “bêaqil” berê ewlin ew meriv e, yê ku xofa Xwedê dihêle û difikire, usa dike, tê bêjî ew dikare bêyî cezastendin prînsîpên heqîtîya Xwedê yên heta-hetayê heram bike”.

Bi rastî merivê bêaqil dikare Xwedê bi fikira xwe qebûl bike, lê dilê xwe da ew heyîna Wî înkar dike, û hema jîyana wî jî wê yekê

dide kifşê. Hema bi saya xofa Xwedê ye, wekî Ruhê Pîroz dikare tevî dilê me bikeve nava eleqeta. Eger em wê yekê unda dikin, wî çaxî bona me îdî guman namîne. Pawlos got: “Gelî bira, zarên xûn-qinêta Birahîm û ne cuhîyên nava weda ye ku ji Xwedê ditirsin, mera ev xebera kö pê xilaz dibin hate şandinê” (Karên Şandîya 13:26). Tenê merivên ku li cem wan xofa Xwedê heye, dikarin xeberên jîyana heta-hetayê bibihên.

## Şirovekirina heta-hetayê

Heta-hetayî dilên me da danî ye, nenihêrî wê yekê, wekî em nikarin bi fikira xwe wê yekê fem bikin. Dêmek wextê ku ez şirove dikim, ez ji we hîvî dikim, ku hûn xeberên min bi dilê xwe qebûl bikin. Bi rastî hûn gerekê wê yekê wextê lêkolînkirina vê kitêbê bikin, eger hûn dixwezin ji wê yekê karê bistînin. Lê çawa wê yekê bikin? Berê ewlin qebûl bikin, ku hûn hewcê alîkarîya Ruhê Pîroz in û ji Wî hîvî bikin ku Ew alî we bike. Ew tevî merivê di nava we da dikeve nava eleqeta, lê ne ku tevî fikira we. Ya duda, wextê ku gotineke nava vê kitêbê da xwe bispêre dilê we, bisekinin û bifikirin. Temamîya kitêbê lez nexwînin. Eger hûn usa bikin, wî çaxî ew kardarîya ku hûn dikarin ji kitêbê bistînin, wê sînorkirî be.

Van her du gavên zelal bidine xebatê, bona ku hûn hukumê gotina Xwedê yên heta-hetayê nava jîyana xwe da qebûl bikin û hûnê heta-hetayê guhartî bin. Dawid dinivîse: “Xeberên Te min dilê xwe da veşartin, bona ku ez dijî Te guneha nekim” (Zebûr 119:11). Vê kitêbê tenê bona femkirina bi fikira xwe nexwînin, çimkî hûn dikarin hêsa zanebûna xwe ya stendî bîr bikin, yan jî unda bikin. Îzinê bidin ku Xebera Xwedê bi rêya fikira û duakirina xwe dilê we da veşêre.

Heta-hetayî herdeme: dawîya wê tune. Feqet, heta-hetayî tenê wedê bêdawî nîne, çimkî ew bin hukumê wede da nîne. Heta-hetayî ji wede bilindtir e. Eger em bînin ber çavê xwe, wekî heta-hetayî tenê çawa wedê bêdawî ye, emê bi temamî wê yekê fem nekin.

Bona baş femkirina heta-hetayê gerekê em li Xwedê binihêrin. Ew bi qewat, zanebûn, serwaxtî, rûmeta Xwe bêsînor e. Ew heta-hetayê Xwedê bûye û wê heta-hetayê Xwedê be. Ji navên wî yek jî “Bavê Heta-Hetayê”-ye (Îşaya 9:6), lê nava tercimên mayîn da “Bavê

Heta-Hetayî”-ye. Ew çawa “Padişê Ji Heta-Hetayê” tê navkirinê” (A Tîmotêyo 1:17, AMP). Ew hemû tişt, çi ku yê heta-hetayê ye, nava Wî da ne. Bi rastî, heta-hetayî nava Wî da ne. Ew hemû tiştê, ku ji Wî der e, tiştê wedelû ye û tê guhartinê. Bi çiqwasîva jî ew yek çawa tiştê qenc, mezin, rastgo, yan jî qewîn bê kivşê, yek e, ewê bighîje dawîya xwe. Diqewime dinîya û ezman jî bên guhartinê, lê Ew nayê guhartinê.

> “Xudan, Te pêşda bingeha dinîyayê danî û ezman jî karê destên Te ye. Ew jî dikarin xirab bin, lê Tê heta-hetayê bimînî. Ewê mînanî kinca bimaşin. Tê mînanî kinca kevin wana bipêçî. Ewê mînanî kincê kevin unda bin, lê Tu dîsa mînanî Xwe yî: Tê tu cara kal nebî” (Îbranî 1:10-12, NLT).

Xêncî wê yekê, wekî heyîna Wî wê tu cara nesekine, Ew heta-hetayê mînanî Xwe ye. Încîl eyan dike:

> “Hemû meriv mîna gîhê ne û temamîya rewşa wan gulên gîhê. Gîha hişk dibe û gulên wê jê diwarin, lê Xebera Xudan heta-hetayê dimîne. Eva ew xeber e, ya ku bi Mizgînîyê wera hate dayînê” (A Petrûs 1:24,25).

Xwedê heta-hetayî ye. Ew yek dide kifşê, wekî Ew çi dibêje, dîsa yê heta-hetayê ye. Ew nikare derewa bike û gotina Wî nikare neyê mîyaserkirinê. Eger usa nîbûya, wî çaxî hemû tiştê biketa nava tarîstanê, çimkî Ew ronahî ye û hemû tiştî bi Xebera Xwe xweyî dike. Ew çi ku Ew dibêje, tu cara nikare bê guhartinê, çimkî eger usa nîbûya, Ewê tu cara heta-hetayî nîbûya. Eva hîmekî qewîn e, li ser kîjanî em dikarin jîyana xwe çê bikin.

## Jîyanên heta-hetayê

Gelek meriv roja îroyîn jîyana xwe li ser heta-hetayê (Xebera Xwedê) çê nakin. Hîmê wan fikirdarîya kûltûra, tradîsîya, fikirdarî û fikirên derheqa wê yekêdanin ku Xwedê kî ye. Ev yek ne tenê derheqa ne mesîhîya da, lê derheqa gelek bawarmenda da ye. Tiştekî ne baş e, wextê ku meriv bawarîya xwe li prînsîpên wedelû tîne û wana çawa rastîyên heta-hetayê hesab dike. Jîyana merivê wî cûreyî qewîn nîne û jîyana wî hîvîya ketinê ye. Ew bawarîya xwe li derewê tîne û xapîayî ye.

Ez zendegirtî mame, ku ez rastî çiqwas meriva hatime, jîyana kîjana li ser qîmetîyên heta-hetayê nehatîye çêkirinê. Hinek dibêjin, wekî bawarîya xwe li Xwedê û Kurê Wî tînin, lê ewê ku wî dihebînin Ew nîne, Yê ku nava Xebera Wî da eyanbûyî ye. Koka derewê kûr e. Gelo ew çawa dikarin bawarîya xwe li fikirdarîyên ji fikira wan xuliqî û îdêolojyên ji alîyê civakê da çêbûyî bînin, eger anegorî kitêba Pîroz, ew eşkere dijî Heyîna Xwedê ne. Îsa got:

> "...Ewê ku Min texsîr dike û gotinên Min qebûl nake, yek heye ku wê dîwana wî bike, awa gotî ew gotina ku Min gotîye, ewê roja Axretê dîwana wî bike. Çimkî Min xweserî xwe negotin, lê Bavê ku Ez şandime, Ewî temî daye min ku Ez çi bêjim û çi xeber bidim (Yûhenna 12:48,49).

Roja Dîwanê heye, ya ku ji wedê hîmdanîna dinîyayê îzbat bûye (binihêre K'arên Şandîya 17:31). Ew roj wê eyantîyên nû derheqa rastîyê da neyne. Ewê awqasî hemû tiştî anegorî rastîya êdî eyanbûyî qirar bike. Xebera Xwedê, ya ku niha li cem me heye, wê roja dawî dîwana me bike. Ew dîwan ya heta-hetayê ye. Qirarên wê dîwanê yên dawî ne, wî çaxî tu tişt wê neyê guhartinê, yan jî careke mayîn wê neyê lênihêrandinê. Gelo diha baş nîne meriv bizanibe ku Ew çi dibêje û anegorî xeberên Wî bijîn, lê ne ku bi fikirên xwe pêşda herin.

Qirarên dîwanêye wê rojê çawa *dîwanên heta-hetayê* tên navkirinê (binihêre Îbranî 6:2). Bi gilîkî mayîn gotî, qirarên wê rojê qebûlkirî (yên ku li ser wê yekê hatine hîmdanînê ku me bi çiqwasîva jîyana xwe kirîye anegorî Xebera Xwedê ya heta-hetayê) wê qirarkin ku emê temamîya heta-hetayê çawa derbas bikin. Ew qirar wê tu cara neyêne guhartinê, çimkî ew *dîwanên heta-hetayê ne*.

Gelek meriv, him bawarmend û him jî bêbawar bi nezanî îzinê didin, wekî ev dîwana îzbatbûyî bêyî zanebûna derheqa wê yekêda bê. Ew gumanên feş xweyî dikin, bawarîya xwe tiştên usa tînin, derheqa kîjanada Încîl nabêje. Hinek difikirin, wekî Xwedê wê karên wane qenc hesab hilde û eger ew kar ji yên xirab zêdetir bibin, ewê afûkirinê bistînin. Yên mayîn, yên ku dihebînin, wekî ew careke mayîn hatine dinîyayê, difikirin, wekî ewê li ber Îsayê Hakimê xwe nesekinin, çimkî Ew Xilazkirê wan e. Ew bawar dikin, wekî ji hemû dîwana aza bûne û hema bona wan wê hemû tişt ji

nişkêva bibe. Hene meriv jî, yên ku difikirin, wekî dawîyê hemû tiştê baş bibe û ew bawarîya xwe rehma nivîsarên ne pîroz tînin.

Peymana nû van tişta raber nake û hîn nake. Femdarîyên vî cûreyî û gelekên mayîn, yên ku merva fikirên xweda çê kirine, tiştên wedelû ne û hema wê rojê ewê bêqewat bibin. Roja dîwanê gelek mêr û jinên zendegirtî mayî wê hebin û ez difikirm, wekî bona wan meriva wê diha gelekî tiştekî ji nişkêva bibe, yên ku dihebînin ku ew mesîhî ne, lê ne ku bêbawar in.

## Aminayî wextê dîwanê

Usa nîne, wekî em gerekê bi tirsa roja Dîwanêva tijî bibin. Em dikarin bi aminayî li ber Dîwanê bisekinin.

> "Û bi jîyana nava Xwedê da hizkirina me diha tam dibe. Dêmek emê roja Dîwanê netirsin, lê em dikarin bi aminayî li ber Wî bisekinin, çimkî em li vir, li vê dinîyayê mînanî Mesîh in" (A Yûhenna 4:17, NLT).

Guhdarîyê bidine ser vê beşê: "Bi jîyana nava Xwedê da hizkirina me diha tam dibe". Aminaya me wê roja Dîwanê wî çaxî hebe, eger hizkirina Xwedê nava me da bibe ya tam (yan jî gihîştî be).

Li civînê gelek meriv nava vê pirsê da dişimitin. Ew hizkirina Xwedê çawa tiştekî wedelû hesab dikin, lê ne ku çawa tiştekî bin ronahîya jîyana heta-hetayê da. Femdarîya derheqa hizkirinê û qencîyê da heye, ya ku him civaka me, him jî li gelek civîna meriva razî dike. Feqet ew yek li ser normên merivatîyê hatîye hîmdanînê, yên ku bi rastî dijî hizkirina Xwedê ne. Îzinê bidin çend meselên belabûyî bînim ber çava.

"Em gelekî hev hiz dikin û em têra dibînin bizewicin". Vê menîyê gelek meriv dikarin bibhên, wextê ku jin û mêr pêşîya zewacê bi jîyana bedenîva dijîn. Ev yek jî guneh e, hema wî çaxî jî, eger sozê xwe xweykin û bizewicin. Feqet min gelek cara dîtîye, wekî jin û mêrên wî cûreyî usa jî nezewicîne. Wana ew gotina ji Xebera Xwedê bîr kirine: "Zewac gerekê ji alîyê hemûya da hurmetê bistîne û cî-nivînê zewacê gerekê paqij bê xweykirinê, çimkî Xwedê wê xayîntîya nava zewacê da ceza bike û usa jî hemû merivên bêesil" (Îbranî 13:4, NIV). Guhdarîyê bidine ser, wekî xudanê nama bona Îbranîya nanivîse: "...Yên ku xayîntîya zewacê kirine û ew hemû

merivên bêesil, yên ku naçine civînê”. Na xêr, ev gotin derheqa wan meriva da ne, yên ku wî cûreyî dijîn.

“Ez zanim, wekî min temamîya rastîyê negot, lê vî cûreyî emê îşekî tevayî îmze bikin, lê paşê emê bi cûrê anegor qulixî wana bikin”. Afûkirina vî cûreyî gelek cara meriv dikare ji merivên bîzsnêsmên bibhê, yên ku dixwezin tiştekî bifroşin, kîjan bi fikira wan bona bikirçî kardar e, lê ew gerekê hinek tişta navhev bixin bona ku bikirçî qirar bike pêşnîyara wan qebûl bike. Ew guneha dikin, çimkî derewa dikin, lê îmzekirina îşekî her dem hema bona wan kardar e. Gelo wana eşaretîya nava Xebera Xwedê da bîr kirîye? “Bona wan meriva, yên ku bi zanebûn derewa dikin, yan bi gotinê, yan jî bi îşê xwe, para wan nava gola bi agir û qetranê da ye” (Eyantî 21:8, AMP).

“Ew çi ku min derheqa wî da gotîye, rastî ye”. Van gotina meriv gelek cara ji wan meriva dikare bibhê, yên xirab derheqa xebatkar, heval, yan jî serkarê xwe da xeber didin (buxdana dikin, yan jî tiştên xirab dibêjin). Bi rastî hûn dikarin bi sed selefîva rast bin, lê hûn dikarin anegorî normên heta-hetayê şaş bin. Çawa ku tê bîra we, kurê Nuh yê biçûk Kam, bi rastî derheqa nerazîbûn û bêaqilîya bavê xwe da li cem birayên xwe eyan kir. Feqet nava encamê bêhurmetkirina bavê xwe da ewî nifir anî li ser merivatîya xwe, ya ku bi nisileta ser hev kişand. Gelo buxdanbêj, yan jî merivên ku xirab xeber didin banga Xwedê ya bona bawarmenda bîr kirîye? “Ji hev gazin nebin, xwîşk û birayên min, bona ku Xwedê dîwana we neke. Çimkî awa Hakimê mezin tê. Ew li ber derî sekinî ye” (Aqûb 5:9, NLT).

Mînakên vî cûreyî meriv dikare geleka bîne ber çava, lê tomerîbûna wan ew e, wekî ew dijî xwestina Xwedê ya heta-hetayê ne. Tiştê herî xirab ew e, wekî gelek merivên vî cûreyî, yên ku vî cûreyî dijîn û xweafûkirinên wan hene, dikarin herine civînê, xwe baş bidine kivşê û çawa welatîyên baş bêne hesabê. Feqet ew bi çiqwasîva anegorî normên Xwedê yên heta-hetayê ne?

Hela hê pêşda Yûhenna nama xwe da da kivşê, ku çawa dikare hizkirina Xwedê bide pêşxistinê:

> “Kî ku dibêje, wekî ez Wî zanim [ez wî fem dikim, nas dikim û nasîya min Wî ra heye (Îsa Mesîh) ], lê temîyên Wî xweyî nake û gurêda nîne, derewîne û rastîya Încîlê navda nîne. Feqet ewê ku Xebera Wî

> (mînanî xiznê) xweyî dike [yê ku fikira xwe da qanûnên Wî xweyî dike, yê ku banga Wî bi temamî xweyî dike], bi rastî hizkirina Xwedê û hizkirina hindava Xwedê da nava wî da dibe bêyî kêmasîya...” (A Yûhenna 2:4,5, AMP).

Bîra xweda xweyî bikin, wekî bi saya hizkirina Xwedê ye bêkêmasî ye (yan jî gihîştî), wekî em dikarin bi aminayî li ber Hakim bisekinin. Yûhenna zelal dibêje, wekî hizkirina Xwedê bêkêmasî ye, wextê ku temîyên wî xweyî dikin, lê ne ku bona civakê xwe baş didine kivşê. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî guhdarîya Hêwayê neçû li ser alîyê dara ulme qencî û xirabîyê ya *xirab:* guhdarîya wê çû ser alîyê *qenc*. Jinê dît, ku ew dar çiqwasî *bedew* bû û rezê wê darê wê çiqwasî xweş bûya” (Destpêbûn 3:6, TEV). Fikirdarîya mêriv dikare bedewetî û qencîya usa çê bike, ya ku dijî xwestina Xwedê ya bêkêmasî ye.

Încîl jî dibêje, wekî em nikarin beşeke temîyên Xwedê xweyî bikin û bawar bikin, wekî roja Dîwanê aminayî wê hebe. Hizkirina Xwedê nava meda dighîje, wextê ku em fesal Xebera Xwedê bi temamî xweyî dikin. Ev e menî, wekî Xwedê keremê dide me: kerem me qewat dike, bona ku em bi temamî gura xebera Xwedê da bin, çawa ku Ew qebûl dike. Dêmek bi qebûlkirina padişatîya qewîn, wê keremê hişk bigrin, bi kîjanê hûn bi tirsê û xofê, bi hizkirin Xwedê dihebînin” (Îbranî 12:28).

Tiştê girîng ew e em bizanibin, ku Padişa çi dixweze û nava me da çi digere, lê ne ku ew e ku civaka me, yan jî fikirdarîya merivatîyê kîjan tiştî baş hesab dike. Bo vê yekê jî Xwedê dibêje me: “Û nekevine kirasê bendê dinyayê, lê bi nûbûyîna hişê xwe werine guhastinê, wekî bizanibin çi ye qirara Xwedê, ku qencî, xweşî û kamilîye” (Romayî 12:2). Ew çi ku bona kûltûra me qenc e dikare dijî Xwestinên Xwedê derkeve.

Îzinê bidin ez meselekê bînim. Niha ez li Sîngapûrê, li odeke mêvanxanê rûniştîme. Dawîya vê hevtê ez gerekê nêzîkî 20 hezar merivî terîf bikim. Ez gelek cara li vî welatê baş qesidîme. Min çend cara Încîl usa jî li Nîdêrlanda terîf kirîye. Li Nîdêrlanda heyîna marîxûanayê dijî qanûnê nîne. Meriv dikarin aza marîxûanayê bikişînin û netirsin ku wê bêne cezakirinê. Feqet, eger li Sîngapûrê li cem we narkotîka bibînin (gilî derheqa beşeke gelekî hindik da

ye), wê we bigrin û ceza bikin. Eger li cem me narkotîkên diha giran bibînin, wî çaxî wê we darva bikin. Wextê ku hûn bi teyarê diçine Sîngapûrê, derheqa vê qanûnê da hema li ser karta we ya ketina li welêt nivîsar e: “Anegorî qanûnên Sîngapûrê, ewên ku narkotîka difroşin, cezayê wan kuştin e”.

Lê niha bînine ber çavê xwe, wekî cahilekî holandî, yê ku her dem marîxûanayê dide xebatê, diçe Sîngapûrê û wê narkotîkê pêşnîyarî sîngapûrîya dike. Ew bi beşera xweş dibêje hevalên xwe yên nû: “Eva tiştekî gelekî baş e. Hûnê hêsa bin, nêrvên we wê rihet bin, lê beşera xirab jî wê dûrbikeve. Hûnê bixwezin bicêribînin? Ezê tevî we nîvî bikim”.

Vî cahilî carekêra digrin. Ew zendegirtî maye. Pirsa ewline ku ew dide xebatkarên polîsîyayê ev e: “Hûn bona çi min digrin?”.

Roja mehkemê tê. Cahilê holandî li mehkemê, li ber hakim sekinî ye û bi dil bawar dike, wekî ew hemû tişt bi nezanî qewimîye. Hakim wî gunekar dike û derheqa cezayê wî da elam dike.

Cahilê zendegirtî dibêje: “Birêz hakim, li wî welatî, ji kîderê ez hatime, pêşnîyarkirna marîxûanayê ya bona hevala çawa xirabkarî nayê hesabê?”.

Hakim dibêje: “Hûn li Nîdêrlanda nînin, lê li Sîngapûrê ne û ew yek dijî qanûna vî welatî ye”.

Gumana holandî unda dibe: hîmê wî tune ye, ku ew xwe afû bike. Tu tişt nikare alî wî bike. Ew bêyî parastin li ber mehkema wî welatî sekinîye, kîjanê ew gunekar kirîye.

Çend sal pêşda, wextê ku ez careke mayîn li Sîngapûrê bûm, cahilekî amêrîkî bona bi zanebûn xirabkirina avtomaşîna merivekî mayîn hatibû girtinê. Ew hatibû girtinê, çawa gunekar hatibû naskirinê û cezayê çend derbên bi şivdara stendibû. Ev ceza, wextê kîjanê bi darê ji bambûkê, bi qinyatên kîmîyayê hazirkirî, dikare birînên gelekî giran pêşda bîne. Qirara mehkemê gelekî giran dihate texmînkirinê. Serokê Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyî jî cêriband tevî vê prosêsê bibe, bona ku cezayê vî cahilî bê sivikkirinê, lê badîhewa bû. Ewî cahilî qanûnên Sîngapûrê teribandibûn û gerekê cezyaê xwe bistenda.

Em hemû jî gerekê li ber dîwana ezmîn ya tewrebilind biskinin. Qirarên vê dîwanê gerekê yên *heta-hetayê* bin û wê neyêne

guhartinê. Gelekê ecêbmayî bimînin, wextê ku derheqa qirara dîwanê ya bona emirê xwe bibhên, lê gerekê usa nîbûya. Hindava we da jî gerekê usa nebe.

Hûn hazirin? Anegorî Xebera Xwedê, em dikarin li ser xwe guman nêzîkî Hakimê ezmîn bibin. Meremê vê kitêbê ew e ku alî we bikin, bona ku hûn hazir bin. Eger cahilê holandî yê nava mesela me da wededa hîn bûya û bona çûyîna Sîngapûrê xwe hazir bikira, ewê cezayê wî cûreyî yê berk nestenda. Gelekî girîng e, wekî em bona dîwana xwe hazir bin, çimkî qirarên dîwanê, yên ku wê li ber textê Dîwanê bên qebûlkirinê, wê yên heta-hetayê bin.

## Heqdayîn

Nava heta-hetayêda wê ji yekê zêdetir dîwan bên kirinê. Dîwanê hebe bona bêbawara, bona bawarmenda û serbara serda bona milyaketa jî. Nava wanda wê qirarên cûre-cûre hebin.

Hinek wê zirarê yan jî ceza bibînin, lê yên mayîn wê heq bistînin. Derheqa vê yekê da emê serên kitêbê yên mayîn da bi hûr-gilî xeber bidin, lê îzinê bidin, careke mayîn bêjim, wekî ew qirar wê yên heta-hetayê bin. Îzin tune vê yekê zêdetir, gelek cara biwekilînin. Bicêribînin careke mayîn ew tiştê, ku xilaz nabe bi fikira xwe bînine ber çavê xwe, ew yek xwestina Xwedê ye, wekî em pêşda derheqa wê yekê da bizanibin û bicedînin bona çûyîna peyî Xebera Wî em heq bistînin. Pawlos dinivîse:

> "Hûn nizanin, wekî hemû merivên ku direvin, nava lehcê da nin, lê tenê yek xelatê distîne. Hûn jî usa birevin, wekî xelat bibe ya we. Her sporsmênek, yê ku bona lehcê hazir dibe, xwe terbe xweyî dike û bi tiştên nava xwe da tê sînorkrinê. Ew wê yekê dike, bona ku taceke kulîlka bistîne, ya ku wê zûtirekê biçilmise, feqet em [usa dikin, wekî taca heta-hetayê bistînin], ya usa, ya ku wê neçilmise. Bo wê yekê jî ezê bêyî merem nerevim (bêyî meremê zelal). Ez mînanî boksyorekî nînim, yê ku nava hewê da derba dighîne û pêşberî wî tu kes tune. Mînanî[boksyor] ez bedena xwe dixim[bi cûrê berk nêzîkî bedenê dibim, bi dijwarîya şîret dikim] û dikime bin kontrola xwe..."
> (A Korintî 9:24-27, AMP).

Pawlos zelal dibêje: "Ez bêyî merem narevim (bêyî meremê zelal)". Nava tercimeke mayîn da vî cûreyî nivîsar e: "Dêmek ezê

rast berbi meremê birevim û her gaveke min bi meremekî ye" (Xeber 26 NLT). Her merivek gerekê hema usa bike: her kes gerekê li ser xwe guman bireve û meremên wî yên serkevtinê hebe. Em tevî yên mayîn nakevine lehcê, lê bi xwe ra dikevine lehcê.

## Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin

Em nikarin bifikirin, wekî li ber textê Dîwanê her tişt wê bi cûrekî bê rastkirinê. Tu afûkirineke me tune, çimkî Xwedê xwestina Xwe li me eyan kirîye. Gelek meriv, yên ku wê li ber Dîwanê bisekinin, nava temamîya jîyana xwe da guman bûne, wekî ew ji merivên dor- berên xwe diha baş jîyana xwe derbaz kirine, lê wana tu cara îzin nedaye, wekî heta-hetayî bibe qewata wane livandinê û ew rêberîyê li wan bike. Ji vê derê jî sernivîsara vê kitêbê pêşda hatîye: "*Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin*".

Xebera "livandin" dikare bi vê fikirê bê femkirinê: "bilindkin", "rêberîyê bikin", "kontrol bikin", "rê nîşan bidin" yan jî "qewata livandinê bidin". Li ser vê dinîyayê çi rêberîyê li me dike û piştgirîyê dide me? Heta-hetayî, yan tiştê wedelû? Gelo em bi serwaxtîya xwedêtîyê dişuxulin, yan em xwe himberî yên mayîn dikin? Diqewime, wekî me guhê xwe danîye li ser lefekîya, edeta, yan jî çîroka, yên ku li hinek civîna, yan jî mekteba tên hînkirinê. Gelo ew yek, li ser çi me jîyana xwe çê kirîye, wê li ber textê Dîwana Xwedê sekinî bimîne, yan cedandinên me wê heta-hetayê undabin? Bîra xwe da xweykin, wekî em îdî zanin, ku norma dîwana me wê kîjan be: "Ew xebera ku Min got, wê dîwana roja wî ya derbazbûyî bike" (Yûhenna 12:48).

Gelek meriv, yên ku dihebînin, wekî ew mesîhîne, wê ecêbmayî bimînin, wextê ku li ber dîwana Îsa Mesîh bisekinin. Wana çareserî li ser hîmê hinek hînkirinên peymana Nû çê kirine, lê cedandin nedane xebatê, ku şêwira Xebera Xwedê bizanibin. Pirsa min ya bona we ev e: hûn dixwezin rastîyê piştî qirara dîwana *heta-hetayê* pê bihesin, wextê ku îdî dereng be û wê tu tişt neyê guhartinê, yan hûn dixwezin niha wê normê bizanibin, bi kîjanê qirara wê wê bê dayînê.

Serê kitêbêyî mayîn da serhatîke başqe wê destpê bibe, ya ku wê serê mayîn da berdewam bibe. Bi guhdarî bixwînin û bicêribînin bi

çiqwasîva meriv dikare bîr bîne, çimkî emê gelek cara derheqa wê da xebrdin. Derheqa dawîya wê serpêhatîyê da emê serê kitêbêyî heyşta da bixwînin û emê derheqa rastîyên nava wê da hetanî dawîya kitêbê xeber bidin. Temamîya kitêbê dora vê serpêhatîya başqe hatîye çêkirinê. Bo wê yekê jî ez hîvî dikim, sera-bera nexwînin. Hûn dikarin wextê vê hînbûnê careke mayîn vegerine ser wê.

Xwedê tevî min xebat derheqa piranîya qinyatên nava vê kitêbê da raberkirî kirîye. Ezê derheqa teribandinên xwe da, yên nava jîyana min da qewimî we ra gilî bikim, yên ku Ruhê Pîroz bi “hûrdîtinoka” r’astîya Xwe nîşanî min daye. Ez gumanim, wekî ewê we def bide ku hûn bi hizkirin Încîlê lêkolîn bikin, bona ku roja Dîwanê hûn li ser bingeha qewîn sekinî bin. Ezê çend şaşîyên civaka me yên mezin raberî we bikim, rûyê çi da meriv ji Wî dûr dikevin, kîjanî ew çawa Xilazkirê xwe nav dikin. Nava wede da hûnê zendegirtî bimînin, hûnê bên şîretkirinê û rastkirinê, lê peyî wan tiştara sozdayîn, guman û berdildahatin wê bên.

Eger hûn natirsin, dixwezin rastîyê bizanibin û bi dil berbi Xwedê dicedînin, werin em pêşda herin. Hûnê şa bin, wextê ku vê rê derbaz bin. Vê yekê qebûl bikin:

> “Pêşkêşa Xwedê heleqetîyên me yên tevî Wî daye dasekinandinê û jîyana me li me vegerandiye. Serbara serda jîyana heta-hetayê li pêşîya me ye. Tu dikarî nava vê yekê da li ser xwe gumanbî. Ez dixwezim, wekî tu li ser tabîya qewînbî. Nava van pirsa da li ser tabîya qewîn be, bona ku ew merivên ku li ser Xwedê gumanin, li ser rastîyên bingehîn bên merkezkirinê, yên ku wê bona hemûya kardar bin” (Tîto 3:7,8 MSG).

SERÊ 2-A

# Padişatîya Afabêlê: Jîyana Li Êndêlê

*“Û [Îsa] gelek tişt ew bi meselava hîn dikirin (bi meselava yan himberîhevkirinava, yên ku bona şirovekirina wana tevî tiştên rast didane xebatê)...”.*
— Marqos 4:2, AMP

Wextekê dinîyak hebû, ya ku mînanî dinîya me bû, lê ew bi gelek alîyava cuda bû. Li wê dinîyayê dewletên başqe tunebûn, tenê padişatîke mezin hebû, ya ku çawa Afabêl dihate navkirinê. Nenihêrî wê yekê, wekî ew padişatî li temamîya dinîyayê raxistîbû, tenê paytextekî wê hebû, kîjanî serkarîya temamîya padişatîyê dikir. Ew çawa bajarê Afabêlêyî Mezin dihate navkirinê, kîjanî emê çawa Afabêl nav bikin.

Xudanê vî bajarê nebînayî padişê bi navê mezin Cêylon bû. Bindestîyên Cêylonê padişa bi hizkirin û bi hijmekarî nêzîkî wî dibûn. Ewî hizkirina kûr hindava hemûya da dida kivşê, ya ku dihate texmînkirinê ku xilazbûna wê tune bû. Padişa qewat û serwaxt bû, lê bi wê yekêva tevayî ew usa jî laqirdçîkî (henekçîkî) mezin bû. Nenihêrî wê yekê, wekî tabîya wî ya padişatîyê bû, ewî usa jî hiz dikir tevî bindestîyên xwe biketa nava heleqetîya. Wextê ku ew dikete nava heleqetîya, merivên dor-bera diketine nava atmosifêra dilovanîyê. Hazirîya wî hemû govekên jîyanê bilind dikir û dida li ser dereca (asta) nû. Ew yekî dûrdîtî bû û bi dîtina îşên meriva, bêyî şirovekirin, dikaribû menîyên dilê wan bibîne.

Bavê Cêylon, yê ku hîmê Afabêlê danîbû, bi navê padişê Bavê Hîmdar eyan bû. Piştî wê yekê, çawa ku ewî li bajêr qeyde-qanûn îzbat kirin, ewî serkarîkirina padişatîyê derbazî cem kurê xwe kir. Binelîyên evî bajarê mezin alî Cêylon dikirin, ku ew serkarîyê li nehîyên padişatîya xwe ya der bike. Serkarîkirin bi sîstêma dereca

serkarîyê dihate mîyaserkirinê û usa jî bi destî serwêrê paytext dihate kirinê.

Bajar bi cûrê nebînayî mezin bû: têrîtorîya wî nêzîkî 520 çargoşe kîlomêtr bû. Proêkta bajêr usa baş hatibû çêkirinê, wekî nenihêrî wê yekê ku binelîyên wê gelekî six cîhwarkirî bûn, lê meriv nikaribû ew bajar nav bikira çawa bajarê bi binelîyên ji normê zêdetir. Bajar bi gundên dor-bera, malên nava bajêr çêkirî bû.

Li ser rastên nehîya Afabêlê yên rojavayê malên xebatkara bûn (yên ku bona dinîya me wê çawa malên gelekî baş bihatana hesabê). Nenihêrî wê yekê, wekî meriva xebateke giran dikirin, ew bona mecala jîyana li bajarê padişê razî bûn.

Nehîyên çîya, yên sînorên bajêre bakûr û başûr merivên pêşekar û hosta, sazbend, nivîskar, şikilkêş û yên ku xebatên êstêtîkî dikirin, diman. Malên wan gelekî bedew bûn û ji malên xebatkara berfirehtir bûn.

Beşa bajêre here bedew nehîya rojhilatê bû, li kîderê gelek malên bedewe başqe-başqe hebûn. Ev beşa bajêr jî çawa merkeza Padişatîyê dihate navkirinê. Padişê wedê xweyî pirê li vir derbaz dikir û li vir dima. Li merkeza padişatîyê usa jî ew meriv diman, yên ku tevî padişê dixebitîn. Li vir admînîstrasîya wî û cîgirên wî dixebitîn.

Merkeza padişatîyê tê bêjî kevirekî giranbiha bû, yê ku danîbûne li ser zinarekî bilind, ji kîderê dîmena berbi kenarên behra Mezin vedibû. Ji behra şîn her dem bayê sist dihat û hewa paqij dianî bajêr. Li dor-berên van ava kenarên paqij bûn, ji bedewîya kîjana tenê baxçên padişatîyê zêdetir bûn. Ew baxçe li merkeza Padişatîyê li her cîya nikandîbûn û rengekî bedew didane hemû tiştî. Bêyî şikberî, li Afabêlê her cîh yê herî baş bû. Li evê beşa bajêr bedewîya her malekê tenê nedigihîşte sera padişê.

Merkeza Afabêlêda dara jîyanê bû. Tenê bindestîyên padişê dikaribûn rezê wê darê tam bikirana. Tama rezê wê darê gelekî xweş bû û dar bi xwe jî gelekî bedew bû, lê bêhna wê jî bi qewateke ecêb bû.

## Binelîyên Êndêlê

Ji rastên Afabêlê berbi rojavayê qûmistana Der bû, ya ku hetanî sed kîlomêtrî diçû dighîşte çemê Adongaêyî mezin. Bi derbazbûna çemê Adongayê hûnê bighîştana beşa padişatîyêye mayîn, navê

kîjanî Êndêl bû. Çawa ku zarokên welatîyên Afabêlê dihatine dinîyayê, ew derbazî Êndêlê dikirin. Hetanî ku hevtîya wane ewlin temam dibû, ew teslîmî xulamên padişê dikirin ku wana xweyî bikin. Wextê ku welatîyên nû, yên ku êdî êndêlî bûn, dibûne pênc salî ew dişandine mekteba Êndêlê, li kîderê deh sala dixwendin. Ew derheqa jîyana Afabêlê û padişê mezin Cêylonda hîn dibûn.

T'enê xulamên padişê û dersdarên wî dikaribûn rastî Cêylon bihatana. Pênc sala carekê ew bi cûrê xewile diçû Êndêlê û çi ku dilê wî da derheqa mektebê û zaroka da hebû, digote wan. Derheqa hazirîya xweda ewî tu cara elam nedikir, lê li wir jî dilovanîya wî li her govekeke jîyana Êndêlê da dihate kivşê.

Xwendina dehsaleye li mekteba Êndêlê şagirt bona jîyana pêşerojê hîn dikirin. Panzdeh salîyê da wedekî kurt didane şagirta, ku ew hemû tiştên çi ku hîn bûne bidine xebatê. Nava wî wedeyî da hebûn û cabdarî didane wana. Jîyana wana sed pêncî sal bû û ew yek, ku ewê çawa salên xweye cahiltiyê derbaz bikirana wê qirar bikira, ku ewê paşê wedê jîyana xweye mayîn li kîderê û çawa derbaz bikirana. Ew cêribandin wê pênc sala bikişanda û ji şagirta tu yekî derheqa wê yekê da nizanibû. Wanra tenê gotibûn, wekî ewê ji deh sala derbaztir nebe. Wextê ku ew wede ser hevda bihata, ji wana her yek wê li ber padişê bisekinîya, bona ku bo qirarên xweye kirî hesab bida.

Ev wedê cêribandinê, wê qirar bikira, ku gelo ev şagirt aminin, yan na? Ewên ku wê gura emirkirinên Cêylon bikirana, him bi gotina xwe û him jî bi karê xwe û wê serwêrtîya wî nas bikirana, wê li Afabêlê çawa welatî bihatana qebûlkirinê. Ew şagirt wê anegorî qirarên xweye qebûlkirî heq bistendana.

Feqet, eger şagirta jîyanên xwe tenê bona xwe derbaz bikirana û dijî wan qanûna derketana, ewê berbi welatê Lonê bihatana dêportkirinê. Lon cîhekî li qûmistanê bû, li kîderê tarî, tenêbûn û bêgumanî bû. Ewên ku dijî qanûna derketana, wê li wir bihatana girtinê û wê hetanî dawîya jîyana xwe bihatana zêrandinê.

Merivê ewlin, yê ku şandibûne li wî cîhî, Dagon bû. Ew bû hîmdarê Lonê û xudanê wêyî xirab. Nenihêrî wê yekê, wekî gelek sal pêşda ew dijî Cêylon derketibû, hukumê wî dîsa li Êndêlê mabû. Ew êndêlîyên ku serwêrtîya Cêylon qebûl kirin, ji hukumê Dagonê

xirab aza bûn, lê ewên ku nexwestin qulixî Cêylon bikin bin hukumê ewî xudanê xirab da man.

Bona ku tarîstan neketa nava padişatîyê, Cêylonê padişê mezin mecbûr bû qanûnê qebûl bike, bona ku yekîtîya têrîtorîyayên Afabêlê û binelîyên wê biparêze. Ewên ku peyî Dagon diçûn û serwêrtîya Cêylon bi xeber û karên xwe qebûl nedikirin, wê bihatana şandinê li welatê Lonê, hetanî dawîya jîyana xwe.

Serpêhatîya me vî cûreyî destpê dibe. Emê dîna xwe bidine jîyana pênc şagirtê Êndêlê. Navên wan evin: Serbest, Xapyayî, dilê Gumanbir, Xwehiz û Xêrkir. Îzinê bidin ku ez her yekî raber bikim.

## Serbest

Yê Serbest her dem dijî heyîna Afabêlê ye. Ew bi rastî nikare bawar bike, wekî şexsekî bi navê Cêylon, yê ku ewî tu cara nedîtîye û rast pê nehatîye, dewê dike ku hindava Wî da amin be, û usa jî bi cûrê berk cêrge qanûnên wî xweyî bike. Ew difikire, wekî serhatîya derheqa Cêylon da derew e, meremê kîjanê ew e ku wî û şagirtên mayîn bin kontrola dersdara da xweyî bike. Ew eyciz dibe, naxweze here mektebê û derheqa wê padişatîyê da hîn bibe.

Yê Serbest qerfê xwe li yên mayîn dike bona wê yekê, wekî ew bawarîya xwe li tiştên usa yên bêfikir dianîn. Ew qirar dike usa bijî, çawa ku ew rast hesab dike û ji qanûnên Cêylon jî dixweze aza bimîne. Ew hazire tenê wî çaxî gura padişê da be, eger emirkirinên padişê wî ra dest bidin. Wî çaxî ew gurê dike, çimkî ew bi xwe usa dixweze. Ew li ser xwe guman dibêje hemû kesî, wekî ew hazir nabe gura yekî mayîn bike.

## Yê Xapyayî

Yê Xapyayî dijî heyîna Afabêlê dernakeve. Ew bawarîya xwe li Cêylonê padişa tîne û bi hijmekarî nêzîkî sozdayînên wî dibe. Ew bi fikira xwe û bi devkî hînkirinên mektebê û qanûnên wê ra qayîl dibe, lê jîyana wî hîmlî dijî wan hînkirina ye. Ew bi hazirî derheqa wê yekê da xeber dide, wekî gura padişê û hînkirinên wî da ye, tevî bernamên mektebê dibe, wextê ku ew li wî xweş tên, lê wextê ku ew kara xwe nav da nabîne, fikira wî lez tê guhartinê.

Cûrê jîyana wî dijî cûrê peyîhatîyê Cêylonî rast e, lê bi saya şexsîtîya wî ya hukumdar ew yên mayîn berbi rîya xwe dikişîne. Ew tu cara derheqa wedê xweyî cêribandinê û dîwana nêzîk da nafikire.

Yê Xapyayî tevî yê Serbest nava heleqetîyên baş da ye, nenihêrî wê yekê, wekî derheqa heyîna Cêylon da ew bi hevra qayîl nabin. Yê Xapyayî yekî şa û laqirdçî ye û li yê Serbest xweş tê ku tevî wî nava heleqetîya da be.

## Dilê Gumanbir

Dilê Gumanbir li mektebê şagirtê herî dilsoz e. Ew gelek cara caba dersa dide û her dem qîmetên here bilind distîne. Ew gelekî aktîv e û ji mektebê der jî teşkîldarîya teşkîl dike, bona ku alî şagirta bike ku ew tevî civakê bibin. Bi dînaxwedayîna şagirta, meriv dikare li ser xwe guman bêje, wekî ew ji hemûya gelektir dicedîne qulixî Cêylon bike.

## Yê Xwehiz

Yê Xwehiz bawarîya xwe li Cêylon û hînkirinên wî tîne. Ew hindava heyîna Afabêlê da şikber nîne û ew eşkere, mînanî hevalên xwe, derheqa wê yekê da xeber dide. Ew bawar dike, wekî Cêylon padişakî gelekî baş e û usa jî rehm e û wê hindava wan hemûya da rehm be, yên ku wî dihebînin û hindava wî da aminin. Çawa jî hebe, fikira wî ya derheqa hînkirin û xeysetê Cêylon da kêm e. Ew bîr dike, wekî Cêylon padişakî heq û pîroz e, bi wê yekêva tevayî rehm e û wana hiz dike. Dêmek yê Xwehiz derheqa Cêylon da bi cûrê navhevxistî difikire. Ew guman e, wekî yê Xapyayî, dilê Gumanbir û ya Xêrkir wê nava padişatîya Cêylone kamil da bên qebûlkirinê. Feqet ew bi xemgînî tenê derheqa yê Serbest da difikire, yê ku eşkere dijî padişê ye.

Yê Xwehiz guman e, wekî ewên ku bi devikî Cêylon qebûl dikin û usa dijîn ku qanûnên wî yên sereke neteribînin, wê bikevine Afabêlê. Çawa jî hebe, çawa ku navê wî dide kivşê, ew hîmlî xwe hiz dike û gelek cara îşên qenc bona kara xwe dike. Carana yê Xwehiz bi dilovanîyê pêşda diçe, lê wextê ku lazim dibe ew anegorî berjewandîyên xwe dişuxule.

## Xêrkir

Û ya dawî, keça bi navê Xêrkir, ya ku bi dil qanûnên Cêylonê padişa qebûl dike û gura wî daye. Ew ne tenê prînsîpên Cêylon hîn dibe, lê dicedîne bizanibe ku dilê ewê ku emir dike çi tê da heye. Ew gelek wede derbaz dike ku xwestina Cêylon bigere û fem bike. Ew bi seheta lêkolîna dike û bi xwepêşkêşkirinê bona gulvedana mekteba Êndêlê û civakê qulix dike. Ew zane, wekî piştî panzdehsalîyê wedê wê wê hindik bibe, ku xwestinên padişê mezin mîyaser bike. Meremê wê ew e ku ew bi cûrê tam bona kamilîya Cêylon bijî û ew îzinê nade ku berjewandîyên wê dijwarîya bona meremê sereke çêkin.

Xêrkir Cêylon hiz dike û hîvîya wê rojê ye, wextê ku ewê wî bibîne. Ew bi hizkirin gura wî da ye û gelek cara meriva ra derheqa rehmbûna wî da xeber dide. Rûyê wê yekê da gelek meriv qerf-nûçika li Xêrkirê dikin û naxwezin tevî wê bikevine nava heleqetîya. Nenihêrî wê yekê, wekî ew li ser wê tabîyê ye, dêmek rûyê aminaya qewîn ya hindava Cêylon da tu tişt nikare wê paşda bigre ku ew hindava padişê wî cûreyî da usa nîbe.

## Şagirtên ku mekteb xilaz kirine

Ev pênc êndêlî jî bûne panzdeh salî. Roja qirarkirî hat û wana jî tevî du hezar şagirtên mayîn mekteb xilaz kirin. Her yekî teslîmkirineke mexsûs stend û pêra jî pere dane wan, reqema kîjana Cêylon qirar kiribû. Wextê êvarîya xilazkirina mektebê, serkarê mektebê ew pere teslîmî her yekî kirin.

Ji wan her pênc xwendikara ev stendin: yê Serbest pêncîpênc hezar dêpozît stend. Yê Xapyayî û dilê Gumanbir, her yekî çil hezar dêpozît stendin. Yê Xwehiz perê herî mezin, hevtêpênc hezar dêpozît, lê ya Xêrkir bîstpênc hezar dêpozît stendin. Xwendikara perên xwe hildan û teslîmkirinên dawî stendin. Bi vî cûreyî welatîyên cahil ji mektebê aza bûn.

## Yê Ariş-vêrişçî

Nenihêr’î wê yekê, wekî yê Serbest hindik diçû dersa, lê ewî dîsa hinek ders bîr dianîn. Carana ew difikirî, ku gelo bêfikirîyên mektebê dikarin rast bin? Eger usa bû, wî çaxî gumana wî hebû,

wekî tabîya wî wê hukumî li ser wê yekê nekira ku ewê çiqas pere peyî xilazkirina mektebê ra bistenda.

Destê Serbest dilirezîn, wextê ku ewî pakêta bi pera hildida. Wextê ku ewî pakêt vedikir, ewî gerekê bi zendegrtîbûna xwe û texmînkirina sivikayê zeft bikira, fem bikira ku çiqas pere dane wî. Ew serbara serda diha ruhdar bû wextê ku pê hesîya ku ewî bi panzdeh hezara ji dilê Gumanbir zêdetir stendîye û perên wî du cara ji perên Xêrkirê zêdetir bûn. Ew fikirî: *“Gelo çiqas wede û qewat hatine xebitandinê! Ya Xêrkir û dilê Gumanbir temamîya wedê xwe li wir derbaz kirin û wextê xwe nava dersên bêfikir da unda kirin û çiqas sehet dane mektebê. Feqet wana dewsa wê yekê çi stend* ?”.

Vê yekê fikirên Serbest yên derheqa wê yekê da diha da qewînkirinê, wekî Cêylon tune bû. Ewî qirar kir, wekî ew pere dê û bavên xwendikara hiştibûn, yê ku gelek sal pêşda unda bibûn. Vê yekê fikira wî ya derheqa wê yekê da îzbat kir, wekî serhatîya derheqa Cêylonê padişa da feş bû, yê ku mekteb li ber xwe derxistibû, bona ku kontrola xwe li ser cahila îzbat bikira û azaya wan bida sînorkirinê.

Piştî xilazkirina hînbûnê, Serbest çend hevtîya bi cûrê eydê derbaz kir û paşê fem kir ku gerekê şuxulek destpê bikira. Ew êdî ditirsîya, wextê ku didît, ku perên wî çawa lez xerc dibûn.

Serbest bi ariş-vêrişa avtomaşînava mijûl bû û fem kir, wekî ew ariş-fêrişçî ye. Şuxulê wî baş pêşda diçû. Ji xwendikarên tezexilazkirî geleka beşeke perên xwe li cem Serbest, li ser kirîna avtomaşînên xebitandî û yên teze xerc kirin. Mecalên wî zêde bûn. Ewî şuxulên nû destpê kirin û nava wan da gihîşte açixîyê. Kara wî zêde bû û ewî usa jî jîyana xwe ya şexsî da başkirinê. Ewî fem kir, wekî pere mecala hokum e, yê ku tê bêjî dikaribû bextewarî bikirîya. Hebûna wî û emirê wî yê berfireh bala jina dikişand û vê yekê ew diha ruhdar kir.

Serbest nediçû civînên hevtê, lê piranîya êndêlîya ew çawa welatîkî baş hesab dikirin, çimkî ewî piştgirîya mezin dida projeyên olê yên cuda-cuda. Dihate texmînkirinê, wekî jîyana vî êndêlî yê ku bi kel û ced dixebitî, wê ji wêya zêdetir baş nîbûya.

## Çêkirçîyê avahiya û yê ku erdê dagir dike

Yê Xapyayî, tevî Serbest, çend hevtîya xilazkirina mektebê bi heyteholî da kivşê. Rast e, ewî jî mînanî yên mayîn gelek nestendibû, lê ew şa bû, wekî perên wî ji yên Xêrkirê zêdetir bûn. Hema fikira wî ya navhevketî ew yek îzbat kir, wekî Cêylon awqas rehm bû, wekî hinek pirs bona wî girîng nîbûn. Li mektebê yê Xapyayî tevî çend keçika nava heleqetîyên bedenî da bû, nenihêrî wê yekê, wekî ew dijî wan dersa bû, yên ku ewî distendin. Ewî nava wê yekê da tu pirsgirêk nedidîtin, çimkî ewî bawarîya xwe li Cêylon û padişatîya wî dianî. Ewî nêzîkbûna xwe ya hindava jîyanê da çê kiribû: “*Hetanî ku ez dibêjim, wekî ez gura Cêylon da me û êşa mezin nagihînime meriva, li ber padişê tabîya min wê ya heq be*”. Bi fikirdarîya wî, Cêylon fem dikir, wekî hewcetîyên hemûya hene û tu kes bêyî kêmasî nîne. Ew guman bû, wekî wextê dîwanê hemû teribandinên wî wê bi rehmbûna Cêylon û kerema wî bihatana veşartinê, çimkî ewî bi temamîya dilê xwe bawarîya xwe li padişê dianî.

Piştî xilazkirina mektebê, piştî çend hevtîya, yê Xapyayî şuxulê xwe destpê kir. Ewî mal çê dikirin. Destpêkê da bona wî dijwar bû bikirçîya bibîne. Malên ku wî çê kiribûn, bi hemû alîyava yên baş bûn, lê tu kesî ew mal nedikirîn. Hinek difikirîn, wekî bahên wan gelekî bilind bûn, lê yên mayîn jî nikaribûn îzin bidana xwe, ku malên wî cûreyîye bedew dest bianyana. Wî çaxî yê Xapyayî gumanbir bû û bahên xwe kêm kirin.

Ewî çêkirina mala hema bi wê stîla bedew berdewam dikir, bona ku bikirçîya berbi xwe bikişîne. Ewî dîsa wî cûreyî usa dida, mînanî berê, lê matêrîyalên diha arzan dida xebatê û cûrê berê raber dikir, yan jî soz dida. Pareke matêrîyalên ku ewî didane xebatê anegorî qanûnên Êndêlê qedexekirî bû, ne anegorî standartên Êndêlê bû. Yê Xapyayî xwe afû dikir û difikirî, wekî qanûndarên Êndêlê, yên ku ew standart qirar kiribûn, ji çapê der fesal bûn. Ew guman bû, wekî matêrîyalên ku wî bijartibûn, wê li ber hemû qewilên hewê û her hukumekî teyax bikirana. Malên yê Xapîayî himberî bahê xwe gelekî bedew dihatine kivşê û êndêlîyên ku dixwestin bikirîyana, destpê kirin lez peymana tevî wî îmze bikin û ewî pêra nedigîhand çê bikira. Peyî wê yekê ra şuxulê wî qewateke nû stend.

Piştî çend sala yê Xapyayî qirar kir bi zeftkirina erdva mijûl bibe. Ji şikyatên bikirçîya ew îdî westyayî bû. Ew fikirî, wekî vê carê, piştî firotana erd, ewê ji hemû borcdarîya aza bûya, wê mecbûr nîbûya xebatên garantyayê yên daçêkirinê bikira.

Şabûna yê Xapyayî mezin bû, wextê ku ewî beşeke erd dît, bahê kîjanî hezar dêpozît bû. Qewilên wî cûreyî ber çavên wî cûrekî mayîn bûn. Feqet, paşê eyan bû, wekî ew erdê ku ewî dixwest, her dem dikete bin lêya. Derheqa wê yekê da tenê çend meriv zanibûn û hemû jî hevalên yê Xapyayî bûn. Ewî usa kir, wekî endamekî şêwira bajêr, yê ku hevalê Serbest bû, bernama wî îzbatke, bêyî kontrolkirina gêologî. Nava temamîya jîyana wî da li wir tu cara lêyî ranebibû û usa derdiket, wekî bi rastî pirsgirêk (problem) tune bû. Frotana vî erdî bêyî tu dijwarîya mîyaser bû. Peyî wê yekê ra dihate texmînkirinê, wekî jîyana wî bîznêsmênê cahil wê ji wêya zêdetir baş nîbûya.

## Alîkara dersdar

Dawîya hevtê, peyî xilazkirina mektebê ra, dilê Gumanbir tevî çend hevala, wedê xwe pêşkêşî kirîna hinek tişta kir. Ew fikirî, wekî hema bi du menîya hêja bû ew yek bikira: ya ewlin, wekî ewê tevî hevalên xwe wede derbaz bikira û ya duda ewê karibûya kinc û tiştên mayîn bikirya bona ku karyêra xwe ya xebatê destpê bikira. Dilê Gumanbir gelekî dixwest ku ew li mekteba Êndêlê bibûya alîkara dersdar. Çiqas dihate bîra wê, ewê her dem ew yek dixwest. Piştî hevtêkê ew gerekê hevpeyvînê da hazir bûya. Roja kirîna tiştaye duda, hevaleke dilê Gumanbir, ya Buxdanbêj gilî kir, ku çawa nava hevalên wan da, hevaleke wane tomerî, Xirabxeberdankirê gotibû berpirsîyarê mektebê, wekî dilê Gumanbir tevî şagirtekî ketibû nava heleqetîyên bedenî. Dilê Gumanbir carekêra hêrs ket. Gunehkarkirina wî cûreyî dikaribû bona stendina xebata alîkara dersdar dijwar pêşda bianîya. Ew yek derew bû, nava kîjanêda qet hinek rastî jî tunebû. Wextê temamîya xwendinê ewê xwe paqij xweyî kiribû. Dilê Gumanbir li ser wê fikirê bû, wekî Xirabxeberdankirê ew yek ji hevsûdîyê kiribû û diqewime ji hiznekirinê jî.

Hêrsa dilê Gumanbir gelekî rabûbû. Ew bi kûrayî xeyîdî û hetanî destpêka hevtîya nû fikira wê xayîntîya Xirabxeberdankirêva girêdayî bû, çimkî ewê ew çawa hevala xwe hesab dikir. Ewê sond xwer, wekî wê Xirabxeberdankirê mecbûr bike, ku ewê heqê kirina xwe bida.

Roja hevpeyvînê hat û dilê Gumanbir ecêbmayî bû, wextê ku ew derbazî li ser xebata xwe bû. Berpisrîyarê mektebê gote wê, wekî ew gilî gihîştine wî û peyî hinek lêpirsîna ra zelal bûye, wekî ew gotin yên nerast bûne. Xêncî wê yekê, wekî dilê Gumanbir xebat stend, ew usa jî li cem dersdarekî usa ma, kîjanî ewê gelekî hiz dikir. Jîyana dubare mektebê da dersdarê herî zane û cêribandî bû. Ew bîstpênc salî bû û îdî bi sala ser hev êndêlîyên cahil hîn dikirin. (Dîwana dersdara bîstpênc salîyê da nedihat, çawa ku ya êndêlîyên mayîn bû, lê sî salîyêda bû). Dilê Gumanbir zendegirtî ma, wekî ew hatibû bijartinê û ewê li cem rêberekî wî cûreyî xebathiz bixebitîya.

Nîvsalîya hînbûnê destpê bû û hemû tişt baş pêşda diçû, lê dilê Gumanbir hindava hevala xweye berê kîna xwe xweyî dikir. Nenihêrî wê yekê, wekî hemû tişt çawa li hev hat, ewê texmîn dikir, wekî nikare derewa Xirabxeberdankirê bîr bike.

Nenihêrî wê yekê, wekî hemû tişt baş dihate texmînkirinê, qezîya bere-bere dighîşt. Navê Jîyana dubare bi temamî lê dihat. Li ber civakê ew dersdsar bû, lê jîyana wî ya şexsî bi temamî cûrekî mayîn bû. Dîwana wî wê ya here berk bûya, çimkî çawa dersdar Jîyana dubare mecala dîtina Cêylon stendibû.

Êvarekê, wextê ku Dilê Gumanbir û Jîyana dubare tenê bûn, ewî cêriband hijmekarîya alîkara xwe hindava xwe da pêşda bîne. Dilê Gumanbir zendegirtîmayî û hêrsketî carekê ra dûr ket. Jîyana dubare teslîm nebû û wî cûreyî nava çend hevtîyên peyî ra wî cûreyî berdewam kir. Dilê Gumanbir destpêkir tabîya xwe biguhêre û guhdarîya gotinên dersdarê xwe bike, çimkî ew şexsekî eyan û aqil bû. Guhdarîya Jîyana dubare li dilê Gumanbir xweş dihat. Ewî xwe baş xweyî dikir, gelekî rehm bû û xêncî wê yekê ew çawa yekî ji mêrên bajêr yê here bedew dihate hesabê. Piştî şerkarîya hundur ya dirêj, dilê Gumanbir qîztîya xwe da Jîyana dubare û di navbera wan da romaneke aktîv destpê bû.

Hetanî wî çaxî texmînkirinên hizkirinê û xwestinê bona dilê Gumanbir nenas bûn. Her gav, wextê ku ewê Jîyana dubare didît, dilê

wê lez lêdixist. Fikira wê bi temamî diçû dighîşte wan êvarîyên ku tevayî derbaz kiribûn. Rûyê fikirên xwe yên nû da, ewê wedelû xeyda xwe ya kûr û veşartî, ya hindava Xirabxeberdankirê bîr kiribû.

Feqet, piştî çar meha, Jîyana dubare nişkêva ji wê dûr ket. Dilê Gumanbir navhev ketibû û ewê valayî texmîn dikir. Ewê gerekê bizanibûya, ku menî çi bû. Ewê bi fikirên xwe hemû rasthhatin bîr anîn û Jîyana dubare mecbûr kir ku ew menîya qirara xwe bêje. Paşê Jîyana dubare got, wekî ewî derheqa wê serhatîya Xirabxeberdankirê da bihîstîye, wekî dilê Gumanbir tevî şagirtekî ketibû nava heleqetîyên bedenî. Bi rastî menîya rast ew nîbû. Jîyana dubare hewaskarîya hindava dilê Gumanbir unda kiribû. Ew îdî derheqa keçeke mayîn da difikirî. Jinên cahil bi hêsanî bi wî dersdarîva hijmekar dibûn.

Dilê Gumanbir gelekî xwe bêhurmetkirî texmîn dikir. Bona wê fikira derheqa wê yekê da gelekî nebaş bû, wekî ewê her roj Jîyana dubare bidîta. Ewê li ber wê yekê teyax nekir û ji xebata xwe dûr ket.

Piştî çend roja, piştî texmînkirina wê bêhurmetkirinê, dilê Gumanbir salona bedewetîyê bi wan perên mayî vekir. Ewê terka tevbûna tevî berevbûnên her hevtêye li mektebê da, nenihêrî wê yekê ku Cêylon emir kiribû, wekî bindestîyên wî îzina wan berevbûna nedin. Dilê Gumanbir nedixwest tevî wan merivên feş biketa nava heleqetîya, çimkî piranîya wan meriva, wextê wan berevbûna li ber çavê wê feş dihatine kivşê.

Dilê Gumanbir roj bi roj diha berk dibû. Ewê îdî hindik cara mekteba Cêylon dianî bîra xwe. Ew aktîvî, ya ku ewê aza dida kivşê, bi nerazîbûnê û sînîzmêva hate guhartinê. Wextê ku derheqa wê yekê da ji dilê Gumanbir dipirsîn, ewê derheqa aminaya xweye hindava Cêylonda diheband, lê kûraya dilê xwe da ewê ew gunekar dikir, çimkî merivê mînanî Jîyana dubareyî bêesil mekteba wî da dersdarî dikir.

Wextê ku êtapa cêribandinê, ya dilê Gumanbir nêzîkî dawîyê dibû, ew îdî jineke gelekî xeyîdî bû, nenihêrî wê yekê, wekî eger ji wê bipirsîyana, ewê ew yek înkar bikira. Ewê rojên xweye mayî derbaz kirin, cêriband heyfa xwe ji wan meriva hilde, yên ku ew dabûne xeyîdandinê.

## Serokbajarê Êndêlê

Emê niha derheqa Xwehiz da gilî bikin. Ew ji perên stendî zendegirtî mabû. Ewî jî xilazkirina xwendina xwe bi heyteholî da kivşê û ewî êpêce derheqa hînkirinên Cêylon da zanibû, bona ku ji gavên necayîz dûr bima. Piştî hêsabûna çend roja, ewî destbi învêstîsîya kir. Învêstîsyayên wî gelekî kardar bûn û ewî mecalên xweye destpêkê lez zêde kirin. Tevî zêdebûna mecalên pera, ew nava merivên yaşê xwe da diha eyan bibû.

Xwehiz li meheleke Êndêlêye here baş xanî kirî û merivên hukumdar û yên ku serwêrtîya wan hebû, teglîfî li malê kir. Nevsên dewletê, sportsmênên profêsyonal, serkarên hevaltîya û mrivên mayîne eyan layîqî mêvanhizîya wî ya destvekirî dibûn. Ew lez dibû merivekî usa, heleqetîyên kîjanî li wî bajarî yên here mezin bûn.

Piştî sê sala Xwehiz qirar kir kandîdatîya xwe bona qulixa serokbajarê Êndêlê pêşda bikişîne û ew nava wan bijartina da, bi saya hukumê fînansî û tevgirêdanên civakî, ser ket. Wextê destpêka qulixa xwe, ew mecbûr bû gelek qirara qebûl bike. Ji wan qirara yek jî derheqa mektebê da bû. Rûyê zêdebûna binelîyên bajêr da hewce bû ku têrîtorîya diha mezin bidana mektebê. Mektebê gerekê erd bikirîya, peyman mor bikirana, xercên mezin bikirana, usa jî eşyayên pêwîst û dem û dezge bikirîyana.

Gava ewlin berevkirina mecala (pera) bû. Wextê berevbûna her hevtê Xwehiz bihîst, wekî mecalên anegor bona mektebê pêwîst bûn. Hetanî berevkirina mecala ewî ji hezarî hinek kêmtir pere pêşkêş kiribûn.

Paşê dema qebûlkirina qirarê pêşda hat. Mektebê êpêce pere berev kiribûn ku erdekî bikire, yê ku îdî hatibû dîtinê. Ew bona mektebê cîhekî gelekî baş bû û perên mektebê jî têra wî erdî dikirin. Feqet toreke dikana dixwest ew erd bikiriya. Şêwira bajêr di navbera mektebê û wê tora dikana da pareve bibû. Mekteb teşkîleteke usa bû, ya ku bi fînansî kar nedida û ew yek dida kivşê, wekî bi berfirehkirina mektebê fînansê bajêr wê zêde nebûna. Feqet dikana nû wê kara fînansî bida û wê bona binelîyên bajêr cîhên xebatêyî zêde saz bikirana.

Dengê şêwira bajêr pareve bûn, nîvî bûn û dengê qirarkir, yê serokbajar bû. Texmînkirinên Xwehiz dijî hev derdiketin. Xudîyên

tora dikana pêşda piştgirîke mezin dabûne wî, fînans xerc kiribûn, ku ewî kampanîya bijartina derbaz bikira. Wana usa jî hukumê xwe bona wî dabûne xebatê. Ew, gelek cara bi menîyên cûre-cûre, li mala Xwehiz bi mêvandarî dihatne qebûlkirinê.

Xwehiz dengê xwe da bona kara dikanê. Ewî qirara xwe bi wê yekê li ber civakê afû kir, da kivşê, wekî ewê alîkarîke mezin bona binelîyên Êndêlê bîne. Ewî got, wekî mecal çê bû ku cîhên xebatêye nû bên sazkirinê û kara bajêre fînansî zêde bû. Ewî pêşnyarî mektebê kir, ku ewê bicêribînin xwe bidine berfirehkirinê, nenihêrî wê yekê, ku ewî zanibû, wekî ew nikarin wê yekê bikin. Qirara wî peyîhatîyên Cêylon yên bêqelp razî nekirin. Lê piranîya binelîyên bajêr ew yek bi dil silav kirin.

Qulixa Xwehiz ya dusale îdî nêzîkî dawîyê dibû û ew hazir dibû bona bijartina kampanyake nû destpê bike. Bi texmînkirina wijdan, ewî pênc hezar dêpozît pêşkêşî mekteba Êndêlê kirin. Bi wê yekêva tevayî ewî soz da erdekî başqe bide mektebê, li ser kîjanî mektebê dikaribû avayê xweyî nû çê bikira. Vê yekê alî wî kir, ku ew aminaya piranîya peyîhatîyên Cêylon bistenda. Dihate texmînkirinê, wekî rêberê cahil wê qulixa xwe da careke mayîn bihata bijartinê.

## Xudana rêstoranê

Çawa ku Xêrkirê xwendina xwe xilaz kir, ewê ji bîstpênc hezarên xwe, bona çêkirina avayê mektebêyî nû, sisê pêşkêşî mekteba Êndêlê kirin. Ew bona wî hemû tiştî razî bû, çi ku dersdarên wê ew hîn kiribûn û ewê dixwest razîbûna xwe bi cûrekî bida kivşê. Bi bîst û du hezarên mayîn Xêrkirê rêstoran vekir.

Xêrkirê hiz dikir xwerinçêkirinêva mijûl bûya. Bi texmînkirina wê yekê, wekî bi hesabhildana îşê ku ewê hiz dikir û usa jî tabîya wê ya bîznêsmênîyê, vekirina rêstoranêye bi xebitandina pêşkêşên dayî cûrê herî baş bû bona qulixkirina bo civaka xwe. Ewê xwerinçêkirên Êndêlêye here baş teglîf kirin. Bi berevkirina, kordînasyakirina zanebûnên wan, ewê navnîşeke xwerinaye baş hazir kir. Rêstorana wê carekê ra gihîşte açixîyê.

Nenihêrî wê yekê, wekî bona rêstorana xwe ewê gelek rewa û xelat stendin, ewê açixîya xwe her dem serwaxtîya Cêylonva dida

girêdanê. Nava hemû hevpeyvîna da ewê her dem razalixî elamî dersdarên xweye berê dikir û pesinê teşkîla xebatkarên xwe dida. Ewê nedixwest bi cedandinên xweva kubar bibûya û bida kivşê, wekî ew bi qewatên xwe giîştibû açixîyê. Ewê zanibû, wekî ew hemû tişt bi saya Cêylon bû.

Xêrkirê kara xweye fînansî bona alîkirinê da xebatê, him bona ola xwe û him jî bona mekteba Êndêlê. Ewê xwerin belaş dida xwerinxana mektbêye xêrkirinê, ya ku xwerin dida merivên feqîr. Gelek cara ewê êvarî teşkîl dikirin, bona ku xurek li xwerinxana xêrkirinê belakira. Ewê bi dil û can xwerina germ dida feqîra. Ewê qirar kiribû bîst û pênc selefê kara rêstoranê bide mekteba Êndêlê. Nava pênc salên êtapa cêribandinê da ewê îdî ji dused hezarî zêdetir dêpozît pêşkêşî mektebê kiribûn.

Xêrkirê her dem alî wana dikir, yên ku gelekî dixebitîn, lê nikaribûn hemû xercên xwe dadana. Tevî alîkarîya fînansîyê, ewê usa jî derheqa prînsîpên serwaxtîya Cêylon û açixîyên xwe da wan ra şirove dikir. Ewê her dem digote wana, wekî bona hemû destanînên xwe borcara Cêylone.

Nenihêrî wê yekê, wekî rêstorana Xêrkirê bi açixî dixebitî, lê ew tu cara teglîf nedikirin ku ew li mala Xwehiz tevî teşkîldarîyên civakî bibûya û ne jî hîvî jê dikirin ku ew qulixeke bajêre serkarîkirinê da cîhê xwe bigirta. Rûyê wê yekê da ku ew peyî Cêylon diçû, ew li ber çava cûrekî mayîn dihate kivşê. Feqet, rûyê wê yekê da, wekî ew ji alîyê êndêlîyên hukumdarda dihate înkarkirinê, nerazîbûn li cem Xêrkirê pêşda nedihatin. Ewê dicedand bighîje wan meriva, yên ku feqîr bûn. Ewê berevbûnên her hevtêye li mektebê hiz dikirin û her dem alîkarîya xwe pêşnîyar dikir, tişt pêşkêş dikirin, yan jî qulixên cûre-cûre dikirin. Xêrkir jineke cahile gihîştî bû.

## Roja dîwanêye biryarkirî

Roja êtapa cêribandinêye dawî hat. Ewên ku gerekê li ber dîwanê bisekinîyana, difikirîn, wekî ew yek wê nava pênc salên bi sire da biqewimîya, çimkî pênc salên ewlin îdî derbaz bibûn. Tu kesî texmîn nedikir, wekî wedê dîwanê wê awqas zû bihhata.

Ew roj mînanî rojên mayîn destpê bû, lê cûrekî mayîn jî ser hevda hat. Şeva dereng piştovanên padişatîya Afabêlê du hezar şagirtên berê birin. Ew ji dergê bajêre xewileva derketin, wextê ku êndêlîyên mayîn razayî bûn. Van du hezar binelîyên bajêre cahil rîya xewileva birin. Ew tûnêla kûr bû, binerd bû, ya ku bin çemê Adongayêva derbaz dibû. Piştî derketinê ew usa jî du roja nava qûmistana bêavva derbaz bûn. Li temamîya rê piştovanê Sereke her hewcetîke wana razî dikir, xurek, av û tiştên mayîn ji imbara mexsûs dida wan.

Piştovan gelekî baş nêzîkî wan dibûn. Wana bi guhdarî xebata xwe mîyaser dikirin. Nenihrî wê yekê, wekî wana caba hinek pirsên êndêlîya didan, lê hebûn pirs, cabên kîjana ew borcdar nîbûn bidana. Caba piştovanaye hîmlî, ya bona pirsên wî cûreyî ev bû: “Hemû tişt wê wedê xwe da eyan bibe”. Vê yekê hewaskarîya êndêlîya diha zêde dikir.

Êndêlîya dijwarîyên nava qûmistanê da t’exmîn nedikirin, wextê ku ew berbi wî bajarî diçûn û hîvîya gihîştina wî bajarî bûn. Roja sisîya, wextê ku ro derket, ew gihîştine serê girekî. Ji wir, bin tîrêncên royê da bajarê bedew hate kivşê. Afabêl diha bedew bû û nava fikirên xwe da wana wî cûreyî texmîn nedikir.

Çiqasî ew nêzîkî bajêr dibûn, eyantîya derheqa mezinaya wî bajarî da diha zêde dibû û berfireh dibû. Bi nihêrandina Afabêlê, ji alîyê rastê da berbiçav bû û dihate kivşê, wekî beramberî wî bajarî yên mayîn tunebûn. Himberî dor-berên bajêr Êndêl bedew nîbû.

Çawa ku ew gihîştine merkeza bajêr, êndêlîya dît, wekî li Afabêlê hemû tişt sax bû. Li wî cîhê nebînayî teyreda ne tenê distira, lê usa jî xeber didan. Stiranên wane xweş û dengê şîrin, ew bedewî didane kivşê, ya ku wana li ber çavên xwe didît û bi wê yekê rûmeta wî bajarî diha zêde dibû.

Vê yekê êndêlî zendegirtî nehiştin, çimkî wana îdî dîtibû, wekî hespên piştovana xeber didan. Hespa ne tenê bi hev ra xeber didan, lê usa jî sîyarên xwe ra xeber didan. Dihate kivşê, wekî hesp û sîyar nava heleqetîyên germ da bûn. Wana fem kir, wekî hemû tişt li Afabêlê xeber didan û li wir hizkirin û şabûn hebû.

Êndêlîyên cahil li kîderê binihêîyana li ber wan tiştên bedew vedibûn. Ew bi hijmekarî ew dor û ber dinihêrîn. Hema hewa paqij

jî hukumî li ser wana dikir. Ewê zelalî dida fikirên wan û qewat dida bedenên wane ji rê westyayî. Bona wan ji hemû tiştî zêdetir çemê ku nava bajêr ra dikişîya hewaskar bû. Dihate texmînkirinê, wekî ew sax bû, nava wî da jîyan dişuxulî. Mêlodîyayên nazik nava hewê da dighîştine hev û şexsên wan yên westyayî bi edilaya wededirêj didane hêsakirinê. Hemû tişt, ji kulîlkên biçûk destpêkirî hetanî hewê, tê bêjî bi jîyanêva tijîbûyî bûn. Tê bêjî hemû tişt dikaribûn jîyan pêşkêş bikirana. Li ewî cîhê bedew hemû tişt tijî bû.

Welatîyên cahil nikaribûn xwe zeft bikirana û bo wê yekê jî destên xwe dirêj dikirin û didane wî hemû tiştî, çi ku wana didît, wextê ku ew nava bajêr ra derbaz dibûn. Wana dixwest kere-ker birevîyana û hemû tişt bi xwe bidîtana, lê wana fem dikir, wekî wî çaxî îzina wê yekê tune bû.

Rêberîya wan kirin û birin serake mezin. Li wir jin û mêr ji hev cuda kirin. Ew avayî, li kîderê êndêlîyên cahil berev kirin, awqas mezin bû, wekî ew tê bêjî bêsînor bû. Here kêm sed hezar meriv dikaribûn aza hundur da cîh û war bûna.

Li beşên wê serayê îzin dane êndêlîya, ku ew li cîhê avxwekirinêye bêhnxweş xwe bişon, peyî ra kinc dane hemûya, bi kîjana ew gerekê rastî padişê bihatana. Hemûya bi şabûn kincên Êndêlêye nava tozê da ji xwe êxistin. Kincên wane kevin tê bêjî li wî bajarê nava ronahîyêda nefesal bûn û cûrekî mayîn dihatine kivşê. Xwestina êndêlyaye mezin, ya bona jîyana li Afabêlê dihate kivşê. Wana nedixwest paşda vegerîyana.

Piştî avxwekirinê û kincxwekirinê hemû kes careke mayîn gihîştine hev, ku taştê bixun. Nanxwerina wane bi heyteholî li hewşa vekirî derbaz dibû, li kîderê bi wedê kurt îzin dane wana, ku ew xwerinê bixun û bi hev ra xeberdin. Piştî xwerinxwerinê ew careke mayîn ji hev cuda kirin, lê vê carê bi navên wan. Xêrkir, Xwehiz û nêzîkî pênsed êndêlîyên mayîn birine serake li ser milê hewşêyî rastê. Dilê Gumanbir, Xapyayî û Serbest tevî hezar pênsid êndêlyên mayîn birine serake mayîn, ya ku li ser milê çepê bû. Wextê ku ew ketine wan sera, wana dît, wekî li jora derîya nav nivîsar bûn. Ew nav bi zimanekî başqe hatibûne nivîsarê, yên ku êndêlîyên cahil ra eyan nîbûn. Navê serayekê “Sera Jîyanê” bû, lê ya mayîn “Sera Dadgeha Heq”.

## Serayên Jîyanê û Dadgeha heq

Wextê ketina li sera li ser milê çepê, Serbest nerihetî texmîn kir, ya ku tê bêjî ew ditirsand. Ew bi fikirên xwe paşda vegerîya wan salên ku li mektebê dixwend û cêriband bi wan tişta ber dilê xwe da bê, yên ewî bi sivikayî derheqa Cêylon da bihîstibûn. Niha ew hemû tişt tê bêjî meriv navhev dixistin. Ew bona wê yekê poşman bû, ku awqas ders berdabûn, ku ew dersa da hazir nîbûye.

Niha jî ber cava ye, wekî ew şaş bûye, çimkî him ew bajar, him padişa, derheqa kîjana da li mektebê digotin, bi rastî hebûn. Serbest cêriband tirsa ku çiqas diçû zêde dibû, bide zeftkirinê û li ser wê yekê fikirên xwe bide merkezkirinê, çi ku derheqa hizkirin û reh'ma Cêylon da bîr dianî. Wî çaxî ewî nedixwest derheqa heqîtîya pîrozîya Cêylon da bifikirîya, nenihêrî wê yekê, wekî hema ew tişt bûn, ku bona guhdarîya wî şerkarî dikirin. Serbst cêriband xwe bi wê yekêva bide hêsakirinê, wekî ew welatîkî baş bûye û piştgirî, alîkarî daye teşkîldarîyên bajêre rezedilvana.

Serbest bêhna xwe kûr kişand û destpê kir dora xwe binihêre, ku wan dor-bera, li kîderê ew bû, qîmet bike. Bêyî tu dijwarîya ewî dît, wekî nava binelîyên Êndêlêye here xirab da bû. Ewî li wir merivên diz, derewîn û îçkexur dîtin. Li wir merivên usa hebûn, yên ku gelekî hindik dixebitîn, usa jî ew meriv bûn, yên ku dixebitîn ku hemû tiştî bi xwestina xwe bikin. Tirsa wî çiqas diçû zêde dibû, feqet hema wî çaxî, wextê ku ew tevî hev bibû, ewî dilê Gumanbir dît. Serbest çavên xwe girtin û tê bêjî sivikayî li ser xwe texmîn kir. Cerekê ra hate bîra wî, wekî dilê Gumanbir dersxana wan da peyîhatîya Cêylon ya here bêqelp bû. Ewî tê bêjî serbara serda bihsîtibû, wekî dilê Gumanbir li mektebê dixebitî. Eger ew tevî wî li wê serayê bû, bi texmîn hemû tiştê baş xilaz bûya.

Wextê ku ew berbi dilê Gumanbir diçû, ew Yê Xapyayî ket. Ev jî nîşaneke baş bû. Piştî mektebê ewî dilê Gumanbir nedîtibû, lê yê Xapîyayî hesab dikir çawa bawarmendekî xwepêşkêşkirî. Carana ew wextê xeberdana derheqa Cêylon da dijî hev derdiketin. Piştî dîtina hevalê xweyî berê, beşera Serbest bi temamî hate guhartinê.

Yê Xapyayî gelekî aktîv bû û fikirên wî berbi başîyê diçûn. Wana destêpê kir qise bikin û Serbest îdî neditirsîya. Tê bêjî, rehma Cêylon

ji fikira wan zêdetir bû. Gelo wî li wê serayê da nebaxşandîye hemûya, nenihêrî wê yekê, wekî wê fikira wî ra derbaz nebûya, gelo ew meriv dikaribûn xilazbûyî bûna? Bêguman ev yek rast e. Gelo ne usa ye, wekî dersdarê mezin, Jîyana dubare, hinekî ji wî wêdatir sekinîbû? Serbest xwe bi guman texmîn kir, wekî hemû tiştê baş be. Feqet ew hinekî xemgîn bû, ku Xêrkir û Xwehiz ne li wir bûn. Ewî usa jî nikaribû hesab hilneda, wekî çend merivên başqe jî li qulçên serayê digirîyan. Lê diqewime ew bi rehma Cêylonva hijmekar mabû?

Sera mayîn jî bi texmînkirinên mezinva tijî bû. Ew hevalên, ku peyî xilazkirina mektebê ra heleqetîyên xwe unda kiribûn, şa bibûn, çimkî careke mayîn gihîştibûne hev. Hemû qisên wan bi ruhdarîyêva tijî bûn, çimkî zûtirekê wana wê Cêylon bidîta. Ew wede hatibû, wextê ku ewê biketana nava sînor û navê xweyî rast.

Hemûya bi aktîvî derheqa bajarê bedew da gotûbêj dikirin. Wana zanibû, wekî ew bajarê ji Êndêlê baştir bûya, lê ew yek ji dîtinên wan zêdetir bû. Çi ku wana dîtibû diha zêde bû, ne ku çawa ku ew difikirîn. Gelo diqewime wana wê jîyana xweye mayî li wî cîhê rûmet derbaz bikirana? Ji wana her yek hazir bû erdê li wir paqij bikira bona ku layîqî wî qedirî bûya. Ewên ku li wê serayê hîvîyê bûn, zanibûn, wekî ew peyî Cêylon çûne, lê bere-bere ewên ku li wir hazir bûn, diha kûr ketine nava fikira. Gelo ew hindava Cêylon da amin bûne? Zûtirekê ewê derheqa wê yekê da pê bihesîyana. Şabûn hinekî tevî tirsê bû, feqet ew xulamên şikestî hîvîyê bûn Padişê xwe bidîtana.

Pêşda gerekê dîwana li sera Jîyanê bihata kirinê. Feqet emê hinekî dereng derheqa wan da bêjin. Lê niha werin em binihêrin, ku li sera Dadgeha heq çi qewimî.

## Gazîkirin

Îdî nîvro bû. Li sera Dadgeha heq ewên ku hîvîyê bûn, pêra gîhandibûn dilminayê û gumanê dest bînin û bifikirin, wekî hemû tiştê baş be. Ew hemû tiştê ku fikirên wan navhev dixistin, yan jî nava jîyanê da şaş dihate texmînkirinê, wana rehma Cêylon û rêyên Wî yên veşartîva didane girêdanê. Van fikira dilminayî dida wana.

Ji nava hezar pênsed êndêlya da Serbest hate gazîkirinê. Çar piştovanên padişê hatin, ku rêberîyê berbi sera Dîwanêye mezin li

wî bikin. Wextê derketina ji wê serayê ewî cêriband atmostfêrayê bide sivikkirinê, û ew kenîya û çavê xwe piştovanekî ra quripand, yê ku nişkêva li çavên wî nihêrî. Ew ecêbmayî bû, wextê dît ku piştovan tu rêaksîya neda, caba wî neda.

Serbest li peyî xwe dengê girtina dergehên serayê bihîst û fikirên wî careke mayîn vegerîayne li cem wî. Dilê wî sîngê wî da mînanî defê lêdixist. Dengê lêzlêxistina dilê wî awqas bilind bû, wekî ewî texmîn dikir, ku piştovan jî ew deng dibhîstin, lê tê bêjî wana ew yek nedida kivşê. Ewê gelekî bixwesta ku yê Xapyayî tevî wî bihata. Zûtirekê ewê li ber Hakim bisekinîya û ewê bixwesta ku ew tenê nîbûya. Serbest lez gumana xwe unda dikir.

Hetanî ketina sera Mezin, piştovanekî lez nasîya wî da qanûnên sera Dîwanêye xwexweykirinê. Serbest bi serê xwe da kivşê ku fem kir, lê ew ditirsîya, wekî ewê gotinên wî bîr bike. Dilê wî îdî tê bêjî guhên wî da lêdixist, tê bêjî ewê zyan bida bihîstina wî. Piştovan bi serê xwe da kivşê, çawa nîşana wê yekê, wekî Serbest xwendina wî fem kir û wî çaxî dergehên serayê fireh vebûn.

Wextê ku Serbest gava ewlin avîte berbi wê sera mezin, ewî texmîn kir, wekî bedena wî dilerizî. Niqitkên xwîdanê li ser birîyên wî berev bûn. Ew tevî hev bibû, çimkî rûyê dîtina wî hemû tiştî da, ew bi kûrayî zendegirtî mabû.

SERÊ 3-A

# Padişatîya Afabêlê: Roja Dîwanê A

*“Îsa her dem ev mesele didane xebatê,*
*wextê ku Ewî elaletêra xeber dida. Bi rastî çawa ku pêxembera*
*gotibû, wekî Ewê gelek mesela bide xebatê, Ewî tu cara wanra bêyî*
*meselekê xeber nedida. Çimkî pêxembertîya vî cûreyî hebûye: “Ezê*
*bi mesela xeberdim: Ezê şêwirên ji*
*destpêka wededa veşartî şirove bikim””.*
— Metta 13:34,35, TLB

Hetanî berdewamkirina vê serpêhatîîya alêgorîk, ez dixwezim careke mayîn xeberên Îsa yên derheqa dîwana ku tê, bidime kivşê. Yûhenna 12:28-da Ew dibêje: “Ew gotina Min got, wê dîwana wî ya roja derbazbûyî bike”. Em êdî wê normê zanin, bi kîjanê li ber textê Wî dîwana me wê bê kirinê. Ew norm kitêba Pîroz e.

Bo wê yekê jî gelek gotinên Cêylon, kîjana ewê li sera Dîwanê bêje, wê bi kivşkirinên reqema bin. Ewê ji parçên kitêba Pîroz bin, bi tercimên cûre-cûre, kîjana hûn dikarin xilazîya vê kitêbê bibînin. Piranîya gotinên Cêylon ji parçên kitêba Pîroz in, yên ku derheqa her merivekî ji vê serhatîyê tên xebitandinê.

Vê yekê bîra xweda xweyî bikin û werin em paşda vegerine Afabêlê.

## Dîwana Serbest

Sera mezin diha gelekî mezin bû û zêdetir berbiçav bû, ne ku Serbest dikaribû bianîya ber çavên xwe. Eger mecal bidana wî, ku ewî derheqa dîtinên xweda gilî bikira, derheqa wan hezar pênsid merivada bigota, yên ku hela hê hîvîyê bûn, ewê nikaribûya tu xeberek bida xebatê bona gilîkirina mezinaya wê yekê. Ew hemû tişt, çi ku ewî li Êndêlê dîtibû, himberî arxîtêktûra wê serayê

kevinbûyî bû. Li serayê, bi texmîn, ji sed hezarî zêdetir meriv hazir bûn. Serbest tu cara awqas meriv carekêra û li cîhekî mayîn nedîtibû.

Serbest pêşda diçû û wî çaxî ewî sifetên welatîyên Afabêlê dîtin. Ya ewlin, ewî guhdarî da ser wê yekê, wekî fesala wan ya padişatîyê bû, sifetên wan jî gelekî zelal bûn. Xêncî wê yekê fikirek serê wîda pêşda hat: ew ji bedewîya wan meriva zendegirtî mabû. Tê bêjî ew ji dinîyake mayîn bûn. Menîya vê guhartinê ew bû, wekî îzin dabûne wana ku ew ji dara Jîyanê bixun.

Serbest fikirî: *“Diqewime ev meriv êndêlîyên berê ne?”.* Nişkêva ewî sifetê jineke nas dît. Navê wê Qencî bû û ew bi çend sala ji Serbest mezintir bû. Ewî bîr anî, wekî her dem qerf li Qencîyê dikirin bona wê yekê, wekî ew bedew nîbû. Niha ew gelekî bedew bû. Çakûçê wê dîsa ew bû û Serbest ew nas kir, lê niha ew diha bedew bû, ne ku her merivekî mayîn, kîjanî ewî li Êndêlê nas dikir. Bi rastî ewî kî didît, merivê kêm bedew jî, gelekî ji merivên ji cîhê bûyîna wî bedewtir bûn.

Wextê ku Serbest ser hişê xweda hat, ewî dît, wekî berên hazira li ser cîhekî hatibûne merkezkirinê, yê ku hema li pêşîya wî bû. Ewî tu cara tiştê usa nedîtibû.

Xilazîya serayê textek danîyî bû, lê em bêjin xebera “text” nikare bi heqî wê yekê bîne ber çava. Ew text yê herî rûmet bû. Bi dîtina ewê ku li ser text rûniştî bû, Serbest carekêra fem kir, wekî hema ew bû kanîya mezinaya wî bajarî. Hemû tişt ji wî merivê li ser text rûniştî dikişîya. *“Diqewime hema ew e Cêylon*”,– Serbest fikirî. Nişkêva ewî bi kûrayî bawarîya xwe li wî merivî anî, heyîna kîjanî ewî înkar dikir. Cêylon bedew bû, lê gelekî berk dihate kivşê. Lê diqewime hema wî çaxî ew usa bû. Wê diha rast be bê gotinê, ku ew bedew bû, lê nihêrandina wî wê demê ya tirsandinê bû. Cêylon gelekî balkêş dihate kivşê, lê Serbest çiqasî nêzîkî wî dibû, awqasî tirsa dilê wîda diha zêde dibû. Ew gumana ku hetanî wî çaxî li cem wî hebû, bi temamî unda bibû. Gelo ewê rastî çi bê?

Serebest dicêriband xwekontrolkirinê xweyî bike û ewî bi xwe xwera digot, wekî ew nêzîkî rêberê reh’m dibe. Di hundurê wîda şerkarî diqewimî: ew êdî şikber bû, wekî ewê layîqî qirara dîwanê ya baş bibe.

Serbest pêşdaçûyîna xwe berdewam dikir û gihîşte dikeke teng, li kîderê gotine wî ku ew bisekine. Li jorê, li ser text Cêylon dihate kivşê. Ew li ser xwe guman berbirî berevbûya bû:

– Hemû kes... gerekê nas bike û fem bike, wekî Ez Ew im, Yê ku fikira (mitale, texmînkirin û merema) û dila [kûrayên dil] lêkolîn dike, û Ezê bona we her yekî wî tiştî bidim [heqê bona kirina we], layîqî çihe karê we.

Serbest tevî yên mayîn guhdarî dikir, wextê ku nişkêva Cêylon li çavên wî nihêrî û emir kir:

– Bona aborîya xwe hesab bide.

Hetanî ku Serbest pêra bigîhanda xeberek bigota, şikilekî holografîk hate kivşê, kîjanîda jîyana wî ya li Êndêlê, ya ji roja mektebê ya ewlin destpêkirî hetanî hazirîya wî ya li Afabêlê, dihate nîşandayînê. Her karek, gotinek û menîk hatine kivşê û li ber cimeta berevbûyî hate eyankirinê. Ji wê eyantîyê Serbest tirsyayî bû, ya ku ewî derheqa Cêylon da stend: “Kesekî usa tune yê ku ji wî veşartîbe, lê li ber çavên Wî hemû tişt vekirî û eşkere ye, vekirî û neparastî ye, û em gerekê hesab bidin”.

Serbest xwe guvaşte ser hev, çaxê ewî kirinên xwe yên bêaqil, ne baş û xwehiz dîtin. Dîtina vê yekê, ya bi hazirîya awqas cimet, ew tevîhev kir û zendegirtî hişt. Ew hemû tişt, çi ku li Êndêlê çawa tiştekî negirîng û bêziyan dihate texmînkirinê, niha li ber vî hakimê rûmet û li ber welatîyên padişatîya Afabêlê çawa tiştên here xirab dihatine texmînkirinê. Ew ji kirinên xwe tirsîya. Ew çawa dikaribû awqas şaş û bêaqil bûya? Ewî qewat da xebatê, ku gumaneke biçûk bibîne û ewî dît. Ewî texmîn kir, wekî kirinên wî yên baş ji yên xirab zêdetir bûn.

Wextê ku dîtina jîyana wî bi temamî ser hevda hat, ewî li ser xwe sivikayî texmîn kir, nenihêrî wê yekê, wekî ew hîvîya cezakî mayîn bû. Ewê gelekî bextewar bûya, eger nava wê cimetêda çawa yê herî biçûk bihata hesabê. Ew guman bû, wekî Cêylonê bidîta, ku kirinên wî yên qenc ji yên xirab zêdetirin.

Peyî wê yekêra Cêylon ji katibê Sereke pirsî:

– Navê Serbest kitêba Jîyanêda nivîsar e?

– Na xêr, xudanê min,– katibê Sereke li ser xwe guman bersiv da.

Peyî wê yekêra Cêylon xeberda:

– Serbest, tu bona bijartina tebyeta xirab gunekarî, wê te bibine welatê Lonê, li kîderê tê jîyana xwe ya mayî bijî, nava tarîstanê, bêgumanîyê û tenêbûnê da biçerçirî.

Serbest zendegirtî mayî kire qîrîn:

– Xudan, bona çi?

– Te bawarîya xwe li min nedianî,– Cêylon bersiv da.– Dersdarên te hîn dikirin: "Eger hûn bawer nekin, wekî Ez im, hûnê nava gunehên xweda bimirin". Wana usa jî hûn hîn dikirin: "Bi yekî mayînva jî xilazbûn tune, çimkî bin ezmînda li ser meriva navekî mayîn tune, bi kîjanî hûn bikaribin xilazbin".

Serbest careke mayîn xeberda.

– Xudan Cêylon, lê kirên min yên qenc? Gelo ew ji yên xirab zêdetir nînin?

Cêylonê xudan bersiv da:– Pirs ew nîne, wekî meriv qanûnê hindik diteribîne, yan zêde, çimkî "ewê ku qanûna Cêylon bi temamî xweyî dike, lê hinekî dişimite, ew dîsa awqasî gunekar e çawa ew meriv, yê ku hemû qanûn teribandine".

Serbest dil da ber xwe û bersiv da:

– Wî çaxî meriv çawa dikare xilaz bibe?

Cêylon carekêra bersiva wê prsê neda. Ewî li welatîke Afabêlêye jin nihêrî. Ew jina, bi texmîn, qulixçîke Cêylon bû, çimkî ew li ser text rûniştî bû û ew text mînanî textê Cêylon bû, lê diha biçûk bû. Wê jinê xeberda:

Gelo dersdarên te tu hîn nekirine? "Cêylon bi dilrehmîya xwe ya mexsûs hûn xilaz kirin, dema ku we bawer kir. Hûn nikarin hesab bikin, wekî ew qîmetîya we ye. Ew yek pêşkêşa ji Cêylon e. Xilazbûn heqdayîna bona kirên we yên qenc nîne, bona ku ji me her yek bi wê yekêva kubar bibe".

– Gelek wext pêşda, min bona wan bêqanûnîya, yên ku welatîyên Êndêlê kiribûn, yan jî wê bikirana, heq da. Ew yek tiştê bûyînê nîbû, wekî merivek li ber min bêsûc bima, yan jî xwe ji xayîntîyên xwe xilaz bikira. Feqet çawa ku min hemû meriv hiz kirin, min bi xwe heqê neheqîyên wan da. Xilazbûna min pêşkêş e, kîjanê meriv nikare qazanc bike. Bona ku layîqî welatvanîya Afabêlê bûna, meriv nikaribûn awqas kirên qenc bikirana. Ew yek tenê bi rîya bawerîyê tê dayînê. Feqet te ew yek înkar kir, çi ku min bona xilazkirina emirê te kiribû.

Serbestê ku zendegrtî mabû, çend deqîqa bêdeng bû, lê paşê ser hişê xweda hat û bersiv da:

– Ez fem dikim.

Ewî tê bêjî texmîn dikir, wekî ewê niqoyî nava behra bêgumaniyê bibûya. Bi cêribandina dîtina tiştekî, ewî pirsî:

– Dêmek hemû kirên min yên qenc badîhewa bûn?

Cêylon bersiv da:

– Careke mayîn nivîsar e: “Mirî tu tiştî nizanin, pêşerojêda heqdayîn tune û tu tişt nayê bîranînê. Ew çi ku wana nava jîyana xweda kirine, hizkirina wana, hiznekirin, hevsûdî, hemû tişt çûne û derbaz bûne, para wan îdî nava tu tiştîda tune ye”. Û careke mayîn: “Çimkî pêşeroja xiraba tune. Ronahîya wan wê bê temirandinê”.

Serbest nişkêva ji gotinên Cêylon vecêniqî û ewî nikaribû bersiv bida. Bona hemû dersên li mektebê têberdayî ew p’oşman bibû. Diqewime eger ew wan dersada hazir bûya, ewê guhdarîya rastîyê bikira û wê ew şaşî nekira, ya ku bû şaşî bona yazîya wî.

Dema deqîqên bêdengiyê, Serbest ew hemû tişt anî bîra xwe, bi kîjanava ew temamîya rojê ber dilê xweda dihat. Ewî careke mayîn dil da ber xwe û got:

– Belê, ew çi ku tu dibêjî rast e, feqet, Cêylon, tu padişê rehm î. Eger ew yek rast e, tu çawa dikarî min sirgûn bikî?

Cêylon bersiv da:

– Ez padişakî rehm im û bo wê yekê jî ez te sirgûn dikim. Bi qirarkirina ew jîyana li Êndêlê, çawa ku te derbaz kir, te tebyeta xwe bijart, ya ku tebyeta Dagonê xirab e. Ezê çawa rehm bûma, min ê çawa hiz bikira, eger min îzin bida tebyeta te ya bêesil, ya ku wê paqijaya vî bajarê mezin heram bikira? Wî çaxî min ê bineliyên Afabêlê yên bêsûc bikira bin qezîyayê. Piştî wedekî kurt, ew hemû tiştên ku te bijartine, wê bi hezara merivên paqij heram bikirana. Te rîya xwe bijartiye. Tê hema wê yekê jî bistînî, çi ku Dagon stend, peyî kîjanî tu çûyî. Eger cezayê te, yê ku min da te, ji cezayê wî kêmtir bûya, wî çaxî ezê padişakî neheq bûma. Ez yekî usa nînim.

Cêylon berbirî hazira bû û xeberên bavê xwe wekilandin:

– Ewê ku xeberê bêhurmet dike, wê unda bibe, lê ewê ku ji temîyê ditirse, wê heq bistîne.

Hazirên li wir bi bêdengî ew yek qebûl kirin, çi ku peyî wê yekêra qewimî. Padişê emirî li ser xulamên xwe kir:

– Dest û lingên wî girêdin. Wî hildin bibin bavêjine tarîstana der. Li wir wê girî û çeqînîya dirana hebe. Çimkî gelek hatine gazîkirnê, lê hindik hatine bijartinê.

Serbest tirsyayî dikire qîrîn, hetanî ku parêzerê Sereke ew girêda û ji derîyê li rex serayê derxist. Bi hezara hazir li wir hebûn, lê deng ji yekî derneket. Wana bi yazixî dîna xwe dida ewî merivê ku jîyana xwe bêfikir derbaz kiribû û yê ku dibirine berbi cezayê heta-hetayê.

Dema Serbest ji serayê derxistin, ew birine serake mayîn ya mezin, li wir bi hezara odên hebsa hebûn, kîjanada yên ku neheqî kiribûn dihatine xweyîkirinê, hetanî ku reqema ewên ku wê bihatana sirgûnkirinê, tam bibûya. Li jora derê wê serayê ev xeber nivîsar bûn:

> "Xwezî li wana, yên ku temîyên Wî xweyî dikin, wekî ya wana wê bibe serkarîya li ser dara jîyanê û ewê bi dergê bajêrva bikevine hundur. Feqet yên zinêkar, sêrbaz, bêesil, yên ku dikujin û yên ku derewa hiz dikin û dikin, li der in".

Çavên serbest çûne ser wan gotina. Hêrsa wî nava wîda dikelîya. Ew niha bi temamî ketibû bin hukumê heyîna xwe. Her tiştekî baş, yê ku hela hê nava xeysetê wîda hebû, ew wê tabîyêva bibû yek, ya ku ewî bijartibû. Xwexweyîkirina wî çiqas diçû xirab dibû û ew dibû mînanî kelbekî harbûyî. Bêyî hukumê padişê, ew bi temamî tevî fikira xwe ya bêesil mabû.

## Yê Xapyayî li ber Cêylon

Çend sehet derbaz bûn. Gelek hatibûne gazîkirinê li sera Dîwanê. Nava çend sed merivên ku hîvîyê bûn, usa jî yê Xapyayî, dilê Gumanbir û jîyana Dubare sekinîbûn. Yê Xapyayî bi gumaneke baş hîvîyê bû û tabîya wî guman dida yên mayîn.

Derî vebûn û her çar parêzer careke mayîn hatin û vê carê gazî yê Xapyayî kirin. Ew carekêra navhev ket û destpêkir bilerize. Dema wî hatibû. Bona ku ew tevhevbûna xwe veşarta (ew yek li cem wî baş dihate stendinê) ewî gote yên mayîn:

– De çi bêjim, sirîya min pêra gihîşt.

Peyî wê yekêra, wextê ku nasîya yê Xapyayî dane qanûnên xwexweyîkirinê, derên sera Dîwanê vebûn û li derê serekera

rêberîya wî kirin. Ewî hema ew yek texmîn kir, çi ku Serbest texmîn kir. Ewî jî mezinayî û bedewîya serayê dît, usa jî dîna xwe da sifetên welatîya. Wextê ku ew diçû, ewî nava hazirada çend meriv nas kirin, yên ku berê mekteba Êndêlêda hîn bibûn û berî wî mekteb xilaz kiribûn. Yê Xapyayî diha gelek welatî nas kirin, ne ku Serbest, çimkî ewî berevbûnên li mektebê bernedidan.

Ewî merivek jî nas kir, yê ku wextê dersên mektebê hazir nedibû. Navê wî Bêrehm bû. Nava temamîya bajêrda ew merivekî ji nava merivên xirab û bêkêr bû. Yê Xapyayî sekinî û fikirî: *“Ew li vir çi dike?”*. Parêzerê Sereke bi serê xwe da femkirinê, wekî ew dikare wîra xeber bide.

Yê Xapyayî nêzîkî wî bû û pirsî:

– Tu Bêrehm î?

– Wextekê ez bi navê Bêrehm eyan bûm,– ewî bersiv da,– lê Cêylonê Xudan li ber textê Dîwana xwe navê min guhart û ez çawa Lihevhatî nav kirim.

Yê Xapyayî bêyî fikirmîşbûn pirsî:

– Tu çawa hatî li vir? Pir’anîya bajêr te çawa merivekî xirab hesab dikir. Tu tu cara nediçûyî mektebê û ji hemû merivî zêdetir dijî Cêylon derdiketî.

– Belê, rast e, Lihevhatî bersiv da.– Feqet ew çi ku min dikir, min hiz nedikir. Çimkî ez nediçûme mektebê û min tu cara xebera Cêylon nebihîstibû, ya ku jîyanê dide guhar’tinê. Qerez, hevtêkê pêşîya dîwana min, ez bona nanxwerinê çûme rêstorana Xêrkirê. Ewê zanibû, wekî jîyana min unda bibû û ewê cûrekî êşa min fem kir. Ewê heqê xwerina min da bi wî qewilî, wekî ez li cem wê bimama û min wêra qise bikira. Du seheta ser hev ewê derheqa Cêylon, qencîya wî, xilazkirina wî û derheqa vî cîhîda, Afabêlêda, minra got.

Lihevhatî xeberdana xwe berdewam kir:

– Ewê gote min, wekî hela hê dereng nîne, ku ez jîyana xwe pêşkêşî wî padişê mezin bikim. Min hela hê dikaribû baxşandina bêqewil bistenda û çawa welatîyê padişatîya wî bihatama qebûlkirinê. Nenihêrî wê yekê, wekî min karibû li Êndêlê tenê hevtêkê qulixî wî bikira, min ew yek bi temamîya dilê xwe kir. Ez çûme li cem wan, ji kê min dizîbû, yan jî jê stendibû û ji wana

baxşandin xwest. Tiştê usa jî bûn, wekî min diha gelek paşda vegerande wan, lê ne ku çiqas min bi destê zorê stendibû.

Yê Xapyayî ecêbmayî bû û bêdeng bibû. Ewî li piş xwe parêzer nihêrî, yê ku bi serê xwe qayîlî da kivşê. Lihevhatî paşda çû cîhê xwe, lê yê Xapyayî rîya xwe berdewam kir û berbi textê padişê çû.

Wextê ku ew pêşda diçû, ewî nikaribû derheqa wê yekêda nefikirîya, derheqa çida ewî hema teze bihîst. Derheqa rehmbûna Cêylonda wîra gilî kiribûn, lê çi ku ewî ber çavên xwe dît, wê yekê ew zendegirtî hişt. Nava merivên ku ewî nas dikirin, Bêrehm yê herî xirab bû û niha jî ewî mînanî yên mayîn tabîya padişatîyê stendibû. Yê Xapyayî diha gelekî hate ser wê fikirê, wekî li ber Cêylon ewê rastî rehmbûnê bê çimkî ewî bi dil bawarîya xwe li wî dianî.

Wextê ku yê Xapyayî li ber text sekinî, dîsa hema ew pirs dane wî, ya ku dane Serbest:

– Bona kirinên xwe hesab bide.

Mînanî Serbest, yê Xapyayî jî temamîya jîyana xwe, ji roja mektebê ya ewlin destpêkirî hetanî rojekê pêşda, bi şikilê holografîk li ber çavê xwe dît. Bona wî li ser wî sivikayîke usa mezin hebû, wekî ew çawa diçû mektebê û ewî eşkere piştgirîya Cêylon dikir.

Qerez, zûtirekê rengê sifetê yê Xapyayî hate guhartinê. Jîyana wî ew gunekar dikir. Ewî rêyên xwe afû dikirin, lê wextê ku ew hemû tişt li ber hakim û şedên pîroz eşkere bûn, ew tevîhev bû û wî şerm kir. Wextê ku pircûretiya heleqetîyên wî yên bedenî (fîzîkî) li ber civîna padişatîyê eyan bûn, ewî xwest berbi çelekê here û xwe têda veşêre.

Ne tenê kirên wî hatine ber çava, lê usa jî merem û menîyên wî hatine kivşê. Gelo Cêylon çawa ev tişt zanibûn? Ewî çawa dikaribû dîwana yê Xapyayî bikira, bona wan tişta, yên ku bona tu kesî eyan nîbûn. Surên wî yên here kûr jî êdî eşkerekirî bûn. Temamîya civînê dîna xwe dida kirinên wî, frotana avayên çêkirî û erdên zeftkirî. Wana didît, ku ewî her dem xirab xeber dida û buxdan dikirin, ku bighîşta xwestina xwe. Dihate texmînkirinê, wekî çi ku ewî dikir, bona wê yekê bû, ku ew bighîje xwestina xwe. Ewî dicedand ku hemû tiştî bistîne û tenê bona xwe. Niha jî ew nikaribû dijî wan şedetîya derketa. Yê Xapyayî ber dilê xweda dihat û difikirî, wekî ew hemû tişt girîng nîbû, çimkî ewî bawerîya xwe li Cêylon dianî û ew diheband.

Wextê ku temamîya jîyana yê Xapyayî temaşe kirin, Cêylon katibê Sereke nihêrî û pirsî:

– Navê Yê Xapyayî kitêba Jîyanêda nivîsar e?

Na, xudanê min,– ewî bersiv da.

Cêylon elam kir:

– Yê Xapyayî, tu nava bêbextîya hindava minda gunekarî. Wê te bibine welatê Lonê, li kîderê tê jîyana xwe ya mayî nava tarîstanê, bêgumanîyê û tenêbûnêda derbaz bikî û biçerçirî.

Yê Xapyayî zendegirtî ma û cîhê xweda bû kevir. Fikirên wî navhev ketin: "*Na, eva şaşî ye. Usa nikare bibe. Ez Cêylon bawar dikim. Çawa dikare bêje "bêbextîya hindava minda*". Nişkêva ewî pirsî:

– Min çawa hindava teda bêbextî kirîye?

Cêylon got:

– Gelo te nedibihîst, wextê ku dersdarên te derheqa wê yekêda eşaretî didan, ku ewên "ku dibêjin wekî Cêylon nas dikin, lê bi jîyana xweva hindava wîda bêbextîyê dikin"?

– Feqet padişê mezin,– Yê Xapyayî ber gilîyê padişêda hat,– ez diçûme mekteba te. Ez bi dilsozî hemû dersada hazir bûme û nava gelek karên mektebêda bûme. Min serbara serda te çawa xudan nav dikir.

Cêylon carkêra bersiv da:

– Bo çi tu gazî min dikî "Xudan, Xudan", lê wê yekê nakî, çi ku ez dibêjime te ? Te xeberên min nebihîstine, dema min gote te, wekî ne hemû merivin ku xwe bi tabîya bawarmendîyê didine kivşê, lê bi rastî xwedêparêz nînin? Ew dikarin min çawa "Xudan" nav bikin, lê wê nekevine Afabêlê, çimkî faktora ku qirar dike hema ew e, ku gura Bavê minda bimînin. Wextê Dîwanê gelekê bêjine min: "Xudan, Xudan, me derheqa teda merivara gilî kirîye û me navê te hebandîye". Feqet ezê bersiva vî cûreyî bidim: "Hûn tu cara yên min nîbûne. Dûrkevin, çimkî kirên we yên xirab in".

Yê Xapyayî gihîşte dereca dînanîyê:

– Feqet bawerîya min hebû. Min bawerîya xwe te dianî. Dêmek, anegorî xebera te ez gerekê xilazbûyî bim.

Sebira Cêylon hebû, lê ew ser qirara (biryara) xwe bû. Ewî dîna xwe da welatîkî Afabêlêyî rûniştî, yê ku pêşda dersdarê mektebê bû û li ser textekî diha biçûk rûniştî bû:

– Bona Yê Xapyayî wê yekê bixwîne, çi ku te dersên xweda hîn kirine.

Vî merivî jî nivîsarên pîroz xwendin:

– Xwîşk û birayên hizkirî, kara wê yekê çî ye, wekî hûn bêjin bawerîya we heye, lê bi karên xwe jî wê yekê nadine kivşê? Bawarîya wî cûreyî nikare tu kesî xilaz bike. Ew yek bes nîne, ku tenê bawerî hebe. Bawerîya, ku bi karên qenc nayê kivşê, bawerî nîne: ew mirîye û feydayê wê tune. Tu kes nikare vê yekê îzbat bike: “Bawerîya hinek meriva heye, lê yên mayîn jî karên wan yên qenc hene”. Ezê bêjim: “Ez nikarim bawerîya te bibînim, eger karên te yên qenc tune ne, lê ezê bawerîya xwe bi karên xwe yên qencva nîşan bidim”. Hûn hela hê difikirin, wekî ew yek tenê bes e, ku Cêylon yeke? Cin jî bawerîya xwe li wê yekê tînin û ew ji wê tirsê dilerizin. Bêaqil, tê kengê bi kutasî hîn bibî, wekî bawerîya ku feydayê wê karên qenc nînin, bêfeyda ye? Cêylon wekiland:

– Tu dibêjî, wekî bawerîya te heye, lê bawerî bawerî nîne, eger ew bi gavên gurêdabûnêva nayê rêberkirinê. Ew yek bes nîne, wekî tu bawer dikî, çimkî cin jî bawer dikin, lê ew xilazbûyî nînin. Ewên ku bi rastî bawer dikin, wê tebyeta xwe ya guhartî bidine kivşê û wê îdî rezê (berê) xirabîyê neynin. Te her dem rezên Dagon yên xirab dianîn û ew yek tenê şedetîyê dide, wekî te bi temamîya dilê xweva bi rastî bawerîya xwe li min neanîye.

Bona Yê Xapyayî dijwar bû ev hemû tişt fem bikirana, çi ku Cêylon gotê. Ew dîsa ber gilîyê wîda hat:

– Lê ew Bêrehmê xirab? Ez diha baş bûm, ne ku ew. Tu çawa dikarî wî qebûl bikî û min jî sirgûn bikî? Tu heq nînî.

– Tu dibêjî, wekî Cêylon heq nîne,– Cêylon bersiv da.– Guhdarîya min bike. Ez neheqim, yan tu? “Eger merivê bêqanûn ji bêqanûnîyên xwe paşda vegere û gura qanûnê bike, usa jî heqîtîyê mîyaser bike, ewê şexsê xwe xilaz bike, çimkî ewî hemû tişt hesab hildaye û qirar kirîye ji gunehên xwe paşda bê û bi jîyana başva bijî. Ewê ese bijî: ewê nemire”. Yê Xapyayî gumana xwe undakirî û hêrsketî berdewam kir:

– Feqet, ez bi xebera teva merivara nîvî bûme û min şedetîya te daye. Ez li mekteba te dersdarê li ser hîmê rezedilvanîyê bûme.

Cêylon îdî bi cûrê berk bersiv da:

– Îdî qanûnên min newekilîne û bes e, ku tu sozdayînên min elam bikî, çimkî te şîretê min înkar kirîye û qanûnên min jî

bêhurmet kirine. Tu diz dibînî û alî wî dikî û wedê xwe jî tev merivên bêesil derbaz dikî. Tu nifira û derewa dikî û xeberên xirab ji devê te derdikevin. Tu derheqa birayê xweda xirab xeber didî. Ez bêdeng mam û tu fikirîyî, wekî ez hindava wan tiştada rehet im. Feqet niha wedê cezayê te hatîye û ez navê wan hemû gunehkarkirinên dijî te didim.

Yê Xapyayî dengê xwe nedikir. Fikira wî dizvirî, lê gotinên wî tune bûn ku ewî xwe biparasta.

Çend deqîqe derbaz bûn. Padişê gote xulamên xwe:

– Dest û lingêne wî girêdin. Wî hildin bavêjine tarîstana der. Li wir wê girî û çeqînîya dirana hebe.

Wextê ku parêzerê Sereke nêzîk bû, Yê Xapyayî destpêkir ji kontrolê der hindava Cêylon, parêzera û welatîyên Afabêlê kifirîya bike. Ew gelekî hêrs ket û hêrsketî dijî wan derdiket. Hemû tiştên qenc yên nava wîda kişîyane nava şexsê wî yê eşkerekirî.

Dest û lingên Yê Xapyayî girêdan û ew ji serayê birine der, lê ewî jî kifirî dikirin. Ew jî mînanî Serbest, li oda hebsêda hiştin hetanî dawîya dîwanê.

Wextê ku Yê Xapyayî îdî serayêda nîbû, Cêylon berbirî elaleta şede bû: “Heye milet, wekî li ber çavê wî paqij tê kivşê, lê ew ji qirêjaya xwe paqijbûyî nîne”.

## Dilê Gumanbir li ber Cêylon

Li sera dîwanê îdî sed meriv jî nemabûn. Dilê Gumanbir û jîyana Dubare nava wanda bûn. Dilê Gumanbir xwe ji jîyana Dubare dûr digirt, çimkî hetanî wî çaxî jî ewê telayî û eycizî hindava wîda texmîn dikir. Jîyana Dubare jî xwe ji dilê Gumanbir dûr digirt.

Çar parêzerên Padişê hatine hundur û gazî dilê Gumanbir kirin. Ew bona çûyîna xwe nerhet bû, lê razî bû ku ji jîyana Dubare dûr diket. Ew jî, mînanî yên mayîn, nêzîkî derê sera Mezin kirin û nasîya wê dane qanûnên xwexweykirinê û paşê ew birine hundur.

Wextê ku ew ber welatîyên Afabêlêra derbaz dibû, ewê jî gelek nas kirin, yên ku pêşîya wê çûbûn. Piranîya wana li mektebê awqasî jî berbiçav nîbûne û mînanî wê jî bawerîya aktîv nîşan nedabûn. Dilê Gumanbir zendegirtî ma, wextê ku ewê cêrge meriv dîtin, yên ku bi fikira wê gerekê li wir nîbûna.

Dilê Gumanbir nêzîkî textê mezin bû û textên diha biçûk dîtin, yên ku dora wê girtibûn. Ewê çend dersdar û merivên mayîn nas kirin, yên ku bi texmîna wê gerekê nava cêrga rêberên wê padişatîyêda nîbûna. Qerez, ew zendegrtî ma, wextê ku ewê gelek meriv li ser wan texta dîtin. Ew meriv li Êndêlê awqas jî eyan nîbûn. Nava hazirada usa jî merivên dewletî hebûn. “Gelo yên dewletî çawa dikarin li cîhên usa yên hurmetlî cîhê xwe bigrin”,– ew fikirî.

Hetanî ku ewê pêra bigîhanda bersiva pirsa xwe bida, ewê dengê Cêylon bihîst:

– Bona jîyana xwe hesab bide.

Şikilê holografîk jîyana wê da kivşê. Dilê Gumanbir bi hijmekarî wedê mek’t’eba xwe temaşe dikir. Temamîya xebata wê ya rezedilvanîyê, dersên zêde û serkarîya wê ya li dersxanê bi cûrê baş raberî wê dikirin. Ew bi xebathizî û serxwebûna xweva firnax dibû. Feqet beşera wê hate guhartinê, wextê ku caba wê ya hindava derewa Xirabxeberdankirê hate kivşê. Ber çava bû, wekî ewê nedixwest xeyda xwe bihêle, berde. Dilê wêda çi hebû hate eşkerekirinê û ew yek tiştekî baş nîbû.

Peyî wê yekêra pêwendîya wê ya tevî jîyana Dubare hate ber çava. Bona wê pêwendîyê ewê usa jî tobe nekiribû. Ewê her dem xwe rola qurbanîyêda didît û temamîya guneh diavîte ser Xirabxeberdankirê û jîyana Dubare. Rûyê wê yekêda jî ewê usa jî bona biryarên xwe yên qebûlkirî cabdarî hilneda ser xwe. Bi berdewamkirina şikilê jîyana xwe, ewê dît ku çawa texmînkirina hêrsê, talayê û heyfhildanê nava wêda zêde dibû. Nenihêrî wê yekê ku wêra li hev hatibû çend pirsa bide fetisandinê, lê koka wê yekê ji wê dûr neketibû. Nava feydayên wê yekêda ew ne tenê ji jîyana Dubare û Xirabxeberdankirê her dem xeyîdî bû, lê ewê usa jî bona wan dijwarîya Cêylon neheq dikir. Gelo Cêylon çawa dikaribû îzin bida, ku merivê mînanî jîyana Dubare li mekteba wî ders bidana. Nerazîbûna wê ya berk û nebaxşandina wê eşkerekirî bûn.

Wextê ku lênihêrandin ser hevda hat, îdî ber çava bû, wekî dilê Gumanbir jineke bi talayêva tijî bû, ya ku hindava merivada qenc nîbû. Feqet, nenihêrî wê yekê, wekî ev hemû tişt li ber elaleta mezin hate eyankirinê, ew guman bû, wekî xwepêşkêşkirina wê ya pêşda gerekê dilrehmîya padişê ya hindava wêda bida çareserkirinê. Ew

hinekî ditirsîya, lê ewê nikaribû bianîya ber çavê xwe, ku wê çi biqewimîya.

Cêylon li katibê Sereke nihêrî:

– Navê dilê Gumanbirê kitêba Jîyanêda nivîsar e?

– Na, xudanê min,– ewî bersiv da.

Cêylon dîwana wê elam kir:

– Dilê Gumanbir, tu bona wê yekê gunekarî, wekî tu ji heqîtîyê ketî û te hindava minda xayînntî kirîye. Wê te bibine bajarê Lonê, li kîderê tê jîyana xwe ya mayî derbaz bikî, nava tarîstanê, bêgumanîyê û tenêbûnêda bizêrî.

Ecêbmayîna dilê Gumanbirê meriv nikare bîne ber çava. Ew diha zêdetir zendegirtî mabû, ne ku yên pêşîya wê hatî. Tiştê usa nikaribû biqewimîya. Ewê xewina xirab didît: na, eva ber çava dihate kivşê û ewê gerekê lez xwe hişyar bikira. Diqewime ewê şaş fem kir?

Ewê bawarîya xwe li wê gotinê neanî û pirsî:

– Cêylon, te got, wekî gerekê min bibine welatê Lonê?

– Belê, dilê Gumanbir, te rast bihîst,– padişê bersiv da.

– Cêylonê Xudan, çawa dikare usa biqewime? Ez te bawar dikim, ew yek ji jîyana min zelal hate kivşê. Jîyana min mesela baş bûye, ya ku piştgirîyê dide fikirên min. Ez zanim, wekî dilê min berk bû, û hizkirina nava minda mir, lê ew yek gunehê min nîbû. Xirabxeberdankirê û jîyana Dubare gunekar bûn. Dilê min rûyê xayîntîya wanda sar bû.

– Te eşaretîya min bîr kiribû, ya ku min bi destî dersdara dabû,– Cêylon bersiv da,– “Xirabî wê awqas belabe, wekî dilê geleka wê sar bibe. Lê ewê ku hetanî xilazîyê (dawîyê) teyax bike, wê xilaz bibe”. Te hetanî dawîyê teyax nekir.

– Feqet, Xudan Cêylon,– dilê Gumanbir xeberdana xwe dûmayî kir,– ez heq im, çimkî ez te bawar dikim. Diqewime min şedetîya xwe unda kir, lê min bawarîya xwe dianî, wekî mînanî xilazbûnê merivê her dem xilazbûyî bimîne û wê tu cara xilazbûna xwe unda neke. Çend dersdarên me jî em usa hîn dikirin. Wana digot, wekî tu kes nikare min ji destê te bi destê zorê bistîne.

– Belê, rast e,– Cêylon bersiv da.– Tu kes nikare te ji destê min hilide, lê min tu cara negotîye, wekî tu nikarî bi xwe dûrkevî. Ew serwêrî tenê destê teda ye. Gelo te nava nivîsarên Pîrozda

nexwendîye? “Eger meriv ji van qewatên dinyayê yên heram, bi saya zanebûna derheqa Xudanê me û Cêylonê Xilazkirda, birevin, lê paşê careke mayîn bên girtinê û bi wê yekê binkevin, merivên wî cûereyî wê xilazîyê nava halê diha xirabda bin, lê ne ku pêşda. Wê diha baş bûya, wekî ew tu cara rîya heqîtîyê nizanibûna, ne ku bizanibûna û paşê berê xwe li wê temîya pîroz vegerandana, ya ku bona wan hate dayînê”. Min got, wekî wê diha baş bûya, ku wana tu cara rîya heqîtîyê nizanibûna, çimkî ew niha nava halê diha xirabdanin, ne ku hetanî xilazbûnê. Dêmek, te çawa dikaribû bawar bikira, wekî xilazbûnê nikarin unda bikin? Eger nikaribûna unda bikrana, ewê çawa bikaribûna biketana nava halê diha xirab?

Te bona çi guhdarîya wan dersdara dikir, yên ku we dijî xebera min hîn dikirin? Min bi cûrê rast ew hemû tişt nivîsîne, bona ku hemû kes rîya heqîtîyê bizanibe. Bona çi te îzin da xwe ku tu bixapî? Eger te bawarîya xwe li gotinên min bianîya, teyê dijî talaya dilê xwe şerkarî bikira. Dewsa wê yekê, çawa ku te nava berdilhatina feşda çareserî dît, te îzin da, ku talayî bêyî dijwarî nava teda zêde bibe. Niha tu li ber dîwanê sekinîyî, ya ku dikaribû bihata sekinandinê.

– Lê hemû karên min yên qenc, yên ku min li Êndêlê kirine? ,– dilê Gumanbir reca kir.

Cêylonê Xudan bersiv da:

– Gelo te nexwendîye, çi ku min bi destî pêxemberê xwe çi nîşan da? “Eger merivên heq vegerine berbi rêyên sûcdar û destpê bikin mînanî gunekarên mayîn bikin, gelo wê îzinê bê dayînê ew bijîn? Na xêr. Qencîya wan ya berê wê bi temamî bê bîrkirinê û ewê nava gunehên xweda bimirin. Feqet hûn dibêjin: “Xudan heq nîne”. Guhdarîya min bikin. Gelo Ez im yê neheq, yan hûn? Eger merivên rast ji qencîyê dûrkevin û destpê bikin guneha bikin, ewê rûyê wê yekêda bimirin. Belê, ewê rûyê kirên gunekarda bimirin”. Tiştên ku tevî te qewimîne nivîsarin: qencîya te û karên te yên heq hatine bîrkirinê û wê li ser te neyêne hesabkirinê.

Dilê Gumanbir nedixwest teslîm bibe û got:

– Feqet, xudan te got, wekî eger ez te çawa xilazkir bihebînim, wî çaxî wê nava kitêba Jîyanêda bê nivîsarê. Ew çawa bûye, wekî navê min îdî wê kitêbêda nîne? Bona çi katibê te nikare navê min bibîne? Gelo ew dikare bê paqijkirinê?

Cêylonê Xudan bi sebir, lê bi cûrê hêrs bersiv da:

– Te ew yek nebihîst, çi ku îdî hate gotinê? “Ewê ku hetanî dawîyê teyax bike, wê xilaz bibe”. Ewên ku hetanî dîwanê teyax dikin ew merivin, yên ku ser dikevin û min jî zelal got: “Ewê ku ser dikeve wê kincên vî cûreyî yên sipî xwe bike û ezê navê wî ji kitêba Jîyanê paqij nekim”. Eger min got, wekî ezê navê kesekî ji kitêba Jîyanê paqij nekim, ew dide kivşê, wekî ew dikare paqij bibe jî. Eger usa nîbûya, minê bigota: “Eger tu min çawa xudan bihebînî, navê te wê kitêba Jîyanêda heta-hetayê bimîne”.

Dilê Gumanbir dîsa reca kir:

– Tu çawa dikarî min bişînî Lonê, li wî cîhî, li kîderê mirîyên sax tên şandinê?

Cêylon li bindestîkî xwe nihêrî:

– Wan nivîsarên Kevin bixwîne, yên ku bona welatîyên Êndêlê eyan bûne.

Bindestîyê Cêylon xwend:

– “Ew merivê ku ji rîya aqilmendîyê dixalife, wê nava civîna mirîyada bijî”.

Îdî tu tişt tunebû ku dilê Gumanbir bigota. Padişê gote xulama:

– Dest û lingên wê girêdin, lê hildin û biavêjine tarîstana der. Li wir wê girî û çeqînîya dirana hebe, çimkî gelek hatine gazîkirinê, lê hindik hatine bijartinê.

Wextê ku parêzerê Sereke nêzîkî dilê Gumanbir dibû, ewê nifir li Cêylon kir. Ew bi hêrsêva tijî bû, menîya kîjanê talaya di hundurê wêda û tebyeta ku du cara mirî bû (binihêre Cihûda 12). Ew mînanî dara payîzê bû, ya ku ji kokêva rakirî bû, li ser kîjanê tu rezeke heqîtîyê nemabû.

Dest û lingên dilê Gumanbirê girêdan û ew ji derê kêleka serayêva derxistin. Ew jî odeke hebsêda girtin. Wextê ku ew ji serayê derketin, katibê Sereke diha zelal elaleta şedera ew yek şirove kir:

– “Hevalên hizkirî, eger em peyî wê yekêra, wextê ku me zanebûna derheqa rastîyêda stend, bi zanebûn berdewam bikin guneha bikin, îdî tu qurbanîk wê tunebe, ya ku wê wan guneha veşêre. Îdî tu hêvîdarî wê tunebe, lê tenê wê hêvîdarîya dîwana Cêylon û agirê gurkirîyî ku dijminên wî dikişîne hebe. Çimkî em wî zanin, yê ku got: “Ezê heyfê hildim. Ezê bidime wana, yên ku layîqî

wê yekê ne”. Ewî jî usa got: “Cêylonê dîwana cimeta xwe bike”. Tiştekî gelekî bi tirs e, eger bikevine destê Cêylonê sax”.

## Dîwana jîyana Dubare

Merivê dawî, yê ku gerekê ji sera edaletê bihhata gazîkirinê, jîyana Dubare bû. Ewî qanûnên Cêylon zanibûn û ewî zanibû, wekî dîwana wî wê kardar nîbûya. Ewê zûtirekê bida zelalkirinê, ku neheqîyên wî wê çiqas giran li ser wî rûniştana.

Jîyana Dubare li ser xwe zeyîfî texmîn dikir, dema ku ew dibirine sera Dîwanê û parêzer gerekê alî wî bikirana, bona ku ew nêzîkî textê Dîwana Cêylon bûya. Jîyana wî jî hate lênihêrandinê, û ewî jî gotinên bi xofê derheqa wê yekêda bihîstin, wekî navê wî nava kitêba Jîyanêda nehatîye dîtinê.

Cêylon bi cûrê berk elam kir:

– Jîyana Dubare, tu gunekarî nava xayîntîyêda, nava ketina ji heqîtîyê û usa jî nava wê yekêda, ku tu bûyî mîna kevirê ku gulor dibe. Wê te bibine welatê Lonê, li kîderê tê ceza û zêrandinên here giran bistînî.

Jîyana Dubare bi tirs guhdar kir û peyî wê yekêra lava kir:

– Feqet, xudan, ez mekteba teda dersdar bûm. Min jîyana xwe bona karê te da.

Cêylon bersiv da:

– Gelo çawa dersdar te ew kitêb nexwendine, bi kîjana te hîn dikir? “Xwîşk û birayên hizkirî ji we ne hemû kes gerekê li mektebê bibine dersdar, çimkî em, dersdar, emê ji alîyê Cêylonda bi cûrê berk bêne dîwankirinê”.

Jîyana Dubare gotina xwe berdewam kir:

– Ez çawa bibûme kevirê ku gulor dibe?

– Dengê Cêylon diha berk bû:

– Te usa kir, wekî ji biçûkên min gelek şimitîn û heta-hetayê ketin. Dilê Gumanbir yekî ji wana ye. Ewê bawarîya xwe li te dianî. Min serwêrî da te bona ku te ew biparasta, lê ne ku bida xebatê. Te hukumê xwe da xebatê, çi ku te lazim bû, te hilda û zyan da wê û yên mayîn. Ew îdî ji alîyê xwîşkekêda hatibû birîndarkirinê û dewsa wê yekê ku te ew qencî bikira, te ji wî halê wê kar stend. Te bawarîya wê da teribandinê. Niha jî dîwana wê hatîye kirinê û ewê

here Lonê. Çawa jî hebe, tê wê eşaretîyê bîr bînî, ya ku min dabû: “Kî ku usa bike, ku ji van biçûka yek bişmite, yên ku bawarîya xwe li min tînin, wê bona wî diha baş bûya ku kevirekî aş stûyê wîva bihata girêdanê û ew biavîtana nava behrê”.

– Jîyana Dubare reca kir:

– Cêylon, min zanibû, wekî ezê bême şandinê li bajarê Lonê, lê bona çi ezê zêrandinênn here giran bistînim? Bona çi tu hindava minda awqas berkî? Ez bêbawar nîbûm, lê xulamekî te bûm. Ez mînanî Serbest nîbûm, yê ku dixwest tevî te biketa nava kar. Bona çi?

Cêylon careke mayîn bi cûrê berk got:

– Tu zanî û te nivîsarên Kevin hîn kirine. Bona çi tu derheqa wê yekêda ji min dipirsî? Ezê bînim bîra te, wekî tu van xebera bîr bînî. Nivîsarên Kevin zelal dibêjin: “Eger xulam bifikire, wekî xudanê wî wê wedekî dirêj paşda venegere û destpê bike hukumî li ser xulamên mayîn bike... xudanê bêyî eşaretî û nişkêva paşda vegere. Ewê wî xulamî parçe-parçe bike û wê wî tevî bêbawara sirgûn bike. Ew xulama wê berk bê cezakirinê, çimkî ewî borcdarîya xwe zanibû, lê nedixwest wê yekê biqedîne. Feqet merivên ku nizanin, wekî şaşîyê dikin, wê hindikî bên cezakirinê. Ji wana gelek tê xwestinê, bona kîjana gelek hatîye dayînê, lê diha gelek ji wana tê xwestinê, bona kîjana diha gelek hatîye dayînê”.

Serbest diha hindik bêqanûnîyên xwe fem dikirin,– Cêylon xeberdana xwe dûmayî kir.– Lê te him fem dikir, him zanibû. Nenihêrî wê yekê, wekî cezayê wî berk e, lê wê diha hindik be, ne ku yê te. Bona te min cîh xweyî kirîye... “nava tarîstanêda”.

Cêylon bangî parêzerê Sereke kir:

– Dest û lingên wî girêdin. Wî hildin û bavêjine tarîstana der. Li wir wê girî û çeqînîya dirana hebe. Çimkî gelek hatine gazîkirinê, lê hindik hatine bijartinê.

Dema ku parêzerê Sereke nêzîk dibû, jîyana Dubare destpêkir kifirîya li Cêylon, parêzera û welatîyên Afabêlê bike. Ewî bi hêrs şerkarî dikir û serbara serda cêriband ji destê parêzera xilaz bibe, êrîşê bibe li ser Cêylon. Tebyeta wî ya rast hate kivşê. Her tiştekî qenc nava wîda ku hebû bi feştîya wî hatibû fetisandinê. Parêzera dest û lingên jîyana Dubare girêdan û ew dîsa derê li rex serayêva birin. Nava wî wedeyîda ewî hema usa kifirî dikirin. Ew gihîşte hezar pênsid merivên mayîn, yên ku carekêra şandine welatê Lonê.

Gava ku jîyana Dubare ji serayê birin, katibê Sereke kitêb girt û kire gazî:

– Dîwanên te yên here heqin. Ew layîqî çi bûn, wana ew jî stend.

Li wir dengekî bersiv da: dîwanên te rast û heqin.

## Welatê Lonêyî wêranbûyî

Hezar pênsid êndêlîyên ku hatibûne gunekarkirinê û odên hebsêda hatibûne xweyîkirinê, bi destî parêzerên Padişê şandine sefera du hevtîya, berbi welatê Lonêyî wêranbûyî. Ew gihîştine qûmistana Agire mezin, li kîderê ji axa şewitî germayîke gelekî xirab bilid dibû. Nehate femkirinê ku li dûr nişkêva ji kîderê, avayîkî mezin û bi xof hate kivşê. Wextê ku ew nêzîk dibûn, gunekara nivîsara li ser rê dianî xwendin: “Welatê Lonêyî wêranbûyî”.

Wextê ku wana bi guhdarî dîna xwe dayê, wana fem kir, wekî li ewî avayê mezin tu pencerek, yan jî derîk tunebû, xêncî dergekî mezin. Wextê ku ew dergera ketine hundur, wana deng ji hundur bihîstin. Ew deng mînanî bi deha hezara qîrînîya bûn. Nava çend deqîqada wana bihîst ku çawa girtîya reca ji parêzerê Sereke dikrin:

– Gelo bes nîne? Em hîvî dikin, ku hûn dewsa me rehmê hîvî bikin. Cezayê me gelekî xirab e.

– Çiqas wedeye ku ew li virin? ,– Serbest ji parêzerekî pirsî.

– Ji yekê hetanî 129 sala.

Yê Xapyayî nişkêva vecêniqî. Gumana wî hebû, wekî ew hemû tişt piştî çend hevtîya wê xilaz bûya û wê zelal bûya, wekî ew yek xewin bû, yan jî stratêjîya bû, bona ku wana bitirsînin. Ewî hema ji wî parêzerî jî pirsî:

– Gelo ezê li vir jîyana xwe ya mayî derbazkim?

– Belê, çawa ku li Êndêlê eşaretî dabûne te.

Gelek meriv, bona kîjana cezayê berk hatibû qirarkirinê, birine wan beşên avayê hesine diha bilind, li kîderê germayî diha zêde bû. Ewên ku haj ji rastîyê tunebûn, lê kirinên layîqî sirgûnkirinê mîyaser kiribûn, birine beşên diha nimiz. Bona mayîna rojekê jî cîhê wan gelekî xirab bû, derheqa wedê ji sed salî zêdetir îdî çi xeberdan dikaribû hebûya?

Meriv nikaribû zêrandina jîyana Dubare bianîya ber çavê xwe û cezayê wî yê ji merivên beşên here jorin xirabtir bû. Ew birine

zindaneke binerd, li rex rûnê germ. Tenê bêhna wîye xirab îdî bes bû û li wir hewa nedihate guhartinê, germayî li vira diha zêde bû, lê ne ku li cîhekî Lonêyî mayîn. Ew cîh li wî avayê hesin nîbû, lê nava kûraya wî welatîda bû. Bêşik, ew cîh cîhê cêribandinêyî here xirab bû. Jîyana Dubare wê li wir nava tenêbûnêda bihata zêrandinê. Ew cîh bona başqekirina wan meriva gelekî mezin bû, yên ku bona xirabkarîyên giran hatibûne gunekarkirnê. Dengê tek-tenêyî ku wana dikaribû bibhîsta tenê dengê wan bû.

Hema ku gunekar hatine zindankirinê, parêzerê Sereke berbi dêrî çû. Wextê ku dergê hesinîyî mezin hate girtinê, nava wî avayîda qet çirûsîke ronahîyê jî tunebû. Hêsîrên li wir wê ji 125 sala zêdetir nava tarîstanê û tenêbûnêda derbaz bikirana. Gumana dîtina ronahîyê tenê wî çaxî bû, wextê ku salê carekê girtîyên nû dianîn. Qerez, ew ronahî bona hemûya nedihate dîtinê, lê tenê bona wana dihate dîtinê, yên ku nêzîkî dergên mezin bûn. Yên mayîn, mînanî jîyana Dubare wê êdî ronahîya rojê nedîtana. Cezayê wî, hema tarîstana bona wî xweykirî bû.

## Fikirdarî

Ev her çar welatîyên Êndêlê hetanî dawîya heyîna xwe poşman bûn, yên ku qirar dikirin guhdarîya rastîyê nekin. Nava tenêbûnêda ew her dem derheqa bêaqilîya xweda difikirîn, çimkî li Êndêlê wana guhdarîya gotinên Cêylon nedikirin. Wanayê hemû tişt bikirana, ku paşda vegerîyana û mecala wan hebûya yazîya xwe biguhartana. Ew poşman bibûn, wekî wana guhdarîya piranîya meriva û fikirên hêna wanda qebûlkirî kiribûn. Eger mecaleke wan jî hebûya, ji wana her yek wê fikirdarîya bêaqil înkar bikira û wê bi dil nivîsarên kevin qebûl bikira, yên ku tu cara nehatine guhartinê û nikarin neyêne mîyaserkirinê. Gunek’ar dizêrîyan, wextê ku şikilên Afabêlê, yên ji padişatîya here berbiçav, bîr dianîn. Nava zêrandinên xweye hertimîda wana bedewîya wî bajarî bîr dianîn, yê ku wana nava wedekî awqas kurtda dîtin. Ewê yekê zêrandina wan diha gelekî dida girankirinê. Germaya Lonêye ku dişewitand, ew bêhna xirab û tarîstan, ew rastîya derheqa wê yekêda diha gelekî didane kivşê. Ew bedewî wê ya wan bûya, eger wana tenê ew yek bibijarta. Qerez, wana rûyê bêaqilîya xweda Afabêl unda kirin.

## PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

### BEŞA YEKÊ, SERÊN 1-3

1. Hetanî xwendina vê kitêbê weyê xebera “*açixî*” çawa şirove bikira? Meremên we, pirsên we yên pêşin û xeysetên we wê çawa ew şirovekirin bidana kivşê? Gelo piştî xwendina vê beşê, fikira we hate guhartinê, yan jî îzbat bû?

2. Bi fikirmîşbûna derheqa girîngîya heta-hetayêda, tê bêjî çawa tiştekî bêfikir tê texmînkirinê, wekî kesek dikare wextê dîwanê li ser xwe gumanbe, ya ku yazîya wîye heta-hetayê qirar dike. Çi jî hebe, Yûhenna 4:17 hema vê yekê soz dide me. Nava beşên mayînda emê derheqa vê fikirêda xeberdin. Feqet, li ser hîmê zanebûnên weye niha hûn dikarin şirove bikin, ku ew guman, bi fikira we, ji kîderê tê?

3. Vê beşêda we nasîya xwe da padişatîya Afabêlê, ya ku sîmvola jîyana me ye li vê dinîyayê û yazîya meye heta-hetayê ye. Nava vê padişatîyê û serkarîkirina wêda here zêdetir çi li ser we hukum kir? Tiştekî usa hebû, ku hûn ruhdar kirin, yan jî rûyê wê yekêda hûn zendegirtî man? Gelo Încîl derhehqa wan tiştada dibêje?

4. Werin em derheqa binelîyên Êndêlêda xeberdin. We çawa bersiva van her çar gunekarkirina da? Hûn hîvîyê bûn, wekî ewê cûrekî mayîn bûna? Eger hûn dibêjin erê, wî çaxî bona çi?

5. Wextê hînbûna meye niha, pirsa herî zêde ku we xemgîn dike, kîjan e?

# Beşa Duda

SERÊ 4-A

# Mala Mirîya Ya Heta-hetayê

*“Wextê ku şagirtên Wî ji Wî derheqa fikira vê meselêda pirsîn, Ewî gote wan: “Bo we hatîye dayînê, ku hûn [bere-bere] şêwir û surên Padişatîya Xwedê bizanibin (bi cûrê diha hukumdar û zelal naskin û fem bikin*)...”.

— Lûqa 8,9,10, AMP

Nava çar serên kitêbêye bi sirêda emê serhatîya xweye alêgorîk dayînine alîkî û emê guhdarîya xwe li ser wan rastîya bidine merkezkirinê, yên ku wextê dîwanên Serbest, Yê Xapyayî, dilê Gumanbir û jîyana Dubare hatine eyankirinê. Peyî wê yekêra emê bi xeberdana derheqa Xwehiz û Xêrkirêda serpêhatîya xwe ser hevda bînin û hetanî xilazîya kitêbê emê guhdarîya xwe li ser wan rastîya bidine merkezkirinê, yên ku nava jîyanên wanda tên eyankirinê. Dawîya kitêbê emê derheqa heqdayînên bona peyîhatîyên Îsa Mesîhe heta-hetayêda xeberdin.

## Rastîya hîmlî

Nava alêgorîya meda Cêylon sîmvola Îsa Mesîh e, Bavê Padişa Bav Xudan e, Dagon cin e. Jîyana li Êndêlê jîyana li ser topa dinîyayê ye, lê Afabêl bajarê Xwedêyî ezmîn e. Welatê Lonê sîmvola gola Agir e, li kîderê ew merivê heta-hetayê jîyana xwe derbaz bike, kerema kîjanî, ya Îsa Mesîh ya xilazkirinê tune ye. Serên derbazbûyîda meselên raberkirî merivên cûre-cûre didine kivşê, yên ku tên gunekarkirinê, çimkî Xebera Xwedê derheqa vê yekêda gelekî zelal dibêje.

Belê, we rast xwend, wekî ewê heta-hetayê bên gunekarkirinê. Wextê ku ez hazir dibûm vê berbirîbûnê binivîsim, nava minda şerkarî diçû: ez difikirîm ku çawa bona we, xwendevana, wê yekê şirove bikim, çi ku Încîl çawa “dîwana heta-hetayê” nav dike. Bi guhdarî vê beşê bixwînin.

> "Dêmek, werin em pêşda herin û em derbazî êtapa hînbûnên Mesîh yên prîmîtîv bibin, bi cûrê qewîn berbi tomerîbûnê û kamilîyê pêşda bilivin, yên ku anegorî mezinbûna ruhanî ne. Werin em careke mayîn hîmê dîwana heta-hetayê û cezakirinê daneynin. [Ev hemûşk tiştên usa ne, derheqa kîjanada hûn gerekê zûva haj pê hebûna]" (Îbranî 6:1,2, AMP).

Çawa ku hûn dibînin, min pênc hînkirinên hîmlîye mayîn berdan, nava kîjanadanin tobekirina ji karên mirî û bawarîya hindava Xwedêda, bona ku bidime kivşê, wekî dîwan û cezayê heta-hetayê hînkirinên Mesîh yên *prîmîtîvin*.

Xebernamek (ferhengek) xebera "prîmîtîv" bi vî cûreyî şirove dike: "zelal, sade, yan jî beşa hîmlî". Eva ew para sade ye, li ser kîjanê em gerekê ji destpêkê çê bikin: eva hîm e. Bona ku em vê gotinê fem bikin, em gerekê sîstêma xwe ya xwendinê lê binihêrin. Li mekteba prîmîtîv em zanebûnên hîmlî distînin, kîjana em bona xwendina xwe ya pêşerojê didine xebatê, nivîsarê, xwendinê û matêmatîkayê. Eger ew zanebûn nava hîmê xwendina meda tunebin, emê tu cara nikaribin hînbûna xwe bidine pêşxistinê. Hema ev yek jî bona bawarmenda ye. Eger em evê hînbûna derheqa dîwana heta-hetayêda baş fem nekin, emê nikaribin nava Mesîh da jîyana rast çêkin. Vê yekê meriv dikare himberî wê yekê bike, wekî kesek dicêribîne bi nezanîya nivîsarê û xwendinê, yan jî matêmatîkayê xwendina xwe bide pêşxistinê.

Qerez, nava qulixa xwe ya nêzîkî bîst salaye li welatên cuda-cuda min eyan kirîye, wekî gelek meriv (ez usa jî derheqa wan peyîhatîyên Îsa Mesîh da dibêjim, yên ku xwe pêşkêşî Wî kirine) derheqa wê yekêda haj pê tunene. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî xudanê nivîsarê dibêje: "Ev hemûşk tiştên usanin, derheqa kîjanada hûn gerekê zûva haj pê hebûna. Ew nabêje, wekî em gerekê derheqa wê yekêda bizanibin, lê dibêje, wekî em gerekê *tam* yan jî *bi temamî* derheqa wê yekêda bizanibin. Xeberên "gelekî zûva" tenê didine kivşê, wekî kemala van rastîya bona bawarîya me ya hîmlî ye, çawa ku nivîsar û xwendin bona xwendina me ne.

Zûtirekê hûnê bibînin, ku bona çi "dîwana heta-hetayê" hînbûna primitive e, kîjanê em gerekê fem bikin, bona ku em jîyana mesîhîtîyê ya saxlem çê bikin. Xwendina xwe berdewam bikin û

vê yekê bîra xweda xweykin. Bêyî femkirina vê yekê wê bona we gelekî dijwarbe wî hemû tiştî fem bikin, derheqa çida emê xeberdin û diqewime hûn bifikirin: “Fikira vî hemû tiştî kîjane?”.

## Doje: himberkirin, yan rastî?

Pêşîya nivîsara vê kitêbê min nava fikira xweda şerkarî dikir: “*Meriv çawa dikare nisiletekêra şirove bike “ya ku bi roja îroyîn dijî”, wekî qirarên heta-hetayê hene, kîjana Hakimê nava wedê kurt-da derheqa meda qebûl bike*?”. Piştî şerkarîya fikirdarîye çend roja, wextê duakirinê, fikirek pêşda hat. Min fem kir, wekî Îsa serpêhatî gilî dikirin, bona ku rastîyên ruhanî bona fikira merivatîyê bida femkirinê. Hema vî cûreyî jî fikira derheqa serhatîya alêgorîke “Afabêlê”-da pêşda hat.

Wextê ku min derheqa dîwana binelîyên Afabêlê û derheqa cezayê wanî li welatê Lonê dinivsî, ez nava xweda dilerizîm. Êvareke yekşemê, wextê ku ez paşda dihatime malê, min dawîya serê kitêbêyî derbazbûyî dinivîsî. Wê rojê min sê cara terîf kiribû. Alîkarên min kûr razayî bûn, lê ez nedisekinîm û min bi kompyûtêrê ew beş dinivîsî. Ez şev dereng gihîştibûme malê, lê ez ditirsîyam razama, çimkî bona wan meriva ditirsîyam, yên ku wê biketana cîhekî diha xirab, navê kîjanî gola Agir bû û anegorî gotinên Îsa pir’anîya merivatîyê wê bikeve li wî cîhî.

> “Derê tengra bikevine hundur, çimkî fireh ye ew derê ku dibe berbi dojê û ew rîya ku dibe berbi wî cîhî hêsa ye û gelek bi wê rêyê diçin. Lê gelekî teng e ew derî û zehmet e ew rîya ku dibe berbi jîyanê. Û hindik meriv hene, ku wê rê dibînin” (Metta 7:13,14, TEV).

Wê şevê ez nava cîh-nivînada bûm, wextê ku hate bîra min, ku çend sal pêşda hîvî ji min kirin ku ez li hebsa bona mêra, ya rêjîma mexsûs, terîf bikim, ya ku li Afrîka Başûr bû. Tê bîra min, wekî bi çûyîna li ewî cîhê bi tirs, ez bûme şedê tiştên bi tirs û xof, li kîderê bêhna gelekî xirab, qewilên jîyanêye gelekî xirab, odên girtîya hebûn, li kîderê ew li ser dûraya çend santîmêtra ji bîstî hetanî sî mêrî dihatine xweykirinê. Min li çend hebsên amêrîkîda qulix kiribû, lê nava jîyana xweda min qewilên wî cûreyîye bêguman (xirab) nedîtibûn. Hebsên me himberî wî cîhî, mînanî klûbên gunda bûn.

Min nikaribû bianîya ber çavên xwe, ku çawa meriv dikaribû li wî cîhî hema hevtêkê bima, lê derheqa ji çilî hetanî pêncî salî çi xeber? Meriv dikaribû li ser sifetên wan meriva gumanbirî bidîta, yên ku Îsa bawar nedikirin. Min fikirên wan tê bêjî guhdar dikirin: "*Hema rojekê ezê ji vir azabim, pêşîya ku ez bimirim*". Bi wê yekêva tevayî ew ji neeyantîya mirinê ditirsîyan. Ew nava halekî gelekî xirabda bûn û nava bêgumanîya tamda bûn. Eger piştî jîyana nava azayêda hûn mecbûrbûna hetanî dawîya emirê xwe we li wir derbaz bikira, ew yek wê bibûya zêrandineke rast. Ew girtî hema nava halekî wî cûreyîda bûn.

Ez li wir bûm û ez fikirîm, wekî bi çiqasîva jî ew cîh xirab bûya, yek e himberî dojê ew cîhekî baş bû. Ew girtî tenê nîbûn, hevalên wan hebûn û wana ronahiya royê didîtin, ya ku bi pencerên hesinkirîra dikete oda hebsê. Dojêda ne heval hene, ne jî ronahî. Li wir tenê agir e, yê ku wê tu cara netemire. Nava gola Agirda sivikaya heta-hetayê wê tunebe. Merivê her dem nava zêrandinada bin. Li dojê meriv nikarin bifikirin: "*Ezê rojekê ji vir aza bibim*". Wana cezayê heta-hetayê stendîye.

Doje hînkirineke Îsaye primitive e, Wî gelek cara derheqa wê yekêda xeber dida û diha zêde, ne ku roja îroyîn, ji dikên civîna rojên me zêdetir. Ew nedifikirî, wekî xeberdana derheqa dojêda (ew yek, wekî zêrandinên meriva wê li vir tu cara xilaz nebin (kêmasîya rehmbûnê dide kivşê. Feqet usa nîne, çawa Serwêrekî Qenc, Ewî lazim hesab dikir ku me derheqa wê yekêda hîn bike. Bi vî cûreyî menîya bîranîna derheqa dojêda û hînkirina wê yekê hizkirin bû, çimkî ew çi ku Ewî dikir û hîn dikir, ji rehmbûnê dihat. Ez dixwezim vê pirsê bidim: gelo roja îroyîn em qulixî meriva dikin û ji dikên me derheqa dojêda bîr naynin? Gelo ev yek hizkirina rast e?

Nava Încîlêda çend navên dojê hene *şêol* (tenê Încîla Kevinda), *Hadês* û *mexberê* mirinê navên cîyane. *Gêhên* û *gola Agir* navên cîhên zêrandinên heta-hetayê ne. Zûtirekê emê firqîya navberê û heta-hetayê bidine kivş ê.

Încîl hîn dike, wekî doje cîhekî rastî ye, lê ne ku bona fikira himberkirinê ye, çawa ku civaka me dicedîne wê yekê usa raber bike. Serê şanzdada, yê Jimarêda, erd vebû û li ber gelek şeda Şêolê saxe-sax sê malbetên tam daqurtandin. Nava peymana Nûda derheqa yê miqabilî Îsa û pêxembertîya wî ya derewda hatîye

nivîsarê: “Her du jî saxe-sax hatine avîtinê nava gola agir, yê ku bi kirkûtêva gur dişuxule” (Eyantî 19:20, AMP). Ew ne mirin, lê tenê şexsên wan birine li wî cîhî: ew hatine avîtinê nava gola Agir, bi bedenên xwe û şexsên xweva.

## Lazer û dewletî

Nava Mizgînîya Îsa ya li gora Lûqa derheqa qewimandineke tevî merivekî dewletî tê gilîkirinê, yê ku tenê bona xwe dijît. Ewî merivekî kesîb hesab hilnedida, yê ku her roj li ber mala wî paldayîbû. Em zanin, wekî ev serhatî mesele nîne, çimkî Îsa ew bi van xebera destpê kir: “...merivekî dewletî hebû...”. Xêncî wê yekê Ewî navê Birahîm da xebatê û ewê kesîb çawa Lazer nav kir. Nava meselên xweda Îsa nav nedidan û derheqa merivên rastda xeber nedida.

Lazer mir û milyaketa ew birine hembêza Birahîm, yê ku cîhekî usa bû, li kîderê pîrozên peymana Kevin dihatine xweykirinê, hetanî ku Îsa bona wana rîya berbi hazirîya Xwedê ya li Ezmîn vekir. Merivê dewletî mir û kete dojê (li Hadêsê). Nivîsar e:

> “Û li Hadêsê, li kîderê ew nava êşeke mezinda bû, ewî li jor nihêrî û ji dûrva Biraîm dît, û Lazer jî li rex wî bû. Ewî kire gazî: “Bavê Birahîm, li min were rehmê. Û Lazer bişîne, ku tilîya xwe avêda bike, bîne zarê min şil bike, çimkî nava vî agirîda ez nava êşa mezindame”” (Lûqa 16:23,24, TEV).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî ew merivê dewletî nava êşa mezinda bû. Nava tercimêdn mayînda n“zêrandin”, “cizaret”, yan jî “cefa” tên xebitandinê. Bi gilîkî mayîn gotî ew nava cefakî mezinda bû. Doje cîhê zêrandinaye fikirmîşbûyî ye. Usa jî guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî wî merivî Birahîm û Lazer nas kirin, lê wana jî ew nas kirin. Merivên li dojê, merivên tam in, ew karebûnên xweye fikirdarîyê, texmînkirinên xwe, xwestinên xwe, cûrê xwe xweyî dikin. Wî merivî didît, guhdar dikir û êş texmîn dikir. Bedenên meriva jî li wir cûrekîne. Hûn dibînin, wekî ew merivê dewletî gelekî dixwest ku zarê xwe hênik bikira. Îsa dibêje, wekî him beden û him jî şexs nava dojêda heta-hetayê unda dibin (binihêre Metta 10:28). Bi cûrekî mayîn gotî, bedena însên wê her dem ji alîyê agir û kurmada bê xirabkirinê û heramkirinê.

Usa jî guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî ew merivê dewletî hîvî dikir, ku li wî bihatana rehmê, mînanî serhatîya me û merivên zindana Lonêda. Doje cîhekî usa ye, ji kîderê *heta-hetayê* azayî tune. Tu kes wê bona berdildahatina merivên li Dojê wê neçe li wir, nenihêrî wê yekê, wekî piranîya wan meriva dixwezin piştgirîya moralî bistînin. Tê bêjî meriv tu cara rastîya dojê bi temamî fem nake. Birahîm gerekê bianîya bîra merivê dewletî: “Gelîkî mezin heye, yê ku me ji hev cuda dike. Her meriv, yê ku wê bixwesta li wêderêra derbaz bûya û bihata cem te*[bona berdildahatinê]*, li ser kevîya wî guneîhî tê sekinandinê û tu kes nikare wî sînorîra derbaz bibe û bê cem me” (Lûqa 16:26, NLT). Ez merivekî nas dikim, yê ku li dojê bûye. Ewî gilî dikir, wekî ewên ku ewî dîtine, dikirine qare-qar, wekî ew yek bona kişandinê gelekî giran e. Merivê dewletîyî vê serhatîyê jî hema ew yek dikire gazî.

Xwendinê berdewam bikin:

> “Lê Birahîm got: “Lao! Bîne bîra xwe, ku te qencîyên para xwe nav zemanê emirê xweda stendine, lê Lazer tengasî. Niha jî ew li vir dilrehet e, lê tu nava cefada yî...”. Hingê merivê dewletî got: “Bavo, wekî usa ye ez hîvî ji te dikim, tu Lazer bişînî mala bavê min, çimkî pênc birayên min hene, wekî here rastîyê wanra bêje, wekî ew jî neyêne vî cîhê cefa”” (Lûqa 16:25,27,28).

Diqewime we ev mesela kevin bihîstibe: “Mirina tevî hevala xwezilîye”. Dêmek bona çi vê yekê kar nekir? Bona çi merivê dewletî nedixwest ku birayê wî tevî wî bin. Bersiva vê pirsê ev e: dojêda hevaltî û pêwendî tunene. Hinek difikirin, wekî li dojê êvarî wê hebin. Yên mayîn difikirin, wekî ewê li wir tevî hevalên xwe bin. Eger usa bûya, yê dewletî wê bixwesta, ku hemû merivên ku nêzîkî wî ne tevî wî bûna, lê ewî bi gumanbirî dicedand wekî ew nehatana li wî cîhê cefa. Doje cîhê tenêbûnê û gumanbirîyê ye. Ew usa jî cîhê bîranînên heta-hetayê ye, çi jî bi fikira min cefakî dojêyî mezin e.

Bixwînin ku Birahîm bersiva hîvîkirina yê dewletî, ya bona birayên wî dide:

> “Birahîm got: “Bo brayên te Mûsa û pêxember hene ku bikaribin eşaretîyê bidin, birayên te gerekê guhdarîya wan bikin”.
>
> Yê dewletî bersiv da: “Na, bavê Birahîm, eger ji mirîya yek here cem wan, wê ji gunehên xwe vegerin”. Hingê Birahîm wîra got: “Eger

> guhdarîya Mûsa û pêxembera nakin, yek ji mirîya rabe jî dîsa ewana bawar nakin”” (Lûqa 16:29-31, TEV).

Li vir rastîke gelekî girîng nivîsar e. Gelek meriv berbi tiştên başqe dicedînin, bona ku bên li ser wê fikirê, wekî Mizgînî heye, yan jî nava wê yekêda merivên başqe bînin li ser wê fikirê. Qerez, Îsa dide kivşê, wekî tu tiştekî diha mezin çawa ku Xebera Xwedê ye, tune, ya ku dikare nava mêrivda bawarîyê pêşda bîne û wî bi cûrê tam defde, ku ew hetanî xilazîyê peyî Xwedê here. Min şaş fem nekin. Ewên ku tiştên nebînayî dibînin, zendegirtî dimînin û bi wedekî kurt tên guhartinê, lê ew cêribandin bawarîya hertimî dilê wanda pêşda nayne.

Wextê ku ez hela hê negihîştîbûm (tevbûyekî êvarîyên hertimî û kifirîkir), bavê min ez birim, ku em fîlma “Deh temî” temaşe bikin, rola kîjanêye serekeda Çarlton Hêston dilîst. Zelal tê bîra min, wekî min dîna xwe dabû êkrana sînêmayê ye mezin, wextê ku erd vebû û meriv daqurtandin, birine dojê. Wê yekê nişkêva ez zendegirtî hiştim. Wextê ku ez ji sînêmayê derketim, jîyana min îdî hatibû guhartinê. Min destpê kir îdî cûrekî mayîn bijîm û nêzîkî hevtêkê min derheqa wê yekêda xeber dida, lê peyî wê yekêra ez careke mayîn vegeryame li ser xeysetê xweyî berê. Menî kîjan bû? Min Xebera Xwedê guhdar nekiribû, min ji rêyên xwe tobe nekiribû û jîyana xwe tam pêşkêşî Îsa nekiribû û îzin nedabû, wekî kerema Wî min biguhêre.

Ez û hevalên xwe, me tiştên cûrekî mayîn jî dîtibûn, yên ku dîsa em ecêbmayî hiştibûn. Qerez, wan hemû tişta ez neguhartim. Jîyana min tenê wî çaxî hate guhartinê, wextê ku ez li ûnîvêrsîtêyê bûm û xwendikarekî hevalê me hate oda min û bi rîya Mizgînîya Îsa Mesîh nasîya min da Xebera Xwedê. Xebera Xwedê bi taybetî dibêje me: “Bawarî ji guhdarkirinê ye û guhdarkirin ji Xebera Xwedê ye” (Romayî 10:17), û “Hûn ne ku ji havênê pûç dîsa dinê ketine, lê ji yê nepûç, ji xebera Xwedê ya xweynemire heta-hetayê” (A Petrûs 1:23). Bo vê yekê jî tiştekî gelekî girîng e, ku em Xebera Xwedê hîn bikin û terîf bikin, lê ne tenê texmînkirinên xwe.

Qerez, piştî zelal raberkirina vê rastîyê, îzinê bidin ez vê yekê dîyar bikim: *eger texmînkirin xebera Xwedê tam dikin, yan jî hukumê xebera Xwedê mezin dikin, wî çaxî ew yek cîhdane û serbara serda jî*

*pêwîste*. Şedetî roleke mezin nava raberkirina Mizgînîyêda dilîzin, lê em wextê Xebera Xwedê qebûl dikin û bawarîya xwe li Xebera Xwedê tînin, em jîyana heta-hetayê distînin.

## Bo çi ez diçime vir?

Niha îzinê bidin ez şedetîkê gilî bikim, ya ku wê wan rastîyên Încîlê bide tamkirinê, derheqa kîjanada me xeberda. Êvarekê ez û kevanîya xwe li mala hevalê xwe mêvan bûn. Wextê ku em tevayî li oda mêvana rûniştîbûn, wî derheqa qewimandinkêda gilî kir, ya ku salên cahiltîya wîda qewimîbû. Ew li adên Karîbîyê mezin bibû û carekê wextê baranê ew ketibû wê çelê, kîjanêda ava baranê top dibû û ew av bona avayîçêkrinê didane xebatê. Birayê wî xwe avîtibû çelê û cêribandibû alî wî bike, lê nikaribûye alî bike û ew bona hewar-gazîyê revîbû çûbû, çimkî hevalê me nizanibûye xwe avê bixe. Hetanî alîkirinê, îdî ew sî deqeyî mirî bûye.

Ewî mera gilî dikir, wekî wextê ku ew ji bedena (qalibê) xwe derketibû, hemû organên wîye texmîkirinê xebitîne. Ew bi cûrekî lez peyayî nava tarîstanê bûye. Ewî got, wekî usa tarî bûye, wekî ewî nikaribûye destê xwe jî bibîne. Tarîstan usa bûye, wekî ewî texmîn kirîye, ku tê bêjî ewî ew tarîstan li xwekirî bûye. Û ewî got:

– Ez usa tirsyayî bûm, wekî ez difikirîm ku *tiştê ji vê yekê zêdetir xirab îdî nikare bibe*. Feqet ez çiqasî diketim, awqasî tirsa min diha zêde dibû. Li ser dinyayê min tirsa usa texmîn nekiribû. Bi xebera meriv nikare wê yekê bîne ber çava.

Ewî xeberdana xwe berdewam kir:

– Peyî wê yekêra min îşiqên ronahiyê dîtin û min zanibû, wekî ez diçûme dojê. Min destpê kir bikime gazî: “Bona çi ez diçime vir? Ez mesîhîme”.

Dê û bavê hevalê me bawarmendên xwepêşkirî bûn, lê çûyîna wîye li civînê tenê bona hazirîya wîye li wir bû, çimkî ewî nikaribû gura dê û bavê xwe nekira.

Ewî gilî dikir, wekî piştî wê yekê ewî gazîyê tirsê û zêrandina bihîstine. Ez gelekî baş bîr tînim ku ewî çawa got:

– Con, Lîza, qîrînên sade hene, feqet hene yên usa, ji kîjana xwîna te nava tamarên teda diqerime. Min hema qîrînên wî cûreyî bihîstin.

Ewî xeberdana xwe berdewam kir:

– Peyî wê yekêra, ez rû bi rû tiştekî ecêb ketim, yê ku minra digot: “Were vir, tu yê minî”. Min wîra şer dikir. Pêşîyê min ji tirsê nikaribû xeberda, lê paşê min kire gazî: “Min berde, min berde”.

Ez nişkêva ketime bedena (qalibê) xwe. Min dikire qîrîn û serbara serda min destê wî doxtirî gez kir, yê ku pêçîya xwe kiribû gewirîya min. Dayîka min derheqa wê yekêda gote min, dema ku min jêra gilî kir ku min çi dîtibû. Nava temamîya wî wedeyîda, wextê ku dayîka min li sivdera nexweşxanê rûniştî bûye, ewê gazî Xwedê kirîye: “Bavo, eger tu kurê min paşda vegerînî, ezê wî pêşkêşî li Te bikim”.

Piştî çend sala hevalê min li adên Karîbîyê qulix destpê kir.

Hûn dikarin wê yekêra qayîl nebin, ku ewî çi dîtibû, lê gelek mêr, jin û zarok hene, tevî kîjana tiştên wî cûreyî qewimîne. Cêribandinên wî cûreyî wextê hazirîya doxtira gelek cara diqewimin, lê hindik meriv lêkolîna wanva mijûl bûne.

Ji wan lêkolînera yek jî doxtirekî bi navê Mêlvîn Morzê ye, yê ku lêkolîna berfireh derbaz kirîye, tevî kîjana bûne zarok, yên ku nava wê yekêra derbaz bûne. Doktor Morzê du komên zaroka lêkolîn kirine. Koma ewlin 121 zarokê ji sisîya hetanî 16-salî bûne, yê ku nexweşên giran bûne, lê neketine nava wî halî. Bedenên wana aparatava kirine, ku bêhna wan derê û ew nexweş dihatine xweyîkirnê, yan jî bi dozayên bilind derman distendin. Zarokên ji vê komê tu yekî derheqa derketina ji bedena xwe negotin.

Koma zarokaye duda ji 12 zarokên wî cûreyî bûn. Nava vê komêda yên usa bûn, xebata dilên kîjana sekinîye, yan jî avêda xeniqîne û qewimandinên mayîn. Nava vê koma biçûkda her zarokekê gilî kiribû, ku çawa ji bedena xwe derketiye. Çend zaroka bedenên xwe dîtibûn û doxtirara gilî kirine, ku wana çi dikir, wextê ku doxtir li ber bedenên wan dixebitîn.

Hinek dikarin bifikirin, wekî texmînkirina hevalê me encamê xiyala bû. Feqet qewimandinên tevî van zaroka bi guman didine kivşê wekî usa nîne. Xêncî wê yekê, çawa dikarin usa hesabkin, wextê ku ew sî deqeyî nava mirina klînîkîda bûye.

## Doje (Hadês) û gola Agir

Hevalê min usa jî merivên nase mayîn li wî cîhê bi cefa dîtine, navê kîjanî doje ye (yan jî Hadês). Ev cîh ne cîhê wan merivaye heta-hetayê ye, yên ku xilazbûn nestendine. Eva cîhekî bi cefa ye, li kîderê hîvîyê disekinin, li kîderê yên xilaznebûyî hetanî dîwana textê Sipîyî Mezin tên xweyîkirinê. Cîhê hertimî, li kîderê meriv, cin û milyaketên ketî wê piştî dîwana xwe heta-hetayê derbaz bikin, çawa *gola Agir* tê naskirinê Ev yek hema ji vê para Încîlê tê kivşê:

> "Peyî wê yekêra min textê Sipîyî Mezin û Ew, Yê ku li ser text rûniştîbû dît... Û behrê ew mirî dan, yên ku nava wêda bûn, mirinê û Hadêsê (doje) mirîyên heyî teslîmî nava xwe kirin û karên wan hatine qirarkirinê anegorî wî hemû tiştî, çi ku wana kirîye [anegorî kirin û meremên wana]. Peyî wê yekêra mirin û Hadês hatine avîtinê nava gola agir. Gola agir mirina duda ye. Û eger navê kesekî nava kitêba Jîyanêda nehate dîtinê, ew avîtine gola Agir" (Eyantî 20:11,13-15, AMP): du beş bi xetên çargoşe bona zelalbûnê hatine cudakirinê).

Berê ewlin ez dixwezim bidime kivşê, wekî ewên ku li dojê ne (Hadêsê), wê bên anînê li ber dîwanê. Çawa ku dîwana wan xilazbe, ew kesên ku tiştên bêqanûnî mîyaser kirine wê bêne avîtinê nava gola Agir, nava wanda cin, milyaketên ketî û hema doje (Hadês) bi xwe.

## Dîtinoka derheqa gola Agirda

Hevalên min û usa jî yên jina min hene, yên ku esilê xweda yûnanin. Ew mêr û jinin. Navê wê jinê Co ye û ew qulixçîya nisileta sisya ye. Pîrka wê li Yûnanistanê hatîye dinê û li wir mezin bûye û ji salên cahiltîyê ew Xwedê gerîyaye. Pirsên wêye bona merivên dorbera bi bêyî guhdarî dihatine qebûlkirinê û qerfê xwe lê dikirin. Ewê dixwest biçûya civînekê, lê digotine wê, wekî Xwedê tune û ew gerekê derheqa wê bêfikirîyêda xeber nede.

Rojekê, wextê ku pîrika Coyê, wextê cejinekê li meydana gundê xwe tevî hevalên xwe reqasa miletîyê dikir, dengekî wêra xeberda: "Yêprosînî, berbi reqasa heta-hetayê bicedîne".

Ew nişkêva zendegirtî ma. "*Gelo kê minra xeberda*?",– ew fikirî û carekêra terka reqasê da û lez çû malê bi wê gumanê, wekî ewê

bersiva xwe bistîne. Wextê revê tê bêjî barek hate ser wê, tê bêjî li ser pişta wê giranîke mezin hebû.

Çawa ku Yêprosînî kete malê, ew carekêra çû oda xwe, çok da û destpê kir bigirî. Ewê dixwest wî dengîra xeber bide. Kî wêra xeber dida? Ew çi xeber bûn ku gotine wê? Gelo Ew bi wê yekê dicêribîne çi bêje? Van pirsa fikira wê didane cefê û wê yekê dirêj nekişand. Hema çawa ku çokên Yêprosînîyê gihîştine erdê, ewê texmîn kir, wekî tiştekî mînanî agir kete oda wê û ew jî kişande nava xwe. Ew paşda ket û kete nava dîtinokê.

Nava dîtinokêda ewê milyaketekî bi kincê sipî dît, yê ku nêzîkî wê bû. Wî Yêprosînî bilind kir û cîguhastî cîhekî kir, li kîderê ronahî kêm bû. Milyaket ew li wir hişt. Bi guhdarî nihêrandinê, ewê zendegirtî mayî fem kir, wekî li ber dîmena Golgotayê sekinîbû. Xudan li ser xaç bû: xwîn ji birînên Wî diniqitîn. Ewê sifetê Xudanê zêrandî dît.

Bi wê yekêva tevayî Yêprosînîyê ji dûrva qîrîn bihîstin. Ew zivirî, ku bibîne, ku ew deng ji kîderê tên û gelîkî mezin dît, yê ku di navbera xaç û wî cîhîda bû. Ew cîh, ji kîderê qîrîn dihatine bihîstinê, li wî berî gelî bûn. Ji erdê alava agire mezin derdiket. Ew okêana agir bû. Ewê qîrîn dibhîstin, yên ku merivên li wir dikirin. Wana nifir li Xwedê dikirin. Wî çaxî ewê qewatek texmîn kir, ya ku serê wê def dida û dizvirande berbi berê gelîyî alîyê mayîn û ewî dengî, yê ku ewê îdî bihsîtibû, wêra xeberda: “Tu jî gerekê vî cîhîbî”.

Ew zendegirtî ma û destpêkir bigirî, û hîvî kir, ku li wê bê rehmê. Ew kete li ber xaçê dar û li ser pişta xwe ew giranî hilda, ya ku ewê pêşda texmîn kiribû. Ew hinek wede ma li wir û pêra jî digirîya. Wî dengî bi hizkirina tijî û bi rehmê, careke mayîn wêra xeberda: “Wî ev yek bona te kir. Ew bona te mir. Eger tu baxşandinê hîvî bikî û wê qurbanîyê qebûl bikî, ya ku Wî bona te kir, tê mecbûr nîbî herî li wir (gola Agir)”.

Peyî wê yekêra Yêprosînîyê destpê kir diha zêde bigrî û carekêra bersiva wî dengî da. Ewê baxşandin hîvî kir û ew barê li ser wê carkêra hate bilindkirinê, berbi xaç gulor bû.

Ewê li jor nihêrî û Xudan Îsa li ber çavê xwe dît, yê ku bi şikilê Xweyî rûmet sekinîbû. Xudan Îsa ew bilind kir û ew bire li ser çîyayê şîn. Niha Yêprosînî dikaribû nava fikira xweda Wîra xeberda.

Ewê pirs didan, lê Îsa bersiv dida. Ew yek tiştekî ecêb bû. Ewê pirsî, ku ew kuda diçûn û Îsa got: “Bona dîtina Bavê teyî Ezmîn”.

Wextê ku ew nêzîkî serê çîyê dibûn, ewê dergehek dît, ji kîderê ronahî dihate kivşê. Ji kulîlka û dara miqam dihatine bihsîtinê û ew sazbendî li hemû dor-bera bela dibûn. Ew gihîştine wî dergeyî û ketine hundur. Ew yek tiştê bawarkirinê nîbû. Meriv nikaribû ew bedewî bi xebera bianîya ber çava.

Ew raste-rast çûne berbi text. Yêprosînîyê sifetê Xwedê nedît, çimkî ew pêçayî bû, lê kitêbeke mezin û destek dît, yê ku ji ewira derket. Wî destî destpê kir binivîse. Ew pêşda hat bibîne, ku çi dihate nivîsarê û zendegirtî ma, wextê ku navê xwe kitêba Jîyanêda dît (nenihêrî wê yekê, wekî ewê wî çaxî nizanibû, wekî ew kitêba Jîyanê bû).

Wextê ku Bavê ezmîn navê wê kitêba Jîyanêda nivîsî, Wî got: “Tu bi xêr hatî malbetê”. Û enîya Yêprosînîyê ramûsa. Wî çaxî ewê dît, ku milyaketa doran girtîye, yên ku bi şabûn distiran û direqisîn. Ew jî gihîşte wan. Peyî wê dîtinokêra êpêce wede derbaz bû û ew pê hesîya, wekî milyaketa bona qedirê wê usa dikirin, çimkî ew xilaz bibû.

Hinek wede şûnda Xudan wêra xeberda û got, wekî wede ye, ku ew paşda vegere li ser topa dinîyayê, çimkî Ewî karekî mezin bona wê hazir kiribû. Yêprosînî gerekê bona navê Wî nava cêribandinên agirra derbaz bûya, lê Xudan wê tevî wê bûya, û eger ew hemû tişt xilaz bûya, ewê paşda vegerîya, bona ku heta-hetayê tevî Xudan bûya.

Wî çaxî Yêprosînî careke mayîn li malê bû. Ew gelekî aciz bû, wekî ji sefera xweye ezmîn paşda vegerîyabû li ser topa dinîyayê, feqet ewê nikaribû ew yek biguharta.

Wextê ku li gund behsa derheqa wê yekêda bela bû, qerf û nûçik destpê bûn. Ew yek hema ji bavê wê destpê bû, yê ku gef xwerin, wekî wê bi balte wê bikuje, eger ew ji bawarîya xwe dûrnekeve. Yêprosînîyê got, wekî ew tu cara nikare wê yekê bike, çi ku ewê dîtibû.

Êvarekê ew zêrandin diha berk bû. Xwîşka Yêprosînîyê eşaretî da wê, wekî sibetira mayîn çend meriva qirar kiribûn bêne mala wan û wê bibine meydana gund, li kîderê civîna yûnanî hebû. Eger

wana şikilê Meyremê derxista û eger ew li ber ta nebûya, çawa nîşana bawarî yê, wana wê bênzîn bikira ser bedena wê û wê bişewitandana.

Yêprosînîyê bawar nedikir, wekî merivê awqas dûr biçûna. Feqet wana qirar kiribû wê yekê bikin, çimkî wê şevê milyaketekî ku Xudan şandibû hate li cem Yêprosînîya cahil û bi defdana sergirka milê wê, ew hişyar kir. Wextê ku ew hişyar bû, milyaket gote wê, ku ew kincên xwe xweke û nêzîkî derê male bibe. Ewê gura milyaket kir û wextê ku gihîşte dêrî, texmîn kir, wekî yekî ew ji erdê bilind kir. Ew bi fîzîkî ji mala xwe hate cîguhastinê û li gundekî çend kîlomêtra dûr peya bû, li kîderê bona wê qezîya tunebû.

## Zêrandina nebînayî

Pîrika Coyê doje (Hadês) nedîtibû. Ewê gola Agir dîtibû, ya ku dîsa çawa "mirina duda" dihate navkirinê. Jîyana wê hatibû guhartinê, çimkî ewê bi dil qirar kiribû peyî Îsa Mesîh here. Încîl dibêje me:

> "Feqet tirsonek, yên ku berê xwe ji peyîhatina Min (Îsa) vedigerînin, û ewên ku hindava Min da bêaminin û yên kirêt-heram û mêrkuj, bênamûs, û ewên ku tevî sêrbazane, û yên pûtparist, yên derewîn, wê bikevin nava gola Agir, ya ku bi agir û kirkûtêva dişewite. Eva mirina Dudaye" (Eyantî 21:8, TLB).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî ew gola "bi agir û kirkûtêva dişewite". Kirkût ne qinyatê hesinî ye, kîjan wextê dişewite germayîke mezin dide û bîhneke xirab bela dike. Ewên ku doje bi xebera dianîn ber çava, derheqa bîhna gelekî xirabda gilî dikirin. Merivên ku li wir bûne, kîjana ez nas dikim, dibêjine min, wekî meriv nikare bi xebera wê zêrandinê û tirsê bîne ber çava, ya ku meriv li ser xwe texmîn dikin.

Dîsa guhdarîyê bidine ser têrmîna "mirina duda". Îsa dibêje: "Guhê kê heye, bila guhdar bike, ku Ruh çi dibêje civîna. Kî ku ser dikeve, ew ji mirina duda wê zyanê nekeve (Eyantî 2:11).

Diqewime bona we tiştekî ecêb e, wekî Îsa vê yekê civînara dibêje. Feqet, guhdarîyê bidine ser, wekî xebera jorinda derheqa sê cûrên merivada hatîye nivîsarê, yên ku wê gola Agirda bişewitin.

Yên ewlin ewin, yê ku terka çûyîna peyî Wî dane. Yên duda ewin, yên ku hindava Wîda bêamin bûne. Yên sisîya gunekar in, yên ku tu cara tevî Wî nejîtine. Herdu komên ewlin, derheqa kîjanada nava vê xeberêda nivîsar e, wextekê civînêda bûne.

Niha wan hersê merivên ewlin bîr bînin, derheqa kîjanada me nava serhatîya xweye alêgorîkda xeber dida: Dilê Gumanbir, Yê Xapyayî û Serbest. Ji wana dudu li mekteba Êndêlê aktîv bûn, kîjan şikilê civînêyî sîmvolîk e. Zûtirekê emê diha bi kûrayî derbazî vê pirsê bibin.

Mirina duda zêrandina heta-hetayê ye nava gola Agirda ye. Careke mayîn serê kitêbêyî ewlin bîr bînin, kîjanîda me derheqa heta-hetayêda xeber dida. Hinek difikirin, wekî ev zêrandin wê ser hevda bên, lê ev yek bi zelalî miqabilî Xebera Xwedê ye. Kitêba Pîroz dibêje: “Û wê şev û roj heta-hetayê bizêrin” (Eyantî 20:10).

Bona diha zelal bê nîşandayînê, wekî ev zêrandin bêdawî ye, Îsa van xebera derheqa wan merivada dibêje, yên ku gura Xebera Wî nakin: “Û evê herine cefê heta-hetayê, lê yên rast wê herine jîyana heta-hetayê” (Metta 25:46).

Guhdarîyê bidine ser xeberên “cefê heta-hetayê”. Bi gilîkî mayîn gotî, ev cefa tu cara xilaz nabe. Ew yê heta-hetayê ye. Îsa dibêje me:

> “Eger çavê te, te ji rê derdixe, wî derxe. Bo te hê qenc e, ku tu bi çavekî bikevî padişatîya Xwedê, ne ku bi du çava bikevî cehnimê (Gêhên)” (Marqos 9:47, AMP).

Çawa ku hûn dibînin, Îsa derheqa Gêhênê, gola Agirda dibêje. Niha binihêrin, ku ev beşa nava tercimeke mayînda çawa hatîye nivîsarê.

> “Eger çavê te te def dide, ku tu bawarîya xwe unda bikî, wî derxe. Diha başe, ku tu tenê bi çavekî bikevî padişatîya Xwedê, ne ku herdu çava xweyîkî û bikevî cehnimê. Li wir “kurmên, ku wana dixun, tu cara namirin û agirê ku wana dişewitîne tu cara natemire”” (Marqos 9:47,48, TEV).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî kurmên ku wana dixun tu cara namirin û ew yek dide kivşê, wekî xwerina wane hertimî heye. Werin em vê yekê himberî tiştên li dinîyayê bikin. Hema meriv bi fîzîkî dimire, kurm bedena wî dixun, hetanî ku ew xilaz dibe û tenê hestu dimînin. Peyî wê yekêra kurm dimirin. Kurmên li Gêhênê

namirin, çimkî ew çi ku ew dixun, tu cara xilaz nabe. Merivekî, yê ku çûbû cehnimê, gilî dikir, wekî ewî kurmên usa mezin dîtine, yê ku goştê meriva dixwarin, lê ew yek girîng nîne, ku ew meriv çiqas wext bû ku li cehnimê bû. Li ser wan meriva her dem goşt hebû, yê ku kurma dixwar.

Belê, hûn rast fem dikin: wî cîhî meriv nikare bîne ber çavê xwe. Hûn gerekê bîr nekin, wekî Xwedê gola Agir bona meriva çênekiribû. Awa guhdar bikin, ku Îsa çi dibêje wan meriva, yên ku tên avîtinê li wî cîhê xirab:

> "Hingê ewê yên milê xweyî çepêra bêje: "Nifirlêbûyîno! Dûrî min herin nava agirê heta-hetayê, ku bona mîrêcin û milyaketên wî hazir bûye"" (Metta 25:41).

Gola Agir bona mîrêcin û milyaketên wî hatibû çêkirinê, lê ne ku bona merivatîyê. Feqet mîrêcin geleka dixapîne û wana tevî xwe dibe li dîwana heta-hetayê. Eva mînanî serpêhatîya me ye alêgorîk e: nava encamê hukumê Dagonda gelek hatine xapandinê û hêrsa Cêylon, ya ku bona Dagon têra hatibû dîtinê, gerekê bona wan meriva jî bihata xebitandinê, yên ku neketine bin hukumê wî. Eger usa nebûya, wî çaxî Cêylonê heq nîbûya.

## Gulvedana heta-hetayê

Nava serê kitêbêyî pêşinda me dît, ku hêrsa Cêylon bi qewateke çawa tê kivşê. Încîl elam dike, wekî ew mêr, yan jî jina ku "wê ji wê şeraba hêrsa Xwedê vexwe... ewê li ber milyaketên pîroz û li ber Berxê, agir û kirkûktêda cefê bikişîne. Dûyê cefê wan wê heta-hetayê bikişe" (Eyantî 14:10,11).

Em careke mayîn derheqa "heta-hetayêda" xeberdin. Gelo tê bîra we, wextê ku serê kitêbêyî ewlinda me derheqa heta-hetayêda xeber dida, derheqa wê yekêda, wekî me dicêriband wê yekê fem bikin çi ku tu cara xilaz nabe. Hûn nikarin wê yekê bi fikira xwe fem bikin, lê hûn dikarin bi dilê xwe fem bikin. Bo vê yekê jî Xwedê bona temamîya nisiletekê şîn dikir, ya ku gura Wî nekir:

> "Xwezî nêt-fikirên wan hergav ev be, ji Min bitirsin û hemû emirkirinên Min biqedînin, wekî bona wan û zarên wanra heta-hetayê qencbe" (Qanûna Ducarî 5:29).

Guhdarîyê bidine ser xebera “*heta-hetayê*”. Xwezî ew meriv bi tiştên qewînva bihatina rêberkirinê: xwezî ew bi heta-hetayêva bilivîyana.

Dîsa guhdarîyê bidine ser, wekî Xwedê got: “Hemû emirkirinên min nava hemû wedeyîda xweykirana. Ewî negot: “Hemû emirkirinên min *hinek wede* xweyî bikirana”, û negot *“beşeke* emirkirinên min nava hemû wedeyîda xweyî bikirana”. Na xêr, nivîsar e, ku *hemû* emirkirinên Wî *her dem* xweyîkin. Mera hatîye emirkirinê, ku ew bi temamî û her dem gura Xwedê da bin.

Diqewime hûn bifikirin: “*Min hemû emirêd Wî neqedandine. Ezê li ber dîwanê gunekarbim*”. Belê, hûn bi temamî rastin. Qanûna Xwedê dide kivşê û dide zelalkirinê, wekî tu merivek ne anegorî norma Xwedê ye heq e û hemû kes wê li ber dîwanê gunekarbe. Tu merivek wê nikaribe li ber Xwedê bisekine û bêje: “Min jîyana xwe usa derbaz kirîye, wekî ez layîqî padişatya Te me û ne layîqî stendina cezayê heta-hetayê me”.

Menîya şaşbûnên me ew e, wekî destpêkêda, li nava baxçe însan bi zanebûn ji gura Xwedê derket. Çawa encam ewî tebyeta gunehkar dest anî. Nava feydayê xayîntîyêda ew bû xulamê mîrêcin û dîlê wî. Ewî bi tu cûreyî nikaribû xwe xilaz bike, yan aza bike. Ev tebyeta ketî derbazî peyîhatîyê Adem û Hêwayê bû, dêmek temamîya merivatîyê, çimkî em bi tebyeta dê û bavê xwe tên dinîyayê.

Tenê bi saya hizkirina Wî Xwedê soz da, wekî nenihêrî wê yekê, ku merivatî bi temamî bona halê xweyî ketî cabdar bû, Ewê Xilazkir bişanda, bona ku me aza bike. Ew Xilazkir Îsa Mesîh e. Bi seda sala pêşîya bûyîna Wî derheqa wê yekêda pêxembertî hebûye, wekî Ewê ji keça azep bê dinîyayê (binihêre Îşaya 7:14). Bavê Wî wê Xwedê bûya, lê dayîka Wî wê keçeke bi navê Meyrem bûya, ya ku wê ji eşîra Dawidê Padişa bûya. Gerekê vî cûreyî bûya, çimkî eger dê û bavê Îsa însan bûna, Ewê jî bibûya dîlê tebyeta Adem. Ewê bibûya xulamê guneh. Ewê nikaribûya bi wî cûryî bijîta û ew yek jî dide kivşê, ku wê nikaribûya me xilaz bikira. Çawa jî hebe, ew gerekê ji jinekê bihata dinîyayê, çimkî însan bi xwe ketibû û ew jî gerekê bahê xayîntîya me bida. Dêmek Îsa bi sed selefî Xwedê bû û bi sed selefî jî însan bû.

Îsa hate xaçkirinê û hemû gunehên me hildane ser Xwe. Ew mir û xwîna Xwe rêt û bi wî cûreyî bahên gunehên me da. Qerez, çawa ku ew bi jîyana heq emirê xwe derbaz kir, Bavê Ew ji nava mirîya rakir û alîyê Xwedêyî rastê da rûniştandinê. Dawidê padişa, yê ku usa jî pêxember bû û usa jî kal-bavekî Îsa bû, pêşda, berî ji hezarî zêdetir sala, texmîn kir, ku wê piştî xaçkirina Îsa çi biqewimîya. Petrûs roja Pêntêkostê xeberên Wî bîr anîn û ew roj elam kir:

> "Lê ew [Dawidê padişa], ku pêxember bû, wî zanibû, ku Xwedê bi sond wîra soz daye wê ji bedena yekî dayne ser textê wî. Ewî ew yek hê pêşda dît û bona rabûna Mesîh got, ku ewê dîyarê mirîyada nemîne, ne jî bedena wîyê birize. Eva ew Îsa bû, yê ku Xwedê ew ji mirinê rakir, ku em hemû jî şedene" (Karên Şandîya 2:30-32).

Xwedê Îsa ji nava mirîya rakir, bona ku me aza bike. Guhdarîyê bidine ser xeberên Petrûs: ew dibêje, wekî Îsa li Hadêsê nehate hiştinê û ew yek dide kivşê, wekî Ew li wir bû. Ew kengê li wir bû? Ew nava wedê di navbera xaç û rabûna ji nava mirîya bû. Îsa dewsa me hemûya mirin yan jî doje tam kir. Bona ku em mecbûr nîbin, ku em cezayê xweyî heta-hetayêyî heq bistînin. Wextê ku em jîyana xweye xwehiz datînin alîkî û bi temamî xwe pêşkêşî serwêrîya Mesîh dikin, xebata Wî ya kirî, rêtina xwîna Wî û tamkirina mirinê dibe bahê xilazbûna me û ew ji me aza dibe û Xwedê afû dike. Em bi heqîtîya wî tabîya heq dest tînin, û em dikarin li ser xwe guman li ber textê dîwana Wî bisekinin. Rûmeta heta-hetayê bo Xwedê!

Bo wê yekê jî Xebera Xwedê zelal eyan dike: "Xwedê hûn bi rehmûna Xwe xilaz kirin, wextê ku we bawar kir. Hûn nikarin hesabkin, wekî ew yek qîmetê we ye: ew yek pêşkêşa ji Xwedê ye. Xilazbûn heqê bona wan karên qenc nîne, kîjan me kirine, ku ji me tu yek bi wê yekêva kubar nebe" (Efesî 2:8,9, NLT).

Eger we tu cara tobe nekirîye bona ku ji Xwedê cuda bijîn, hûn ji rêyên xweye gunehkar dûr neketine û bi temamî emirê xwe we teslîmî serwêrtîya Îsa nekirîye, hema niha dawîya kitêbê vekin. Wê beşêda ezê bona xilazbûna we programa Xwedê şirove bikim û tevî we dua bikim, bona ku hûn Îsa Mesîh çawa Xudan û xilazkirê xwe qebûl bikin.

Gelek bawermend derheqa wê yekêda baş ha ji wê yekê hene, çi ku min nava çend rûpelada raber kir. Feqet min zelal kirîye, wekî

ew bi temamî wî hemû tiştî fem nakin, derheqa çida ezê nava herdu serên kitêbêye pêşîya meda xeberdim. Bi rastî, gelek meriv, yê ku dihebînin, wekî mesîhî ne, wê ji rastîyên Încîlê yên zelal zendegirtî bimînin, kîjana emê nava rûpelên mayînda bibînin. Nava serên kitêbêye pêşîya meda emê dîsa derheqa wê yekêda xeberdin, ku bona çi rastîya cezayê heta-hetayê tê hesabê çawa zanebûna hîmlî, ya ku bona her bawarmendekî pêwîst e, bona ku bawarmend bighîje mezinbûna ruhanîye saxlem.

SERÊ 5-A

# DÎWANA YÊN XAPÎYAYÎ

*"Em zanin, wekî dîwana Xwedê bi rastîyê ye..."*.
— Romayî 2:2

Îsa hat, ku me ji cezayê heta-hetayê: yê bona gunehê me, me xilaz bike, yê ku pêşda tenê bona mîrêcin û pûtparistê wî têra hatibû dîtinê. Bi dayîna emirê xwe bona me, Ewî hizkirina Xwedêye ecêb eyan kir.

Derheqa vê yekêda bifikirin: pêşda, wextê ku Xudan meriv, terewil, teyrede, buhuk, terewilên berhê û hemû tiştên ku li ser topa dinîyayê hene, usa jî atmosifêra, çêkir. Nivîsare: û Xwedê ev hemû tişt dît, çi ku ewî kiribû û ew jî gelekî qenc bûn" (Destpêbûn 1:31). Paşê Ewî efrandarîya Xwe teslîmî mêriv kir, bona ku ewî kontrol bikira û xweykira. Anegorî elamkirina Zebûra: "Ezman tenê yê Xudan e, lê dinîya Ewî da însên" (Zebûr 115:16, TEV). Adem borcdar bû ne tenê xwe biparasta, lê usa jî ew gerekê temamîya efrandarîya Xwedê ji dijminê sereke Lyûsîfêr biparasta.

Xwedê robot nedixwestin, li cem kîjana bijartina aza ya hizkirina Wî, gurêdabûn û tevgirêdanên tevî Wî tunebûn. Dêmek Ewî girêdayî dareke nava baxçera emir kir: "Tu dikarî her rezekî ji her darekî li baxçe bixuwî, xêncî wê darê, ya ku zanebûna derheqa qencîyê û xirabîyêda dide. Hûn gerekê rezê wê darê nexwun: eger bixwun, hûnê hema wê rojê jî bimirin" (Destpêbûn 2:16,17, TEV).

Xwedê derheqa mirina fîzîkîda nedigot, çimkî Adem peyî teribandina wê emirkirinêra, piştî gelek sala mir (nenihêrî wê yekê, wekî ew jî encamekî gurênekirinê bû). Dewsa wê yekê Xudan nîşanî mêriv kir, wekî ewê ji jîyana Xwedê cuda bibe û wê tebyeta Lyûsîfêr dest bîne, û ew jî hema mirin e.

Hinek wext şûnda Lyûsîfêr Hêwa xapand, nava fikira wêda xeysetê Xwedê navhev xist. Ewî karibû guhdarîya Hêwayê ji ser darên nêzîkî wê dûrbixista û bibira ser dara qedexekirî. Çawa ku

Hêwayê qirar kir, wekî ew dara ya qenc, kardar û xweş bû, ewê ji wê darê xwer. Menî ew bû, wekî nava fikira xweda ewê destpêkir hesab bike, wekî Xudan ji mêriv distîne, lê ne ku bi merdanî dide. Qerez, wî çaxî merivatî hela hê neketibû. Efrandrîya Xwedê hetanî wî çaxî tebyeta mirinê dest neanî, wextê ku malxwê Hêwayê ew rezê dara qedexekirî nexwer. Û wê yekêda jî gunehê Adem diha mezin bû. Hêwa hatibû xapandinê, lê ew na (binihêre A Tîmotêyo 2:14).

Dêmek ne tenê Adem, lê temamîya efrandinê, li ser kîjanê ew hatibû qeydekirinê, carekêra tebyeta mirinê dest anî. Hetnî xayîntîya Adem, heywana hev nedikuştin, goştê hev nedixwerin û ne jî dimirin. Bager, erdh'ej, bobelîsk, xelayî, nexweşî û êpîdêmîya tunebûn. Ew hemû tişt wî çaxî pêşda hatin, wextê ku mêriv ew kontrol nekir, çi ku Xwedê lê amin bibû. Nivîsar e:

> "Hemû tiştên li ser dinîyayê ji alîyê Xwedêda hatine nifirkirinê, nenihêrî wê yekê, wekî Ewî ew yek nedixwest. Temamîya efrandinê hîvîya wê rojê ye, wextê ku ew bighîje lawên Xwedê, ji mirinê û undabûnê nava azaya rûmetda" (Romayî 8:20,21, NLT).

Tebyet bi bijartina xwe nifira mirinê hilnade ser xwe, lê ew yek rûyê gurênedabûna mêrivda ye. Adem ew yek neparast, çi ku lê amin bibûn. Rûyê wîda ne tenê tebyet, lê ew bi xwe, jina wî û nisiletên wîye pêşerojê ketine ber wê nifirê, ya ku pêşda tenê li ser Lyûsîfêr bû. Fikira wê nifir'ê cudabûna ji Xwedê bû. Gelo eva xayîntîke çawa bû!

Wextê ku ew yek qewimî, Xwedê dikaribû bigota: "Merivatîya ku Min jê hiz kir, Min dua lê kir û min bi cûrê tam ew çê kir, lê merivatîyê Ez hiştim û berbi Lyûsîfêr cedand. Bila hemû herine gola Agir, lê Emê (Bav, Kur û Ruhê Pîroz) hemû tiştî ji nûva destpêkin. Emê ezmanekî mayîn çêkin, bi binelîyên usava, yên ku wê hindava meda aminbin û wê Me usa hiz bikin, çawa ku Em wana hiz dikin.

Eger Xwedê usa bikira, Ewê bi temamî nava qirara Xwe da heq bûya. Feqet rûyê hizkirina Xwe ya ecêbda, Ewî soz da merivatîyê, wekî wê Xilazkir bişîne bona me ji wê dîltîyê aza bike, ketine nava kîjanê em. Ew Xilazkira wê Kurê Wî bûya, tevî Kîjanî Ewî ezman û dinîya çêkirin. Bi gilîkî mayîn gotî, Kurê bahê gunê me û usa jî bahê tebyeta mirinê bida, nenihêrî wê yekê, wekî Ewî hema destpêkêda xêncî hizkirina merivatîyê tu tişt nekiribû. Hizkirna Xwedê ecêb e.

Awa bona çi Îsa li Golgotayê hate xaçkirinê. Ez zendegirtî dimînim, wextê ku mesîhî nikarin caba wê prsê bidin, wextê ku bêbawerek dipirse: “Gelo çawa Xwedêyê ku hiz dike, dikare wan meriva bişîne dojê, yên ku Mizgînî guhdar nekirine?”. Bersiveke mine zelal heye: “Ew yek ne ku gunehkarîya Xwedê ye, lê ya me ye”. Îsa bihakî mezin da bona azakirina merivatîyê. Peyî wê yekêra Ewî temî da wan meriva, yên ku îdî derheqa wê behsa qencda zanin, ku temamîya dinîyayê bigerin û wan hemûyara gilîkin, kî ku nizane, wekî em ji wê nifirê xilaz bûne, hatine kirînê, ya ku me anîye li ser xwe û usa jî li ser temamîya efrandinê. Em gerekê bona nisileta xwe hesab bidin. Xwedê para Xwe ya nava karên xilazkirina merivatîyêda kirîye.

## Em tebyeta Xwedê distînin

Xêncî wê yekê, wekî Îsa cezayên gunehên me kişand, nava Wî da me tebyeta nû stend, ya mînanî tebyeta Xwedê. Em îdî xulamên gunehê nînin. Wextê ku meriv bi temamî jîyana xwe pêşkêşî Îsa dike, ew bi temamî dibe yê nûçêkirî.

> “Wextê ku kesek dibe mesîhî, ew nava xweda bi temamî dibe merivekî nû. Ew îdî yê berê nîne. Jîyana nû destpê bûye” (B Korintî 5:17, TLB).

Em bi xebera dimirin, wextê ku em Îsa Mesîh çawa Xudan qebûl dikin. Bona Xwedê tebyeta meye kevin tevî xaçkirina Mesîh tê kuştinê. Bi vî cûreyî em careke mayîn dibin. Niha em ji wê tebyetê azane, ya ku wextekê serwêrîya jîyana me dikir. Încîl zelal dide kivşê: “Û çawa ku Mesîh bi qewata Bavê rûmet ji nava mirîya rabû, niha em jî wî cûreyî dikarin derbazî jîyana nûbin... Şexsên meye kevin tevî Mesîh hatine xaçkirinê, bona ku guneh serwêrîya xweye nava jîyana meda unda bike. Em êdî xulamên gunehê nînin. Çimkî wextê ku em tevî Mesîh mirin, em ji serwêrîya gunehê aza bûn” (Romayî 6:4,6-8, NLT). Niha em dikarin anegorî tebyeta Mesîh bijîn, lê ne ku bi wê tebyetê, li kîderê em rûyê xayîntîya Ademda dîl ketibûn.

Ew yek, nezanîya here mezin e, wextê ku mesîhî yekî bêhurmet dike, yê ku Îsa çawa Xudan qebûl nekirîye, rûyê jîyana wîda. Binyata merivê wî cûreyîyî ruhanî bona gunehkirinê ye û ew hema

usa jî dike. Ew yek tiştekî tebyetî nîne, wekî merivê “bawermend” her dem û bi rezedilîya xwe guneha dike. Ew merivê ku her dem guneha dike, dikare qebûl bike, wekî Îsa Xudan e û xilazkirê wî ye, lê bi rastî usa nîne, bo vê yekê jî xebera *bawermend* min kire nava vêrgula. Eger Îsa bi rastî Xudanê wî merivî bûya, nava jîyana wîda wê tebyeta xwedêtîyê bihata kivşê. Îsa ev prînsîp zelal raber kir:

> “Meriv dikare lez darên fêkîyaye hemû cûreyî qirar bike û rezên wan lê binihêre. Ew cûrê ku rezê xweş dide, wê tu cara feydayê nexwerinê nede. Û ew dara, ku feydayê nexwerinê dide, nikare rezê qenc bide. Darên ku rezên wan nayêne xwerinê, tên birînê û tên avîtinê nava agir. Belê, darê yan jî mêriv bi rezê wane dayîva qirar dikin” (Metta 7:17-20, TLB).

Gotina Îsaye nava vê beşêda çetin nîne fem bikin û ew jî nikare bê guhartinê. Rûyê wê yekêda ku rez bi xwe nayê qirarkirinê: ew bi cûrê darê tê qirarkirinê. Feqet hema rezê darê jî cûrê darê dide kivşê.

Eger em nêzîkî darekê bibin, li ser kîjanê rezên saxlem hene, wî çaxî hûnê bizanibin, wekî rezên wê darê yên xwerinêne. Feqet eger hûn rezên nexwerinê bibînin, wî çaxî wê bê kivşê, wekî ew dar ne ya baş e. Bi rezên darê tê qirarkirinê ku ew dar ya baş e, yan ne baş e. Hema bi wî cûreyî Îsa dibêje, wekî mesîhîyên rast yan nerast ne ku bi gotinên wanva tên qirarkirinê, ne ku bi wê yekêva ku çiqasî ruhanî ew tên texmînkirinê, yan jî çiqas gelekî tevî civînên Mesîhîya dibin, lê bi karên wanva ew yek tê qirarkirinê. Gelo ew xwe pêşkêş dikin û li ser padişatîya Ezmîn hatine merkezkirinê, yan ew xwehizin û li ser dinîyayê hatine merkezkirinê, çawa ku Yûhennayê şandî nava nama xweda dide kivşê?

> “Qeyde-qanûnên vê dinîyayê hiz nekin. Rezên vê dinîyayê hiz nekin. Hizkirina vê dinîyayê, hizkirina hindava Bavê ji we dide derxistinê. Ev hemû tiştê, ku li vê dinîyayê diqewime, xwestina weye, kirina çi ku hûn dixwezin, xwestina weye stendina hemû tiştî ye bona we û xwestina weye bona kivşbûna çawa merivekî girîng, Bavêva girêdayî nînin. Ew hemû tişt tenê we ji Wî dide qetandinê. Ev dinîya û hemû xwestinên wê, xwestin, xwestin wê derbazbin, lê ewê ku xwestina Xwedê diqedîne, wê heta-hetayê qewîn bimîne” (A Yûhenna 2:15-17, MSG).

Wedekî dirêj ji Lîzayê û ji min hate xwestinê, wekî zarokên xwe nava vê yekêda bînine ser wê fikirê. Ew diçûne mektebên mesîhîya

û li ber çavê xwe didîtin, ku gelek hevalên wane ji dersxanên wan, yên ku her car tevî dê û bavên xwe diçûne civînê û bawar dikirin, wekî mesîhî bûn, lê her dem şexsên xwe didane razîkirinê çawa ku derheqa wê yekêda li beşa jorinda nivîsar bû. Rezê jîyana wana ew nîbû, ku ew mînanî Mesîh bin. Hevalên zarokên me bona xwe dijîtin, dewsa wê yekê gerekê wana bixwesta û bicedanda xwestina Xwedê biqedandana û nava wê yekêda şabûn texmîn bikirana.

Ew çi ku zarokên me li mektebê didîtin, ji gelek mesela tenê yek bû, ku min anî ber çava. Ev pirsgirêk nava malbetada, dinîya bîznêsê û hema li civîna û li qulixdarîyên mesîhîtîyêda jî hene. Gelek meriv dibêjin, wekî mesîhîne, lê rezê jîyana wana eşkere cûrekî mayîn dide kivşê.

## “Paşdahatina” sade

Me Mizgînî ne bi cûrê balanskirî terîf kirîye. Me her dem bi rîya duakirina duayê merivê gunehkar, qebûlkirina Îsa daye kivşê. Lazim e ku Wî çawa “Xudan” qebûl bikin û peyî wê yekêra emê heta-hetayê xilazbin. Feqet Îsa usa hîn nake. Ew dibêje: “Ne ku ewê minra dibêje: “Xudan, Xudan” wê bikeve padişatîya Ezmana” (Metta 7:21).

Eger em gotina Îsa tenê guhdar bikin, bêyî cudakirina terîfên bi salaye nebalanskirî, bi hînkirin, kitêb û stiranên wî cûreyî, emê fem bikin, wekî Mizgînîya wedê niha miqabilî wê yekê ye. Îsa nikaribû ji wêya zelaltir bida kivşê: ne hemû kes, yên ku duayê gunekar dua kirine û Ew çawa Xudan qebûl kirine wê herine Ezmîn. Eger ewê neçine Ezmîn, çawa ku we serê kitêbêyî pêşda dît, rêke başqe heye.

Werin em qulixa xwe tomerî bikin. Terîfkir derheqa “Qebûlkirina Îsa û stendina duada” dibêje. Ew dibêje, wekî Îsayê şabûnê, aşîtîyê, gulvedanê, bextewarîyê, saxlemîyê, Ezmîn û tiştên mayîn bide. Hûn min şaş fem nekin: Xwedê dixweze li me dua bike. Feqet Îsa tu cara duakirinên Xwe neda xebatê, ku meriva bikişîne alîyê Xwe, ku ew peyî Wî herin.

Piştî raberkirina 35 deqa, qulixçî hîvî ji aûdîtorîyaê dike, ku merivên hazir serên xwe takin. Ew pirsê dide, ku eger ew vê şevê bimirana, gelo wê biçûna Ezmîn? Wextê hinek berevbûna qulixçî dibêje hazira, ku ew dîna xwe bidine merivên dor- berên xwe û wê

pirsê bidine wana. Eger ew vê şevê bimirana, wê biçûna Ezmîn? “Eger ew nikarin bêjin “belê”, û qulixçî xeberdana xwe dûmayî dike,– destê wana bigrin û wana pêşda bînin”.

Hetanî ku kandîdatên nû nêzîk dibin, koma stirana wî çaxî stiranên anegor distirê, mesele sitrana salên 90-ye hizkirî “Çawa ku ez heme”. Wî çaxî hazir destên xwe hev dixin û dikenin, lê sazbend bona merivên ku pêşda tên miqamên serkevtinê diqedînin.

Wextê ku hemû tên, qulixçî hîvî ji wana dike, ku ew ta bibin û çend duayên sade biwekilînin: “Bavo ez xwe mikur têm, ku ez gunekarim. Gunehên min bibaxşîne. Îro ez hîvî ji Îsa dikim, ku Ew bê nava jîyana min çawa Xudan û Xilazkirê min. Spas bona wê yekê, ku Te ez kirime lawê xwe. Bi navê Îsa, amîn”. Aûdîtorîya civînê şabûnêva tijî dibe, sazbend miqam diqedînin û ewên ku “paşda vegerîyane” ji civînê dertên “çawa ku ew hebûn”, lê tenê niha ew xapyayî bûn. Wana tu tişt derheqa tobekirina ji gurênedabûnê, terkdayîna xwestinên xwe, mîyaserkirina xwestina Xwedê, usa jî derheqa pêşkêşkirina jîyana xweye bona karên Mesîh nebihîstin. Wana Îsa çawa Xudan qebûl kir, lê dilê wan nehate guhartinê. Niha Îsa tenê beşeke jîyana wan e.

Îzinê bidin bêjime we, Padişê padişa û Xudanê xudana wê neyê nava emirê me, eger Ew gerekê bibe yê duda, yan jî yê ewlin tevî hizkirîyên mayîn. Ewê tenê çawa Padişê tam û yê tek-tenê bê, wextê ku tu merivek, tu tiştek, yan tu kirinek wê dilê meda tevî tabîya Wî nekeve nava konkûrênsîyayê. Ew gerekê bibe Xudan, û ew yek dide kivşê, wekî Ew Xudan û serwêrê meyî herî sereke ye û jîyana me îdî ya tu kesî nîne.

Derheha vê yekêda bifikirin: hûnê yekîra bizewicîyana, eger ew meriv amin bûya him hindava weda û him jî nava hizkirîyê mayînda û hûn bibûna yê ewlin? Gelo eva tiştekî bêfikir nîne, ku vê yekê padişê ezmînra bêjin! Gelo ewê bûka usa qebûl bike, ya ku dibêje? “Tu nava hizkirîyên minda yê e’wlinî”. Nava qewilên vî cûreyîda nikarin heleqetîyên sozdayî, yan jî yektî hebin. Eva xapandin e!

Evên “paşdavegeryayî” îzin nedane wekî xaç jîyanên wane xwehiz bikuje û cîh aza bike bona ku tebyeta Mesîh nava wanda çêbe. Ew tenê qayîl bûne jîyana diha baş li vê dinîyayê û sozdayîna

ezmîn bistînin. Eva gelekî hewaskar e! Li gelek welata, li kîderê mesîhî tên zêrandinê, ew bi zanebûn Îsa qebûl dikin, çimkî ew fem dikin, wekî ewê jîyana xwe undakin. Roja îroyîn li welatên rojavayê em Îsa qebûl dikin, bona jîyana diha baş bistînin û herine Ezmîn. Feqet em jî gerekê jîyana xwe boy Wî undakin.

Roja îroyîn gelek bawarmendên civînên Mizgînîyê li welatê me rûyê wê Mizgînîyêda xapyayîne, ya ku me terîf kirîye. Ewên paşdavegeryayî dikarin bi "bawarîya weye tezedîtî" şabin, tevî teşkîldarîyên mesîhîtîyê bibin, herin civînê û tevî projeyên li wir bibin, çimkî ew nû ne û ber dilada hatîne. Ew mînanî wê yekê ye, wextê ku diçine klûbeke nû, mekteba nû, yan jî derbazî li ser xebateke nû dibin, çimkî nava wê yekêda tezebûn heye. Feqet van mesîhîya ew hemû tiştên ku Îsa bona hemû peyîhatîyên Xwe yên rast emir kirîye, nekirine: bahê çûyîna peyî Wî hesabkin, lê paşê qirara bona qulixkirina bo Wî, ya hetanî dawîyê, qebûlkin (binihêre Lûqa 14:27-33).

## Undakirina bona dîtinê

Eva pevguhartin e. Em gerekê temamîya jîyana xwe bidin û dewsa wê yekê jîyana (tebyeta) Wî bistînin. Îsa her dem derheqa wê yekêda dibêje. Ew dibêje:

> "Eger meremê kesekî heye peyî Min bê, bira xwe bîr bike [bîrke, hesab hilnede, înkar bike, guhdarîyê nede ser xwe û hewaskarîyên xwe], xaçê xwe hilde û [çawa şagirt bighîje Min û piştgirîya koma Min bike], peyî Min bê [her dem, qewîn Minva girêdayîbe]" (Marqos 8:34, AMP).

Em gerekê her dem qewîn Wî va girêdayîbin. Xilazbûn tenê duakirina yekcare nîne, peyî kîjanêra jîyan bi hemdî xwe diçe û tenê bi wê firqîyê, wekî niha li klûba "mesîhîtîyêdanin" û diçine Ezmîn. Îsa gotina xwe berdewam dike: "Eger hûn bicêribînin jîyana xwe bona xwe xweykin, hûnê wê unda bikin. Feqet eger hûn ji jîyana xwe boy Min û boy Mizgînîyê paşda bisekinin, hûnê jîyana rast bibînin" (Marqos 8:35, NLT). Nava tercima Încîlêye "Êmplîfaydêda" vî cûreyî nivîsar e: "Kî ku jîyana xwe [yê ku tenê li ser vê dinîyayê dijî] boy Min û Mizgînîyê dihêle, wê ewê yekê

xilazke [jîyana xweye ruhanîye tewrebilind, ya nava padişatîya Xwedê ya heta-hetayêda]”.

Eva pevguhartina zelal e. Em ji mafê bûyîna xudanê jîyana xwe paşda disekinin. Bi kirina wê yekê, em karebûnê distînin ku xwestinên Wî bikin û çawa bersiva wê yekê em jîyana Wî, ya heta-hetayê distînin. Ew Mizgînîya ku îro tê terîfkirinê, derheqa wê yekêda, wekî gerekê peyî Îsa herin, nade kivşê. Em tenê derheqa alîyên wêye başda guhdar dikin. Çawa ku tê kivşê me *sozdayînên* derheqa *rabûna ji nava mirîya* terîf kirine û derheqa *hukumê xaç* û *bangêda* bîr neanîye.

Bînin ber çavên xwe, wekî xortekî cahil bi têlêvîzyonê rêklama derheqa mobîlîzasîya leşkerîda temaşe dike. Ew leşkerekî bi şikilê berbiçav dibîne, yê ku çaxê wîra ye, li ser gemîke bedew sekinî ye. Gemî derdikeve behra vekirî û ew leşkera tevî hevalên xwe dikene. Peyî wê yekêra ew leşker li bajarên dinîyaêye cuda-cuda tê nîşandayînê û nava rêklamêda tê kivşkirinê, wekî ew hemû rêwîtî belaşin (bêperene).

Xortê cahil carkêra diçe merkeza mobîloîzasîyon û navê xwe dide nivîsarê. Ew qewilên leşkerîye derheqa tevbûna xweda naxwîne, çimkî tenê derheqa kara xweda difikire. Ew gelekî şa ye. Nava jîyana wîda wê tiştekî nû destpêbe, ewê temamîya dinîyayê bibîne û wê bibe parçekî esker û wê gelek hevalên nû dest bîne.

Qerez, îdî nava êtapa hazirîya pêşinda zelal dibe, ku ew nikare hetanî seheta neha, anegorî xeystê xwe razê. Jêra dibêjin, ku ew gerekê porê xweyî dirêj bibire. Ew nikare tevî teşkîldarîyên cûre-cûre bibe, çimkî îzina wî nadin, ku ew nava mehekêda ji du roja zêdetir ji parsekerê xwe dûrkeve. Tiştê herî xirab ew e, wekî ew nava temamîya rojêda ketîye nava navnîşê û îzinê nadine wî, ku ew rastî yên mayîn bê. Temamîya rojê ew destava û xwerinxana paqij dike, fîzkûltûrayê û tiştên mayîne dijwar dike. Wedê wîyî aza tune û her êvar ew westîyayî pal dide û radizê.

Gumana vî xortê cahil hela hê heye, çimkî ew zane, wekî zûtirekê ewê jî li ser gemîyêbe. Piştî hazirîyên pêşin wî nava teşkîla gemîkêda kivş dikin, lê ew dîsa wê xebatê dike, lê tenê niha nava behra vekirîdane. Nişkêva şer destpê dibe û ew fem dike, wekî ew mecbûr e tevî opêrasyonên leşkerî bibe, nenihêrî wê yekê, wekî ewî navê xwe bona wê yekê nedabû nivîsarê.

Vî xortî navê xwe dabû nivîsarê, çimkî qulixa leşkerî jîyaneke usa pêşnîyar dikir, ya ku ewî bi xwe nikaribû bikira, û ew jî belaş. Ewî guhdarî nedabû ser hemû qewilên merkeza mobîlîzasîyon. Belê, ew jîyan belaş bû, feqet ewî gerekê bona wê yekê azaya xwe bida. Ji gelek alîyava, niha ev cahil xwe xapyayî texmîn dike. Bi fikira wî tenê alîyên baş nîşanî wî dabûn, lê derheqa wî bahayîda elamî wî nekiribûn, kîjan gerekê ewî bida. Me Mizgînîya usa terîf kirîye, anegorî kîjanê xilazbûn belaş e û eva rastîya tam e. Feqet me negotîye "kandîdatên xilazbûnê", wekî ew gerekê azaya xwe bikine qurban. Bi xeberdana derheqa azayêda, ez derheqa azaya rastda nabêjim, lê azaya ku bi fikira xwe meriv dibêjin, çimkî bêyî Mesîh hemû meriv xulamên gunehê ne. Ew xulam in, nenihêrî wê yekê, ku ew dikarin bi temamî li ser wê fikirêbin, wekî aza ne.

Vê yekê meriv dikare himberî fîlma "*Matrîsa*"-ê bike. Çend sal pêşda kurê minî mezin cûrê wê fîlmêyî rêdaktorî lêkirî kirê kir, û êvarekê me bi temamîya malbetêva ew temaşe kir. Nava wê fîlmêda me gelek himberîhevkirinên ecêb dîtin.

Nava fîlma "*Matrîsaê*"-da pirseke hewaskar heye: "Hûnê çawa xewinê ji rastîyê cuda bikin, eger hûn hela hê ji xewinê hişyar nebûne".

Vê fîlmêda jîyana sedsala 20-îye sade tê nîşandayînê û ew hemû tişt xiyal e. Bi rastî ev serpêhatîya dawîya sedsala 21-ê destpê dibe. Merivatî întêlêktê çê dike, kîjanê ewana çawa Maşîne nav dikin. Maşîne kotrola dinîyayê hildidin ser xwe û meriv dijî wana şêr destpê dikin. Ev şera bona temamîya topa dinîyayê hukumê wêrankirinê pêşda tîne û nava encamê wê yekêda Maşîne ser dikevin.

Maşîne dibînin, wekî dikarin heyîna xwe, bi xebitandina ênêrgîya êlêktrîkîye ji bedena mêriv, xweykin û ew xiyalên mezin çê dikin, meriva dixapînin, ku ew qulixî wan bikin. Tê texmînkirinê, wekî li dinîyayê hemû tişt bi cûrê sade ye û hela hê sedsala 20-ye, lê bi rastî bedenên meriva nava kamêrayên mexsûsda tên xweykirinê, lê meriv dikare bêje wekî wana li "fêrmayên" mezinda zêde dikin. Fikira wana bernama hemdinyayîye rastîya vîrtûalva kirine, ya ku tê navkirinê çawa "Matrîsa" û ew jîyana sade raber dike. Azaya merivatîyêye ku usa tê texmîkirinê ne ya rast e, çimkî bi rastî ew xulamin.

Fîlm derheqa komekêda gilî dike, yên ku Matrîsayê dişkênin û ji wê derdikevin û heyîna xweye rast eyan dikin. Ew li dinîya rast kolonîyake bi navê “Sîon” çê dikin, li kîderê tu tiştekî sax tune. Ji wana çend meriv bere-bere paşda diçine Matrîsayê, ku dijî Maşîna şer bikin û merivatîyê aza bikin. Ew nava şerkarîyên sertda nin û jîyana wana hêsa nîne, lê ev meriv diha gelekî berbi azaya rast dicedînin, lê ne ku berbi jîyana nava feşkirina rastîyêda. Ew azaya xweye rast çetinayara diguhêrin, ne ku xulamtîyêra, ya ku dixapîne, wekî ew jîyana baş e. Niha em himberî hev bikin: gelek bêbawar hesab dikin, wekî Mesîhî xulam, dîl û merivên bêyî azayê ne, lê ew bi xwe aza ne. Qerez, rastî ew e, wekî bêyî Mesîh hemû jî dîlin, mînanî merivên ku nava xiyalada dijîn, yên ku li cem wan Maşîna xulamin. Meriv xulamên gunehê ne.

## Mesîhîtî dijwar e

Ne tenê ew merivên ku tu cara Mizgînî guhdar nekirine û naxwezin bawarîya xwe li wê yekê bînin, nava dîltyêdanin. Gelek merivên “paşdavegeryayî” nava rojên meda dîsa nava dîltîya gunehêdanin. Ev himberîhevkirin me bona wê yekê çê kirîye, bi paşdasekinandina elamkirina wan û jîyana temamîya berbirîbûna derheqa wê yekêda, ku çûyîna peyî Îsa bi rastî çi dide kivşê. Gelek meriv hesab dikin, wekî ew azane, lê bi rastî ew nava dîltîêdanin û jîyana wana wê yekê dide kivşê.

Îsa dibêje:

> “Ez we didime bawarkirinê û bi heyteholî dibêjime we, ku ewê ku guneha dike û her dem nava gunehêda ne, xulamê gunehê ye. Xulam her dem [heta-hetayê] li malê namîne: kurê [malê] heta-hetayê dimîne. Dêmek eger Kur we aza berde [bike merivê aza], hûnê bi rastî û bêyî xeberdan azabin” (Yûhenna 8:34-36, AMP).

Ev xeber wê rastîyê diweklînin, ya ku me bi mesela dara fêkîya dît. Eger kesek her dem guneha dike, ew şedetîya wê yekê dide, wekî ew hela hê xulamê gunehê ye. Ew kur nîne, çimkî nava wîda hela hê guhastin tune. Ew meriv dikare bifikire, wekî ew aza ye, çimkî ewî duayê gunehkar dua kirîye, lê ew ji “mafên” xwe paşda nesekinîye, bona ku peyî Îsa here. Ew hela hê dixweze azaya xwe

(ya ku feşe) tevî alîyên xilazbûnêye baş xweyke. Feqet ew yek tiştê nebûyînê ye, bona ku herdu jî hebin.

Çawa ku îdî hate kivşkirinê, ev merivana dikarin jîyana xweye “tezebûyî” bi şabûn, bi ruhdarî û bi ênêrgîyayê hiz bikin, çimkî ew nû ye. Qerez paşê heyîna wane neguhartî wê pêşda bê, lê ewê nava doranên mesîhîtîyêda biqewime û ewê bi zimanê ruhanî veþartîbe. Hema rûyê vê yekêda karên wana ne yên rastin, yên xapandinêne. Peymana Nû bi taybetî derheqa wê xapandinêda eşaretîyê dide.

Pawlos dinivîse: “Nava rojên dawîda mesîhîtî wê gelekî dijwarbe” (B Tîmotêyo 3:1, TLB). Em hema nava rojên dawîda dijîn. Nava wê yekêda şikberî tune. Hemû pêxebertîyên Încîlê eyan dikin, wekî Mesîhê zûtirekê paşda vegere. Pawlos rojên me bona bûyîna Mesîh çawa wedê here dijwar nav kirîye.

Nava tericimên mayînda xeberên “xirab” û “bi tirs” bona nîşandayîna rojên me tên xebitandinê. Menî kîjan e? Bi lêkolînkirina wî wedeyî, kîjanîda Pawlos dijît, em dibînin, wekî ew rastî dijîderketina mezin dihat. Ewî pênc cara lêdana bi qamçîyaye li ser pişta xwe dîtibû. Sê cara jî ew bi dara hatîye lêxistinê. Carekê jî ew dabûne ber kevira û ewî gelek sal hebsada derbaz kiribû. Ew kuda biçûya, rastî zêrandinên berk dihat. Feqet ew dinivîse, wekî nava rojên meda bona bûyîna mesîhî wê diha dijwarbe. Û ew menîya wê yekê eyan dike:

> “Merivê bibine xwehiz, perehiz, kubar, babax, kifir, ne gura dê-bavada, bêşêkir, heram, dilsar, bêrehm, buxdanbêj, temsist, zulmkar, neyarên qencîyê, nemam, culet, xwerazî, rihethiz, ne ku Xwedêhiz...”
> (B Tîmotêyo 3:2-4).

Bi gotûbêjkirina vê beşê diqewime hûn usa jî fem nekin, ku Pawlos çi dixweze bêje. Gelo dema wîda hemû tişt cûrekî mayîn bû? Nava civaka wîda hemû meriv vî cûreyî bûn. Ew xwehiz û perehiz bûn. Ew ne pîroz bûn û nedibaxşandin û tiştên mayîn. Petrûs roja Pêntokostê got: “Xwe ji vî miletê neheq xilazkin” (Karên Şandîya 2:40, AMP). Dêmek Pawlos bona çi vê nisletê cuda dike û hema wan cudatîya dide kivşê û vî wedeyî bona mesîhîya hesab dike çawa wedê herî dijwar.

Ew berdewam dike, dinivîse: “Çimkî [nenihêrî wê yekê] li cem wan cûrê xwedêparêzîyê heye, lê ew qewata wê bîr dikin û înkar

dikin û bona wê jî xerîbin [kirinên wana dijî hebndina wane rastin]” (B Tîmotêyo 3:5, AMP), yan jî “...pişkê xwedênasîyê wê li wankeve, lê wê qewata wê înkar bikin”.

Niha hûn fem dikin, ku bona çi mesîhîtîyêra wê nava rojên meda dijwarbe. Gelekê hebin (anegorî nivîsarên başqeye nava peymana Nûda), yên ku wê bihebînin, wekî *usa bûne*, *xilazbûyîne* û *mesîhîne,* feqet ewê îzinê nedin, wekî xaç jîyana wane xwehiz bikuje. Wana hemû maf û xwestinên xwe nehiştine alîkî, ku peyî Îsa herin. Ew meriv bi dil bawar dikin, wekî hema Ew Xilazkirê wane, lê ew dixwezin tevî Îsabin, çimkî bi duayên Wî hijmekar bûne, lê ne ku bi Şexsê Wî. Vê yekê meriv dikare himberî wê yekê bike, wextê ku jin mêr distîne bona hebûna wî. Diqewime ew bi hizkirinê wî distîne, lê menîyên dilê wê şaşin. Hema bi vî cûreyî jî gelekê Îsa bigerin, bona ku xilazbûnê, açixîyê nava vê jîyanêda bistînin û paşê jî bikevine Ezmîn. Ewê bêqelp bawar bikin, wekî Mesîh Xilazkirê wan e, feqet ewê tu cara bi xwe serwêrîkirina jîyana xwe paşda nesekinin.

Pawlos berdewam dike û dibêje, wekî ev “bawarmend” “...her dem hîn dibin û wê tu cara berbi ulmê rastîyê nikarin bên” (xeber 7). Ew diçine qulixên civîna, komên li mala û berevbûnên mayîn, guhdarîya Xebera Xwedê dikin, lê nayêne guhartinê.

## Sînorên nezelal

Dijwarî rûyê wê yekêda pêşda tê, wekî îdî sînorên zelal tunene. Merivekî usa bînine ber çavê xwe, cedandinên kîjanî yên xwehizîyêne, lê ew qebûl dike, wekî hemû gavên xwe Xudanra dide qayîlkirinê, bi zimanê bawarmendaye rast xeber dide, hevaltîyê tevî merivên xwedêparist dike û bi şabûn tevî berevbûnên bawarmenda dibe, lê tebyeta wî nayê guhartinê. Dêmek ew meriv derewîne, nenihêrî wê yekê, wekî ew wê yekê fem nake û dijwarî rûyê wê yekêda pêşda tê, wekî xwexapandina merivên wî cûreyî mînanî nexweşîyê bela dibe.

Yên mayîn jîyana xwe li ser hîmê “normên” kûltûra mesîhîtîyê çê dikin, lê ew norm ne anegorî normên ezmînin. Nava encamê wê yekêda bona wan meriva dijwar e bibine bawarmendên rast. Eger hûn rojên Pawlosda mesîhî bûna, jîyana we wê her deqe bin

qezîyayêda bûya. Ew yek nedihate gotûbêjkirinê: bi qirarkirina aminaya hindava Îsada, hûn nava wê sirêda bûn.

B Tîmotêyo serê 3-da Pawlos gotina xwe berdewam dike:

> “Lê tu zanî, ku ez çi hîn dikim Tîmotêyo, û ez çawa dijîm û meremê jîyana min kîjane. Tu bawarîya min zanî û zanî, ku ez çiqas zêryame. Tu hizkirina min, sebira min û teyaxbûna min zanî. Tu zanî, ku min çiqas zêrandin û cefa dîtîye. Tu derheqa wî hemû tiştîda zanî, ku ez çawa li Antîokê, Îkonîonê û Lyûstrayê hatime zêrandinê, lê Xudan ez ji wî hemû tiştî xilaz kirim. Belê, û her yek, yê ku dixweze nava Mesîh Îsada jîyana xwedêtîyê derbaz bike, wê cefê bibîne. Feqet merivên xirab û derewîn wê pêşda herin. Ewê dîsa meriva bixapînin û ewê jî xapyayîbin” (B Tîmotêyo 3:10-13, NLT).

Pawlos zelal da kivşê, wekî Tîmotêyo dikaribû ne tenê bona hînkirina wî hindava wîda amin bûya. Pawlos usa jî bona cûrê jîyana xwe û meremê jîyana xwe amin bû (ew bi heta-hetayêva dilivîya, derheqa çida emê vê kitêbêda diha dereng xeberdin). Şedetîya Pawlos ji duayên wîye bersivdayî, ji nîşanên peyî wî, navê qulixa wî û ne jî karebûna hînkirina Xebera Xwedê nîbû. Na xêr, ewî ev tişt nîşan nedan. Ewî derheqa jîyana xweda xeberda. Ev e ew faktor, ya ku nava jîyana bawarmendda her dem ya qirarkir bûye û wê her dem jî usa be.

Pawlos xeberdana xwe berdewam kir û got, wekî “merivên xirab û derewîn wê pêşda herin”. Em hemû jî zanin, wekî gerekê ji merivên xirab dûr bimînin. Feqet derewîn ew merivin, sifetên kîjana ne anegorî heyîna wane rastin û ew jî yên here qezîyane. Ew dibêjin, ku ew mesîhîne û ji derva mînanî mesîhîyane, lê nava kirinên wanda tu şedetîke usa tune, ku mînanî wê yekê bin. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Pawlos dibêje, ku ew ne tenê yên mayîn dixapînin, lê pêra jî bi xwe xapyayîne.

Ev gotin anegorî merivê nava serhatîya meye alêgorîkdane, yê Xapyayîdane. Ev xort li mekteba Êndêlê aktîv bû, xwe hesab dikir çawa peyîhatîyê xwepêşkêşkirî û bi dil bawar dikir, ku ew li ber padişê li ser tabîya rast bû. Ewî aminaya xweye hindava padişêda diheband, lê ewî nedicedand ku bi jîyana xwe wê yekê bide kivşê. Ew ne xapyayî bû, lê ewî usa jî merivên başqe dixapand. Rûyê normên Xapyayîda gelek, ji wan keçika destpêkirî, berbi berdaxustina çûn, li ser kîjana ewî bi *berbir’îbûna* xwe hukumê xwe hişt.

Diqewime hûn bipirsin: “Bi berbirîbûnê? Ne ew dersdar bû?”. Rast e, lê ez bi wê fikirê dibêjim, wekî jîyana me diha bilind terîf dike, ne ku gotinên me. Ew şagirtên li Êndêlê, yên ku hindava Cêylonda amin bûn, gerekê şerkarî bikirana, ku neketana bin hukumê Yê Xapyayî. Ewên ku qewîn nesekinîbûn, ketine bin hukumê wî.

Derheqa vê şerkarîyêda ne tenê Pawlos, lê usa jî gelek xudanên peymana Nû eşaretîyê didin. Cihûda dinivîse:

> “Hevalên min yên giranbiha, min gelek dicedand, wekî wera derheqa xilazbûna me hemûya binivîsîya, wextê ku min texmîn kir, ku hewcetî heye ezê careke mayîn wera binivîsim, ber dilê weda bêm, ku hûn bona wê bawarîyê şerkarîyê bikin, ya ku Xwedê heta-hetayê da cimeta Xwe” (Cihûda 3, TEV).

Guhdarîyê bidine ser lezketina gotinên wî. Cihûda dixwest derheqa wan hemû tiştên başda xeber bida, yên ku nava xilazbûnêda tên parevekirinê, lê mecbûrî heye bi têmake mayîn binivîsin. Ew gerekê piştgirî bida cimeta Xwedê, ku ew bona bawarîyê şerkarî bikira. Gelo gilî derheqa kîjan şerkarîyêdane? Ew bi nivîsarê şirove dike:

> “Çimkî hinek merivên bêxwedê bi cûrê veşartî ketine nava me, ew merivên ku berbirîbûna derheqa kerema Xwedêyê me navhev dixin bona afûkirina rêyên xweye bêesil û yên ku Îsa Mesîh înkar dikin, Xudan û Serwêrê meyî tek-tenê. Gelekî zûva kitêbên Pîroz pêşda derheqa wê dîwanêda gotine, ya ku wana qebûl kirîye” (Cihûda 4, TEV).

Ev şerkarî bona hukumê merivên bêesil e, yên ku kerema Xwedê navhev xistine bona afûkirina jîyana xweye gunehkar. Ev êrîş diha gelekî ya mirinê ye, ne ku zêrandina hemdinyayîye dijî civînê ye. Ew diha bi qezya ye, ne ku qanûnên dijî prînsîpên Încîlê, mesele abort, qebûlkirina xebitandina narkotîka û zewacên yekqismê, yan jî li mekteba hînkirina têorîya êvolyûsyayê. Ew diha gelekî zyandar e, ne ku bawarîke mayîn, yan jî ya derew. Ew yek heta-hetayê meriva unda dike.

Diqewime hûn bipirsin, ku gelo çi tevgirêdan tevî merivên civînê hene. Ew meriv, derheqa kîjanada Cihûda digot, Îsa Mesîh înkar dikin, yan jî qebûl nakin. Tu kes li civînên me nikare wê yekê bike û hela serbara serda jî çawa mesîhî bê hesabkirinê.

Feqet, çi usa dike ku hûn bifikirin, wekî bawarmend rojên Cihûdada bi fikirên xwe diha zelal bûn, ne ku îro. Careke mayîn bi guhdarî bixwînin. Ev meriv *veşartî* diketin nava doranên me. Tu kes nikare wextê civînên me roja îroyîn, (yan jî rojên Cihûdada) bi devê xwe qebûl bike, wekî Îsa Mesîh qebûl û nas bike û ew meriv neyê dîtinê. Dêmek, wî çaxî ew meriv çawa Wî qebûl nakin? Bersiva wê pirsê nava kitêbeke peymana Nûye mayînda ye: "Merivên wî cûreyî *îzbat dikin, wekî Xwedê nas dikin*. Feqet, ew bi jîyana xwe *Wî qebûl nakin*" (Tîto 1:16, NLT). Ew bi jîyana xwe Xwedê qebûl nakin, lê ne ku bi gotinên xwe. Ew meriv dibêjin, wekî Xwedê nas dikin. Ew dihebînin, wekî Îsa Xudanê wan e. Feqet karên wan tiştekî mayîn didine kivşê. Bîr bînin, wekî ew ne tenê yên mayîn dixapînin, lê ew bi xwe jî xapyayîne: Ew bi temamîya dilê xwe bawar dikin ku mesîhîne.

## Kerema Xwedê ya rast

Cihûda îzbat dike, wekî ev meriv banga kerema Xwedê tevîhev dikin. Nava van rojên dawîda ev yek belabûyî ye, çimkî hînkirinên me bona wê yekê derî vekirine. Em hîn dikin, wekî kerem pêçandina Xwedê ye, ya ku cûrê jîyînêyî bêxwedê afû dike. Fikirdarîya vî cûreyî li civînê li cem geleka heye, yên ku mesele, dibêjin: "Ez zanim, wekî usa najîm, çawa ku gerekê bijîm, lê şikir ji Xwedê bona kerema Wî". Eva xapandineke mezin e. Încîl hîn nake, wekî kerem derman e: kerem *di nava meda qewata Xwedê ye, ya ku bona mîyaserkirina dewakarîyên rastîyê karebûnê dide me*.

Me hîn kirîye, wekî kerem ji alîyê Xwedêda ne her dem anegorî kirina tê dayînê. Belê, kerem xêrkirina ji alîyê Xwedêda ye, ya ku meriv nikare bikire, yan jî qazanc bike. Feqet, kerem jî qewatê dide, ku em gura Wî da bin û şedetîya wê yekê ye, wekî me bi rastî kerema Xwedê qebûl kirîye û ew yek jîyana meye xwedêparêzîyê ye. Kirina gura Xebera Xwedê îzbat dike, wekî kerem nava jîyana meda kar dike. Awa bona çi Aqûb dinivîse:

> "...Eger karên bawarîyê tunebin (gavên gurêdabûnê û kirinên usaye bona îzbatkirina wê yekê), wî çaxî ew bêyî qewate (bêkar e, mirî ye). Feqet kesekê bêje, ku tu [dibêjî, wekî] bawarîya min heye, lê karê min yên[qenc] hene. Wî çaxî bide kivşê, ku bawarîya te ya

> [xwepêşkêşkirî] bêyî tu karên[qenc] çi cûreyî ye, lê ezê jî bawarîya xwe bi karên[gurêdabûna qencva] bidime kivşê. Tu bawar dikî, wekî Xwedê yek e: tu baş dikî. Pûtparist jî bawarîya xwe li wê yekê tînin û dircifin...” (Aqûb 2:17-19, AMP).

Aqûb kêmasîke gelekî mezin nava hînkirinên meye wedê nihada dide kivşê. Em beşên cuda ji hemtêksta diqetînin, mesele: “Bawarîya xwe li Xudan Îsa Mesîh bîne û tê xilazbî (Karên Şandîya 16:31). Eger bona stendina xilazbûnê tenê bawarî tê xwestinê, wekî Îsa heye û Ew Kurê Xwedê ye, dêmek anegorî gotinên Aqûb pûtparist jî wê bi bawarîya xwe xilazbin. Eva ne tiştê nêzîkî aqila ye. Bona ku gotina xwe diha bide zelalkirinê, Aqûb dide kivşê, wekî pûtparist li ber Xwedê dilerizin. Bi gilîkî mayîn gotî pûtparist diha gelekî ji Xwedê ditirsin, ne ku hinek meriv, yên ku dibêjin, wekî bawarîya wan heye, lê nikarin karên gurêdabûnê bidine kivşê ku bawarîya wan îzbat bikin.

Şedetîya derheqa wê yekêda, wekî em bi rastî bi kerema Îsa Mesîh xilaz bûne, jîyana anegorî Xebera Xwedê ye. Awa bona çi Yûhennayê şandî dinivîse:

> “Bi wê yekê em zanin, ku em Wî nas dikin, eger em temîyên Wî biqedînin, yê ku dibêje: “Ez Wî nas dikim”, lê temîyên Wî naqedîne, ew derewîn e, rastî nava wîda tune ye. Lê yê ku xebera Wî diqedîne, hizkirina Xwedê rast nava Wî da temam e. Bi vê yekê em zanin, ku em nava Wî da nin. Yê ku dibêje: “Ez nava Wî da me”,– gerekê usa bijî, çawa Îsa jît” (A Yûhenna 2:3-6).

Yûhenna zelal dide kivşê, wekî şedetîya wê yekê ew e, wextê ku em bi rastî Îsa Mesîh nas dikin, temîyên Wî diqedînin, yê ku dibêje, wekî Îsa nas dike, lê Xebera Wî xweyî nake, xapyayî ye, derewîn e û ji rastîyê dûr e, nenihêrî wê yekê, wekî ew bi devê xwe Xebera Xwedê qebûl dike. Bo vê yekê jî Yûhenna dinivîse: “Zarokên min, ez vê yekê wera dinivîsim, wekî hûn guneha nekin, lê eger yek guneha bike, li cem Bavê piştgirê me, Îsa Mesîh, Yê heq heye” (A Yûhenna 2:1).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Yûhenna nanivîse: “...ez vê yekê bona we dinivîsim, wekî... wextê ku yek guneha bike, piştgirê me heye...”. Na xêr. Meremê me gunenekirin e. Di nava meda qewata kerema Xwedê ye, bona ku meremê me jîyana mînanî ya Mesîh be (çawa ku A Yûhenna 2:6-da nivîsar e, em gerekê herin

“çawa ku Ew çû”), çimkî em ji hukumê tebyeta meye negurêdabûyî azane. Feqet eger em cîh bidine guneh, wî çaxî Piştgirê me heye.

Em, bawarmend, menîya meye şabûnê heye, çimkî niha em dikarin bi cûrê qebûlkirinê qulixî Xwedêyê xwe bikin:

> “Awa em vê yekê biiêkirînin, ku em padişatîke nehejayî distînin û bi vî awayî bi xof û tirs Xwedê bihebînin çawa ku li Wî xweş tê” (Îbranî 12:28).

Awa ev e meremê keremê. Ew qewatê dide me, ku em bi cûrê qebûlkirî yan jî bi şabûnê qulixî Xwedê bikin.

Bona çi me temamîya Mizgînîyê elam nekirîye? Bona çi me tenê nîvê Mizgînîyê gilî kirîye? Belê, xilazbûn pêşkêş e: xilazbûnê meriv nikare bikire, yan jî qazanc bike. Ev hemû tişt rastî ye. Qerez, me bîr kirîye bêjine meriva, wekî xilazbûnê meriv dikare tenê wî çaxî bistîne, eger em jîyana xwe bihêlin û serwêrtîya Îsa bihebînin. Wî çaxî emê qewata keremê bistînin, bona ku anegorî tebyeta Wî bijîn. Petrûs dinivîse:

> “De bira kerem û edilayî wê zanebûna Xwedê û Xudanê me Îsa li ser we zêde bibe. Qewata xwedêtîya Wî her tiştê ku li jîyana xwedênasîyê dikeve, pêşkêşî me kir, bi wê zanebûna me ya hindava Wîda, Yê ku rûmetê û qencîyêra gazî kir. Bi vî awayî Ewî sozên here mezine qîmet dane me, wekî em bi wan tevî binyata xwedêtîyê bibin û ji wê boş-betalîya, ku ji dilhavjîyên dinê pêşda tê, birevin” (B Petrûs 1:2-4).

Guhdarîyê bidine li ser çend îzbatkirina: me *kerem* bi naskirina Îsa Mesîh stendîye: kerem *qewata* Wîye *xwedêtîyê ye*, ya ku wî hemû tiştî dide me, hewcê çine em, bona ku em bi cûrê xwedêtîyê bijîn û ev jîyîn anegorî *tebyeta* Wî ya *xwedêtîyê ye*. Em ji heramîyê xilaz bûne, ya ku bi destî Adem ketîye vê dinîyayê û rûyê xwestinên mêrivda zêde bûye, yên ku dijî miqabilî Xwedê ne. Dêmek îzinê nedin tu kesî ku bi xebera xwe, yan jî bi karê xwe we xemgîn bike, bona ku hûn anegorî tebyeta xwedêtîyê nejîn, ya ku derbazî we bûye. Pawlos zelal dide kivşê:

> “Çimkî kerema Xwedê, ya ku xilazbûnê tîne, li cem hemû meriva eyan bûye. Ew me hîn dike ku em bêqanûnîyêra û xwestinên dinîyayêra bêjin “na” û li vê dinîyayê bi cûrê heq û xwedêparêz bijîn, hetanî ku em hîvîya gumana xwe, eyantîya Xwedêyê meyî mezin û

> Xudan Îsa Mesîhe bi rûmetin, Yê ku Xwe bona me kire qurban, bona ku me ji bêqanûnîyê xilaz bike û bona Xwe pîrozke, çawa cimeta Xwe, ya ku bi hazirî qencîyê dike. Ev in ew hemû tişt, kîjana tu gerekê hîn bikî (Tîto 2:11-15, NIV).

Kerema Xwedê me hîn dike, ku em hemû xwestinên vê dinîyayê bihêlin û bi cûrê heq û xwedêparist bijîn. Nava jîyana meda kerema Xwedê mînanî dersdar e, yê ku rê nîşanî me dide û bi karebûna peyî çûyînê alî me dike.

Guhdarîyê bidine ser, wekî em gerekê van tişta hîn bikin. Pawlos dîsa gotina xwe berdewam dike: “Vê gotinêda xêlifî tune. Û ez dixwezim, ku tu van tişta eseyîkî, wekî yên ku Xwedê bawar dikin xîret bikin, tiştên qenc bikin. Evana merivara qenc û karin” (Tîto 3:8).

Em gerekê her dem bi qewata kerema Xwedê, ya ku nava meda ye, karên qenc bikin. Hetanî xilazbûnê kerema me tunebû. Li cem pîrozên peymana Kevin jî ev yek tunebû. Ew pêşkêşa Xwedê ye, ya ku bi destî Îsa Mesîh mera hatîye dayînê.

Bo vê yekê jî Îsa dibêje me, wekî nava wedê peymana Kevinda hûnê çawa merivkuj bihatana hesabkirinê û hûnê li ber çûyîna dojê bisekinyana, eger we jîyana yekî jê bistenda. Feqet, bin navê keremêda bes e ku hûn birayê bêaqil navkin, nêzîkbûna cûrekî mayîn bidine kivşê, nexewzin bibaxşînin, yan jî hiznekirineke başqe nava xweda xweykin, û hûnê li ber qezîya ketina nava agirê dojêda bisekinin (binihêre Metta 5:21,22). Bo çi usa ye? Niha em dikarin bi tebyeta Xwedê bijîn him hundurda û him jî derda, bi rîya qewata kerema Wî.

## Her dem îzbat bike

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Tîto 3:8 temîyê dide me, ku van tişta *her dem* îzbatkin, yan jî hîn bikin. We eva guhdar kir? Ez dibînim, wekî nava rojên meda ev tiştana ji dika *hindik cara* tên terîfkirinê, û bawarmend hindik derheqa vê yekêda xeber didin, lê derheqa hînkirina hertimîda îdî xeberdan nikare hebe. Ev e menî, wekî em ji girîngîya mîyaserkirina karên qence bi kerema Xwedê xalifîne. Diqewime me îzin daye, wekî qewata meye hundurda razayî bimîne, rûyê kêmasîya bawarîyê, yan jî femdarîyêda. Bawarîya me, ya ku dikare berbi Xwedê here, gerekê

bi rîya xeberdana derheqa bawarîyên meda hertim bişuxule. Pawlos dinivîse: “Ez dua dikim, wekî heleqetîya teye tevî me, nava bawarîyêda me bighîne wê zanebûna kûr, ya ku hindava her tiştên meye qence tevî Îsa Mesîh e” (Filîmon 6).

Eger em her dem van tişta îzbat nekin, emê ji rastîyê bixalifin. Eva zelal nava gotinên nama Îbranyada tê kivşê:

> “Bona vê yekê gerekê em hê gelekî guh bidine wan tiştên ku me bihîstine, wekî em ji wan nexalifin. Çimkî eger ew xebera pê destê milyaketa hate gotinê, hîmgirtî ma û hemû neheqîyê û bêalimîyê heqê xwe rast stendin, lê emê çawa xwe xilazkin, eger em guh nedine wê xilazbûna mezin? Bona vê xilazbûnê Xudan pêşda dannasîn kir û yên ku dengê wî bihîstin, meva eseyî kirin” (Îbranî 2:1-3).

Her dem, bi îzbatkirina van tişta, emê tu cara van rastîyên girînge heta-hetayêva girêdayî bîr nekin, yên ku wê îzinê nedin ku em bixalifin.

Xortanîya xweda min gelek cara masî digirtin. Carna ez û hevalê xwe, me bîr dikir qeyîka xwe bidine girêdanê û wextê ku guhdarîya me li ser masîgirtinê bû, qeyîk ji kenarê çêm dûr diket. Piştî 45 deqa, wextê ku me dora xwe dinihêrî, me fem nedikir, ku em li kîderê bûn. Em ji cîyê xwe dûrketibûn, çimkî me guhdarîya xwe li ser tiştên mayîn dabû merkezkirinê, lê ne li ser masîgirtinê.

Kirinên vî cûreyî li ser meriva biha rûniştine, çimkî wana çemên usada masî digirtin, yên ku bi qezîya ser hevda dihatin. Gelek meriv li parên çemaye rêtinê dimirin, çimkî ew ji wî cîhî dûrketibûn, li kîderê ew pêşda sekinîbûn.

Nava pirsên girînge derheqa heta-hetayêda jî hema ev rastî ye. Eger Xwedê dibêje, wekî em gerekê her dem van tişta îzbatkin, ew yek dide kivşê, wekî em gerekê vê yekê bikin. Bona çi em derheqa qewata keremêda nabêjin, ya ku karebûna derbazkirina jîyana xwedêparêzîyê û gurêdabûnê dide me.

Min daye zelalkirinê, wekî civîna ewlin vî cûreyî dikir. Min çend karên bavên civîna ewlin lêkolîn kirine û min dîtîye, wekî wana tiştên usa hîn dikirin, yên ku himberî hînkirinên roja îroyîn li ber çavê me çawa yên xerîb tên texmînkirinê, lê ew dijî Încîlê nînin. Bavên civîna sedsalên ewlin bawar dikirin, wekî karên gelekî girîng bona xilazbûna me şedetîne. Em çend mesela lê binihêrin.

Şexsê ewlin, xebera kîjanî ezê bînim ber çava, Polîkarpose (salên 69-156). Ew li civîna Zmyûrnîyayê serwêr bû û hevkarê Yûhennayê şandî bû. Yaşê wîyî mezinda ew girtin û li ser dar şewitandin. Ew dinivîse: “Gelek dixwezin bikevine nava vê şabûnê (xilazbûnê), bi zanebûna wê yekê, wekî hûn bi keremê xilaz bûne, lê ne ku bi kar”. Ev gotin nava doranên îroyînda wê ya qebûlkirî bûya. Me daye dîyarkirinê, wekî em bi saya karên xweye qenc xilazbûyî nînin. Feqet Polîkarpos jî bawarmendara dinivîse: “Ewê ku karebûn da Wî, ku ji nava mirîya rabe, wê usa jî karebûnê bide me, eger em xwestina Wî biqedînin, anegorî temîyên Wî bijîn û wan tişta hiz bikin, çi ku Ew hiz dike û xwe ji hemû neheqîya dûr bigrin”. Roja îroyîn hûnê hertim derheqa wê yekêda ji dikên me nebihên.

Guhdarîyê bidine ser xebera “eger”. Ewî got, wekî em gerekê xwestina Xwedê biqedînin û anegorî temîyên wî biqedînin bona ku em jî bikaribin ji nava mirîya rabin. Zûtirekê hûnê bibînin, wekî wan xebera Îsa jî dibêje.

Şexsê mayîn, xebera kîjanî ezê bînim ber çava Klêmês Romayî ye (salên 30-100). Ew hevkarê Pawlos û Petrûsê şandî bû û serwêrekî civîna Romayê bû. Ew dinivîse: “Em bi xweva xwe afû nakin, ne jî bi xwedêparêzîya xwe, yan jî bi karên xwe, lê bi bawarîya xwe, bi rîya kîjanê Xwedê hemû meriv afû kirin). Ev gotin jî wê roja îroyîn nava doranên mesîhîtîyêda bi berfirehî bihata qebûlkirinê. Feqet Klêmês jî bawarmendara dinivîse: “Lazim e ku cedandina meye mezin, ya bona kirina karên qenc, hebe. Çimkî Ewî eşaretî da me: “Awa Xudan tê û heqdayîna Wî li ber Wî ye, bona ku her merivekî anegorî karên wî heq bide” (Romayî 2:6-10)”.

Diqewime hema ev bû menî, ku Pawlos dinivîse: “Ez miqabilî wê dîtina li ber ezmên nesekinîm, lê min pêşîyê yên Şamê, Orşelîmê û temamîya topraxên Cihûstanêra dannasîn kir, usa jî ne cuhîyara, ku tobe bikin, berbi Xwedê vegerin û kirên qenc bikin, wekî bê kivşê, ew ji gunehkirinê vegerîyane” (Karên Şandîya 26:19,20). Nava tercima (NLT) -da nivîsar e: “...û bidine kivşê, wekî ew bi karên xweye qencva hatine guhartinê, ên ku ew dikin). Çawa ku Pawlos ev yek dida kivşê, li me çawa tiştê nêzîkî aqila tê kivşê, wekî hevkarê wî Klêmês Romayî hema ew yek jî dikir.

Rêberê bi sirê, navê kîjanî dixwezim bîr bînim, Klêmês Îskenderî ye (salêd 150-200). Ew li Alêksandrîyayê rêberê civîna li Misirê bû û usa jî serkarîya mekteba li civîna xwe dikir, ya ku bona paşdahatîya bû. Derheqa bêbawerada ew dinivîse: "Eger ew niha jî karên qenc bikin, piştî mirinê jî ewê tu karê neynin, eger bawarîya wan tunebe".

Ev gotina jî wê roja îroyîn bi cûrê dilvekirî ji alîyê mesîhîyada bihata qebûlkirinê. Em zanin, çawa ku îdî min serên pêşinda daye dîyarkirinê, wekî nenihêrî wê yekê, ku bêbawar çiqas karên qenc dikin, yek e ew nikarin bikevine padişatîya Xwedêye heta-hetayê. Em bi kerema Xwedê xilazbûyîne. Qerez aw Klêmês bawarmendara çi dinivîse:

> "Ewê ku rastîyê dibîne û bi karên qencva berbiçave wê xelata jîyana heta-hetayê bistîne... Hinek bi cûrê rast fem dikin, ku Xwedê qewata lazim çawa dide (bona xilazbûnê), feqet çawa ku wan kara girîng hesab nakin, yên ku berbi xilazbûnê dibin, ew nikarin bi cûrê lazim hazirbin, ku bighîjine tiştên xweye guman".

Diqewime hinek ji we bifikirin: "*Diqewime wan meriva peymana Nû nexwendine*", na xêr, wana xwendiye. Nava xebata bi sernavê "Şedetîya dawî"-da Coş MakDaûêl dide kivşê, wekî Klêmês Înskenderî ji her sê kitêbên peymana Nû bi tomerî 2400 xeber dane xebatê". Hema bi wî cûreyî jî rêberên mayîn dikirin, xeberên kîjana min dane xebatê. Gerekê bêjin, wekî gelek kitêbên li kitêbxanên mesîhîtîyêye wedê niha gelekî hindik beşên Încîlê didine xebatê. Diqewime xalifandina me hema ew e, wekî me her dem, çi ku girîng e îzbat nekirîye?

## Mizgînîya meye bi kêmasîya

Telebextra em hîmlî beşên kitêba Pîroze usa didine xebatê, yên mînanî, mesele, Romayî 10:9: "Eger tu bi devê xwe Îsa çawa Xudan bihebînî û dilê xweda bawar bikî, ku Xwedê Ew ji nava mirîya rakir, tê bijîyî". Em dibêjine meriva, wekî gerekê evê duakirinê biwekilînin û ewê xilazbûyîbin.

Feqet, bo çi em guhdarîyê nadine ser xeberên Îsa û wana hîn nakin. Ewî got: "Bo çi hûn Min "Xudan, Xudan" nav dikin û wî hemû

tiştî nakin, çi ku ez dibêjim” (Lûqa 6:46). Çawa ku we dît, xebera “Xudan” dide kivşê çawa serwêrê herî bilind. Nava fikira wêda, fikira xudanê tiştekî heye, çawa xweyê wî tiştî. Dêmek Îsa eşaretîyê dide: “Min çawa “Xudan” nav nekin, eger hûn hela hê serwêrîyê li jîyana xwe dikin. Diha baş e hûn Min çawa “pêxemberê Mezin”, yan jî “Dersdar” navkin, bona ku hûn xwe nexapînin”.

Niha careke mayîn xeberên Îsa lêkolîn bikin, bi kîjana me ev gotûbêjkirin destpê kir: “Ne ku her yek, yê ku Min “Xudan, Xudan” nav dike, wê bikeve padişatîya Ezmîn (Metta 7:21a).

Çawa ku me êdî got, hemû kes nîne, yê ku Îsa Mesîh çawa *Xudan* nav dike û wê here Ezmîn. Ev yek eşkere dide kivşê, wekî tenê bi duakirina “duayê gunehkar” cîhê me wê li Ezmîn neyê çareserkirinê. Wî çaxî ez dixwezim vê pirsê bidim: kî wê bikeve padişatîya Ezmîn.

Îsa bersiva vê pirsê dide û dibêje: “Lê ew, yê ku xwestina Bavê Min mîyaser dike ku li Ezmîne” (Metta 7:21b).

Tiştekî hewaskar e, wekî Polîkarpos hema bi wî cûreyî van gotina diwekilîne. Bi vî cûreyî emê neçine Ezmîn, eger em tenê Îsa bihebînin. Emê herine li wir, eger em Îsa bihebînin û xwestina Xwedê mîyaser bikin. Û em dikarin tenê bi kerema Wî xwestina Xwedê biqedînin. Xwedê kerema Xwe dide me, wextê ku em li ber wî ta dibin, ji jîyana xwe dûr dikevin û Wî çawa Xudan qebûl dikin. Hebandin hêsa ye: lê ew yek dijwar e, wextê ku tu xwe bi temamî teslîmî serwêrtîya Wî dikî.

Lê niha binihêrin, ku ez bo çi vê rastîyê vî cûreyî didime kivşê:

> “Wextê ku r’oja dîwanê bê, gelekê minra bêjin: “Xudan, Xudan! Ne me bi navê te pêxembertî kirin û bi navê te cin derxistin û bi navê te gelek keremet kirin?”. Hingê Ezê bêjime wan: “Min tu cara hûn nas nekirine. Ji Min dûrkevin, merivên neheq”” (Metta 7:22,23, TEV).

Salên 1980-yî Xwedê tiştek nîşanî min da. Min elaleteke mezin dît, dawîya kîjanê nedihate kivş ê. Ew elaleta tê bêjî ji behra meriva bû. Min zanibû, wekî nava wê komêda atêîst, gunehkarên li ser xwe guman, yan jî peyîhatîyên dînên mayîn tunebûn. Hemû kes li wir dihebandin, wekî mesîhîbûn. Ev meriv hatine li ber textê Dîwanê û hîvîyê bûn, wekî Îsayê bêje wan: “Bikevine nava şabûna Xödan,

padişatîya Xwedê”. Dewsa wê yekê wana bihîst: “Ji min dûrkevin, neheqno” (Metta 7:23).

Li ser sifetên wan meriva min tirs û ecêbmayîn dîtin. Hûn dikarin bînine ber çavên xwe, wekî hûn nava xilazbûna xweda gumanin, lê usa dertê ku hûn xilazbûyî nîbûne. Bînine ber çavên xwe, wekî hûn gerekê berbi agirê dojêyî heta-hetayê bêne sirgûnkirinê, nenihêrî wê yekê, wekî we bawar kirîye, ku hûn diçine Ezmîn. Û heta-hetayê hûn gerekê li ser wê fikirê bin, wekî hûn û him jî ew meriv, bona kîjana we terîf dikir, gelekî bi sivikayî nêzîkî gihîştina wê yekê bûne.

Gelo em dikarin bangeke baş bona wan meriva terîf bikin, yên ku Xwedê digerin, lê temîyên Îsa bîr naynin?

Hûn fem dikin, ku bona çi em gerekê şêwira Xwedêye bi temamî elamkin, lê ne ku tenê alîyên wêye baş? Belê, alîyên baş li me xweş tên û em gerekê derheqa wanda gilîkin û bi wana şabin. Feqet gerekê em wê yekê kîsî temîyên Xebera Xwedê û hesabhilnedana eşaretîya nekin.

Tê bîra min, wekî carekê, wextê civînekê min got, wekî ez rastîyê terîf dikim, çimkî “...naxwezim, wekî roja Dîwanê meriv li ser min bikine qîrîn û bêjin: “Bo çi te rastî negote me?” û xwîna wana ji destên min biniqite”.

Piştî terîfkirina min, serwêrek, yê ku gelekî hêrs ketibû, carekêra nêzîkî min bû. Meriv dikare bêje, wekî ew ji hêrsê dikelîya. Ewî got:

– Hûn çawa dikarin xwedêzanîya peymana Kevin bavêjine li ser me qulixçîya? Ji destên min bona elamnekirina Mizgînîya tam xwîna tu kesî wê neniqite.

Tiştekî kivş û ber çava bû, wekî alîyên Xebera Xwedêye baş li wî merivî xweş dihatin, lê ew dixebitî, ku wan beşa bîr neyne.

Min bersiv da:

– Bixwînin ku Pawlos rêberên Efesîyêra çi got.

Încîla min li cem min bû, û min kitêba Karên Şandîya vekir û hîvî ji wî kir ku bixwîne: “Bona vê yekê ez roja îroyîn li ber we şedetîyê didim, ku cabdarê xwîna we tu kesî nînim, çimkî min xwe neda paş, *temamîya* qirara Xwedê wera got” (Karên Şandîya 20:26,27).

Ewî serê xwe bilind kir û zendegirtî li min nihêrî: çavên wî û devê wî fireh vebibûn. Û ewî got:

– Min gelek cara peymana Nû xwendîye, lê min tu cara eva nedîtibû.

Peyî wê yekêra me bi hevaltî qise kir. Wextê wê qisê, min da dîyarkirinê, wekî bona ku meriva nava Mesîhda werguhêzî merivên gihîştî bikin, em ne tenê gerekê hîn bikin, lê eşaretîyê bidine wan (binihêre Kolosî 1:28). Eşaretîya me kîjan e? “Ji rastîyê dûr nekevin. Bi bangên merivên derewîn nexalifin, yên ku bi derewa ne tenê xwe, usa jî gelek meriva, ji xwedêparêzîyê dûr dixin”. Hetanî qewimandina nava serê 20-îda, Pawlos wedekî dirêj tevî bawarmendên Efesîyê derbaz kiribû. Ewî ew meriv hiz dikirin û bi Ruhê Xwedê zanibû, wekî ewê îdî wana, hetanî rasthatina li Ezmîn, nebîne. Bifikirin, ku weyê xeberên xwe çiqasî fesal bibijartana, eger we bizanibûya, ku hûn cara dawî berbirî wan dibin, yên ku bona we çawa zarok bûne. Wextê xatirxwestinê Pawlos temîyên vî cûreyî dane wan:

> “Niha miqatî xwe û temamîya wî kerê pêzbin, ku Ruhê Pîroz hûn ser berpirsîyar kivş kirine. Şivantîyê li civîna Xwedê bikin, ya ku Wî bi xwîna xwe qazanc kir. Çimkî ez zanim, peyî çûyîna minra gurên devxûn wê bikevine nav û heyfa wî kerî neyê. Ji nava weda jî merivê derên û tiştên xêlif wê xeberdin ku şagirta peyî xwe bibin. Bona vê yekê hişyar bimînin û bîr nekin, ku min hûn her kes, we sala, şev û roj bê rihetî, bi hêsira şîret kirine” (Karên Şandîya 20:28-31).

Ev merivana wê çawa rastî navhevxistana? Bi texmîn, bi gotina, lê diqewime bi karên xweva jî. Guhdarîyê bidine li ser wê yekê, wekî Pawlos bi qewata mezin texmîn dikir, wekî ew yek wê biqewimîya, wekî sê sala şev û roj ser hev eşaretî dida efesîya. Em careke mayîn dibînin, wekî em gerekê her dem van tişta îzbat bikin.

## Xwedêyê hizkirinê û heqîtîyê

Nava serhatîya meye alêgorîkda meriv dikaribû ecêbmayî nerihetîya yê Xapyayî texmîn bikira. Keserek hate we, wextê ku we girtina wîye li Lonê texmîn kir. We anî ber çavê xwe, wekî jîyana wîye mayî, 130 salên mayî wê çawa nava tarîstanê, germayê û hewa qirêjda derbaz bûna. Qerez, ew tiştek nîne himberî wan tişta. Gelek mêr û jin wê rastî çi bên, eger em temamîya qirara Xwedê elam nekin?

Eger tê bîra we, Cêylon him hiz dikir û him jî heq bû. Nava dîwana wîda hizkirin wî cûreyî eyan bû, wekî ewî nikaribû îzin bida, ku merivekî bi tebyet û xeysetê Dagon biketa bajarê Afabêlê. Eger ew yek biqewimîya, wî merivî wê temamîya bajar û binelîyên wî wê navhevxista û heram bikira. Hizkirina Cêylon merivên bêsûc diparast.

Bi wê yekêva tevayî Cêylon nikaribû îzin bida ku merivê bi tebyeta Dagon bona gurênekirinê cezayê hê nimiz bistenda, ne ku Dagon bi xwe. Bo vê yekê jî, ewên ku qirar kiribûn peyî Cêylon neçin, gerekê bihatana sirgûnkirinê û li Lonê, mînanî wî, bihatana girtinê.

Hema bi wî cûreyî jî hizkirina Xwedê nikare îzinê bide merivekî, tebyeta kîjanî ya mîrêcin e, ku li bajarê heta-hetayê bijî. Ew yek wê ne heq bûya, ku mîrêcin û leşkerên wî li gola Agire heta-hetaê bimana, bizêrîyana, lê bona wan meriva, yên ku bin serwêrtîya mîrêcinda bûne, cezayê nimiz bidana wana. Ew meriv, li cem kîjana tebyeta mîrêcin e wê heta-hetayê tevî wî nava gola Agirdabin. Xwedê rehm û heq e û her dem wê usa bibe û rûmeta Wî wê li temamîya dinîyayê eyanbe.

## PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

### BEŞA DUDA, SERÊN 4-5

1. Hetanî xwendina vê beşê we hesab dikir, wekî dîwana heta-hetayê dersdarîya hîmlî ye, wekî hemû mesîhî gerekê wê yekê fem bikin? Çi diqewime, wextê ku em dersa didine meriva, bêyî bi kûrayî hînkirina vê têmayê?

2. Gelek mesîhî merivara derheqa dojêda gilî nakin, çimkî ditirsin, wekî wê wana hesabkin çawa şexsên xirab û rexnekir. Qerez, derheqa vê yekêda xeberdana tevî meriva gaveke dilovanî ye. Bawarmend (him merivên cuda-cuda û him jî civîn) çawa dikarin derheqa vê yekêda bi saya hizkirinê xeberdin?

3. Hûnê tevgirêdana bawarîyê û rez (yan jî kar) çawa şirove bikin? Eger xilazbûn pêşkêş e, wî çaxî bona çi karên me bona bawarîya me girîngin?

4. Serê kitêbêyî pêncada me da dîyarkirinê, wekî em guhdarîya xwe li ser sozdayînên Mizgînîyê didine merkezkirinê û derheqa wê yekêda gilî dikin, bi hesabhilnedana wê yekê, ku qirara çûyîna peyî Îsa nava jîyana mêrivda çi hukumî dikare bihêle. Bona çi jîyana gura Mesîhda diha tijî ye, ne ku ew jîyan, ya ku rêyên ruhanî nîşanî me dide û me borcdar nake, ku em cûrê jîyana xwe biguhêrin?

5. Bi fikira xwe wî hemû tiştî bîr bînin, ku hetanî niha derheqa xilazbûnê û dîwanêda em çi pê hesîyan, ku jîyana meye îroyîn çi cûreyî hukumî li ser heta-hetayê dike. Gelo şirovekirina keremêye serê kitêbêyî pêncada alî we kir, ku hûn diha bi kûrayî van têma fem bikin?

# Beşa Sisîya

SERÊ 6-A

# Berdaxustina Mezin

*"Lê kî ku hetanî dawîyê teyax bike, wê xilazbe..."*
— Metta 24:13, TEV

Nava vî serê kitêbêda emê derheqa wan rastîyada xeberdin, yên ku bi şikilê jîyana Dubare û dilê Gumanbir hatine raberkirinê. Wextekê ew bi rastî peyî Cêylon diçûn. Feqet, ji wana yek bi menîyên rast peyî wî nediçû, lê ya mayîn, bi kutasî ji rêyên wî dûr ket. Axirîya herduya jî ya tragîk bû.

## "Em wê yekê bixwînin, bawarîya xwe li çi tînin?", yan "Bawarîya xwe li wê yekê bînin, çi ku me xwendîye?"

Ev rastî, derheqa kîjanada emê nava vî serê kitêbêda bixwînin, nava hinek doranên ruhanîda bi hevra nayêne qayîlkirinê. Feqet, eger em dixwezin rastîyê pê bihesin û em hindava xweda bêqelpin, lêkolînkirina Încêlêye bi hûrgilî wê hemû hevraqayîlnebûna bide dûrxistinê. Emê derheqa wê yekêda xeberdin, ku çawa Încîl derheqa merivên mînanî jîyana Dubare û dilê Gumanbir hîn dike. Îzinê bidin, ez hîvî ji we bikim, wekî hûn xwendinê bi dilê vekirî û bi fikira vekirî berdewam bikin.

Çetinayîke (dijwarîke) mezin, rastî kîjanê em tên, ew e, wextê ku em dicedînin qirara Xwedê naskin, nava xwendina Încîlêda em *bawarîya xwe li çi tînin wê yekê dixwînin*, dewsa wê yekê ku em *bawarîya xwe li xwendina xwe bînin*. Em wê yekê dixwînin, bawarîya xwe li çi tînin, wextê ku em qirar dikin "bi berçavkên qirêjbûyî" rastîyê binihêrin. Menî ew e, wekî zanebûn ne rast e, çimkî wê zanebûnê ji merivên başqe, yan jî ji hînkirinên cînara distînin û pêra djî fikirên xweye şaşe derheqa Xwedêda û rêyên Wîda hesab hildidin. Eva tiştekî gelekî qezîya ye, çimkî ew yek dikare me berbi xapandinê bibe. Meseleke wî cûreyî meriv dikare kitêba Îboda bibîne.

Van axirîya min Încîla xwe hilda û min pêra negîhandibû vekim, wextê ku Ruhê Xwedê got: “Kitêba Îbo veke û ji serê 32-da bixwîne”. Min carekêra ew serê kitêbê vekir û min dît, wekî ew destpêka xebera Yêxîûs bû.

Bona nasandinê hinekî pêşda bêjim. Îbo tragêdîyake mezin dît, peyî kîjanêra fikira wî ya derheqa Xwedêda lez hate guhartinê, rûyê zêrandinê û qezîyayêda. Ewî destpêkir Xwedê ji alîyê cêribndina xweda binihêre, dewsa wê yekê ewî gerekê serwaxtîya Wî bigerîya (binihêre Aqûb 1:2-8). Nava wededa fikirên wî ew birine berbi xweafûkirinê. Hersê hevalên Îbo, yên ku hetanî vî serê kitêbê, ji kîjanî min destpêkir xwend, xeber didan, mînanî xwedêzanên şaş, cêribandin tragêdîya Îbo şirove bikin. Cêribndinên wana hal diha zêde dane xirabkirinê. Bi nekarebûna înkarkirina fikirên Îboye şaş, hevala ew gunehkar kirin.

Yêxîûs, yê ku nava wê komêda yê herî cahil bû, gelekî dirêj hîvîyê sekinî, bona ku serwaxtîya Xwedê ji Îbo û hersê hevalên wî guhdar bikira. Bi kutasî, wextê ku ewî fem kir, wekî gotinên her sê hevalên Îbo îdî tunene, ewî destpêkir xeberde: “Min bi sebir guhdar dikir, hetanî ku we xeber dida, û ez hîvîyê bûm, hetanî ku hûn gotinên serwaxt digerîyan. Min bi guhdarî dîna xwe dida we û min bihîst, ku hûn çawa teribîn: we gotina Îbo înkar nekir. Hûn çawa dikarin bêjin, wekî we serwaxtî dîtîye? Xwedê gerekê bersiva Îbo bide, çimkî hûn teribîn, şaşin” (Îbo 32:11-13, TEV).

Yêxîûs xeberdana xwe berdewam kir û miqabilî hemûya derket. “Gelo Xwedê gerekê heqîtîya Xwe bike anegorî dewakarîyên we?” (Îbo 34:33, NLT). Gelo çiqas rast ewî derheqa şaşîya roja îroyînda belabûyî xeberda! Eva kokeke sereke ye, ya xwedêzanîya civînêye şaşbûyî ye: *me îzin daye cêribandina xwe, ku Xebera Xwedê şirove bike, dewsa wê yekê, ku em îzinê bidine Xebera Xwedê, ku ew normên rastîyê nîşan bide.*

Yêxîûs bi fikirdarîya merivatîyê, yan jî bi xwedêzanîya usa xeber neda, ya ku li ser qewimandinên cuda, yan jî fikirên şaşe derheqa Xwedêda hatîye çêkirinê. Ewî Xebera Xwedêye paqij raber kir, bêyî feşkirina rastîyê.

Peyî gotina wîra em dixwînin:

> “Û ji nava bagerê Xudan Îbora xeberda: “Tu kîyî, ku serwaxtîya Minra, bi xeberên xweye valava qayîl nebî? Mînanî mêra li ber min bisekine û bersiva wan pirsa bide, kîjana Ezê bidime te”” (Îbo 38:1-3, TEV).

Nava tercima Încîlêye “Êmplîfaydê”-da pirsa Xwedê ev e: “Ev kî ye, wekî bi xeberên bêfkiriva şêwirê dide tarîkirinê?”. Awa çi diqewime, wextê ku em xeberên Xwedê bi cêribandina xwe, bi fikirên merivên başqe, bi xwedêzanîya şaş û bi fikirên şaşe derheqa Xwedêda lê dinihêrin. Em şêwira Wî didine tarîkirinê û em wê bona merivên dora xwe dikine tiştên nefemdarî. Bi gilîkî, em rastîyê ji wana vedişêrin, yê ku dixwezin wê yekê bizanibin. Awa bona çi Xwedê li ser Îbo û hevalên wî hêrsketî bû û roja îroyîn jî hêrs dikeve, wextê ku em rêyên Wî bi şaşî raber dikin. Em îzinê nadin ku meriv rastîyê nas bikin.

Xudan bona eyankirina Xebera Xwe, bona Îbo çar serî başqe kirin. Çaxê ku Ewî xilazkir, Îbo poşmanbûyî got:

> “Xudan, ez zanim, wekî Tu Yê herî qewatî, wekî Tu çi ku bixwezî dikarî bikî. Tu ji min dipirsî, ku ez çawa bi nezanîya xweva, serwaxtîya Tera qayîl nînim. Min derheqa wan tiştada xeberda, derheqa çida min fem nedikir, kîjan gelekî mezinin bona zanebûnê. Te emir kir, ku min guhdar bikira, wextê te xeberda, û minê bicêribanda caba pirsên Te bida. Berê min ew zanibû, çi ku yên mayîn gotine min, lê niha min Te bi çavên xwe dît. Dêmek, ez bona wî hemû tiştî şerm dikim, çi ku min gotîye û ez li ser axê û nava kozîyêda tobe dikim” (Îbo 42:2-6, TEV).

Guhdarîyê bidine ser, wekî Îbo got: “Berê min tenê ew zanibû, çi ku yên mayîn minra gotibûn, lê niha min Te bi çavên xwe dît”. Nava vê gotinêda rastîke mezin heye. Încîl dibêje, wekî em ji rûmetê berbi rûmetê tên guhartinê, wextê ku em Xudan *dibînin* (binihêre B Korintî 3:18), lê ne ku wextê em *derheqa Wîda dibihên*). Îsa Xebera Xwedêye sax e. Dîtina Wî dide kivşê, Wî û rêyên Wî naskin.

Awa binihêrin, ku rastîya eyanbûyî nava jîyana mêrivda çi dike. Em Xebera Xwedê dibihên, lê emê neyêne guhartinê, eger em *nehatine ronahîkirinê*. Wextê ku rastîya Xebera Xwedê dikeve dilê me, em dikine qîrîn: “Min fem kir! Min fem kir!”. Wî çaxî em ronahî dibin û em tên guhartinê, berdewam dikin bibine mînanî Wî.

Vê rastîya ruhanî usa kir ku Pawlos dua bike: “Bona vê yekê min ji hingêva, ku bona bawarîya weye ser Xudan Îsa û ew hizkirina weye hindava temamîya cimeta Xwedêda bihîstîye, bona we min dest ji şikirdayînê nekişandîye. Ez timê we nava duayên xweda we bîr tînim. Wekî Xwedêyê Xudanê me Îsa Mesîh, Bavê xweyîrûmet,

ruhê serwaxtîyê û eyantîyê bide we, ku hûn tam Wî nas bikin...” (Efesî 1:15-18). Îbo diha zêde hate ronahîkirinê himberî wî çaxî, nenihêrî wê yekê, wekî jîyana xwedêparêzîyê pêşîya tragêdîya xwe derbaz dikir. Ewî Xwedê li ser dereca diha bilind nas kir.

Wextê ku Xwedê xeberdana xweye tevî Îbo xilaz kir, Ew berbirî hevalekî Îbo, Yêxîpas bû: “Ez li ser te û herdu hevalên te hêrsketîme, çimkî we rastîya derheqa Minda negot (Îbo42:7, TEV). Xudan cûrekî mayîn qebûl dike, wextê ku em Wî û rêyên Wî bi cûrê şaş raber dikin. Ew yek şêwira Wî tarî dike û heqîtîya Wî navhev dixe. Ez wê yekê fem nakim, wekî meriv bêyî fikirmîşbûn piştgirîya alîyên xwedêzanîyêye usa dikin, yên ku bi şêwira Xebera Xwedêva nayêne îzbatkirinê. Eva tiştekî bi tirs e! Em çawa dikarin bêjin, ku rastîyê nas dikin, lê naxwezin bi wê rastîyê bên şîretkirinê, yan jî rastkirinê?

Wextê ku min kitêba Îbo ser hevda anî, Xudan tiştekî usa gote min û ew yek bû bersiva gelek pirsa. Ewî got: “Kurê min, te dît, wekî Ez wî çaxî eyan nebûm, wextê ku Îbo û hevalên wî derheqa Minda şaş xeber didan. Hazirîya Min eyan nebû, çimkî tu kes hela hê nesekinîbû û rastî negotibû”.

Peyî wê yekêra min tirs texmîn kir, wextê ku Xwedê dilê minra xeberda û min destpê kir derheqa gotina Wîda bifikirim. Min careke mayîn guhdarîya Wî kir: “Awa bona çi gelek meriv, civîn û merivên başqe hazirîya Min û qewata ku jîyîna diguhêre texmîn nakin. Ew Xebera Min, ya paqij, eyan nakin, ew bi şirovekirinên xwe yan jî bi fikirên xwe Xebera Min diguvêşin ser hev, tiştên girîng ji nav derdixin û bi wê yekêva ew ji Îbo û hevalên wî cuda nabin. Ew şêwira Min bi xeberên xweye bêfikir didine tarîkirinê”.

Eger em dixwezin hazirî û qewata Xwedê naskin, em gerekê bicedînin rastîyê naskin, bêyî feşkirina wê. Dêmek wextê ku em lêkolînkirina Încîlêye derheqa dîwanên Xwedêda berdewam bikin, îzinê nedine fikirên şaşe derheqa Xwedêda, xwedêzanîya şaş û qewimandinên şaş, ku fikira weye derheqa wan tiştada biguhêrin, yên ku Ewî îdî zelal eyan kirine. Dewsa wê yekê Wî bi Xebera Xwedêva eyanbûyî bigerin, bona ku hûn bêne ronahîkirinê û rêyên Wî bibînin.

## Îsa digerin bona berjewandiya xwe

Werin em derheqa jîyana Dubareda xeberdin. Emê destpê bikin paşda vegerine li ser gotnên Îsa, derheqa kîjanada me serê kitêbêyî derbazbûyîda xeberda:

> “Wextê ku roja Dîwanê bê, gelekê bêjine Min: “Xudan, Xudan”. Bi navê Te me banga Xwedê elam kir, bi navê Te me gelek cin derxistin û gelek tiştên ecêb kirin. Wî çaxî Ezê bêjime wana: “Min tu cara hûn nas nekirine. Ji Min dûrkevin, merivên neheq” (Metta7:22,23, TEV).

Nava tercimeke mayînda, ya ku diha nêzîkî orîgînalê ye, bersiva Îsa vî cûreyî ye: “Min hûn tu cara nas nekirine: ji Min dûrkevin, *merivên ku neheqîyê dikin”*. Xebera “neheqî” nava yûnanîda (“anomîya” (dide kivşê, wekî dijî qanûn û qirara Xwedê derdikevin, yan jî gura serwêrîya Xwedê nakin.

Îsa usa jî xebera “dikin” serda zêde dike, dide kivşê, wekî ew derheqa wan merivada nabêje, yên ku car-carna dişimitin, ne jî derheqa bawarmendên zarokên nava Mesîhda dibêje, yên ku bona azabûnê şerkarîyê dikin. Ew derheqa merivên usada dibêje, yên ku bi cûrê Xwedêyî baş najîn û hesab hilnadin, cûrê jîyana xwe afû dikin, yan jî vedişêrin. Dêmek xeberên Îsa derheqa merivên mînanî Yê Xapyayî û yên mînanî jîyana Dubaredanin.

Ew elalet, Îsa berbirî kîjana dibe, wê qirarên dîwanê bibhên, yên ku heta-hetayê wê wana li cîhên wan rihet nehêlin. Tiştekî gelekî girîng e, wekî em eşaretîya Xudan hesab hildin û bi sivikayî nêzîkî wê yekê nebin.

Werin em hinekî bi guhdarî derbazî koma duda bin, berbirî kîjana dibe Îsa, li beşa jorinda. Nava wan merivada, yên ku wê nekevine padişatîya Xwedê, merivên usa wê hebin, yên ku *bi navê Îsa* cina derdixin.

Ev meriv kî ne? Gelo kesek dikare bona derxistina cina navê Îsa bide xebatê, eger tevgirêdana wî Xudan Îsara tune? Werin em beşeke ji kitêba Karên Şandîya, bona stendina bersiva vê pirsê bixwînin:

> “Komeke cuhîya, yên ku ji bajarekî diçûne bajarekî mayîn, bi derxistina ruhên xirab cêribandin navê Xudan Îsa bidine xebatê. Digotin: em pê wî Îsayê ku Pawlos dannasîn dike, berî we didin”.

> Ev yek her hevt kurên Skêwayê serekkahînekî cuhîya kirin. Feqet, wextê ku wana cêribandin wê yekê li ser merivekî bikin, yê ku bi ruhê xirabva girtîbû, ruhê xirab li wan vegerand û got: “Ez Îsa zanim û Pawlos jî zanim, lê hûn kî ne?”. Hingê ew merivê ku ruhê xirab têdabû, bi qewateke usa banzda ser wan, wekî ew ji malê tazî û birîndar revîn” (Karên Şandîya 19:13-16, NLT).

Ev merivana nikaribûn bi navê Îsa cin derxistana. Nava vê serpêhatîyêda rastîk heye: bona derxistina cina tenê navê Îsa bes nîne. Tevgirêdana weye tevî Wî gerekê hebe. Hûn gerekê nava wanda bin, yên ku peyî Mesîh diçin, lê ne ku nava wan merivada bin, derheqa kîjanada me serê kitêbêyî derbazbûyîda xeberda. Diqewime hûn bifikirin: “*Ne axir Îsa got, wekî tu cara ew nas nekirine? Lê çawa ew dikaribûn bi navê Îsa cin derxistana û ecêb bikirana? Gelo ev yek tiştê bûyînê ye?”*”.

Hene meriv, yên ku bi dil gihîştine Îsa, bona ku mecalên xilazbûnê bistînin, lê ew yek tenê bona kara xwe kirine. Wana tu cara dilê Xwedê nas nekirine, lê tenê qewat û duayên Wî xwestine. Pawlos eşaretîyê dide, wekî merivên wî cûreyî “bi fikira xweva herambûyîne û ji rastîyê dûrketîne, yên ku xwedêparêzîyê çawa kanîya karê hesab dikin: ji yên usa dûrkeve” (A Tîmotêyo 6:5).

Ev meriv Îsa bona kara xwe digerîyan. Usa dertê, wekî ew bona kara xwe qulixî Wî dikirin, lê ne ku ji bo hizkirina Wî. Îsa ew nas nedikirin, çimkî nivîsar e: “Feqet eger Xwedê yekî hiz bike, ew *ji alîyê Wî da naskirî ye*” (A Korintî 8:3).

Ew ji alîyê Xwedêda naskirî ye. Xebera “naskirin” nava vê gotinêda nade kivşê, ku gerekê derheqa Wîda bizanibî, çimkî Xwedê derheqa hemûyada zane. Ew hemû tiştî zane. Nava vê xeberêda fikira naskirina nêzîk heye. Tercima Încêlêye “Êmplîfaydêda” ev fikir tê zelalkirinê: “Eger kesek bi rastî [bi hizkirin, bi gurêkirina lez û bi razîbûn qebûlkirina duayê Wî] Xwedê hiz dike, ew ji alîyê Xwedêda naskirî ye. [ew layîqî *nêzîkaya Wî* û hizkirina Wî dibe, û ew dibe yê Wî]”.

Îsayê roja Dîwanê bêje elaletê: “Min tu cara hûn *nas nekirine*”. Dêmek ewên ku Xwedê hiz nakin (ew yek kivş e, çimkî ew gura Wîda nînin û bi hizkirin, usa jî bi xofê nêzîk nabin), ji alîyê Bavê û Îsada *naskirî* nînin, nenihêrî wê yekê, wekî ew hîvîya xilazkirina Wî

ne. Hizkirina Îsa dide kivşê, wekî hûn emirê xwe bona Wî datînin. Hûn îdî bona xwe najîn, lê bona Wî dijîn.

Cihûda mesela merivê wî cûreyî ye. Ew gihîşte Îsa. Çawa ku Cihûda bona çûyîna peyî Wî qurbaneke mezin kir, dihate texmînkirinê, ku ewî Xwedê hiz dikir. Cihûda hemû tişt hişt, ku bighîşta koma Îsaye qulixê û peyî Xudan biçûya. Ewî wextê zêrandinên gur teyax kir heta wî çaxî jî, wextê ku endamên qulixêye mayîn dûr ketin (binihêre Yûhenna 6:66). Ew teslîm nebû. Ewî cin derdixistin, nexweş qenc dikirin û mizgînî terîf dikir (binihre Lûqa 9:1).

Qerez, menîya Cihûdaye ji destpêkê rast nîbû. Ewî bona menîyên xwehizîyê tobe nekir. Xeysetê wî em nava van beşên Încîlêda dibînin. Ewî got: “Hûn çi dixwezin *bidine min*, û ez...” (Metta 26:15). Ewî bona kara xwe derew û lefekî dikirin (binihre Metta 26:25), pare bona xwe ji mecalên qulixa Îsa didizîn (binihêre Yûhenna 12:4-6), û her dem bi vî cûreyî. Ewî usa jî bi cûrê nêzîk Xudan nas nekir, nenihêrî wê yekê, wekî sê sal û nîv nava hazirîya Wî da derbaz kir, bi bûyîna şagirtê Wî. Bo wê yekê jî Îsa derheqa wîda got: ““Ne axir Min hûn, 12 şagirt, bijartin, û ji we yek cin e”. Ev gotin hema derheqa Cihûdayê Îsxeryotîda bû...” (Yûhenna 6:71,72 b).

Gelek meriv ji Cihûda cuda nabin. Van meriva gelek tişt qurbanî qulixê kirine, meriv ji cina xilaz kirine, nexweş qenc kirine, Mizgînî terîf kirine û bona xilazbûna xwe bawarîya xwe li Îsa anîne, lê tu cara bi cûrê nêzîk Ew nas nekirine. Hemû karên (îşên) wan bona kara wan hatine kirinê, lê ne ku ji bo hizkirina Xwedê. Ev şirorvekirin nava serpêhatîya meda anegorî jîyana Dubare ye. Ew serwêrtî û hukum li Wî xweş dihhatin, wekî ewî bi saya çûyîna peyî Cêylon distendin. Hema destpêkêda jî menîyên wî nava koka hizkirina Cêylonda nîbûn.

Bona merivên vî cûreyî gunehkarkirina mezin têra tê dîtinê. Îsa derheqa Cihûdada got: “Wîra hê qenc bû, ku ew qet dinê neketa” (Metta 26:24). Xudan gote wan rêberên ruhanî, yên ku bona kara xwe qulixî Xwedê dikirin û bi navê Xudan ew meriv didane xebatê: “Bona vê yekê dîwana we wê hê giranbe” (Metta 23:14). Ew mêr û jin, yên ku mînanî jîyana Dubare ne, wê bikevine cîhên dojêye here tarî û xirab.

## Hiştina xilazbûnê

Ev hemû tiştên nava serhatîya meda bi rastî derheqa jîyana Dubaredanin. Lê gelo em çi dikarin derheqa dilê Gumabirda bêjin? Tevgirêdanên wêye tevî Cêylon hebûn û ewê Cêylon hiz dikir jî, feqet ewê hetanî dawîyê teyax nekir. Încîl derheqa vê yekêda çi dibêje? Em destpê bikin bersiva vê pirsê bi gotinên Hezeqêlê pêxember bidin:

> "Eger yê heq ji heqîtîya xwe paşda vegere û neheqîyê bike, heramîyê bike, gelo ewê bijî? temamîya heqîtîya wî gerekê neyê bîranînê: ew gerekê bi wanava, dêmek xirabkarîyên xwe û gunehên xweye kirîva bemire (Hezeqêl 18:24).

Berî her tiştî, Xwedê derheqa merivê *heqda* dibêje, lê ne ku derheqa merivekî usada, yê ku xwe heq *hesab kirîye*, lê tu cara heq nîbûye. Bêyî şikberî meriv nikare vî merivî himberî yên xapyayî yan jî yên derewîn bike, derheqa kîjanada me serê kitêbêyî derbazbûyîda got.

Xwedê dibêje, wekî wê heqîtîya vî merivî *bîr neyne*, wextê ku Xwedê tiştekî bîr dike, tê bêjî ew yek tu cara neqewimîye. Em zanin, wekî Xwedê gunehên me bîr dike, wana awqasî dûr dixe, çiqasî rohilat ji rojavayê dûr e û wana nava behra bîrkirinêda vedişêre. Bêfitîya, eva rast e. Ew elam dike: "Gunehên wan neheqîyên wan ezê îdî bîr neynim" (Îbranî 8:12). Xwedê gunehên me bîr dike, wextê ku em Îsa çawa Xudan qebûl dikin. Mîrêcin dicêribîne me gunehkar bike, lê Xwedê gotîye, wekî Ewê gunehên me îdî bîr neyne. Dêmek, bona Wî usa ye, ku tê bêjî me tu cara guneh nekirine. Eger em wekî mayîn jî bifikirin, usa jî rast e. Wextê ku Xwedê dibêje, wekî wê heqîtîya kesekî bîr neyne, ew dixweze bêje, wekî wê bîr bike, ku wextêda ew meriv nas kirîye. Heleqetîyên wîye tevî wî merivî wî çaxî îdî xilaz dibin. Aqûbê şandî dinivîse:

> "Gelî xwîşk-birayên min! eger yek ji we ji rîya rastîyê dûr bikeve û yekî din wî vegerîne, bira ew zanibe, yê ku gunekar ji rîya wîye xalifî vedigerîne, ew ruhekî ji mirinê xilaz dike û gelek guneha resît dike" (Aqûb 5:19,20).

Tiştê ewlinî ku gerekê nava vê beşêda bidin kivşê ev e: "Xwîşk-birayên min, eger yek ji we...". Aqûb derheqa wan merivada

nabêje, yên ku tenê difikirin, wekî mesîhî ne. Ew derheqa *bawarmendda* dibêje, yê ku ji rîya rastîyê dûr dikeve. Nava vê beşêda ew birayê ku ji rîya rastîyê xalifîye, çawa *gunehkar* tê navkirinê. Ev yek nade kivşê, wekî ew îdî bûyî nîne, lê wê yekê dide kivşê, wekî nava jîyana wîda gunehkirin bûye tiştekî sade û ew gerekê paşda vegere nava gurêdabûnê. Feqet, Aqûb zelal dide kivşê ku eger ew nava xalifîbûna xweda ber xwe bide, wî çaxî şexsê wî wê bimire: eger ew li Xwedê paşda venegere (tobe neke), ewê unda bibe. Kitêba Gotinên Silêman vê yekê îzbat dike û dibêje: “Ew merivê ku ji rîya serwaxtîyê *dixalife,* wê nava civata ruhda (mirîyada) bijî” (Gotinên Silêman 21:16, AMP).

Kitêba Gotinên Silêman gotinên Aqûb îzbat dike: ew merivê ku ji rêyên Xwedê dixalife û li heqîtîyê venagere, nava mirîyada dijî, ya ku Hadês e, û bi kutasî dikeve nava gola Agir.

## Kitêba Jîyanê

Nava Peymana Nûda heyşt cara derheqa kitêba Jîyanêda nivîsar e. Pawlos û Yûhenna dinivîsin, wekî vê kitêbêda navên wan meriva nivîsarin, yên ku wê heta-hetayê tevî Îsa derbazkin. Navên me li wir wî çaxî tên nivîsarê, wextê ku em ji nûva dibin.

Serê kitêbêyî çarada şedetîya Yêprosînîyêda bîr bînin. Çawa ku keça yûnan jîyana xwe pêşkêşî Îsa kir, Bav Xwedê navê wê kitêba Jîyanêda nivîsî û got: “Tu bi xêr hatî li malbetê”. Hema bi wî cûreyî jî Pawlos bawarmendekîra dinivîse: “Ez hîvî ji te dikim, hevalkarê minî amin, tu alî wan kulfeta bike, çimkî evana tevî min bi cedandin xebitîn, derheqa Mizgînîyêda merivara gilî kirine. Û ew usa jî tevî Klêmês û tevî wan hevalkara xebitîn, navên kîjana kitêba Jîyanêda nivîsarin” (Fîlîpî 4:3, NLT).

Wekî mayîn jî rast e. Navên kîjana kitêba Jîyanêda nivîsar nînin, ew undabûyî ne. Guhdarkin, ku kitêba Eyantîyê çi dibêje: “Û navê kê vê kitêba Jîyanêda nivîsar tunebû, ew hate avîtinê nava gola Agir” (Eyantî 20:15). Yên mayîn wê nava mirîyada bin.

Nava kitêba Eyantîyêda, serê sisîyada, Îsa berbirî civînekê dibe (ne ku bajarekî, ne ku komeke merivên undabûyî, ne ku bawarmendên ku Xwedêyê feş dihebînin, û ne jî civîna nava

vêrgulada). Ew derheqa wan merivada xeber dide, yê ku bi rastî yên Wî ne û eşaretîyê dide: “Ewê ku serbikeve, ewê kincên çîle-qerqaş li xwe wergire. Ezê navê wî ji kitêba Jîyanê *resît nekim*” (Eyantî 3:5).

We xebera “resît” dît? Navê we dikare ji kitêba Jîyanê tenê wî çaxî resît bibe, eger ew li wir pêşda nivîsar bûye. Kitêba Jîyanêda tenê navên wan meriva nivîsarin, yên ku ji nûva bûne, bawarîya xwe li Îsa Mesîh anîne. Bêbawar û merivên xapyayî, yên ku tu cara bi rastî tevî Îsa negerîyane, nikarin nava wê Kitêbêda bin: navên wana nikarin ji wir resîtbin. Ew berbirî wan meriva dibe, yên ku malbeta Wî da nin.

## Dîtinoka ku hişyar dike

Ev serhatîya qulixçîkî nivîsîye, yê ku sedsala 20-da bi bawarî nêzîkî 70-salî qulixî Xwedê kirîye. Ewî hukumekî mezin li ser temamîya bedena Mesîh hiştîye. Kitêbên wî bi 65 mîlîon mesela hatine çapkirinê, lê mekteba wîye Mizgînîyê ji 20 hezarî zêdetir meriv xilaz kirine.

Derheqa vê têmayêda ew kitêbeke xweda dinivîse. Ew dinivîse, wekî sala 1952-a Îsa bi dîtinokê xwe eyan kir û jina serwêrekî nîşan da, ya ku ewî nas dikir. Wê jinê bawarîya xwe li derewekê anîbû, wekî ew talanta xwe û bedewîya xwe nava qulixêda xerc dikir. Nava wededa ewê fikirên derheqa eyanbûnê û dewlemendtîyêda qebûl kiribûn, yên ku dikaribûn li cem wê hebûna. Bi kutasî, ewê ew fikir qebûl kiribûn, mêrê xwe hiştibû û destpê kiribû wê açixîyê bigere, ya ku ewê dixwest.

Xudan bi cûrê mexsûs gote wî qulixçîyî: “*Ew jina zaroka min bû*”, û emir kir, ku ew qulixçî bona wê jinê dua neke. Beşa mayîn hema ji kitêbê raber kirîye:

– Xudan, ew jinê çawa bibe? ,–

– Ewê heta-hetayê nava cîhê nifirkirîyada derbaz bike, li kîderê girî û çeqînîya dirana ye,– Xwedê bersiv da.

Nava wê dîtinokêda min dît, ku ew çawa dikeve çela dojê. Min qîrîna wêye tirsyayî bihîst.

– Ew jin zaroka Te bû, Xudan. Ew Ruhê Teva tijîbûyî bû û qulixî te dikir. Xêncî wê yekê Te emir kir, ku bona wê dua nekim. Ez fem nakim.

Xudan ev gotin anî bîra min: “Eger yek bibîne, ku birê wî guneh kirîye, lê nabe berbi mirinê, bira bona wî dua bike û Xwedê wê jîyanê bide wî. Ez vê yekê hindava wanda dibêjim, yên ku gunehê berbi mirinê nakin. Guneh heye ku dibe berbi mirinê. Ez nabêjim, ku bona wê yekê dua bikin” (A Yûhenna 5:16).

Min gotê:

– Feqet Xudan, min her dem bawar kirîye, wekî nava vê gotinêda derheqa gunehekî usada nivîsar e, rûyê kîjanîda beden dimire û wekî meriv xilazbûyî ye, nenihêrî wê yekê ku ew guneh dike.

– Na xêr, nava vê xeberêda derheqa mirina bedenêda niîvsar nîne,– Xudan got.– Tu tiştên başqe li ser vê xeberê zêde dikî. Eger bi temamî serê pênca, ya A Yûhenna bixwînî, tê bibînî, wekî ew derheqa jîyanê û mirinêda dibêje, jîyana ruhanî û mirina ruhanîda û nava vê gotinêda hema derheqa mirina ruhanîda nivîsar e. Eva derheqa wî bawarmendî da ne, yê ku bi guneha ku berbi mirinê dibe, guneh dike: awa ez bo çi dibêjim, wekî wî çaxî gerekê dua nekî. Min gote te, ku tu bona wê jinê dua nekî, çimkî ewê bi gunehê ku berbi mirinê dibe, guneh kirîye.

– Ew yek bi temamî xwedêzanîya min erdê dixe, Xudan. Tu dikarî diha bi hûrgilî şirove bikî? ,– min pirsî (carna xwedêzanîya me gerekê bikeve, eger ew ne anegorî Xebera Xwedê ye).

Îsa ev gotin ji Încîlê anî bîra min:

Îbranî 6:4-6

4 “Çikmî yên ku carekê hatine ronahîkirinê, pêşkêşa ezmên tam kirine û Ruhê Pîroz par stendine,

5 Usa jî Xebera Xwedê ya qenc û qewatên dinîya wê gerekê tam kiribe,

6 Eger ew ji wê bawarîyê bikevin îdî nabe ku ewana vegerin, ser xweda bên, çimkî ewana careke din Kurê Xwedê nav xweda xaç kirin û kirin sosret”.

Nava vê beşêda çend qewil hatine raberkirinê, derheqa kîjanada em gerekê xeberdin. Ya ewlin, bona ketina ji bawarîyê, meriv gerekê ronahîkirîbe û gerekê pêşkêşa ezmîn tamkirî be. Eva derheqa wan merivadane, yên ku Îsa qebûl kirine, çimkî Ew e pêşkêşa e’zmîn. Ya duda, ew meriv gerekê bi Ruhê Pîroz tijîbûyî be. Ya sisîya, ew gerekê Xebera Xwedê ya qenc û qewatên dinîya wê tamkirîbe. Ji vê navnîşê zelal dibe, wekî ev yek derheqa mesîhîyên zarokda nîne, lê tenê derheqa bawarmendên gihîştîdane.

Ösa qewimîye, wekî meriv hatine cem min û hêsir li çavên wan gilî kirine, wekî naxwezin qulixî Xudan bikin. Paşê ew bi kûrayî poşman bûne û tobe kirine. Wana tirseke mezin texmîn kiriye,

wextê ku ev beş û beşên mînanî vê Încîlêda xwendine. Qerez, zarokên ruhanî rûyê nezanîya xweda bi cûrê aqil gava diavêjin û Xudan wê yekê zane. Xudan nama Îbranîyaye derheqa mesîhîyên zarokda nabêje, lê derheqa bawarmendên gihîştîda dibêje.

Bona berdildahatina merivên xemgîn, ez dibêjim, ku eger wana bi gunehê ku berbi mirinê dibe, guneh kiribin (derheha kîjanîda beşa jorinda nivîsar e), ewê tu cara nexwestana paşda vegerîyana cem Îsa. Ew yek, wekî wana birçîbûn hindava Wî da texmîn kirîye û tobe kirine, wekî tobekirina wana rezê ruhanî daye, îdî nîşan dide, wekî Ruhê Pîroz ew paşda vegerandine berbi tevgirêdana tevî Wî. Eger ev meriv her dem ji Xwedê dûrketîbûna, çaw nava serpêhatîya meda jina wî serwêrî, wanayê îdî nexwesta Îsara nêzîk bûna û jîyana Pîroz derbaz bikirana.

Îsa got, wekî ew jina zaroka Xwedêye rast bû. Ew qulixçîyê, ku ev serpêhatî nivîsîye, bawarîya xwe bi cûrekî usa destpê kiribû, li kîderê bawar nakin, wekî meriv nikare xilazkirina xwe unda bike: ew çareserîya heta-hetayêye bêyî peyman bawar dikin. Bo wê yekê jî ewî got: “Ew bi temamî dinêzanîya min diêxe”. Ew jina zaroka Xwedê ye û navê wê nava kitêba Jîyanêda hatibû nivîsarê. Ewê hetanî xilazîyê sebir nekir, lê heta-hetayê dûrket, bi çûyîna ji vê dinîyayê: bona wê yekê jî navê wê anegorî eşaretîya Îsaye nava kitêba Eyantîyêda, beşa sisîyada, hate resîtkirinê. Ewê qirar kir, ku bi temamî dûrkeve. Ew “serkevtî” nîbû. Bo wê yekê xudanê kaxeza Îbranîya mera dinivîse, ku meriv wî cûreyî nikare bê dasekinandinê. Niha ew îdî du cara mirî bû. Wextekê ew nava gunehên xweda mirî bû, peyîra ewê jîyana heta-hetayê stend, lê careke mayîn nava gunehda mir, û bi temamî ji Xwedê dûr ket (binihêre Cihûda 12).

Çawa ku meriv dikeve nava vî halî, ew îdî nikare ji nûva bibe. Bo wê yekê jî xudanê kaxeza îbranîya dinivîse: “...tiştê bûyînê nîne... wekî ew careke mayîn bona tobekirinê bên hazirkirinê”. Dêmek ew yek şaş e bifikirin, wekî meriv dikare ji nûva bibe.

Îzinê bidin careke mayîn ez biwekilînim: wextê ku meriv vî gunehî dike, wî çaxî îdî xwestina wîye tobekirinê û xwepêşkêşkirina hindava Îsada tune ye. Tu kes nikare xêncî Ruhê Pîroz me bîne cem Îsa. Eger Ew rûyê wê yekêda ji bawarmendê rast dûrkeve,

wekî meriv paşda vekişîya ye, çawa mesela jina serwêre nava serpêhatîya meda, Ewê îdî tu cara paşda venegere. Ev e menî, wekî Ruhê Pîroz dûrdîtî ye. Ew bi hêsanî teslîm nabe.

## Dûxana tarîstanîyê

Petrûsê şandî dîsa me hîn dike:

> "Wextê ku meriv ji bawarîya vê dinîyayê direvin, bi naskirna Xudan û Xilazkirê me Îsa Mesîh..." (Bi Petrûs 2:20, NLT).

Werin em li vir bisekinin û binihêrin, ku Petrûs derheqa kêda dibêje. Eger meriv ji heramîya (xirabîya) vê dinîyayê direvin, bi rîya naskirina Xudan û Xilazkir Îsa Mesîh diçin, ew bêyî, şikberî mesîhî ne. Ew nikarin derewînbin, derheqa kîjanada me serê kitêbêyî derbazbûyîda got, dêmek merivên usa, yên ku qebûl dikin, wekî Xwedê nas dikin, lê bi rastî wî nas nakin. Ew bi rastî ji heramîyên vê dinîyayê bi saya kerema Xudan Îsayê xilazkir revîne. Bêyî şik, Petrûs derheqa wan merivên ku bi rastî ji nûva bûne dibêje.

Bi berdewamkirina xwendinê, em dixwînin:

> "...paşê dîsa dikevine nava wan guneha û bi wê yekê dibine xulam û wî çaxî ew dikevine nava halekî diha xirab ne ku pêşda. Wanra wê diha qenc bûya, eger ewana ev rîya rastîyê nas nekirana, ne ku naskirana lê paşê temîya bona derbazkirina jîyana Pîroz înkar bikirina, ya ku wanra hatibû dayînê" (B Petrûs 2:20,21, NLT).

Petrûs derheqa wan mesîhîyada dibêje, yên ku careke mayîn dagerîyane nava xulamtîya guneh. Wê diha baş bûya, eger wana tu cara, bi destî Îsa Msîh xilazbûn tam nekirana. Wana qirar kir, ku jîyîna Pîroz înkarkin û peyî razîbûnên xwe û kubarîya vê jîyanê herin.

Bona çi wê diha baş bûya, eger wana rîya rastîyê nas nekirana? Cihûda bersiva vê pirsê dide. Mînanî Petrûs ew derheqa wan merivada dibêje, yên ku ji xilazbûnê dûr ketine: "Wey li wan, ku rîya Qayênda çûn, mîna Bilam xalifîn, peyî kara xwe çûn û mîna raberîbûna Qorax bela xwe dîtin" (Cihûda 11).

Him Qayên, him Bilam, him Qorax wextekê tevî Xudan nava tevgirêdanada bûn. Ji wana dudu qulixçî bûn. Şaşîya Qayên ew bû, wekî ewî eşkere gura Xwedê nedikir. Şaşîya Bilam hizkirina hindava parada bû, lê şaşîya Qorax serhildana dijî serwêrtîyê bû.

Cihûda berdewam dike:

> “Evana mesrefên hizkirina weda lekene, tevî we bêxof dixun-vedixun, tenê zikê xwe diçêrînin. Yên ha ewirên bêave ji ber bê çûyî ne, darên payîzêye bêber in, rawava rakirî, du cara hişkbûyî, pêlên behrêye rabûyî ne, ku çawa eyba kirên wê mîna kefê ser dikeve. Ew steyrkên xalifî ne, bona kîjana dûxana tarîstanîyê heta-hetayê xweykirî ye” (Cihûda 12:13).

Li civîna ewlin mesirefa hizkirinê, şîva êvarê bû, wextê kîjanê endamên civînê berev dibûn. Wê yekê heleqetîyên wane tevî Xwedê û yên bi hevra dida kivşê. Mesirefa hizkirinê bi şêwira elametîya pîrozva ser hevda dihat. Nava vê beşêda em titekî hişyarkirinê dibînin: ne hemû kes, yên ku ji bawarîyê dûr dikevin, wê dest ji civînê bikişînin, çawa ku ew jina serwêre nava serhatîya meda kir. Merivên wî cûreyî dibine yên here bi qezîya, çimkî ew li ser bawarmendên zarok jî hukum dihêlin, yên ku hela hê sistin, û birînên ji wana stendî dikarin yên mirinêbin.

Qorax mesela merivê wî cureyî ye. Nenihêrî wê yekê, wekî ew alîkarê Harûn bû, ewî him gote Mûsa û Harûn: “Hûn gelekî dûr çûne. Temamîya Îsraêlê ji alîyê Xudanda hatîye başqekirinê û Ew *tevî me hemûya ye*. Hûn bi kîjan extîyarîyê usa dikin, tê bêjî hûn diha mezinin, ne ku yên mayîne nava cimeta Xudanda” (Jimar 16:3, NLT). Rûyê hukumê Qoraxda 250-î rêber bi cezayê mirinê hatine gunehkarkirinê, lê 14700 meriv jî ji cimetê.

Cihûda dibêje me, wekî ewên ku paşda vedikişin, kîjana ew çawa leke nav dike, nava meda dimînin. Çareserîya wane qelp nava wê kereméda heye, nava kîjanêda ew wextêda bûne, feqet wana ew navhev xistîye, bona xwe jîtine û xofa Xwedê unda kirine. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wextê ku Qorax got, wekî Xwedê “tevî me hemûya ye”. Texmîkirina wîye çareserîya feş hebû, çimkî rojtira mayîn dinîya vebû û saxe-sax ew daqurtand, bire dojê.

Ew yek dide kivşê, wekî ewên ku paşda vedikişin, zanebûnên mesîhîtyê li cem wan hene, ew tevî bawarmendên mayîn nava tevgirêdanadanin, lê wê nekevine nava wan bawarmenda yên ku ser dikevin, bona kîjana Îsayê paşda vegere. Ewê paşda vegere bona civîna bêyî *leke* (Efesî 5:27).

Cihûda dide kivşê, wekî ew meriv *du cara mirîne*. Meriv çawa dikare du cara bimire? Wextekê ew nava guhneda mirî bû: paşê ewî bi saya bûyînê navê jîyîna heta-hetayê stend, lê telebextra, ew careke mayîn mir, rûyê gunehkirinê û tobenekirinêda. Bîr bînin, wekî Aqûb dinivîse, wekî eger mesîhî ji rastîyê dûrkeve û nava wî halîda bimîne, şexsê wî wê *bimire*. Lê Yûhenna dibêje, wekî heye guneh, yê ku bawarmenda berbi mirinê dibe. Herdu jî derheqa *mirina du carada* dibêjin.

Guhdarîyê bidine ser xeberên Cihûda: "...bona kîjana *dûxana tarîstanîyê heta-hetayê* xweykirî ye". *Dûxana tarîstanîyê* cezayê heta-hetaêyî herî xirab e. Em dikarin zelal vê yekê ji xeberên Îsa bibînin, derheqa hatina Wî û dîwanêda. Ew dibêje: "Xwezî li wan xulama, ku çaxê Axayê wan bê, wan hişyar bibîne. Ez bi rastî wera dibêjim, ewê pişta xwe girêde, wan li ber sivirê bide rûniştandinê û berdestîyê wanra bike, lê eger ew xulam dilê xweda bêje:

> "Axayê min hatina xwe derengî diêxe" û destpê bike li xulam û carîya bixe, buxwe, vexwe û serxweşbe, axayê wî xulamî wê rojeke usa bê, ku ew ne hîvîyêye û seheteke usa ku ew nizane. Wê wî têke du qeta û para wî tevî para bêamina bike û ew xulamê ku xwestina axayê xwe zane û hazir nabe, ne jî li gora xwestina wî dike, wê gelekî bê lêdanê. Lê ewê ku bi nezanîya xwe tiştekî hêjayî lêdanê dike, wê hindikî bê lêdanê" (Lûqa 12:37,45-48).

Nava van xeberada gelek înformasîya hene. Em çend tiştên girîng bidine dîyarkirinê. Ya ewlin, guhdarîyê bidine ser, wekî ev gotin li vir derheqa *xulamdane*, lê ne ku derheqa yekî xerîbda, yan jî yekî bêbawar, yan jî gunehkarda. Xulam *xwestina axayê xwe* zanibû, lê li gora xwestina wî nekir. Ev şirovekirina derheqa Serbestda nîne: ewê bikeve nava wan meriva, yên ku nizanibûn û *hindik hatine lêdanê*. Eva usa jî derheqa yê Xapyayîda nîne: ew jî difikirî, wekî xulam bû, lê li gora Cêylon, tu cara xulamekî rast nîbûye. Ew meriv, derheqa kîjanîda Îsa nava vê beşêda dibêje, çawa xulam tê navkirinê û bi temamî xwestina axayê xwe fem dike. Awa binihêrin, ku kî xilazbûna xwe dihêle.

Guhdarîyê bidine ser, wekî evî merivî xulamên xwe dixist. Gilî derheqa bona kara xwe, yan jî razîbûnên xwe, xebitandina merivên başqeda ye. Em dibînin, wekî ew xulam destpê dike bi

roja îroyînva bijî. Ew duxwe, veduxwe û serxweş dibe. Ew destpê dike qulixî xwe bike. Xeberên Cihûda bîr bînin, yên derheqa wê yekêda, wekî merivên paşdavekişyayî tevî mesirefa sivirê dibin, tevî bawarmendên mayîn, bêyî xofa Xwedê. Ew tenê qulixî xwe dikin. Hemû qirarên wana tenê bona kara wanin.

Em derheqa dîwana vî xulamîda dixwînin, wekî para wî kete tevî bêbawara (merivên xilaznebûyî). Bêbawar *hindik hatine lêdanê*, lê ev xulam, yê ku xwestina axayê xwe zanibû û dûr ket, *gelekî hate lêdanê*. Ev yek dide kivşê, wekî ewê gunehkarîya here berk bistîne, ya heta-hetayê mayîna nava gola Agirda, yan jî dûxana tarîstanêda.

## Nebaxşandina tal

Bêyî şik, eva derheqa dilê Gumanbirdane (usa jî jîyana Dubareda). Dilê Gumanbir zanibû, wekî xwestina Cêylon baxşandina meriva bû, lê ew nexwest vê yekê bike. Ewê qirar kir xeyda xweye ji Xirabxeberdankirê xweyî bike. Talaya wê bona herambûna wê derî vekir. Bo wê yekê jî derheqa cimeta Xwedêda nivîsar e: “Hişyar bimînin, ku ji kerema Xwedê tu kes paş nemîne, wekî kokeke tal jî şîn nebe û tengasîyê nede û bi wê yekê gelek bên heramkirinê” (Îbranî 12:15).

Nava feydayê lêkolînkirina Xebera Xwedê û cêribndina qulixa nava salên dirêjda ez hîn bûme, wekî talaya here mezin, ya ku meriva ji Xwedê dide dûrxistinê, nebaxşandine. Mînanî mesela dilê Gumanbir, nebaxşandinê derî bona hemû cûre şaşîya û kirina vedike.

Metta serê 18-da Îsa metelokek derheqa padişakîda gilî kir, yê ku xulamên xwera hesab dikirin. Xulamek anîne cem wî, yê ku deh hezar talent deyndar bû. Talent çapa fînansî nîbû, lê ya giranîyê bû. Bi talentê zêr, (binihêre B Padiþatî 12:30), zîv (G Padişatî 20:39) û hesinên mayîn, yan jî qinyatên mayîn dikişandin. Nava vê metelokêda talent sîmvola çapa deyne: dêmek em dikarin bifikirin, wekî Îsa ew çap çawa çapa pevguhartinê dida xebatê, û gilî derheqa zêr yan jî zîvda bû. Em hesabkin, wekî gilî derheqa zêrda bû.

Talentek nêzîkî 35 kîlogirama bû. Ew dihate hesabê çawa giranîke tomerî, ya ku meriv dikaribû hilda (binihêre D Padiþatî

5:23). Deh hezar talent nêzîkî 350 000 kîlogirama yan jî 350-î tonnaye. Dêmek ev xulam 350-î tonna zêr deyndarê padişê bû. Wextê kö min ev kitêb dinivîsî, wî çaxî girameke zêr nêzîkî 40 dolara bû. Niha bicêribînin hesabkin. Deh hezar talent zêr bahê 14 mîlîard dolara ye. Dêmek ew xulama awqas deyndarê padişê bû. Îsa dida kivşê, wekî deynê wî xulamî bêhesab bû, yê ku wê tu cara nikaribûya ew deyna bida.

Padişê emir kir, ku wî û malebeta wî bifroşin, bona dayîna deyn. Wî merivî xwe avîte ber lingê padişê û reca kir, ku padişa hindava wîda rehmê bide kivşê û padişê hîvîkirina wî razî kir, temamîya deynê wî baxşande wî.

Nava vê metelokêda padişa sîmvola Bav Xwedê ye. Merivê baxşandî ew e, yê ku baxşandina Xwedê bi destî Îsa Mesîh stendîye. Nava jîyana her merivekîda dewsa her neheqîkê deyn pêşda tê. We bihîstîye, wekî meriv dibêjin: “Bona wê yekê ewê heq bide”. Baxşandin wî deynî hêç dike. Deynê wî merivî, usa jî yê me, gelek bû û deynê wî hatibû baxşandinê.

Çi jî hebe, nivîsar e: Lê çaxê ew xulam derket, ew rastî xulam-hevalekî xwe hat, ku sed zîvî deyndarê wî bû, dest kire xeneqê û gotê: “Tu çiqasî deyndarê minî, bide!”” (Metta 18:28).

Zîvek aylixa (miaşa) rojekê bû. Em hesabkin, wekî ew dighîje sed dolarî, anegorî perên îroyîn. Deynê tomerî wê bighîşta deh hezar dolara. Dêmek gilî derheqa xeyda sivikda nîne.

Em xwendinê berdewam dikin: “Hingê hevalê xulam xwe avîte lingê wî, jê lava kir û gotê: “Li min sebirke. Ezê li te vegerînim”. Lê ewî guh neda wî, çû ew avîte kelê, heta ku ew deynê xwe bide” (Metta 18:29,30). Qasî 14 mîlîard dolara li wî baxşandibûn, lê hevalê wî deh hezar dolar deyndarê wî bû, lê ewî ew deyn berneda. Ewî qirar kir, yê pêşberî xwe mecbûr bike, ku wan pera paşda vegerîne.

Ew yek girîng e bidine kivşê, wekî xeydên meye miqabilî hev, himberî neheqîyên dijî Xwedê, mînanî deh hezar dollarê himberî 14 mîlîard dollar ye. Nenihêrî wê yekê, wekî bi çiqasîva xirab hindava weda neheqî kirine, neheqîya meriva nikare himberî wê yekêbe, çi ku me dijî Xwedê kirîye. Diqewime weva bê kivşê, wekî tu kes nava halekî awqas xirabda nîne, çiqas hûnin. Wî çaxî hûn fem nakin, ku

çiqas xirabî hindava Îsada kirin. Ew bêsûc bû: Ew berxê paqij bû, yê ku hate serjêkirinê û deynê meyî 14 mîlîard dolara hilda ser Xwe.

Ew merivê ku nikare bibaxşîne, bîr kirîye ku deynekî çawa mezin li wî hatîye baxşandinê. Wextê ku hûn fem bikin, wekî Îsa hûn ji mirinê û cefayên hetayê-hetayê xilaz kirine, hûnê bi hêsanî neheqîyên meriva berdin. Ji wê yekê xirabtir tu tişt tune, çawa ku heta-hetaya nava gola Agirdane. Li wir tu sivikayî tune. Li wir kurm namire û agir natemire. Ew cîhê meyî dawî bû, hetanî ku Xwedê bi rîya mirina Kurê Xwe Îsa Mesîh nebaxşande me. Eger meriv nikare bibaxşîne, ew fem nake, wekî doje rastî ye. Ewî hizkirin û baxşandina Xwedê fem nekirîye.

Werin em xwendina vê metelokê berdewam bikin:

> "Çaxê xulam-hevalên wîye din ev yek dîtin, gelekî ber xwe ketin û çûn xweyê xwera tiştê ku qewimî bû, gilî kirin. Hingê axê wî gazî wî kir û gotê: "Xulamê xirab! Min hemû deynê te baxşande te bona wê yekê ku te lava ji min kir. Lê ji te nediket, tu jî li xulam-hevalê xwe bihatayî rehmê, çawa ku ez te hatime rehmê?"" (Metta 18:31-33).

Ez dixwezim wê yekê bidime kivşê, wekî nava vê metelokêda Îsa derheqa bêbawarada nabêje. Ew derheqa xulamên padişê, bawarmendên ji nûva bûyî, dibêje. Vî merivî îdî baxşandina deynê xweyî negotî (xilazbûn) stendibû û çawa xulamê padişê dihate navkirinê. Ew merivê, ku wî nikaribû lê bibaxşanda, xulam-hevalê wî bû. Dêmek em dikarin bên ser wê fikirê, wekî ew çi ku paşê qewimî, ew dawîya "bawarmend e" yê ku naxweze bibaxşîne.

Nava vê metelokêda ez tiştekî ecêb dibînim. Wextê ku Îsa metelok gilî dikirin, meriva gerekê bipirsîyana, bona ku şirovekirina wana bizanibûyana. Feqet, Îsa vê metelokê, bêyî hîvîyêsekinandina pirsên meriva, şirove dike. Ez difikirim, wekî menî ew e, wekî gotina Wî awqasî ne anegorî normên merivatîyê bû, wekî Ew gerekê guman bûya, wekî meriva ew yek fem kir. Awa şirovekirina Wî:

> "Û axayê wî hêrs ket, ew da destê zulmdarên kelê, heta ku hemû deynê xwe vegerîne. Usa jî Bavê minî Ezmana wê serwêrîyê li we her yekî bike, eger hûn bi dil nebaxşînine birê xwe" (Metta 18:34,35).

Sê rastîyên girîng hene, kîjana ez dixwezim nava van her du gotinada bidime dîyarkirinê. Ya ewlin, xulamê ku nebaxşand kete

destê zulmdara (yan jî celata). Ya duda, ewî niha gerekê îdî deynê pêşda bida, yê ku 375 tonna zêr bû. Û ya sisîya, wekî Bav Xwedê wê wanara çi bike, yê ku wê xeyda birayê xwe nebaxşînê.

Werin em lez van her sê xala gotûbêj bikin. Ya ewlin, *cefa* dide kivşê, ku êşeke qewîn û cêribandinê bidî fikira mêriv û bedena wî, usa jî ji tabîya wîye sade ji cîh bileqînî. Zulmdar yan jî celat ew e, yê ku cefê dide.

Ew bawarmendê, ku naxweze bibaxşîne, wê ji alîyê ruhên cinada cefê bikişîne. Îzina van celata (zulmdara) hatîye dayînê, ku ew êşê û zêrandinê bidine fikira mêriv û bedena wî. Wextê berevbûna, min gelek cara bona merivên hazir dua kirîye, yê ku nikaribûne qencbûnê, berdildahatinê yan jî azabûnê bistînin û menîya tek-tenê ew bû, wekî wana neheqîyên meriva bernedan û bi dil nedibaxşandine wan. Ev talayî bawar bikî her dem hêrsa dijî Xwedê û xeydê pêşda tîne. Bawarîya mêriv heram dibe, û eger ew tobe nake, nabaxşîne, dawîya wî wê ya tragîkbe.

Xala duda ew e, wekî ew xulama gerekê deynê xweyî pêşdayî mezin vegerîne. Ji wî ew yek tê dewkirinê, çi ku tiştê bûyînê nîne. Gilî derheqa wî deynîdane, yê ku Îsa Golgotayê da. Diqewime hûn xwe bicivînine ser hev, wextê ku hûn vê yekê bixwînin, lê awa binihêrin, ku Îsa nava xebereke mayînda çi dibêje: “Û gava ku hûn disekinin û dua dikin, bibaxşînin, eger tiştekî we hindava kesekîda hebe, wekî Bavê weyî Ezmana jî neheqîyên we bibaxşîne we” (Marqos 11:25).

Bi guhdarî lê binihêrin, ku Îsa li vira berbirî kê dibe: “...Bavê weyî Ezmana...”. Xwedê bona neheqa Bav nîne. Ew bona neheqa *Xwedê ye,* lê bona bawarmenda *Bav e*. Gunekar dua nakin. Dêmek kivş e, wekî Îsa berbirî zarokên Xwedê dibe.

Werin em berdewam bikin. Îsa dibêje: “Lê eger hûn nebaxşînin, Bavê weyî Ezmana jî neheqîyên we nabaxşîne we” (Marqos 11:26). Ji wêya zelaltir îdî nayê gotinê. Ji vir jî em dighîjine xala sisîya: eger meriv nexweze bibaxşîne, ewê cefê bibîne, hetanî ku wî deynî bide, dayîna kîjanî tiştê bûyînê nîne. Ew yek tiştê bûyînê nîne, çimkî tu kes nikare bona şexsê xwe heqê xilazbûnê bide (binihêre Zebûr 49:7, NLT). Îsa dibêje, ku eger hûn nebaxşînin, Bavê we jî wê neheqîyên we nebaxşîne. Gelo hêja ye usa bê kirinê?

Li vir gilî derheqa wî merivîda nîne, yê ku dicedîne xeyda xwe alt bike û dua dike, ku bikaribe bibaxşîne. Em derheqa merivên mînanî dilê Gumanbirda dibêjin, yên ku mêrkîmî naxwezin bibaxşînin. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî nava serhatîya meye alêgorîkda nebaxşandin derî bona xirabîyên başqe vekir û ewê bere-bere xwepêşkêşkirina hindava Cêylonda sekinand. Gelo hêja bû, ku ewê xeyd xweyî bikira û bighîşta dawîya wî cûreyîye tragîk. Careke mayîn, ev e menî, wekî xulamê nama Îbranîya kivş dike, ku em fesal xwe gotûbêj bikin û her cûrekî talayê ji xwe dûrxin, çimkî gelek bi wê yekê heram dibin.

Niha em dikarin xeberên Îsaye derheqa rojên civînêye xilazîyêda fem bikin: “Hingê gelekê ji rê bikevin, nemamîya li hevdu bikin û ber çavê hev bikevin... Ji dest zêdebûna neheqîyê, hizkirina geleka wê sar bibe. Lê kî ku hetanî xilazîyê teyax bike, ewê xilaz bibe” (Metta 24:10,12,13).

Guhdarîyê bidine ser, wekî nava rojên dawîda ne ku çend kes, lê *gelekê* ji rê bikevin. Xebera “gelek” bê sînor e, ya ku dide kivşê, gelekî mezin, yan jî bêhesab. Xeyîd, yan jî nebaxşandin wê bighîne neheqîyê û hizkirina merivaye bêhesab wê sar bibe.

Ew xebera ku nava vê gotinêda çawa “hizkirin” hatîye tercimekirinê, bi yûnanî “agapê”-ye. Gilî derheqa hizkirina Xwedêdane, ya ku dilê mesîhîda wî çaxî hate raxistinê, wextê ku ew xilaz bû. Îsa derheqa yên xapyayîda nabêje, çimkî wana tu cara bi rastî hizkirina Xwedê nestendine. Ew derheqa bawarmendada xeber dide, çimkî Ew dibêje: “Lê ewê ku hetanî xilazîyê teyax bike, ewê xilazbe”. Tu kes wê nebêje merivê neheq yan xapyayî: “Eger tu hetanî xilazîyê teyax bikî, tê xilazbî”. Wan meriva hela hê şuxulkarîya xwe destpê nekirîye.

## Dûrketina ji bawarîyê

Încîl derheqa paşdavekişandina mezinda eşaretîyê dide, ya ku nava bawarmendên rojên meda wê biqewime. Pawlos dinivîse: “Bila tu kes we tu tiştîva nexapîne, çimkî Ewê (Xudan) neyê, *eger şoriş* (yan jî paşdavekişandin) *pêşda neyê*” (B Têsalonîkî 2:3). Û careke mayîn ew dibêje: “Û Ruh eşkere dibêje, ku rojên axirîyêda hinekê ji bawarîyê bikevin” (A Tîmotêyo 4:1).

Menî kîjan e? “Çimkî zemanê bê, ku meriv wê guh nedine hînkirina saxlem, lê wê xwestinên dilê xwera wan dersdara ser hev top bikin, yên ku tiştên li guhên wan xweş tê wê hîn bikin. *Wê guhê xwe ji rastîyê dagerînin* û *peyî çilovîskakevin”* (B Tîmotêyo 4:3,4).

Guhdarîyê bidne ser, wekî nava xebera jorinda Pawlos dinivîse, wekî “Hinekê ji bawarîyê bikevin”. Ew li vir tenê derheqa bawarîya raste hindava Îsa Mesîhda dibêje. Bona ku ev meriv ji bawarîyê dûrketana, ew gerekê zemanekî nava bawarîyêda bûna.

Min beşên Încîlêye ji peymana Nû derheqa wê yekêda raber kirin, wekî bawarmend dikarin ji bawarîyê bikevin. Niha îzinê bidin, ez ji xebatên bavên civînaye eyan bînim ber çava, ji kîjana çend meriv hevalkarên xudanên peymana Nû bûn. Ez dibînim, wekî gotinên wana bi temamî anegorî beşên Încîlêne, yên ku me lêkolîn kirin.

> “Dêmek, werin em bi heqîtî bişuxulin, bona ku xilazbûna xwe hetanî dawîyê (xilazîyê) xweyî bikin”.
>
> – Klêmês Romayî

> “Hema wî çaxî jî, eger kesek nava jîyana xweda gelek karên qenc kirîbe, lê dawîyê serê xwe unda kirîye û ketîye hembêza neheqîyê, hemû cedandinên wîye berê wê bona wî bêfeydabin, çimkî ewî para xwe li dawîya jîyana xwe hişt”.
>
> – Klêmês Îskenderî

> “Hinek difikirin, wekî Xwedê borcdar e wî hemû tiştî bide ne layîqa, çi ku soz daye [bide]. Dêmek ew difikirin, wekî Ew bûye xulamê merdanîya Xwe... Çimkî ne usa ye, wekî gelek paşê dik’evin [ji keremê]? Gelo ev pêşkêşa ji geleka nayê hildanê?”.
>
> – Têrtûlyanos

> “Meriv dikare heqîtîyê dest bîne, ji kîjanê dikare bikeve”.
>
> – Orîgênês

> “Ew wan meriva ji mîratê miqûf dihêle, yên ku gura Wîda nînin û ew îdî zarokên Wî nînin”.
>
> – Hîrînêos

“Bi guhdarkirina tabîya min ya derheqa rastîyên Încîlêda, hineka bi şaşî gotine min: “Con, tu armînîyî”. Ev têrmîna ferhengêda bi vî cûreyî tê şirovekirinê: “Girêdayîye xwedêzanîya Aqûb Armînîyos û peyîhatîyên wîra, yên ku hînkirinên kalvînîstîyê înkar kirin û

bawar dikirin, wekî xwestina mêrive aza himberî serwêrtîya Xwedê ye”.

Ez bersiva vî cûreyî didime merivên wî cûreyî: “Na xêr, ez ne kalvînîme, ne jî armînîme. Ez mesîhîme, yê ku bawar dike, wekî Încîl Xebera Xwedê ya bêşaşî ye”.

Aqûb Armînîyos ji xudanên Încîlê hê derengtir hebû û hela hê dereng, ne ku rêberên civînêye ewlin, navên kîjana me jorê anîne ber çava. Gelo hûn dikarin wan xudana çawa armînî nav bikin. Ber cava ye, ku nikarin, çimkî ew hela hê pêşîya bûyîna Armînîyos dijîtin û dinivîsîn. Ew çi ku ez dinivîsim, fikirên min, yên şexsî nînin, yan jî femdarîya min nîne, lê rastîya peymana Nû ye, ya ku zelal nava Încîlêda eyan bûye. Xwedê gelekî zelal eşaretîya xwe derbazî li me, bawarmenda kirîye. Em gerekê fesalbin, ku mektebên xwedêzanîyêva girêdayî nîbin, lê bona hemtêksta Încîlê vekirîbin, ya ku bi Ruhê Pîrozva ruhdarkirî ye, çimkî:

> “Temamîya kitêba Pîroz ji bêhna ber Xwedê ye û kêrhatî ye bona hînkirina meye wê yekê, ya ku rastî ye, û dide femkirinê, ku nava jîyana meda şaşî kîjan e. Ew me dide rastkirinê û me hîn dike, ku em rast bişuxulin. Ew mecala Xwedê ye, bona ku me bi hemû cûreyî hazir bike...” (B Tîmotêyo 3:16,17, NLT).

Tiştekî hewaskar e bidine kivşê, wekî ew rêberên feş, yên ku ji alîyê Îsada eşaretîya berk distendin, dora mektebên xwedêzanîyêye cuda-cuda berev bibûn û anegorî wana hîn dikirin. Qerez, Încîlêda gelek cara derheqa Yûhennayê Nuxumdar, Îsa û merivên başqeda hatîye nivîsarê, yên ku derheqa rastîyêda xeber didan, wekî wana hîn dikir. “...mînanî yekî xweyhukum... ne ku mîna qanûnzanên wan” (Metta 7:29). Bo wê yekê jî Pawlos Tîto şîret dike: “Van tişta hînke, bi temamîya hukumê xwe dil bide wan (yan jî bi serwêrtîya xwe)” (Tîto 2:15). Ew usa jî Tîmotêyora dinivîse: “...ku li Efesê bimînî... wekî temîyê bidî çend kesa, ku hînkirina xerîb (bîyanî) hîn nekin” (A Tîmotêyo 1:3). Pawlos usa jî emirî li ser Tîmotêyo kir:

> “Xeberê dannasîn û terîf bike. Texmînkirina xweye lez xweyke [her dem nêzîk û hazirbe], nenihêrî wê yekê, ku mecal kardar e yan na [nenihêrî wê yekê, ku ew fesal e yan ne fesal e, tiştê xwestinê ye, yan nexwestinê ye, tu çawa terîfkirê Xeberê, gerekê nîşanî meriva bidî ku jîyanên wana çi cûreyî şaşin]. Li şaşîya hilê, û rastke, eşaretîyê

bide û dil bide meriva, bêyî westandin, bi temamîya sebirê hînke” (B Tîmotêyo 4:2, AMP).

Nava Efesî 6-da Pawlos hîvî dike, ku bona wî dua bikin, wekî “... ezê bona wê turuşkim xeberdim çawa lazime” (xeber 20). Vî alîyê xeyset hûn dikarin li cem hemû pêxemberên Xwedêye rast bibînin. Serwêrtîya wana nava Xebera Xwedêda ye. Ewê dora hestê xweye şexsî, mektebên Xwedêzanîyê, yan jî fikira piranîyê berev nebin. Carna piranî jî dikare şaş bibe. Em gerekê bizanibin, wekî fikira Xwedê ew e, çi ku dibêje û wekî Ew wê yekê dibêje, çi ku difikire.

## Xwe zelal xweyîkin

Hînkirina ketina ji keremê, ya ku nava Încîlêda eyan e, nava gelekada tevhevbûn pêşda anîye. Ew navhevketî hatine cem min û gotin: “Ez difikirîm, wekî çareserîya meye heta-hetayê heye”.

Wextê pirsên usa, ez dibêjim: “Bêfitîya, ew rast e. Çareserîya meye heta-hetayê heye. Îsa got, wekî wê wana unda neke, yên ku Bavê dane Wî (binihêre Yûhenna 18:9), çimkî Ewê me nehêle û neçe. Feqet Ewî got, wekî em dikarin Wî bihêlin”. Peyî van xeberara meriv bi nihêrandina xemgînbûyî li min dinihêrin. Ez xebera xwe berdewam dikim: “Eger hûn bi rastî Îsa Mesîh hiz dikin, hûnê bo çi bixwezin ji Wî dûrkevin. Hûnê nexwezin Wî bihêlin, eger hûn bi rastî Wî hiz bikin”

Eger hûn Xwedê hiz dikin, bona we wê dijwar nîbe temîyên Wî xweykin. Eger qulixa bona Xwedê dibe borcdarî, wî çaxî hûn ketine nava heleqetîyên qanûnparêzîyê û bona we wê dijwarbe temîyên Wî xweykin. Em gerekê qulixî Xwedê nekin, bona stendina begemîya Wî: em gerekê qulixî Xwedê bikin, çimkî em bengîyî li ser Wî bûne. Cihûda temîyê dide me, ku em hizkirina xwe bi cûrê teze xweykin, nenihêrî wê yekê, wekî li civînê hukumên xirab hene. Ew dinivîse: “Xwe nava wê hizkirina Xwedêye hindava xweda xweykin, hîvîya rehma Xudanê me Îsa Mesîhbin, ku jîyana heta-hetayê bide we” (Cihûda 21). Em gerekê her roj û her gav Xudan bigerin. Em gerekê Wî hiz bikin û her dem Wî bigerin, wekî Ew bi cûrê diha qewat Xwe li me eyan bike, çimkî “her kesê ku bona vê yekê gumana xwe danîye ser Wî, ew xwe usa paqij dike, çawa ku

Mesîh paqij e” (A Yûhenna 3:3). Yûhenna mexsûs derheqa eyantîya Îsa Mesîhda digot.

Eger hûn Wî bigerin û tevî Ruhê Pîroz bikvine nava heleqetîya, hûnê tu cara nexwezin dûrkevin. Bo wê yekê jî hewcetîya tevhevbûnê tune. Sozdayîna min, ya here hizkirî ye nava Încîlêda, li dawîya nama Cihûda ye. Cihûda dibêje wana: ewên ku li ser Xwedê bengî dimînin û eyantîya Îsa digerin:

> “Wîra, yê ku dikare we ji ketinê xweyî bike û li ber rûmeta Xwe ya bêqisûr eşq bide sekinandinê, Xwedêyê bêşirîkî-bêheval, Xilazkirê mera, bi destê Îsa Mesîhê Xudanê me, şikir û mezinayî, qudret û hukumatbe, berî her-heyê û niha jî û heta-hetayê! Amîn!” (Cihûda 24:25).

Eva duakirina min ya germ û xwestina min bona we ye.

SERÊ 7-A

# BINGEH

*"...Ew merivê heq, yê ku berbi daxustinê naçe, hîmê wî yê heta-hetayê ye".*
— Gotinên Silêman 10:25, AMP

Pêşîya paşdahatina li ser serhatîya Afabêlêye alêgorîk û pêşîya raberkirina wan dîwana û heqdayîna, yên ku wê Xwehiz û Xêrkir bistînin, emê wî hemû tiştî bidine tomerîkirinê, derheqa çida me nava her sê serên kitêbêda xeberda. Werin em beşeke Încîlê bîr bînin, ya ku serê kitêbêyî çarada hatîye raberkirinê:

> "Dêmek, werin em pêşda herin û derbazî hînbûnên Mesîhe ji destpêkê bibin, bi îzbatî berbi tomerîbûnê û gihîştîbûnê herin, yên ku anegorî gihîştîbûna ruhanîne. Werin em careke mayîn... bingeha dîwan û cezayê heta-hetayê daneynin. [evana ew hemû tiştin, derheqa kîjanada hûn gerekê zûva haj pê hebûna]" (Îbranî 6:1,2, AMP).

Bi tunebûna bingeha îzbatbûyî, yê dîwan û cezayê heta-hetayê, emê nikaribin jîyana xweye nava Mesîhda çêbikin. Çawa himberîhevkirin bînin ber çavê xwe, wekî kesek dicêribîne xwendina (perwerda) baş bistîne, lê zanebûnên wîye hîmlîye ji mekteba destpêkê tunene, mesele, nezanîya nivîsarê û xwendinê. Eger bi guhdarî Mizgînîya lêkolîn bikin, hûnê bibînin, wekî Îsa diha gelekî derheqa dojêda xeber dida, ne ku E'zmînda. Ewî ew yek dikir ku nava jîyana meda bingeh danîya, ya ku xofa Xudan e. Awa meselek:

> "We çi tarîyêda gotîye, ewê ronahyêda bê bihîstinê û we çi li malê guhada, li piş derê girtî, xeberdaye, ewê li ser bana bibe dengî. Hevalên giranbiha, ji wana netirsin, yên ku dixwezin we bikujin. Ew dikarin tenê bedenê bikujin, ji wê pêştir tiştekî din nikarin bikin. Lê ezê wera bêjim ku hûn ji kê bitirsin. Ji Xwedê bitirsin, Yê ku dikare meriva bikuje, lê paşê wana biavêje dojê" (Lûqa 12:3-5, NLT).

Ev xeberdan gelekî zelal e: wextê ku em hînbûna ceza û dîwana heta-hetayê fem dikin, xofa Xudan dilên meda qewîn îzbat dibe û dimîne.

Îzinê bidin şirove bikim. Tenê Xwedê dikare qirara bona derbazkirina heta-hetayê li dojê qebûl bike. Ew çi ku me veşartî gotîye, bin ronahîya rûmeta Wî da wê wextê dîwanê eyan bibe. Ne tenê gotinên meyê eyan bibin, lê usa jî menîyên me, nêzîkbûn û îşên me. Xofa Xwedê her dem tîne bîra me, wekî tu tişt ji Wî nikare bê veşartinê, usa jî titên here veşartî. Em zanin, wekî tu tişt wê ji dîwana Wî der nemîne û dîwana Wî ya heq e. Eger em vê yekê fem nekin, emê bên xapandinê, emê bawar bikin, wekî Xwedê neheqîyên me hesab hilnade, yan jî nabîne, û berdildahatinê bibînin, ne nava rehma nivîsarên pîrozda, ya ku bi rastî tune (mînanî yê Xapyayî, dilê Gumanbir û jîyana Dubare). Em dikarin bibine yekî ji wan merivên rojên dawî, yên ku ji xwepêşkêşkirina nehejyayî berbi neheqîyê dixalifin.

Ew merivên ku li cem wan ev bingeh tune, wê bikevine wê telê, li kîderê ewê ji meriva bitirsin, lê meriv jî ji kê ditirse qulixî wî dike. Eger em ji Xwedê bitirsin, emê bin hukumda jî gura Wî da bin. Eger em ji mêriv bitirsn, emê cî bidine meriva, bi taybetî bin hukumda û emê berbi razîbûnên xwe, xwestinên bedenê û kubarîyê bixalifin. Cîhdayîna bona tebyeta bedenî wê li ber pirsgirêka bide sekinandinê. Dêmek, eger em rastîya dîwan û cezayê heta-hetayê fem nekin, emê nava xofa Xudan da şaşbin, çimkî tirsa pîroz alîkî tirsa Xudan e, ya nava dîwanên Mesîhda. Pawlos vê fikirê vî cûreyî şirove dike:

> “Çimkî gerekê em hemû jî li ber dîwana Mesîh bisekinin, wekî her kes weke wan emelên qalibê xweda kirî bistîne, çi ku kiribe, qencî yan jî xirabî. Awa em ku haj ji xofa Xudan hene, dikin, ku meriva bînine rayê...” (B Korint’î 5:10:11).

Pawlos derheqa dîwana textê Sipîyî Mezinda nedigot (derheqa kîjanîda Îsa Lûqa 12-da digot), wextê kîjanê merivê bêne gunehkarkirinê û wê herine dojê. Ewî derheqa dîwana bawarmendada digot. Emê derheqa wê dîwanêda serê kitêbêyî mayînda xeberdin, lê guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Pawlos xofa Xudan himberî dîwana Mesîh dike. Ew usa jî dîwana Mesîh

çawa tirsa Xudan nav dike. Fikira vê xeberê ew e, wekî meriv nikare fikira derheqa dîwanêda ji tirsa Xudan cöda bike, û wekî xofa Xudan kilîta jîyana aqilmendîyê ye.

Niha xeberên Îşaya pêxeber guhdar bikin: “Ewê bibe bingeha wedê teyî qewîn, imbara xilazbûnê, serwaxtîyê û zanebûnê: xofa Xudan kilîta vê xiznê ye” (Îşaya 33:6, NIV).

Xofa Pîroz bingeha Xwedê ya qewîn e. Xeberên Îsa bîr bînin, yên ku serên kitêbêye derbazbûyîda hatine raberkirinê, kîjanada ewî derheqa wan elaletada digot, yên ku bi navê Wî ecêba dikin, lê wê bên înkarkirinê û berbi cezayê heta-hetayê herin. Tiştê ecêb nîne Metta-7-da, peyî van gotinara, Îsa carekêra destpêkir şirove bike, wekî menîya ketina wan bingeha wan bû. Wana jîyana xwe li ser wan cûrên fikirdarîyê çê kiribûn, yên ku nikaribûn li ber bagerên jîyanê teyax bikirana. Bi xeberên Îsa:

> “Dêmek, kî ku van gotinên Min dibhê û wana diqedîne, ew mîna merivekî serwaxt e, yê ku mala xwe li ser zinar çê dike. Baran barî, ba û lêyî rabû, û bayê ajote li ser wê malê. Lê ew mal neket, çimkî li ser zinar çêkirîbû [li ser bingeha Xwedê, ya qewîn, xofa Xudan]. Lê kî ku van gotnên Min dibhê û naqedîne, ew mîna merivekî bêfem e, yê ku mala xwe li ser qûmê çêkir. Baran barî, ba û lêyî rabûn, bayê ajote li ser wê malê û ew ket. Û ew ketin tiştekî gelekî xirab bû! (Metta 7:24-27, TEV).

Ew merivên ku hetanî dawîyê sebir dikin, bi saya bingeha xweye qewîn li ber bagera teyax dikin. Ew bingeh xofa Xudan e, ya ku qewînbûnê tîne nava jîyana me. Ew imbara dewlemendîya Xwedê ye. Xilazbûn, serwaxtî û zanebûna Wî, nava wêda hatîye xweyîkirinê.

## Xofa Xudan

Xofa Xudan çi ye? Gelo ew dide kivşê, ku gerekê hindava Xwedêda tirsê texmîn bikin? Na xêr. Gelo em çawa dikarin tevî Xödan nêzîkbin (ew xwestina dilê Wî ye), eger ji Wî bitirsin. Wextê ku Xwedê hat ku Xwe li Îsraêlê eyan bike, meremê Wî ew bû ku tevî cimetê bikeve nava heleqetîya, çawa ku Mûsa tevî wî nava heleqetîyada bû, lê temamîya cimetê revî, nexwestin nêzîkî Wî bibin. Mûsa gote cimetê: “*Netirsin*, çimkî Xwedê hatîye we

bicêribîne, û *wekî tirsa Wî* li *pêşîya webe*, ku hûn guneha nekin" (Derketin 20:20, NKJV).

Tê bêjî Mûsa bi xwe dijî xwe derdiket, lê usa nîne. Ewî tirsa ji Xwedê û xofa Xudan cuda dikir, çimkî nava wanda firqî heye. Ew merivê ku ji Xwedê ditirse, tiştê wîyî veşartinê heye. Bîr bînin, ku Adem çi kir, wextê ku li baxçê Êdêmê ji gura Xwedê derket: ewî ji hazirîya Xudan xwe veşart. Qerez, merivê ku tirsa Xwedê li cem wî heye, ditirse ku wê ji Xwedê dûrbe û rûyê gurênekirinêda direve. Dêmek, şirovekirina ewlin, ya xofa pîroz ew e, ku meriv gerekê ji dûrbûna Xwedê bitirse.

Werin em şirovekirina xofa Xudan berdewam bikin. Heyîna xofa Xudan dide kivşê, wekî meriv gerekê himberî her merivî, ji her tiştî zêdetir qedirê Wî bigre, Wî qîmet bike, bi qedirgirtin û bi xofê nêzîkî Wî bibe. Xofa Xudan dide kivşê ku gerekê wê yekê hiz bikin, çi ku Ew hiz dike û wê yekê hiz nekin, çi ku Ew hiz nake. Ew çi ku Ew bona me girîng hesab dike, bona me girîng e û ew çi ku bona Wî girîng nîne, bona me jî girîng nîne. Wextê ku xofa Wî li cem me heye, em *ji Xebera Wî dilerizin,* û ew yek dide kivşê, wekî em carekêra gura Wî dikin, wî çaxî jî, wextê ku ew yek çawa tiştekî bêfikir tê texmînkirinê, wextê ku ew yek diêşîne û wextê ku em tu karekê ji wê yekê nabînin. Û em hetanî dawîyê gura Wî dikin. Kivşbûna xofa Xudan kirina gura Xebera Wî, rê û temîyên Wî ye.

Încîl li me eyan dike, wekî xofa Xudan destpêka serwaxtîyê ye. Meriv usa jî dikare bêje, wekî ew *bingeha* serwaxtîyê ye. Serwaxtî, derheqa kîjanêda emê diha bi kûrayî serên kitêbêye mayînda xeberdin, vê yekê dide kivşê: zanebûn û karebûnê, ku wededa qirarên rast qebûl bikin. Ew merivên ku bin hukumdanin qirarên şaş qebûl dikin, serwaxtîya wan kêm e, lê kanîya serwaxtîyê jî xofa Xudan e.

Încîl eyan dike, wekî em jîyana xwe dikarin himberî çêkirina malê bikin. Pêşda bingeh tê danînê, lê paşê avayî tê sekinandinê. Nivîsar e: "Malê bi serwaxtîyê bê çêkirinê" (Gotinên Silêman 24:3). Eger em bi qebûlkirina qirarên rast jîyana xwe çêbikin, emê bi cûrê rast bijîn û li ser xwe guman li ber dîwana Mesîh bisekinin. Destpêka serwaxtîyê, yan jî bingeha wê xofa Xudan e.

## Çi cûreyî nexalifin?

Mesîhî wê nexalifîyana, eger xofa Xudan dilên wanda qewîn nikandî bûya. Emê ji xwepêşkêşkirina qewîne hindava Îsada neşimitîyana û nexalifîyana. Meyê Xebera Wî kêm qîmet nekira, û ne jî bi sivikayî nêzîkî wê bûna. Meyê tevî guneh nelîsta, rûyê çida dilê bawarmend berk dibe û dawîyê ew ji keremê dikeve (binhêre Îbranî 3:12,13). Meyê her dem bizanibûya, wekî ew çi ku veşartî hatîye gotinê û hatîye kirinê, wê li dîwana Mesîh bi dengê bilind bê elamkirinê.

Awa binihêrin ku Xwedê derheqa bawarmendên peymana Nûda çi gote Yêrêmîya:

> "Û ewê bona min bibine cimet, lê Ez bona wana Xwedê. Û Ezê dilekî û rêyekê bidime wana, wekî ew her dem (yan jî heta-hetayê) ji Min bitirsin, bona ku bo wana û peyî wanra bo zarokên wana baş bibe. Û Ez peymana heta-hetayê tevî wana datînim, bona ku ji wana venegerin, ji kirên wane qenc, û xofa Xwe daynime nava dilên wan, bona ku ji min dûrnekevin" (Yêrêmîya 32:38-40).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Xwedê derheqa cimeta Xweda dibêje: "*...bona ku her dem (yan jî heta-hetayê) ji Min bitirsin... ku ji Min dûrnekevin*".

Berevbûneke li Malazîyayê tê bîra min, li kîderê Ruhê xofa Xudan bi cûrê qewat eyan bû. Li wê derê ji temamîya beşa dinyayêye rojhilatê meriv hazir bûn: sera, li kîderê min terîf dikir, bi xwendikarên mekteba Mizgînîyê, serwêra û merivên başqeva tijî bû. Dawîya qulixê gelek meriv êdî li ser erdê, li ber dikê, paldayî bûn û ji kontrolê der digirîyan.

Li wî cîhî, tirsa Xudan gelekî ecêb bû. Ez nişkêva fikirîm: "*Con Bîvêr eger tu gaveke şaş bavêjî, yan jî tiştekî şaş bêjî tê li vir bimirî*". Gelo tiştê usa wê biqewimîya? Ez nizanim, lê ez dikarim bêjim, wekî nava peymana Nûda derheqa mêr û jinekêda nivîsar e, yên ku nava atmosifêra wî cûreyîda şaşî kirin û mirin. Encamê dîwana wana ew bû, wekî "tirseke mezin kete ser temamîya civînê û wan hemûya, yên ku ev yek bihîstin" (Karên Şandîya 5:11).

Peyî wê berevbûnêra mêr û jinekê, yên ku ji Hindistanê bûn, nêzîkî min bûn û gotin:

– Con, em paqijîke usa zor xweda texmîn dikin!

– Belê, ez jî usame,– min bersiv da.

Sibetira mayîn min li oda mêvanxana xwe ev xeber dît: “Xofa Xudan pîroz e, *ew heta-hetayê dimîne*” (Zebûr 2:9).

Ruhê Pîroz carekêra dilê minra xeberda û got: “Lyûsîfêr milyaket bû, yê ku serwêrtîya hebandina ezmîn dikir. Ew rûnkirî bû, bedew û duakirî bû, lê ji Min neditirsîya: *ew heta-hetayê nema*”.

Ez dora vê yekê difikirîm û min nişkêva bihîst: “Yek sêanîya milyaketa, yên ku dora textê Min digirtin û rûmeta Min didîtin, ji Min neditirsîyan. *Ew heta-hetayê neman*”.

Ez ji wê yekê zendegirtî mabûm, çi ku Xwedê li min eyan kir. Min careke mayîn bihîst: “Adem û Hêwa nava hazirîya rûmeta Min da digerîyan. Ew tevî Min nava heleqetîyada bûn, lê ji Min neditirsîyan. *Ew nava hazirîya Min da heta-hetayê neman*”.

Xudan karebûna mayîna heta-hetayê dide me. Bi saya wê em her dem gura Xebera Xwedêdanin. Încîl eşaretîyê dide bawarmenda: “Dêmek ew sozê ku bona ketina nava rihetîya Wî hê dimîne, werin em *bitirsin*, ku ji we tu kes ji wê rihetîyê nemîne” (Îbranî 4:1, NKJV). Tiştekî hewaskar e, wekî xudanê nivîsarê xebera “tirs” lê ne ku “hizkirin” daye xebatê. Ew tirsa Xwedê ye, ku îzinê nade me, ku em berbi guneh vegerin.

## Mizgîndarê eyan

Ezê tu cara seredana xweye li cem terîfkirekî eyan bîr nekim, yê ku li hebsê sala dawî, ya cezayê girtina xweye pêncsale, derbaz dikir. Girtina wî li temamîya dinîyayê eyan bibû û eybeke mezin anîbû li ser padişatîya Xwedê. Qerez, nava sala xweye dawîda, ya li hebsê, ew rastî Xudan hatibû. Wextê hevdîtina me tiştê ewlin ku ewî gote min ev bû:

– Con, ev hebsa bona min dîwana Xwedê nîbû, lê rehma Wî bû. Eger min jîyana xwe usa berdewam bikira, çawa ku ez dijîtim, minê heta-hetayê dojêda derbaz bikira.

Ewî carekêra bala min kişande ser xwe. Min fem kir, wekî min merivekî Xwedê, dilê kîjanî şikestî bû û xulamê Mesîh yê rastra xeber dida. Min zanibû, wekî destpêka qulixa xweda ew gelekî bengîyî ser Îsa bibû. Bawarîya wîye bi qewata mezin ber çava bû.

Bona min ew yek çawa pirs bû, ku ji Xudan awqasî dûrket, çimkî ew li ser xala qulixa xweye bilind bû. Min jê pirsî:

We kengê terka hizkirina Îsa da?

Ewî li min nihêrî û bêyî navbirî bersiv da.

– Tu cara!

Min zendegrtî bersiva wî da:

– Lê hûnê çawa wan xapandinên bi postê kirî û bêesilîya xweye nava hevt salên qulixa xweye dawîda şirove bikin, bona çi hûn niha li hebsê ne?

– Con,– ewî got,– min her dem Îsa hiz dikir, lê ez ji Xwedê neditirsîyam. Ew serwêrê jîyana min, Yê sereke, nîbû.

Peyî wê yekêra ewî tiştekî usa got, wekî bala min kişande ser xwe:

– Con, li Amêrîkayê bi mîlyona mesîhîyên mînanî min hene. Ew Îsa çawa Xilazkirê xwe nav dikin û Wî hiz dikin, lê ji Wî natirsin, çawa Xudanê wanî sereke.

Nava minda ronahî hate raxistinê. Min fem kir, wekî em dikarin Îsa hiz bikin, lê tenê ew yek wê me ji ketinê xweyî neke. Em gerekê usa jî ji Xwedê bitirsin. Xeberên Mûsa bîr bînin: "Xwedê hatîye, ku we bicêribîne û *wekî tirsa Wî li pêşîya webe, ku hûn guneha nekin*" (Derketin 20:20, NKJV). Tirsa Xudan ya ku karebûna teyaxkirinê dide me, bona ku em ji gurêkirina Xwedê dûr nekevin, mînanî Lyûsîfêr, yek sêanîya milyaketa, çawa Adem û usa jî ew merivên civînê, yên ku van rojên dawî wê paşda vekişin.

## Xilazbûna xwe mîyaser bikin

Bo vê yekê jî Pawlos temîyê dide me: "Bixebitin (hazirkin, *mîyaserkin* û *bi temamî bighîjine dawîyê* (xilazbûna xwe bi *tirs* û *xofê* û *lerizandinê* mîyaser bikin). Bêaminîya hindava şexsê xweda, gelekî fesal, bi îsaf, bi kontrolkirina dijî mesirefa, bi tirs dûrketina ji her tiştî, çi ku dikare navê Xwedê û navê Mesîh bêhurmet bike" (Fîlîpî 2:2, AMP). Em bi *tirs* û *xofê* xilazbûna xwe mîyaser dikin û dighînine dawîyê. Em wê femdarîyê xweyî dikin, wekî her fikirek, gotinek û karek wextê dîwanê wê eyan bibe. Bi bîranîna derheqa vê yekêda em şikestî dimînin, hişyar dimînin û pêra jî derheqa wan menîyada zanin, yên ku me ji rê derdixin. Fikirdarîya derheqa vê yekêda me

def dide ku em her dem ji wî hemû tiştî dûr bimînin, çi ku dikare bona Xwedê nebaşbe.

Guhdarîyê bidine ser, wekî Pawlos nabêje, wekî em bi temamî bi hizkirin û bi qencî xilazbûna xwe dighînine dawîyê. Xofa Xudan qewatê dide me, ku em ji kerema Wî nekevin û nekevine nava neheqîyê. Ji alîkî mayîva jî hizkirina Xwedê me ji qanûnparêzîyê dûr xweyî dike, ya ku nêzîkaya tevî Xwedê xirab dike. Hizkirina meye hindava Xwedêda alî menî û fikirên me dike, ku em qewata xwe xweyî bikin û ji rastîyê nexalifin. Nava jîyana meda ev her du qewatên mezin gerekê bişuxulin, hizkirin û xof, bona ku heleqetîyên meye tevî Xwedê saxlembin. Bo wê yekê jî Pawlos Xwedê çawa Bavê meyî Ezmîn û Abba (fikira vê xeberê Bav e) nav dike, lê usa jî dibêje, wekî Xwedêyê me agirê peritandinê ye (binihêre Îbranî 12:29). Ew hizkirin e, lê Ew usa jî Hakimê heq û pîroz e. Eger em ji wî netirsin, emê teyax nekin, lê Îsa her dem dibêje: “Ewê ku teyax bike hetanî dawîyê, ewê bijî” (Metta 10:22).

## Hukumê me

Em gerekê derheqa hînbûna dîwan û cezayê heta-hetayêda bi menîke mayîne girîng jî bizanibin, ya ku hukmê meyî li ser merivên mayîne. Eger xofa Xudan li cem me tunebe, emê Mizgînîya nebalanskirî derbazî li ser meriva bikin, yan bi gotina, yan jî bi kar. Nava feydayên wê yekêda, merivên bin hukumê meda dikarin rastî qezîya paşdavekişandinê û undakirina heta-hetayê bên.

Eger em, dersdar û serwêrên Mizgînîyê, van hînkirina nizanibin, wî çaxî emê ji çapê zêdetir derheqa van prînsîpên duakirî, gulvedayî û jîyana bextewar bidin dîyarkirinê, derheqa kîjanada Încîl hîn dike. Ev prînsîp wê usa bişuxulin, çawa ku têra hatîye dîtinê: ewê saxlemîyê, açixîya fînansî, aşîtîyê pêşda bînin, heleqetîyên tevî merivaye diha baş û tiştên mayîn bînin. Qerez, eger fikirdarîya meye derheqa dîwanên heta-hetayêda tune, emê ji terîfkirina derheqa xaç û wî bihayîda paşda bisekinin, kîjanî gerekê bidin, bona ku peyî Îsa herin. Emê diha gelekî banga terîf bikin, yên ku li meriva xweş tên, lê ne ku emê bang bikin, ku bi her awayî em jîyana xwe bona Xwedê daynin.

Eger em bi heta-hetayêva nelivin, emê bijîn û tevî meriva nava heleqetîyadabin, berê ewlin emê nava jîyanêda kara xwe bigerin, emê jîyanê ji alîyê heta-hetayêda nenihêrin. Emê meriva hînkin, ku bona roja îroyîn bijîn, lê ne ku çawa kal û bav dijîtin, yên ku hîvîya “ew bajarê xweyî rikinê miqerim efrandar û avakirê kîjanî Xwedê ye” bûn (Îbranî 11:10).

Belê, nava vê jîyanêda bona gurêdabûna hindava prînsîpên Xwedê heqdayîn hene û me gelekî bi hûrgilî derheqa wê yekêda hîn kirîye. Feqet bîr nekin, wekî jîyana meye li ser vê dinîyayê wedelû ye. Em gerekê nava vê jîyanêda bighîjine açixîyê, gerekê wê yekê anegorî normên Ezmîn, lê ne ku anegorî kûltûra me bikin. Mala meye rast li vir nîne.

Bi guhdarî derheqa menîyên wan pîrozada bixwînin, yên ku ev dinîya bona çûyîna li peyî Xwedê hiştin’

> “Ev hemû jî bawarîyêda mirin, lê sozên Xwedê nestendin. Ewana tenê ji dûrva soz dîtin, şa bûn û xwe mikur hatin, ku ew merîne, xerîb firarîne li ser dinîyayê. Ewên ku tiştên wa dibêjin, didine kivşê kö ew welatekî bona xwe digerin. Û eger bona wî welatî bîr bianîna, ku ew ji kîderê derketibûn, mecala wan wê hebûya vegerîyana wir. Lê ji ber wêva demana welatekî hê qencda bûn, wa gotî yê Ezmîn. Lema Xwedê vê yekêda şermîyê nabîne, ku ew jêra Xwedê bêjin, çimkî Ewî bona wan bajarek hazir kirîye (Îbranî 11:13-16).

Ew welatê ku pîrozî lê digerîyan, bajarê Xwedê ye, Orşelîma Nû, û emê guhdarîya xwe hetanî dawîya vê kitêbê bidine ser wî. Ew merivên ku wê vî bajarîda bijîn ew in, yên ku *ser dikevin*. Heqê wana wê bêsînorbe, lê ne ku jîyana here başe li vê dinîyayê.

## PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

### BEŞA SISÎYA, SERÊN 6-7

1. Bi fikira we, ji menîyên çûyîna peyî Mesîh kîjan dikare bona we diha balkêşbe, ne ku nêzîkaya weye şexsîye tevî Îsa? Gelo çi dikare alî we bike, ku hûn her dem dilê xwe berbi meremê herî girîng vegerînin?

2. Ew fikira, ku bawarmend dikare bi rezedilîya xwe ji bawarîyê dûrkeve, ya hişyarkir e. Ew yek dijî fikirên we ye? Bersiva pirsê bin ronahîya vê rastîyêda bidin: çawa bawarmend, em gerekê ne ku bi tirsê, lê bi xofa Xudan bijîn.

3. Derheqa meteloka xulamê bêrehmda bifikirin, ya ku Metta 18:23-35-ada nivîsar e. Bi fikira we bona çi Xwedê bi guhdarîya wî cûreyî nêzîkî baxşanlinê dibe?

4. Bi xeberên xwe şirove bikin, ku çawa dîyarkirina şaşe li ser rehma Xwedê, ya ku bi xofa pîrozva balanskirî nîne, dikare bawarmend berbi xapandinê bibe.

5. Fikira meye derheqa heta-hetayêda ne tenê hukumî li ser me dike, lê usa jî hukumî li ser merivê dor-bera dike. Bi fikira we, meriv çawa dikare derheqa zêdayên dinyayêye bona çûyîna peyî Xwedê terîf bike (mesele saxlemî, açixî, yan jî razîbûna hundur) û ji meremê meyî herî girîng nexalife?

# BEŞA ÇARA

SERÊ 8-A

# PADIŞATÎYA AFABÊLÊ: ROJA DÎWANÊ B

*“...Ezim, Yê ku fikira (fikira û merema) û [hundurda] dila,*
*û Ezê anegorî kirinên we her yekî bidime we*
*[heqê bona kirina we]”.*
— Eyantî 2:3, AMP

Em paşda vegerine li padişatîya Afabêlêye alêgorîk û em bidine zelalkirinê, ku Xwehiz û Xêrkir rastî çi hatin. Bi saya wan emê eşkerekirinên girîng derheqa dîwana bawarmendada bikin, ji kîjana yek jî ew e, wekî hemû bawarmend wê heqê weke hev nestînin.

## Dîwana bawarmenda

Ev dîwan şebeqê, hinek wede piştî wê yekê, derbaz bû, wextê ku êndêlî hatine sera Mezin. Nêzîkî 500 êndêlîya li sera Jîyanê hîvîyê bûn û bi xemgînî hîvîyê bûn, ku ewê çawa cara ewlin rastî Cêylonê padişa bihatana. Xêrkir û Xwehiz hevalên nû û kevin dîtin wanra qise dikirin, wextê ku parêzerên Padişatîyê nişkêva ketine serayê. Hemû xeberdan sekinîn, wextê ku parêzerê sereke berbirî wan bû:

– Zûtirekê hûnê li ber padişê xwe bisekinin. Ewî her dem hûn hiz kirine û hîvîya vê rojê bûye, ku hûnê kengê bighîjine Wî. Nenihêrî wê yekê, wekî *hûn tu cara rastî Wî nehatine, Ewî hûn dîtine. Ewî dilê we û berê we jî dîtîye. Ew dilê we, menîyên we, fikirên we û texmînkirinên we, usa jî karên we, zane. Tu tişt veşartî nîbûye. Bizanibin*, wekî *dîwana Wî ya heqe. Tu kes wê xewile nemîne.*

Parêzerê sereke xeberdana xwe berdewam kir û elamî wan kir, ku ew gerekê çawa berbi sera Mezin bên rêberkirinê û li sera Mezin gerekê xwe çawa xweyî bikin. Piştî wê elametîyê ewî got:

– Xwehiz yê ewlin e, ku wê here cem Cêylonê padişa. Pêşda were, ku em berbi sera Mezin rêberîyê li te bikin.

## Xwehiz û dîwana wî

Xwehiz fikirî, wekî ew yê ewlin hatîye gazîkirinê, çimkî ew li Êndêlê serokbajar bûye. Ew li ser xwe guman bû, wekî ewê heqê mezin bistîne ku li cîhên padişêye der serkarîyê bike. Ewî ji hînbûnên nivîsarên Kevin bîr dianî, wekî ewên ku li Êndêlê çawa yên amin bihatana hesabê, li Afabêlê wanayê heq û tabîya serwêryêye baş bistenda. Hêna serkarîkirina wîye li Êndêlê bajar gulvedida. Wextê çûyîna bona dîtina padişê, ewî guman texmîn dikir.

Dergên sera mezin vebûn, û Xwehiz birine nava hazirîya padişê. Mezinaya serayêye bedew hukumekî berk li ser wî hişt. Ewî dît, wekî sera bi meriva tijî bû. Em hazir sekinîbûn. Xwehiz zendegirtî ma, wextê ku ewî cîhên vala dîtin, lê ew lez ber dilê xweda hat, qirar kir, wekî welatîyên li wir anegorî xwestina xwe cîhên xwe girtine.

Li dawîya serayê, li cîhê herî dûr, textê Cêylon bû. Ew diha bilind bû, ne ku çawa Xwehiz difikirî. Ewî usa *jî textên biçûk dîtin, yên ku çawa ew fikirî, yên bindestîyên Cêylon bûn. Qasekê tê bêjî dilê wî sekinî*: li wir çend cîhên vala hebûn. Ew guman bû, wekî ji van textên vala yek jî yê wî bû.

## Hevalê berê

Wextê ku Xwehiz pêşda diçû, ew ji beşera êndêlîyên berê zendegirtî mabû, yên ku niha welatîyên Afabêlê bûn. Ewî çend gav avîtine berbi text û li para serayêye pişva hevalê xweyî berê nas kir. Navê wî Eleqet bû. Rêstorana wî hebû û Xwehiz gelek cara diçû wir. Ewî li parêzerê sereke nihêrî, tê bêjî pirsî, ku gelo îzin heye xeberdin. Parêzer bi serê xwe nîşana qayîlîyê da kivşê.

Xwehiz nêzîk bû û herduya hev hembêz kirin.

– Eleqet, nava vî wedeyîda tu çawa bûyî? ,– Xwehiz pirsî.

– Gelekî baş,– hevalê berê bersiv da,– lê navê min îdî Eleqet nîne, lê Razîbûyî ye. Xudan Cêylon navê nû da ser min: ew navên nû dide ser hemû xulamên xwe, yên ku li ber textê wî disekinin. Afabêl cîhekî gelekî ecêb e û me nikaribû derheqa wê yekêda biketana nava xiyala jî,– Razîbûyî got:– ev sera Mezin tenê dergê berbi vî bajarê bedew û ecêb e. Padişê me jî yekî diha hizkir û bilinde, lê ne mînanî her merivekî başqe, yê ku te nava jîyana xweda nas

kirîye. Ez usa razîme, wekî nas dikim û qulixî wî dikim. Bûyîna nava padişatîya Wîda qedirekî mezin e. Eger li Êndêlê min ew yek bizanibûya, çi ku ez niha zanim, minê jîyana xwe cûrekî mayîn derbaz bikira. Minê diha zêde bicedanda padişa razî bikira. Nava wedê li Êndêlê derbazkirî ezê welatîkî diha baş bûma. Eger usa *bûya, ezê niha diha nêzîkî wî bûma.*

– Bi wê yekê tu çi dixwezî bêjî? ,– Xwehiz ber gilîyê wîda hat.– Tu li Êndêlê ji wan welatîyên here baş bûyî. Rêstorana here baş ya te bû û te sponsêrîya gelek teşkîldarîyên civakî dikir. Te gelek cara mecal û xwerinên belaş didane teşkîletên ku pareberevkirinêva mijûl dibûn. Gelek cara *jî te kara xweye rojê pêşkêşî hineka dikir.*

Razîbûyî serê xwe bir û anî:

– Min ew hemû tişt dikir, ku navek dest bianîya û ji alîyê civakêda bihatama qebûlkirinê. Min usa jî zanibû, wekî bi wî cûreyî minê diha gelek mişterî dest bianîyana. Menîya min ne ku duakirina meriva bû, lê çareserkirina açixîya min bû. Min gerekê guhdarîya xeberên Cêylon bikira. Ewî gotibû me: “Eger tu nanxwerinekê, yan jî şîvekê teşkîl dikî, ne gazî pismamê xwe, ne jî birayê xwe, ne jî merivên xwe, ne jî cînarên xweye dewletî bike. Wextê ku tu nanxwerinê teşkîl dikî, gazî kesîba, feqîra, kora, seqeta bike. Û tê xwezilîbî, çimkî tu tiştê wan tune, ku dewsê bidine te, çimkî wextê rabûna yên heq dewsa wê yekê heqê te wê hebe”. Min pêşkêş didan bona kara xwe, lê ne ku bona kara bajarê me. Min dixwest ez nava merivên Êndêlêye here hukumdarda bûma.

Xwehiz xeberdana xwe berdewam kir. Feqet te *pêşkêş didane mekteba Êndêlê jî. Gelo* te bona wê yekê razîbûna Cêylon nestend?

Razîbûyî bersiv da:

– Belê min pêşkêş didane mekteba Êndêlê, lê ew *pêşkêş ji kara min beşeke gelekî biçûk bû. Min beşa kara rêstoranêye mezin vedişart, çimkî ez ditirsîyam, ku ezê rojekê binkevim. Min ew yek dikir, çimkî min dixwest ku jîyana min baştir bûya. Menîya min ya rast xweparastin bû. Ew tiştê hindik ku min didan, bona rihetbûna* wijdanê min bû. Min xwe nava mecbûrîyêda texmîn dikir, çimkî dersdarên me gelek cara digotin, ku dayîna pêşkêşaye bona padişatîyê û piştgirîkirina feqîra gelekî girîng bû. Min ew yek rûyê texmînkirina guneh û mecbûrîyêda dida, lê ne ku ji hizkirinê û rehmbûnê.

Razîbûyî xeberdana xwe berdewam kir:

– Min mesela Cêylone derheqa wê jina bîda bîr kir, ya ku padişatîya Afabêlê hiz dikir. Bîr bîne, wekî ewî got: “Ez rast dibêjime we, wekî ev jinebîya feqîr ji hemûya zeftir avîte xiznê. Çimkî hemû kes ji zêdaya xwe avîtinê, lê evê ji feqîrîya xwe avîtê, çi ku li cem wê hebû, hebûna temamîya jîyîna xwe ewê avîtê”.

Xwehiz derheqa wan teşkîldarîyên civakî û şîvada fikirî, yên ku ewî li mala xwe derbaz dikirin. Li wir tu merivekî feqîr, yan jî ji wî nimiztir, yê dereca jîyana li wir, tunebû. Paşê ewî derheqa wan pênc hezarên dêpozîtda bîr anî, yê ku ewî dabû, ku wan meriva bide kerkirinê, yên ku aciz bibûn, wextê ku ewî qirar kiribû wî erdî bide tora dikana, lê ne ku mektebê. Wî çaxî ew difikirî, wekî parekî mezin ewî dabû, lê niha ewî bona wan parê hindik şerm dikir. Gelo Cêylonê wê yekê çawa niha qîmet bike?

Fikirên wî bi gotinên Razîbûyîye dawîva hatine teribandinê:

– Eger ez bi rastî bi temamîya germaya dilê xweva bûma,– ewî got,– minê wede başqe bikira, ku min li mektebê qulix bikira. Wextê ku her kes karê xwe dike, bar sivik dibe, eger na, çend kesên mayîn temamîya bar hildidine ser xwe. Eger me hemûya bernama Cêylon mîyaser bikira, tu kes wê bin barê giranda nîbûya. Ew kesên ku barên giran hildabûne ser xwe, heqê mezin bona wê yekê stendin. Fikira wê ew e, wekî ew tiştên hindik, ku min didan, bona sivkkirina îsafa min bû, çimkî min zanibû, wekî min xwe pêşkêşî padişatîya Cêylon nekiribû.

Wextê ku jîyana min hate *lênihêrndinê, tiştekî ber çava bû, wekî ez gelekî bona xweşîya xwe, çareserî û navê xwe dijîtim, lê ne ku bona rûmeta Wî. Niha ez welatîkî vî bajarîyî biçûkim. Qerez, nenihêrî wê yekê, ku usa hate stendinê, ez hela hê bi rehmbûna Cêylon û bi hizkirina wî zendegirtî mame, kîjanê ew hindava minda dide kivşê. Ez bi rastî layîqî wî hemû tiştî nîbûm, çi ku min ji wî stend, lê tê* zûtirekê bibînî, wekî hizkirina wî û merdanîya wî ji hemû fikira bilindtirin. Hetanî dawîya jîyana xwe ez borcdarê merdanî û rehbûna Wî me.

Xwehiz ecêbmayî kire gazî:

– Welatîyê herî biçûk! Tu dixwezî bêjî, wekî li vir klas (derece) hene?

Razîbûyî kenîya û got:

– Belê, bêguman. Li Êndêlê derheqa wê yekêda em hîn dikirin, lê ji me gelek bi sivikayî nêzîkî wê yekê dibûn. Feqet me bi kûrayî ew yek zanibû. Bi rastî tu bi xwe jî derheqa wê rastîyêda usa difikirîyî, wextê tu ketî vê serayê. Min fikirên te bihhîstin: tu hîvîyêyî, wekî *tê li vir textekî bistînî. Te zanibû, wekî ew yek dikare anegorî nivîsarên kevin biqewime, ên ku me lêkolîn dikirin, feqet diqewime te guhdarîya mezin danetanî li ser fikirên xwe, yên ku derheqa tabîya teda bûn, wextê ku tu li Êndêlê bûyî.*

Ew merivên ku hindava Cêylonda nava wî wedê kurtda, ew wedê li Êndêlê derbazkirîda amin bûne, rêberin û qulixên here mezin nava vê civakêda diqedînin. Ew li beşên bajêre here bedew dijîn û mecala wan heye padişê bibînin. Ewên ku diha gelekî bona xwe jîyan derbaz kirine, wextê ku li Êndêlê bûn, qulixên xwe li beşên bajêre der stendine. Wê yekê usa jî li vê serayê dikarin bibînin. Em li cêrgên paşinda rûniştîne, li rasta dijîn û xebatên giran dikin. Nava vê padişatîyêda em yê here biçûkin. Ewên ku di navbera serayêda cîhê xwe girtine, li çîya dijîn û qulixên efrandarîyê stendine. Lê ewên ku pêşîya serayê û li ser texta rûniştîne, li merkeza Padişatîyê dijîn, li kîderê cîhê rûniştandina padişê ye. Îzina wan heye, ku ew tevî wî bijîn û bişuxulin. Nava vê padişatîyêda ew *yên here mezinin.*

Razîbûyî gotina xwe ser hevda anî:

– Xwehizê hevalê min, tu bizanibe, wekî *Cêylon rêberekî heq û hizkirî ye. Ew çi jî bide, ewê bibe heq. Ji me tu kes wê tu cîhekî li vî bajarî nejîta, eger ew nîbûya.*

Razîbûyî ev yek got û paşda vegerîya cîhê xwe. Parêzerê sereke bi destê xwe eşaretî da, ku Xwehiz pêşda here, rîya xweye berbi text berdewam bike.

## Dersdarê eyan

Xwehiz çend gav jî avîtin û merivekî mayîn dît, yê ku ewî nas dikir û sîmpatîya wî hindava wîda hebû. Navê wî Piştgir bû. Ew li mekteba Êndêlê desrdar bû û Xwehiz ew çawa merivekî berbiçav hesab dikir. Hînkirinên wî bi fikir bûn û her dem Xwehiz ruhdar dikirin. Wî dersdarî usa hîn dikir, wekî şagirta xwe bilind û qîmetlû hesab dikirin. Dersdarên mayîn jî ruhdar dikirin, lê carna hinekî

berk xeber didan û gotina wana berxudana bi êşê pêşda dianî. Piştgir usa nîbû, wextê ku ew ji dersxanê derdiket, hemû kes xwe baş texmîn dikir. Bi rastî, hetanî wê demê, ew dersdarê Xwehizî hizkirî bû.

Xwehiz careke mayîn li parêzerê sereke nihêrî û îzin xwest, ku dersdarê xweyî berêra xeber bide. Parêzer careke mayîn bi serê xwe nîşan da ku qayîl e. Xwehiz nêzîkî Piştgir bû û herduya bi germayî silav dane hevdu.

Xwehiz nikaribû xwe zeft bikira û carekêra pirsî:

– Hûn bona çi li vir, li cêrgên paşindanin?

– Eva tabî û cîhê min e. Ez welatîkî Afabêlêyî herî biçûkim. Ez li rasta dijîm û xebata min li ser avdayînê ye.

– *Çi?* ,– Xwehiz kire gazî- hûn dersdarê Cêylonî hereî baş bûn. Hûn çawa dikarin welatîkî herî biçûk bin? Hûn gerekê li ser textekî pêşin rûniştî bûna.

– Çend menî hene, ku ez bona çi nava vê civîna mezinda li ser tabîya diha bilind nînim, û bona çi ez tevî Cêylon serwêrîyê nakim,– Piştgir got.– Bona hêvişandina wede ezê tenê derheqa koka bêaqilîya xweda gilî bikim. Tê bîra te, ewên ku jîyana xwe pêşkêşî Cêylon dikirin, himberî avayîçêkirina dikirin? Mektebêda her dem derheqa vê yekêda em hîn dikirin. Borcdarîke meye sereke li Êndêlê ew *bû, ku me jîyanên merivên başqe çêbikira. Me* ew yek bi bangên xwe dikir, yêd ku bi cûrê xebera me, kirinên me yan jî karên meva dihatine derbazkirinê.

*Çawa dersdar min mecaleke mezin û cabdarîke mezin stendibû. Min şagirt hînî prînsîp û rêyên Cêylon dikirin. Qerez, çawa dersdar ez gelek alîyava teribîm.*

Hînkirinên min balanskirî nîbûn. Min tenê alîyên baş, yên bona qulixkirina bo *Cêylon didane kivşê. Min piştgirîya şagitên xwe geleka dikir, ku* ew berbi açixîyê bicedandana, bêyî fikirmîşbûna derheqa feydayên wanda. Min ew hîn nedikirin, wekî meremê jîyanêyî rast ew bû, ku hemû tişt li Cêylon xweş bihatana. Min ew *hîn dikirin, ku çawa prînsîpên Wî bidana xebatê, bona ku nava jîyanêda bighîştana açixîyê. Feqet, min tu* cara *eşaretî nedida wana, ku nava civakêda çel û telên çawa hene.*

Nivîsarên kevin zelal didine kivşê, wekî min gerekê şêwira

Cêylon bi temamî terîf bikira. Dikeve nava wê yekê: “Şîretkirina her merivekî û hînkirina her merivekî bi her serwextîkê, wekî her merivekî bêyî kêmasî li ber Cêylon bidin sekinandinê”. Min hîn dikir, lê min eşaretî nedida. Ez çawa dersdarekî baş bûm û tu cara min eşaretîyên aqilmendî nedidan, min gelek jîyan çêkirin, yên ku rûmeta hindik bona Cêylon anîn.– Wî çaxî ewî serê xwe berjêr kir.– Ji wana gelek niha ji civînê dûr ketine.

Bi dîtina ecêbmayîna Xwehiz, dersdar gotina xwe wekiland:

– Belê ew ketine nava halekî wî cûreyî. Gelek niha li welatê Lonêyî wêranbûyî dijîn, ji alîkîva jî rûyê hînkirinên mine nebalanskirîda. Min ew tişt nedidane şagirtên xwe, hewcê çi bûn ew: min ew tişt didan, çi ku wana dixwest. Min nedixwest ku begemîya wane hindava minda û usa jî navê xwe min unda bikira. Rûyê wê yekêda jî min bi cûrê şaş çêkir. Min govekên jîyana wane sist û nexweş ji kokêva ranedikirin, lê min fikir derbazî li wan dikirin, yên ku tenê xwestinên wane xwehizîyê didane gurkirinê.

Ji nivîsarên kevin wê eşaretîyê bînine bîra xwe, ya ku bona dersdara bû: “Wana cimeta Min dikirine nava şaşîyê û digotin: “Aşîtî”, wextê ku aşîtî tune û wextê ku dîwarê neqewîn tê çêkirinê, wî bi herîyêva vedişêrin, dêmek bêje wana, wekî ewên ku herîyêva vedişêrin, wê bikeve”. Ji şagirtên min geleka jîyanên xwe bi tiştên wedelûva dabûne sekinandinê û veşartibûn. Kûraya dilê xweda min zanibû, wekî ew dîwarên nerm bûn, lê min eşaretî nedida wana. Min digote wan, wekî hemû tişt baş bû, lê ew yek usa nîbû. Ez ber dilê wanda dihatim, min piştgirî dida şuxulkarîya wana û ew nava xapandinêda îzbat dikirin.

Bona şagirtên xweye berê ez xemgîn dibim, yên ku niha li Lonêne. Hinek şagirtên min jî hatine Afabêlê, lê ji wana gelek, yên ku tenê hînkirinên baş qebûl dikirin,– Piştgir li piş xwe nihêrî û dengê xwe nimiz kir û got,– li cêrgên pişvanin. Wana jîyanên xwe xerc kirin, lê kirên wana li ber textê vê Dîwanê bi agir şewitîn.

– Li ber textê Dîwanê şewitîn? ,– Xwehiz pirsî.

– Belê,– dersdar got.– Gelo nivîsarên kevin nayêne bîra te? “Her kes, yê ku li ser wê bingehê çê dike, dikare zêr, zîv, kevirên giranbiha, dara yan jî tiştên mayîn bide xebatê. Feqet wedê nihêrandinê, roja dîwanê, wê bê, wextê ku zelal bibe ku her çêkirçîk

xebata çi cûreyî kirîye. Karê her yekî wê nava agirra derbazbe ku bê zelalkirinê, ku gelo ew *qîmetê xwe xweyî dike, yan na. Eger karê wî li ber agir teyax bike, çêkirçî wê heq bistîne. Feqet* eger kar bişewite, çêkirçî wê zirareke mezin bibîne. Ew çêkirçî wê xilazbe, lê mînanî merivekî usa, yê ku firtê-firtê ji agirê mezin aza bûye".

Dersdarê eyan xeberdana xwe berdewam kir:

– Ew bingeha, derheqa kîjanêda şandîyê kevin xeber dida, serwêrtîya Cêylon e û em zanin, ku ew rîya tek-tenê ye, bona ku bikevine vê padişatîyê. Qerez, wextê ku em bi rastî yên Cylonin, gerekê li ser vê bingehê çêbikin.

Anegorî nivîsarên kevin, jîyana min ne anegorî normên Cêylone heq e: ez nava wê govekêda teribî bûm, li kîderê hukumê min hebû, û ew jî hînkirin bû. Min serwêrîya xwe nedida xebatê, bona ku şagirtên xwe berbi mîyaserkirina karê Afabêlê def bida, û min heqdayîna xwe unda kir. Tê bîra te, ku dersdarê wedê berêyî mezin Pawlos derheqa wan merivada çi got, nava jîyanên kîjanada ew hatibû gazîkirinê? "Dêmek, çi gumanê û şabûnê dide min û heq û tuacê me çi ye, bi kîjanê em firnax dibin. Ew hûnin. Belê, hûnê şabûneke mezin mera bînin, wextê ku em tevayî li ber Xudan bisekinin".

Min rastîyên Cêylon baş zanibûn, wextê ku min teze destpêkiribû hîn bikim, feqet min îzin da, wekî texmînkirina bêçarîyê, xwestina stendina begemîyê û kubarî min bixalifandana. Gelek wede derbaz nebibû û ez êdî ji zanebûnên xwe xalifîbûm. Paşê min bi xwe destpê kir usa bijîm, çawa ku min terîf dikir. Bi xalifandina wî cûreyî min nava jîyana xweye şexsîda jî eşaretîyên Cêylon hesab hilnedan. Bûyîna merivê eyan û texmînkirina razîbûnê li vir cûrekî mayîn tê qebûlkirnê, lê ne ku li Êndêlê. Bawar bikî hemû tiştên ku min li wir girîng hesab dikirin, li vir çawa tiştên gelekî biçûk tên hesabê.

Xwehiz bi dengekî hişyar pirsî:– Piştgir, hevalê min gote min, wekî *Cêylon navên me diguhêre.* Navê teyî nû çi ye?

Dersdar kenîya:

– Navê min Şikestî ye.

Ewî ew yek got, serê xwe berjêr kir û paşda vegerîya li cîhê xwe. Xwehiz li parêzerê Sereke nihêrî, yê ku serê xwe hejand, îzbat kir, wekî ew hemû tişt, çi ku ji Şikestî bihîst, rast bû.

Xwehiz çûyîna xweye berbi text berdewam kir. Niha ew awqasî li ser xwe guman nîbû, çiqasî wî çaxî bû, wextê ku ji nûva hatibû gazîkirinê li serayê. Ew derheqa jîyana xweda fikirî. Menîyên wî kîjan bûn? Gelo ewî bona rûmeta Cêylon serwêrî dikir, yan bona cedandinên xweye xwehizîyê? Ewî çawa jîyana xwe derbaz kiribû? Gelo jîyana wî anegorî xeberên Cêylon bû, yan ew jî xapyayî bû? Gelo ewî jîyanên meriva çê dikirin, yan ewî tenê bona çêkirina jîyana xwe ew didane xebatê?

## Yê Serwêr

Xwehiz di navbera sera Mezinra derbaz dibû. Ewî dît, wekî rengrûyê welatîyên li wir diha gelekî nêzîkî yên padişatîyê bûn. Ji wana her yekî bi hizkirin û bi begemî dîna xwe didane wî. Nihêrandinên wana bêhn dane ber Xwehiz. Ewî alîkarîke bêqîmet stend, çimkî ewî destpê kiribû xwe bêguman texmîn bike û êdî nizanibû ku hêvîya wî çi bû.

Xwehiz texmîn dikir, ku tê bêjî sed sal derbaz bûn, hetanî ew gihîşte li ber text. Wextê avîtina her gavekê, ewî gelek tiştên ji jîyana li Êndêlê bîr dianîn. Gumana wî hela hê hebû, wekî ew dikaribû bibûya serwêrekî Cêylon, bi saya wê yekê, ku ew pêşda serokbajarekî açix bûye.

Xwehiz gihîşte li wir, li kîderê serwêr Cêylon bû. Ewî kincên wane padişatîyê û tacên li ser serên wan dîtin. Destê her yekîda darê destayî padişatîyê hebû. Ji welatîyên bajarê mezin ewana bi rengê xwe maqûl dihatine kivşê. Ew zendegirtî mabû, wextê ku dît, wekî meriv dikare here ser rengê awqasî bi rûmet.

Nava serwêrada Xwehiz sêkrêtara endamekî şêwira Bajêr dît. “*Gelo ew bona çi li ser textekî rûniştîye?”,*– Xwehiz fikirî. Ew jina li mektebê ji yên mayîn cuda nedibû. Ewê mekteb salekê pêşîya Xwehiz xilaz kiribû. Xwehiz bi xwe ew nas nedikir, çimkî ew şexseke biçûk bû.

Ew jin *pêşda hat, û parêzerê Sereke sekinî û li ber wê ta bû. Ewê Xwehiz bi hembêzkirinê û bi kenekî germ silav kir:*

– Xwehiz tu bi xêr hatî Afabêlê. Ez Sebirkirim. Cêylon hîvî ji min kir, ku ez tera xeberdim, hetanî ku tu li ber Wî bisekinî. Ez li Afabêlê serwêreke wî me.

Xwehiz bêyî fikirmîşbûn got:

– Serwêr? Tu çawa dikarî bibî serwêr? Te li Êndêlê tu tişt nedikir.

Rengê wî sor bû, çimkî ewî fem kir, ku gotina wî bi çiqasîva ne cîhda bû û gelekî hişk bû.

Sebirkirê bi serê xwe da kivşê, wekî ewê ew fem kir:

– Ji gotina xwe navhev nekeve. Li vê serayê xapandin nikare xwe veşêre û ne jî li vî bajarî. Tu awqasî bêqelp bûyî. Li Êndêlê tu bi fikirên meriva û bona navê xwe xemgîn bûyî. Ew yek geleka hîn dike, ku bi fêlbazî xeberdin û ew *bêaqilya xwe fem nakin. Li vir xeber gelekî girîngin, lê menî û merem diha giranin, çimkî ew her dem ber çavane. Zûtirekê tê derheqa wê yekêda bizanibî*, wextê ku tu bona her xeberekê, ya ku te li Êndêlê gotîye, bêyî dîwankirinê.

– Her xeberekê? ,– Xwehiz kire gazî. –Tu dixwezî bêjî bona her xebereke her xeberdanekê?

– Belê,– Sebikirê got,– her xeberekê. Xeberdana xudan Cêylon bîr bîne, ya nava nivîsarên kevinda: “Hûn dikarin wê gumanêbin, wekî roja Dîwanê her kes gerekê bona her *xebereke vala* hesab bide, ya ku ewî wextekê gotîye. Xeberên we wê bona kirina dîwana we bêne xebitandinê, ku yan bêsûc, yan jî gunehkar elam bikin”. Xeberên vala yên ku badîhewa, yan jî bi sivikayî hatine gotinê, ewin, yên ku dijî tebyeta Cêylonin.

Xwehiz wê yekêra qayîl nebû:

– Ez her dem difikirîm, wekî em gerekê bona derewên mezin, yan jî rastîyên mezin hesab bidin, yên ku me gotine, usa jî bona karên mezin, yan destanînên mezin,– ew hinekî fikirî, lê paşê xeberdana xwe ser hevda anî:– çi li pêşîya mine?

Sebirkirê got:

– Nivîsarên kevin zelal eyan dikin: “Dayîna heqê te xeber û karên teva girêdayî ye”. Dêmek, dîwana te *wê ne tenê bona hemû kirên te, lê bona her xebereke ku te gotîye, bê kirinê. Eva derheqa xeberên xirab, qenc û valadane jî, yên ku ji devê* te derketine. Feqet ne tenê xeber û kirên te wê bên lênihêrandinê, li piş wan menîyên wan jî wê bêne nihêrandinê. Dîwana te usa jî bona wan fikira wê bê kirinê, yên ku te qebûl kirine. Bîr neke, wekî *dîwana Cêylon ya heq e: ew “Fikirê û dil kontrol dike”. Ewî bi xwe got: “Ez, Cêylon, hemû dila enene (guvtugo) dikim û menîyên veşartî dinihêrim. Ez anegorî kirên meriva didime wana, anegorî wê yekê, ku kirên wana layîqî çine”. Ew ne tenê her xeberekî û kar lê dinihêre, lê menîyên li piş wan jî dinihêre.*

Sebirkirê xeberdana xwe berdewam kir:

– Awa ku bona çi tu awqasî zendegirtî mayî, wextê ku te min li ser text dît. Tu bin ronahiya destanînên min yên li Êndêlê min qîmet dikî. Dîwana Cêylon cûrekî mayîn e: tu niha destpê dikî wê yekê bibînî û zûtirekê tê diha bi cûrê kivş bibînî. Birayê giranbiha, tê bona jîyana li Êndêlê heqê rast bistînî.

Tu kesî rastîya vî cûreyî tu cara negotibû Xwehiz. Feqet, ew yek bi hizkirineke usava tijî bû, ya ku ewî tu cara nas nekiribû. Niha ewî zanibû, wekî *Cêylon gerekê serwêrekî hizkir û rehm be, çimkî ewî ew hizkirin bi saya serwêreke wî texmîn kir. Sebirkirê dijî wî xeberda, lê* ew xeberdan bi hizkirinêva tijî bû. Ewî fem kir, wekî meremê hizkirinê ne ku xweşhatina li ber merivên mayîne, lê ew rastî ye.

Sebirkirê serê xwe berjêr kir:

– Padişê te hîvîya te ye.– Bi gotina vê yekê, ew berbi textê xwe çû û parêzerê Sereke Xwehiz da femkirinê, wekî ew gerekê tenê nêzîkî text bibe. Parêzer gerekê li jêra dikê hîvîyê bisekinîya, li kîderê serwêr bû.

## Xwehiz li ber Cêylon

Anegorî nîşandayînên stendî, Xwehiz fesal pêpelîngara bilind bû, berbi dika jorîn çû, ya ku li jêra text bû. Ewî li jor nihêrî û padişa dît. Nava wê civînêda tu kes wê negihîşta bedeweîya Cêylon, tabîya wîye padişatîyê û maqûlîyê. Ew him balkêş bû û him jî bi xof bû. Xwehiz tu cara yekî mînanî wî nedîtibû. Ewî fem kir, wekî tu kes nikaribû dijî serwaxtîya wî û qewata wî derketa. Cara ewlin ji nihêrandina çavên Cêylon, Xwehiz fem kir, wekî padişa diha gelekî milahîm û diha gelekî bi xof bû, ne ku ewî dikaribû bianîya ber çavê xwe. Nihêrandina wî nava Xwehizra derbaz bû û ewî xwe bêkinc texmîn kir. Ber çava bû, wekî derheqa wîda li vir tu tişt veşartî nîbû. Xweh'iz gumana xweye bona dîwana Milahîm undakir, lê ewî êdî derheqa wê yekêda nedifikirî. Ewî niha diha gelekî rastî dixwest, lê ne ku her tiştekî mayîn.

*Cêylon got:*

– Tu bi xêr hatî padişatîya min, Xwehiz. Ez gelekî hîvîya vê demê bûm. Te li Êndêlê serwêrtîya cimeta min dikir. Gelo tu layîqî textekî Afabêlêyî rûniştandinê û serwêrîkirinêyî? Xwehiz, yê ku nava her

derecekêda bersiva wî hebû, navhev ket. Hinekî pêşda ewî texmîn dikir, wekî dikaribû li Afabêlê bibûya rêberekî baş, lê li sera mezin, bi qisekirina tevî çend welatîyên Afabêlê, ewî fem kir, wekî fikirên wî, bi texmîn tenê xiyal bûn.

Cêylon ji serwêrekî li rex xwe pirsî:

– Nava jîyana çend welatîyada Xwehiz hukum bona vê padişatîyê hiştîye? *Çend nav hatine dayînê.* Xwehiz zendegirtî mabû û bi guhdarkirina wê yekê xeberên wî tunebûn ku bêje.

Padişê ji wî serwêrî pirsî:

– Nava jîyana çend welatyada Sebirkirê hukumê xwe bona vê padişatîyê hiştiye?

Ji pênc hezara hinekî zêdetir, xudanê min,– serwêr bersiv da.

– Ew çawa dikare biqewime? ,– Xwehiz xwe zeft nekir. –Ew tenê sêkrêtar bû, lê ez jî serokbajar bûm. Ew çawa dikare usa bibe, wekî min hukum li ser awqas hindik meriva hiştiye, lê ewê awqas gelek? Cêylon bi îzbatkirin bersiv da:

– Min nepirsî, ku te çiqas hukum hiþtiye, lê min pirsî, ku nava çend jîyanada te hukum hiştîye bona vê padişatîyê.

Dengê wî hinekî milahîm bû, lê ewî biryardarîya xwe xweyî kir:

– Dersdarê teyî berê Piştgir jî, yê ku niha bi navê Şikestî eyan e, hukumê wîyî nava jîyana gelek merivada diha zêde ye, ne ku hukumê te. Feqet parçekî wî hukumîyî gelekî biçûk gihîşte vê padişatîyê. Awa ew e menî, wekî ew li vî bajarî serwêrîyê nake. Ew hukumê ku çawa yê mayînê li ber textê vê Dîwanê hesab dibe, anegorî rêyên Min û padişatîya Min in.

*Cêylon xeberdana xwe berdewam kir:*

– Îzinê bide ez gilî bikim, ku Sebirkirê çawa hukum li nava jîyana ji pênc hezara zêdetir merivada hiştîye. Ewê bi şabûn bona mektebê pêşkêş dikirin, him bi fînansî û him jî bi qulixkirinê. Dêmek ew merivên ku ji qulixa mektebê kar stendin, li ser wê hatine hesabkirinê.

– Lê min jî bona mektebê pêşkêş kirine,– Xwehiz ber xwe da.

– Te pêşkêş dikirin ku te wijdanê xwe sivik bikira, usa jî bona wê yekê ku te çawa navê xwe xweykira û bida dasekinandinê,– Cêylon got –Li Êndêlê te temamîya heqê xwe bona wê yekê stend. Lê Sebirkirê pêşkêş dikirin, çimkî ewê ev padişatî û meriv hiz dikirin.

– Sebirkirê merivekî bi navê Bêrehm paşda vegerand, yê ku destpê kir qulixî min bike. Ew niha li sera Jîyanê ye û hîvîya dîwana xwe ye. Ezê navê Terîfkir daynime ser wî, çimkî ewî bi cûrekî baş banga min bela kir. Ewî bi xwe nava jîyana ji hezarî zêdetir merivada hukum hiştîye bona vê padişatiyê. Ew merivên ku ewî jîyana wan çê kirîye, li ser hesabê Sebirkirêne, çimkî ewê rêberî li wî merivî kir, ku ew qulixî min bike, û ewê alî mektebê dikir, ya ku ew hînkir.

Xwehiz Bêrehm ji Êndêlê bîr dianî. Ewî hesab dikir, wekî *Bêrehm ji çapê zêdetir nava bawarîyêda hevsûd bû. Ew xudanekî rojnama cîh bû û gelek cara nivîsarên xweda dinivîsî, wekî welatîya xwe pêşkêşî Afabêlê nekiribûn. Ew jî gihîşte gelek Êndêlîya, helan dane wana, ku ew endamên şêwira bajêrva bên girêdanê û bona berfirehkirina mekteba xwe piştgirîya wan bikin. Ewî eşkere nerazîbûna xwe da kivşê, wextê ku Xwehiz dengdayîn da guhartinê û ew erd neda mektebê. Xwehiz Bêrehm bona wê yekê hiz nedikir. Niha ewî şerm dikir, çimkî fem dikir*, wekî ew hemû tiştên bona çi Bêrhem şerkarî dikir, padişatîya Afabêlêva girêdayî bû. Gelo ew çawa dikaribû awqasî kor bûya?

Cêylon xeberdana xwe berdewam kir û tiştên mayîn nîşan dan, bi saya kîjana Sebirkirê hukum nava jîyana êndêlyada hiştibû bona padişatîya Afabêlê. Gelek tiştên biçûk jî hebûn, yên ku bi hevra çawa yên mezin hatibûne hesabê. Ew hindava hemûyada bi qencî û paqijîyê, bi dilê hizkirinêva tijî nêzîk dibû. Ew hindava feqîrada merd bû û bi cûrê qewîn peyî rastîyê diçû.

Wextê ku padişê xeberdana derheqa Sebirkirêda ser hevda anî, ewî bi hûrgilî jîyana Xwehiz nihêrî. Çawa ku Sebirkirê got, her menîk, her xeberek û karek hate qîmetkirinê.

Xwehiz ew qencî dît, ya ku ewî bi navê padişê kiribû, lê ji wê yekê xemgîn bû, wekî piranîya karên wî bi menîya çareserîya şexsê wî, navê wî û bi meremên xwehizîyê hatibûne kirinê. Hetanî dawîya guvtugokirina (enenekirina) jîyana wî, Xwehiz li ser wê gumanê bû, wekî *wê bihata gunehkarkirinê.*

Ewî li ber padiþê kire qîrîn:

– Ez hetanî dawîya jîyîna xwe layîqî cezakirinême. Ez layîqî Lonê me. Dewsa wî hemû tiştî çi ku min stendibû min awqas tişt badîhewa kirine û awqas hindik feyda dane.

Xwehiz êşeke gelekî mezin texmîn dikir: hêsir ser hev li ser sifetê wîra dikişîyan. Wî merivî, gumana kîjanîye mezin hebû, wextê ku ew kete sera Mezin, niha mûk digerîya, ku xwe lê bigirta. Tiştê tektenê, yê ku mabû, gumana rehmê bû, lê ewî bawar nedikir, wekî ew layîqî wê bû. Ewî xwe topî ser hev kir, hîvîyê sekinî, wekî padişayê derheqa sirgûnîya wîye berbi Lonê elam bikira.

Piştî bêdengîya çend deqîqa, padişê xeberda:

– Xwehiz, tu xulamê minî, te bawarîya xwe li min anî û tu teslîmî serwêrîya min bûyî. Nenihêrî wê yekê, wekî te awqas tiştên badîhewa kirine, ez te hiz dikim û nava padişatîya xweda te xilas dikim, hetanî dawîya jîyana te.

Xwehiz ecêbmayî bû. Ewî li jor nihêrî, lê paşê destpêkir ji kontrolê der bigrî, lê ne ku ji xemgînîyê, lê ji şabûna bêsînor. Ew ji rehm û qencîya wî padişê mezin zendegirtî mabû. Ew hemû tiştê ku ewî derheqa xeysetê Cêylonda bisîtibûn carekêra bona wî zelal bûn. Çend deqîqa pêşda ewî gunehkarî û êşeke usa t’exmîn dikir, ya ku ewî tu cara nikaribû bianîya ber çavê xwe. Xêncî sirgûnbûnê ew layîqî tu tiştî nîbû. Ew layîqî gunehkarkirinê bû: lênihêrndina jîyana wî ew yek da kivşê. Niha, bi xeberên here milahîm û qenc, derheqa kîjanada meriv tenê dikaribû bifikirîya, ev padişê bi xof wî nava bajarê xweyî nebînayîda silav dikir. Rehma çawa ye! Hizkirineke çawa ye!

Ew çi ku Xwehiz li Êndêlê kiribû, li ber çavê wî şewitî, lê ewî hela hê xeberên padişê dibihîstin: “Ez te hiz dikim û nava padişatîya xweda te silav dikim”. Ewî fem kir, wekî hevalê wî Razîbûyî rast bû: çi ku ewî bistenda jî bona wî ji hemû tiştî zêdetir bû, çimkî anegorî kirinên xwe ew ne layîqî wê yekê bû.

Padişê careke mayîn xeberda:

– Xwehiz, tu îdî bi navê xweyî berê eyan nînî. Ez navekî teze (nû) didime te. Nava padişatîya minda tê bi navê Milaîm eyanbî. Min bona te mal li mile rastê çê kirîye û tê bibî dîzaynêrê dîmenên tebyetê. Nenihêrî wê yekê, wekî tê li vî bajarî serwêrîyê nekî, tê alî min bikî, ku ez li nehîyên der serwêrîyê bikim.

Xwehiz pirsî:– Tevî te li nehîyên der serwêrîyê bikim?

– Ewên ku li vî bajarîne, serwêrin,– Cêylon got-padişatîya min hetanî qulçên topa dinyayêye dûr bela dibe. Welatîyên van bajarên

der li Êndêlê usa mînanî welatîyên Afabêlê nexwendine û ne jî li ber dîwanê sekinîne. Dêmek li cem wan ew cudatîyên baş tunene, yên ku li cem binelîyên vî bajarî hene. Nenihêrî wê yekê, ku tê li Afabêlê serwêrîyê nekî, lê tê alî min bikî serwêrîya min li temamîya dinyayê belabe. Xebata teye mexsûs wê ew be, ku tu bi qulixkirina wan û hînkirina wana, serkarîyê li hemû dîzaynêrên tebyetê, yên bîst bajarên beşa dinyayêye Bêngîlayê bikî.

Xwehiz serê xwe berjêr kir û girîya: qencîya padişê nebînayî bû.

Padişa nêzîkî sivrekê bû û tiştek ji wir hilda, lê paşê zivirî û berbi Milaîm çû. Ew gihîşte wê dikê, li kîderê Milahîm sekinî bû û got:

– Lê niha, vî berî hilde û buxwe.

Milahîm ew ber ji destê Cêylon hilda û xwer. Ew tiştê herî xweş bû û ji wî tiştî ewî tu cara nexweribû. Peyî xwerinêra tê bêjî fikir û dilê wî paqij bûn. Fikirên wî bi hizkirinê û bi xwestina qulixkirinêva tijî bûn. Wextê xwerinê ew ji êşa berê û fikirên tarî paqij dibû. Ewî ruhdarbûn û bextewarî texmîn dikir, bi gumanê û bawarîyêva tijî dibû. Ewî carekêra fem kir, wekî ew ber (rez) ji dara Jîyanêye eyan bû, derheqa kîjanîda dersdara li mektebê xeber didan. Li ser sifetê Milaîm ken hate kivşê, lê Cêylon bi razîbûn li wî dinihêrî.

Paşê Cêylon got:

– Bizvire û malbeta xwe binihêre.

Milahîm fesal zivirî. Ewî hela hê şerm texmîn dikir, bi femkirina wê yekê, wekî geleka bi hûrgilî derheqa jîyana wîda dîtin û bihîstin. Wextê ku ew bi temamî zivirî, elaletê destê xwe li hev xistin û bi şabûn kirine gazî. Miqamek destpê bû ji welatîya hineka destpê kirin bireqisin. Milaîm bawar nedikir, ku ew ji alîyê welatîyên wê padişatîyêda layîqî hizkirin û qebûlkirina wî cûreyî dibû. Ew yek ew derman bû, yê ku bi temamî ew ji şaşîyên li Êndêlê kirî qenc kir.

Milahîm zivirî û kenê li ser sifetê Cêylon, yê herî bi rûmet û *şa dît*. Ewî wî çaxî çavên Cêylon dîtin. Ew çav bi hizkirin û germaîyîke usa li Milaîm dinihêrîn, kîjan ewî pêşda tu cara nedîtibûn. Niha ew fikirên Cêylon dibhîstin, çawa ku Sebirkirê û yên mayîn fikirên wî dibhîstin. Ewî bona xwe derheqa begemîyê, salên xwehizîyêda dibhîst, derheqa wî welatîda, yê ku Cêylon gelekî hiz dikir. Milaîm kete ser çoka û ji padişê razî bû. Padişê ew da seknandinê, qewîn hembêz kir û bi ken got:

– Tu bi xêr hatî, heval.

Paşê rêberîya Milahîm kirin û ew birine dawîya (xilazîya) aûdîtorîyayê, li kîderê gerekê hîvîya dîwana êndêlîyên mayîn bûya. Hemû hêsir hatibûne paqijkirinê. Êdî xemgînî, êş û girî tunebûn. Tiştên kevin îdî derbaz bibûn.

## Dîwana Xêrkirê

Sibe derbaz bû: hemû welatî êdî ji sera Jîyanê hatibûne gazîkirinê, xêncî Xêrkirê. Nenihêrî wê yekê, wekî ew tenê mabû, lê ew qet ber xwe nediket, çimkî li wê serayê kitêbên baş hebûn, xudanên kîjana welatyîên Afabêlê bûn. Ewê *kitêba duda, ya Dîroknivîsên Afabêlê* dixwend, wextê ku parêzerê Sereke nêzîkî wê bû û bi dengê nerm gotê:

– Xêrkir, padişê te *hîvîya te ye.*

Dilê wê ji şabûnê lêdixist. Bi kutasî ewê ew bidîta, yê ku ewê hiz dikir û hîvîya dîtinê bû. Bi sala ser hev ew hîvîya vî wedeyî bû û niha jî wede pêra gihîştibû. Parêzer kenîya, wextê ku Xêrkir nêzîkî wî bû ew tevayî çûn berbi sera Mezin.

Dergehên sera Mezin vebûn û Xêrkirê bi dîtina dor-berê xwe, carekêra kete nava fikirên baş. Qerez, guhdarîya wê çû ser textê Cêylon, yê ku dûr bû. Wî çaxî ewê ji dûrva Cêylon didît. Ewê destpê kir welatîyên padişatîya Afabêlê binihêre. “Gelo ev merivne çawa cudane! ,– ew fikirî. –Ez çawa dikarim weke van meriva xwe nav bikim?”.

Ewê dît, wekî welatî ta dibûn, wextê ku ew derbaz dibû. Gelo bona çi ev merivên bilind gerekê li ber wê ta bûna? Ew gelekî berbiçav û bedew bûn û ew bi çiqasîva zêde nêzîkî text dibû, kincên meriva diha rûmet dibûn. Dihate texmînkirinê, wekî ew merivên bilind bûn. Gelo çawa merivê vî cûreyî dikaribûn ta bûna, bi taybetî li ber wê?

*Xêrkirê çend meriv nas kirin, yên ku ewê li Êndêlê nas dikirin. Ew bi şabûn û bi hizkirina hindava wêda dikenîyan. Ewê dixwest bisekinîya û her yek hembêz bikira, lê texmîn kir*, wekî wedê anegor nîbû. Ewê Bêrehm dît û nikaribû xwe zeft bikira. Ew revî li cem wî û hembêz kir. Her du jî gelekî *şa bûn:*

– Tu bi xêr hatî mala xweye nû.

– Tu bona çi li ber min ta dibî? ,– Xêrkirê pirsî. –Ez ne Xwedê me, ku wê yekê bistînim.

– Nava hebandinê û qedirda firqî heye,– welatîyê padişatiyê bersiv da- tenê xudanê me layîqî hebandinê ye, lê nava vê padişatîyêda em qedirê wana digrin, yên ku li Êndêlê bi dilê qenc qulixî me kirine. Em usa *jî qedirê wana digrin, yên ku li vir serwêrîyê dikin.* Li Êndêlê me girîngîya qedir fem nedikir.

*Xêrkir, te li Êndêlê quixî min kir. Eger şikestîbûna teye hindava padişêda nîbûya, ezê li vir nîbûma*: ezê li welatê Lonêyî wêranbûyî bûma. Berê ewlin ez borcdarê padişê xweme û ji wî razîme, lê ez usa jî borcdarê teme û ji te jî razîme. Ezê bi kêfxweşî qulixî te bikim û qedirê te bigrim hetanî dawîya jîyana xwe.

Navê min îdî Bêrehm nîne,– ewî Cêylonê xudan navê min li ber textê Dîwanê guhart û ez Lihevhatî nav kirim. Bawar bikî min rehma here mezin li ber padişê me stend.

– Lihevhatî! Navekî çiqasî xweş e! ,– Xêrkirê got.– Hevalê hizkirî, min te li Êndêlê qazanc nekir, wekî te qulixî min bikira. Min te hiz dikir û min ew yek kir, çimkî ez bona jîyana te difikirîm.

– Ezê qedirê te bigrim û qulixî te bikim, hema bona menîyên te. Tê bi cûrê mezin ji alîyê padişêda heq bistînî. Tu bona hizkirina Cêylon xebitîyî. Te tu cara tu tişt nekir, bona ku tu nava peyîhatîyên Cêylonda bihatayî naskirinê, yan jî te heq bistenda. Cêylon bi saya wan meriva bi şabûn dijî, yên ku meriva bi hizkirina xwe qazanc dikin. Wextê ku em Êndêlê bûn, gelekî girîng bû ku me dilê wî fem bikira, lê ne ku t’enê qeretûyê wî. Li cem te herdu jî hebûn, xwîşka delal, û menîyên dilê te derbazî li min bûn. Awa ku bona çi min hevtîya dawîyêye li Êndêlê bi cedandineke mezin dilê geleka qazanc kirin. Li vir min heqê merdanî bona xebata xwe stend, nenihêrî wê yekê wekî ew xebat gelekî kurt bû.

*Xêrkir kenîya:*

– Lihevhatî, ez bona te gelekî şame. Ezê qulixî te bikim hetanî dawîya jîyana xwe.

– Xêrkir tu êdî usa xeber didî, tê bêjî bi sala ser hev tu li Afablê jîyayî,– Lihevhatî got.– Li vî bajarê mezin em bona qulixîhevkirinê

dijîn. Bi rastî, ew merivên ku rêberîyê dikin, xulamên here mezinin. Gelek borcdarîyên me hene û em bi hizkirin wana diqedînin. Dîwana li vir ne mînanî ya li Êndêlê ye. Li vir rêber nacedînin ku meriv qulixî wana bikin, lê diha gelekî şa dibin, ku diha gelek mecala bistînin bona qulixkirinê. Şabûna here mezin, ya her welatîkî li vir qulixkirin e, berê ewlin qulixî padişê me bikin, lê paşê qulixî hemû welatîya bikin, bi taybetî wana, yên ku li Êndêlê hukum li ser me hiştine, û usa *jî welatîyên ku ji nehîyên der dimînin, derheqa kîjanada tê zûtirekê bizanibî. Lihevhatî xeberdana xwe ser hevda anî:*

– Xwîşka delal, ez teva firnax dibim. Here cem padiþşê xwe. Ew hîvîyêye ku te bibîne û bona qulixkirina te heq bide te.

Bi van gotina herduya jî hev hembêz kirin. Xêrkir gihîşte parêzer û ew *çûne berbi text.*

## Xêrkir li ber Cêylon

Xêrkirê îdî dikaribû diha zelal Cêylon bidîta, çimkî ew îdî nêzîkî bîst mêtrî ji text dûr bû. Bi derbazbûna li rex serwêrara, ewê texmîn nekir, wekî ew çawa li ber wê ta dibûn: berê wê li alîyê Cêylon bû. Ji rûmeta padişêye bilind ewê xof texmîn kir.

*Xêrkir bi pêpelîngava hilkişîya û gihîşte dika jorin, deverû kete li ber padişê. Cêylon ji ser text r'abû, gav avît û* ew da sekinandnê. Ewî gelekî nazik xeberda:

– Xêrkir, xulama min ya here biha, tu bi xêr hatî padişatiya min. Ez hîvîya vî wedeyî bûm ku min bi xwe te bidîta.

*Xêrkirê got:*

– Xudan, ez gelekî hîvîya vî wedeyî bûm. Tu padişê minî. Niha ez gumanim, wekî ezê hetanî dawîya jîyana xwe nava hazirîya tedabim û ezê diha baştir qulixî te bikim.

Padişê got:

– Were û wê padişatîyê qebûlke, ya ku bona te hatîye çêkirinê, hela hê pêşîya efrandinên dinîyayê. Ez birçî bûm û te xwerin da min. Ez tî bûm û te av da min. Ez xerîb bûm, û te ez li mala xwe qebûl kirim. Ez bêkinc bûm û te kinc dane min. Ez nexweş bûm, û te miqatî li min kir. Ez li hebsê bûm û tu hatî li cem min.

*Xêrkirê zendegirtî got:*

– Xudan min kengê tu birçî dîtî û xwerin daye te, yan jî tî bûyî û min av daye te? Min kengê tu dîtî, ku tu xerîb bûyî û min te li mala xwe silav kir, yan jî bêkinc bûyî û min kinc dane te? Min kengê tu nexweş dîtî, yan jî li hebsê û ez hatime cem te?

Padişê bersiv da:

– Ez dibêjime te, wekî dema ku te ew yek bona xwîşk û birayên min kir, usa ye te ew bona min kir.

*Cêylon qulixa Xêrkirêye baş nîþan da, ya ku bi cûrê qulixa bona merivên başqe û gurêdabûna wîda hatibû kivşê. Temamîya jîyana wê hate lênihêrandinê, her xeberek, karek, fikirek û menîke dil. Hemû tişt hate ber çava, qulixa wê,* pêşkêşkirinên bona mektebê, ew hizkirina ku ewê hindava hemwelatîyên xweda dabû kivşê, ew yek, wekî ewê nexwestibû tevî karên bêesil û xeberdanên wî cûreyî bibe, ew cêribandinên bona ku ewê bona Cêylon dîtibûn, kirên wêye, ku ewê bi rêstorana xwe qulixî merva kiribû, gihîştina merivên şaşbûyî, girîyê wêye bona undabûyîya, tabîya wêye çûyîna bi rêyên Cêylon, ew yek jî wekî ew teglîfî li teşkîldarîyên civakî nedikirin bona hevsûdîya hindava Cêylonda, ew jî wekî ewê dijî hemwelatîyên xwe xeber nedida û tevî xeberdanên Buxdanbêj nedibû û gelek tiştên mayîn.

*Xêrkir zendegirtî mabû, wextê ku* ev hemû tişt dîtin, bi kîjana ewê hukum li ser meriva hiştibû. Piranîya karên wê, yên ku ewê kiribûn bona rûmeta Cêylon progiramkirî û fikirmîşbûyî nîbûn. Ewê awqasî bi kel û ced dicedand usa bijî, çawa ku nivîsarên kevin hîn dikirin.

Hinek tişt, kîjan Xêrkirê kiribûn, hatine şewitandinê. Bona undakirina mecala û şaşîyên xweye kirî ew gelekî poşman bû. Feqet, tenê beşeke jîyana wêye biçûk unda bû.

## Heqê bona Xêrkirê

Piþşî lênihêrandina karên wê û xeberên wê, padişê li serwêrekî li cem xwe rûniştî nihêrî û pirsî:

– Bona padiþatîya min Xêrkirê li ser çend meriva hukum hiştîye?

– Xudanê min, li ser 5183 meriva,– serwêr got.– Ji yek şeşanîya temamîya binelîya hinkî zêdetir.

– Awqas gelek? ,– Xêrkir ecêbmayî bû.

Cêylon got:

– Tê bîra te, wekî nava nivîsarên kevinda min soz da “wî toximî zêdekim, yê ku te çandîye û barê heqîtîya te zêdekim?”. Xêrkir, padişatîya min bi prînsîpa çendbarebûnê kar dike.

Peyî wê yekêra padişê diha bi hûrgilî da kivşê, ku çawa karên wêye şikestî çendbare bûne, hukumî li ser gelek meriva kirine, nenihêrî wê yekê, wekî ewê tabîya serwêrîyêda cîhê xwe negirtibû. Hukumê karên wê meriv ecêbmayî dihiştin.

*Cêylon serda zêde kir:*

– Çawa ku nvîsar e: Yê merd direşîne û bela dike. Ew dide kesîba. Karên wîye heq, baş, qenc û merd wê dirêj bikişînin û heta-hetayê bimînin”. Ew *jîyana ku gura mindane, wê feydayên çendbare bistîne. Tu welatîk wê derheqa hukumê jîyana xweye rastda nizanibe, çimkî hela hê li ber vî textê Dîwanê nesekinîye. Ev e menî*, wekî gelek nava tiştên biçûkda şikestî nînin. Meriv wana girîng hesab nakin. Feqet, gelek cara hema tiştên ku biçûk tên kivşê nava vê padişatyêda çandina here mezin tînin. Kilîta wê yekê şikestîbûna te bû, nenihêrî tiştên mayîn.

*Cêylon pirsî:*

– Xêrkir, tu vî textê li alîyê minî rastêyî aza dibînî?

– Belê, xudanê min,– ewê bersiv da.

– Evê bibe ew textê ku tê li ser rûnêyî. Tê tevî min hetanî dawîya jîyana xwe serwêrîyê bikî.

*Xêrkir ecêbmayî bû:*

– Xudan, ez layîqî wê serwêrîkirinê nînim. Li wir tenê rêstorana min hebû. Gelek meriv hene, yên ku dikarin wê yekê diha baş bikin, ne ku ez. Ez çawa dikarim li padişatîya vî cûreyîye ecêbda serwêrîyê bikim? Xwehiz nava meda rêberekî mezin bû. Gelo ew nikare serwêrîyê bike? Ez hîvî dikim, xebateke usa bide min, bi kîjanê ez qulixî te û cimeta te bikim.

*Cêylon got:*

– Xwehiz li beşa sera Mezine li piştê ye. Ewê çawa dîzaynêrê tebyetê li beşa bajarê meyî “Rastê” bixebite. Ewê usa jî li cêrge bajarên der çawa dîzaynêrê tebyetê qulix bike. Lê tê bibî serwêr,

bi saya wê hizkirinê, ya ku te hindava min û cimeta minda daye kivşê. Sebira te, aminayî û şikestîbûna te tu layîqî vî qedirî kirin. Gotinên min, yên ji nivîsarên kevin tên bîra te? “Çimkî her kesê ku xwe mezin dike, wê ta bibe (wê tabîyê bistîne, ya ku ji qedirekî yan jî wî heqî nimiztirbe, çi ku min daye wan), û ewê ku ta dibe (derheqa xweda li ser fikira şikestîye û anegorî wê yekê dişuxule), wê bê mezinkirinê (wê tabîya bilind bistîne)”. Xêncî wê yekê, wekî tê serwêrîyê tevî min bikî, min maleke rûmet bona te li ber kenarê behra Mezin, li rex mala xwe, li Merkeza Padişatîyê çê kirîye. Ez zanim, ku tu behrê hiz dikî, û tu çiqasî dengên pêlên behrê hiz dikî û bo wê yekê jî min ew daye te çi ku tu dixwezî, û çi jî şabûnê dide te. Her xulamekî aminra ez xwestinên dilê wî didim.

Gotinên Xêrkirê tunebûn.

– Tê li deh nehîyên vî bajarî serwêrîyê bikî,– padiþê got.– 11 serwêrên mayîn wê t’vî te li hemû 120 nehîyên bajarê Afabêlê serwêrîyê bikin. Tê tevî min û 77 serwêrên bajarê meye mayîn bixebitî, yên ku li ser van texta rûdinên. Serwêrên mayîn jî wê govekên usada bixebitin, yên mînanî xwendinê, senayê, îdarên wedederbazkirinê, çandê û gelek govekên mayîn. Tenê ev 77 serwêr, Bavê min û ez, tevayî program dikin, qirar dikin û serwêrîyê li jîyana Afabêlê dikin. Di navbera min û welatîyên minda tê bibî yeke ji şêwirmend û navçîgarên mine amin.

Wextê ku Cêylon ev hemû tişt Xêrkirêra digotin, Şikestî li piş serayê sekinîbû û bona hevala xweye mektebê şa dibû. Feqet nava şabûna wîda poşmanî bona wê yekê hebû, wekî mecala wî hebû bona padişatîya Afabêlê nava jîyanên bi hezara merivada hukum bihişta, lê ewî ew yek nekir. Ew dikaribû bibûya yekî ji wan serwêra, serwêrtîya kîjana hebû ku tevî Cêylon bixebitîya. Ew razî bû, wekî li padişatîya Afabêlê hatibû qebûlkirinê, lê fem dikir, wekî wedê xweyî kurt, yê li Êndêlê, badîhewa xerc kiribû û wekî ew yek wê hukumî li ser 130 salên jîyana wîye mayîn bikira.

Padişê gote parêzerê Sereke:

– Taca Serketî û darê Serwêryêyî desta minra bîne.

Padişê tac û darê Serwêryêyî desta hilda, û tac danî li ser serê Xêrkirê.

Her bijîyî, padişê kire gazî- tu xölameke aminî, tu nava wî tiştê biçûkda amin bûyî, yê ku min teslîmî te kiribû û niha çawa heq tê bibî serwêra deh nehîya û 12 bajara.

Padişê darê Serwêryêyî desta jî da wê û gotê:

– Navê te *wê îdî Xêrkir nîbe, çimkî ezê navê nû bidime te. Navê* te *wê bibe Serkevtîya Biguman. Min negotibû hemû welatîyên Êndêlê*? “Ewê ku serkeve û heta xilazîyê kirên li gora dilê min bike, ezê wî hukumê li ser nehîya û mileta bidime wî: ewê bi şivdara hesinî şivanîtîyê li wan bike, çawa ku min ew serwêrî ji Bavê Xwe stend”.

Cêylon nêzîkî wê sivirê bû, li kîderê berê dawî danîbû. Ewî anî û ew da Serkevtîya Biguman û got:

– Hevala mine giranbiha û hevala nava serwêrtîyêda, tu dikarî evî berê ji dara Jîyanê tam bikî.

*Mînanî yên mayîn, Serkevtîya Bigumanê jî texmîn kir, ku wextê tamkirina vî berê herî xweş* ew çawa tê paqijkirinê. Fikirên wê bi hizkirina diha mezin tijî bûn, û xwestina wêye qulixkirinê berfireh bû, gihîşte derecên usa, yên ku berê bona wê eyan nîbûn. Ew ji hemû ênêdêlîya û fikirên tarî paqij bû. Hemû tişt nû bû. Ewê ruhdarbûn, xweşbextî, guman û bawarî texmîn kir. Ewê li Cêylon nihêrî û kenîya. Eva destpêka hevaltîya hetanî dawîya jîyanê bû.

*Cêylon rêberîya Serkevtîya Bigumanê kir, hetanî ber textê wê û gotê:*

– Serkevtîya Biguman bizivire û malbeta xwe binihêre.

Ew zivirî, û rastî destlihexistina hat. Temamîya serayê bi dengê şabûnêva hejîya, meriva destpê kirin bireqisin. Şabûn himberî dîwanên merivên baþqe diha zêde bû. Atmosifêra bi heyteholê û dengên cedandinêva tijî bû. Li ser sifetê Serkevtîya Biguman ken bû: qebûlkirina wî cûreyîye bi hizkirinê ew ecêbmayî hişt. Padişê wê ew hembêz kir û bi şabûn elam kir:

– Baş, xulama qenc û amin. Bikeve nava şabûna xudanê xwe.

Bi vî cûreyî serpêhatîya me, ya derheqa padişê mezin, xulamên wî û padişatîya Afabêlêda ser hevda tê.

## Xebera şîretdayînê û eşaretîyê

Nava vî serê kitêbêda me ew tişt fem kir, ku dîwana pîroza wê çi cûryîbe. Bêyî şik, rûmeta dîwana Mesîh wê diha zêdetirbe, lê ne ku hemû tiştên nava vê serhatîyêda. Feqet, ev serhatîya alêgorîk gelek rastîyên derheqa padişatîya Xwedêda raber dike.

Meremê vê serhatîyê ne ku îzbatkirina rastîyê ye, lê eşkerekirin û derbazkirin e. Wextê ku Îsa metelok gilî dikirin, meriva fikira wana fem dikirin, lê li ser wan tiştên hûr guhdarîya xwe nedidane merkezkirinê, yên ku awqasî jî bona wan girîng nîbûn, bona femkirina rastîyên ku ji alîyê wîda dihatine derbazkirinê.

Hema bi wî cûreyî jî min cêriband bi hûrgilî ew fikirên girîng: yên nava vê serpêhatîyêda raber bikim, yên ku padişatîya Mesîhe heta-hetayê didine kivşê. Hetanî dawîya kitêbê, hûn dikarin careke mayîn vê alêgorîyayê bixwînin, bi saya kîjanê hûnê wan hînkirinên Încîlê diha bi kûrayî fem bikin, yên ku nava serên vê kitêbêye mayîndanin.

SERÊ 9-A

# Ezman

*"Lê ezê bi heqîtî sifetê Te bibînim, û çaxê ez hişyarbim,*
*ezê bi mînanîhevbûna Te têrbim"*
— Zebûr 17:15

Niha em derheqa wê yekêda xeberdin ku çi diqewime, wextê ku yên heq ji vê jîyanê dûrdikevin. Çawa ku bona bêbawera cîhê jîyînêyî wedelû heye, yê ku çawa doje (Hadês) tê navkirinê û cîhê jîyînêyî xilazîyê (dawîyê), yê ku çawa gola Agir tê navkirinê, usa jî du cîh hene, yên ku bona wan bawarmendane, yên ku ji vê jîyanê dûrketine. Cîhê niha li kîderê ew dijîn, ji alîyê gelekada çawa *Ezman* tê navkirinê, lê anegorî Xebera Xwedê ew tê navkirinê çawa Orşelîma ezmîn. Cîhê jîyanêyî heq, yê dawî jî çawa Orşelîm tê navkirinê, lê ewê bibe li ser vê dinîyayê. Eva ew bajar e, yê ku piştî dîwana dawî wê ji ezmîn peya bibe. Navê wê *Orşemîla Nû ye* (binihêre Eyantî 21:2).

## Orşelîma Jorin

> Lê hûn nêzîkî çîyayê Sîyonê wî bajarê Xwedêyê sax, Orşelîma ezmana û nêzîkî wê kombûna rengîne milyaketên bêhesab bûne, wê civîna nuxurîyaye, ku navên wan li ezmana nivîsar e. Hûn nêzîkî Xwedê bûne, ku hakimê hemûya ye û nêzîkî ruhên rasta bûne yên ku gihîntine kamilîyê û nêzîkî Îsayê, ku wekîltîyê peymana Nû dike..." (Îbranî 12:22-24).

Orşelîma ezmana, yan jî "Orşelîma jorin" (binihêre Galatî 4:26) bajar e, yê ku nava alêgorîya meda anegorî bajarê Afabêlê ye. Ew li ser çîyayê bi navê Sîyon hatîye çêkirinê. Li wir Bav, Kur û bêhesab milyaket dijîn. Kombûna rengîne milyaketên bêhesab, û ew civîna nuxurîya pîrozên ji peymana Kevinin û yên ku nava Mesîhda razayîne jî, li wir dijîn.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî "ruhên raste (heq) kamil" jî li vî bajarîne. Gelo ev meriv kîne, eger em hesab hildin, wekî

xudanê nivîsarê îdî derheqa pîrozên peymanên Kevin û Nûda daye dîyarkirinê, yên ku çûne heqê xwe bistînin.

Bîr bînin, wekî bi bûyîna bi Ruhê Xwedê em dibine yên nûye çêkirî. Ruhên me bi mînanîhevbûna Mesîh kamil dibe, û em nava Wîdanin. Nava vê xeberêda xudanê nivîsarê derheqa şexs û bedenên wan merivada nabêje, lê tenê derheqa ruhên wanda dibêje. Ez bawar dikim, wekî eva derheqa wan pîrozadane, yên ku li ser vê dinîyayê, li vir qulixî Îsa dikin. Derheqa wê yekêda bifikirin. Xudanê nama Îbranîya mera dibêje: “Usaye, êdî em mêrkîmî nêzîkî textê Xwedêyî keremê bibin...” (Îbranî 4:16). Textê keremê, yan jî text di navbera bajarê Xwedêda ye û ev teglîfkirin (dewatkirin) bona me ye, yên ku li vê dinîyayêne. Gelo diqewime, wekî gelek meriv, yên ku hela hê li ser vê dinîîyayê dijîn, li ser text gelekî eyanin, çimkî ew gelek cara bi rîya duakirinê diçin wir.

Em ruhin, şexsên kîjana hene, yên ku ji fikirê, xwestinê û texmînkirina çêkirîne, û niha jî nava bedenên fîzîkîda dijîn. Îsa got, wekî em tenê “bi ruh û rastîyê” dikarin bi rastî Xwedê bihebînin (Yûhenna 4:24). Pawlos careke mayîn vê yekê dide dîyarkirinê: “Xwedê şedê min e, ew Xwedêyê ku ez nava Mizgînîya Kurê Wîda bi dil û can xulamtîyê dikim...” (Romayî 1:9). Çawa ku ruhên me bi şikilê Xwedê hatine çêkirinê, em ji nûva bûne, bi saya xwîna Îsa û qewata Ruhê Pîroz em dikarin bikevine sera textê Xwedê, wextê ku hewcetîya hebandinê, yan jî xwestin hebe.

## Seredanên li ezmana mîyaserkirî

Orşelîma jorin niha li cîhekî usa ye, yê ku çawa ezmanê sisîya tê navkirinê. Eva ew cîhê rast e, li kîderê Pawlos pêşîya mirina xwe qesidîbû. Ew dinivîse:

> “Lê belê, ezê niha derbazî ser wan dîtin û eyantîya bibim, yên ku Xudan nîşanî min dane. Ez bawarmendekî Mesîh nas dikim, 14 sal pêşda nizanim qalibda bû, nizanim bê qalib bû, ew Xwedê zane, heta ezmanê sisîya hate hilatinê. Û ez zanim, ku ev meriva, qalibda bû, bêqalib bû, ez nizanim Xwedê zane, heta buhuştê hate hilatinê û tiştên nayêne gotinê bihîstin, ku ji mêriv nakeve bona wan tişta xeberde jî” (B Korintî 12:1-4).

Xwedêzan wê yekêra qayîlin, wekî Pawlos ew yek derheqa xweda digot. Nava tercima “Nyû Lîvîng”-êda xebera sisîya vî cûreyî nivîsar e: “Çardeh sal pêşda ez Ezmîn hatime hilatinê”. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Pawlos nizanibû, ku ew bi bedena (bi qalibê) xwe li wir bû, yan na? Vê yekê meriv dikare usa şirove bike, wekî ezman cîhekî rast e û mêtrîyalî ye. Gelek difikirin, wekî ew cîh dîyar nîne, kivş nîne, li kîderê meriv mînanî ruh digerin. Na xêr, ew cîhekî matêrîyalî ye li kîderê soqaq, dar, terewil, avayî, av û tiştên mayîn hene.

Ez çend meriva nas dikim, yên ku çûne ezmana û paşda vegerîyane, lê îzinê bidin, ez serhatîke xweye here hizkirî wera gilîkim. Hevalekî minî serwêr heye, navê kîjanî Grêg e. Sala 1979-a, roja serwêrtîya wîye ewlin, ew ji civînê paşda vegerîya malê û dît, wekî jina wî li ber pêpelînga rûniştîye û ji kontrolê der digirî. Ewî carekêra fem kir, wekî tiştekî gelekî xirab qewimîye. Ew pê hesîya, wekî kurê wîyî deh salî Castîn têlêvîzîona biçûk biribû oda himamê, bona ku wextê avxwekirinê lîstika fûtbolê temaşe bikira. Ewî nişkêva têlêvîzyon avîtibû nava avê û ênêrgîya êlêktrîkî wî xistibû. Wextê ku Grêg çû cem kurê xwe, xwîna tamarên Castîn nedixebitî. Bedena wî sar û şînbûyî bû, çavên wî gelekî fireh bibûn û ew yek dida kivşê, wekî mejûyê wî nedixebitî. Grêg li polîsîyayê çawa cîgirê şêrîf xebitîbû û ewî zanibû ku çawa alîkarîya doxtirîyêye ewlin bida. Ew nava xebata xweda bibû şedê gelek mirina. Eger ew nava halekî usada bûya, wextê ku ofîsêrê polîsyayê bû, ewê elam bikira, wekî zyankêş mirîye û wê gazî lêpirsîyarê polîsyayê bikira.

Qerez, Grêg bawarmend bû û derheqa qewata duakirinêda zanibû. Ewî destbi duakirinê kir û pêra jî hewa dida kurê xwe. Piştî çend deqa xebatkarên ambulancê (alîkarîya lez) hatin. Grêg îzin da, ku pêşekzan xebata xwe bikin, lê ewî duakirin berdewam kir. Koma alîkarîya lez (ambûlansê) bîstûpênc deqa li ser wê zarokê xebitî, lê wanra li hev nehat, jîyana wî paşda vegerînin. Dezgê kontrolkirina dil li ser êkrana xwe xeta rast dida kivşê. Xebatkarên ambûlansê êdî nedixwestin wê yekê berdewam bikin, çimkî bi fikira wan ew yek êdî fanatîzm bû.

Paşê Grêg dua kir: “Bavo, bawarîya min êdî tune. Min bawarîya xwe êdî ser hevda anî, lê ez zanim, wekî nava Xebera Teda Tu derheqa bawarîke mayînda dibêjî” (Ewî derheqa pêşkêşa bawarîyêda digot, derheqa kîjanêda A Korintî 12:9-ada nivîsar e).

Bi gotinên Grêg, ewî li jora serê xwe tiþtekî mînanî destekî t'exmîn kir. Hema wî çaxî ewî texmîn kir, wekî ji ruhê wî qewat û serwêrtîke mezin bilind bû, û ewî li kurê xwe kire gazî:

– Tê bijîyî û tê nemirî. Bi navê Îsa.

Nişkêva aparata kontrolkirina dil destpê kir nîşana bide û li ser êkranê livandina tamara hate kivşê. Xebatkarên ambûlansê şabûnêva tijî bûn. Wexê ku Castîn pêpelîngên malêra peya kirin û danîne li avtomaşîna ambûlansê, rengê bedena wî ji rengê şîn werguhêzî yê sor bibû, çavên wî bi temamî hatibûne dasekinandinê, lê bedena wî germ bû.

Grêg gelekî ruhdar bibû. Kurê wî sax û silamet bû. Niha şedetîya wîye derheqa ecêba mezinda hebû û ewî dikaribû derheqa wê yekêda hemû hevalên xwera gilî bikira, ku Xwedê çi kir. Feqet, ewî nizanibû, wekî şerkarîya bona emirê kurê wî hela hê ji nûva destpê bibû.

Doxtira gotin, wekî kurik li ser hişê xwe nîne. Piştî lêkolîna, wana da zelalkirinê, wekî perdên li ser gurçikên wî katêtrêra derdiketin. Bi zimanê ne pêşekzanîyê ew yek dida kivşê, wekî organên wîye hundur xirab dibûn. Doxtira gote Grêg ku eger kurê wî bijî, ewê mînanî şînayêbe. Diha dereng wana got, wekî mejûyê wî eger bixebite, wê mînanî mejûyê zaroka sêmehîbe, lê faktora fikirdarîya wî wê 0,01 be.

Hevt meha ser hev malbeta wî dua dikir û nedixwestin teslîm bûna, wextê ku Castîn nişkêva ji wî halê bêhiş hişyar bû. Bavê wî li rex cî-nivînê wî rûniştî bû, wextê ku ew yek qewimî û ewî destpêkir ser hev pirsa bide kurê xwe û bersivên wan pirsa bistîne.

Castîn xwendina navîn stend, zanîngeha Los Ancêlêsê xilaz kir (demam) kir û li mekteba Încîlê xwend, û ji alîyê wan îdarada gelek hurmetname stendin. Ew usa jî li mekteba navîn mezinê dersxana xwe bû. Roja îroyîn malbeta wîye baş heye.

## "Bavo, ez tevî Îsa bûm"

Peyî wê yekêra, piştî sê roja, wextê ku Castîn ji nexweşxanê derxistin, Grêg texmîn kir, wekî sifetê kurê wî ronî dibû.

– Ev çi diqewime, Cast*în*? ,– ewî pirsî.

– Bavo, ez tevî Îsa bûm,– Castîn got. Wextê ku têlêvîzyon kete nava ava himamê, min tu tişt texmîn nekir. Milyaketekî mezin destê minî rastê girt û ewî ji qalibê (bedena min) ez derxistim. Em

tûnêlekêra firîn: fir*îna me çiqas diçû diha* lez dibû. Çûyîna me weke bayê ronahîyê bû, hetanî ku em li soqaqeke Ezmîn peya bûn.

Castîn bavê xwera gilî kir, wekî soqaqên ezmana avzêrkirî nînin: ew ji zêr*ê paqij hatine çêkirinê û ewî nava wan soqaqara dinihêrî. Li ser dinîyayê zêr* nikare awqas paqijbe, çiqas ew li ezmana ye, lê nava zêrê herî paqijra meriv dikare alîyê mayîn binihêre. Li ser dinîyayê jî wî zêr*î carna nava çêkirina pencerada didine xebatê, bona ku rengê zêr bidine wan (bi wî cûreyî şuşên formên pîlotên ezmîn, teyarada şuşên pêşîya pîlota,* usa *jî pencerên* hinek avayada didine xebatê).

Castîn gilî kir, wekî merivên ewlin, yên ku li ser wê soqaqa ezmana ew silav kirin, xêrxwezên wane mirî bûn. Ewî navên wan meriva dan, nenihêrî wê yekê, wekî ewî tu cara çend merivên ji nava wana pêşda nedîtibûn û navê wan jî (dê û bavê w*î ew meriv nas kirin). Nava wê komêda jinek hebû, navê kîjanê Fîlîs bû. Ew cînara wa*n bû. Dayîka Castîn mehekê pêşîya wê qewimandinê tevî wê dua kiribû û r*êberîya wêye li c*em Îsa kiribû. Ew jina cînar piştî qebûlkirina Îsa, piştî du hevtîya, miribû.

Castîn wan merivara xeber dida, wextê ku nişkêva deng bihîstin, û merivên dora wî destpê kirin dûrkevin: ewî Îsa dît.

Xudan Castîn bire rêwîtîya ezmana. Li bajarê Ezmana, gelek soqaq û avayî hebûn. Ew bi rastî mezin bû. Kulîlk, şînayî û heta kevir jî sax bûn, yên ku tê bêjî distiran. Castîn got, wekî dihate texmînkirinê, wekî tê bêjî wana pesinê Xwedê didan. Wextê ku ewî nigê xwe diatanî li ser şînayîkê, yan jî kuîlkekê, ew şînayî nediket, lê carekêra vedigerîya ser cûrê berê. Castîn texmîn kir, wekî hemû reng gelekî berbiçav û vekir*î bûn, diha gelekî vekirî, ne ku* li ser dinîyayê. Li vir rengên usa *jî hebûn, yên ku Castîn tu* cara nedîtibûn. Mecal dane wî, ku ew malên day*îka xwe*, bavê xwe, bira û xwîşka xwe bibîne.

Peyî vî hemû tiştîra tiştek nişkêva hîvîya wî bû: Îsa got, wekî ew gerekê paşda vegerîya li ser dinîyayê. Castîn nedixwest ji ezmîn dûrketa. *Lê Îsa* ew bire cîhekî, ji kîderê xêlîk kişande jor. Cast*în dît*, wekî bavê wî paşda gazî wî dike:

– Ew bavê te ye û serwêrîya wî ya paşda gazîkirina te heye.

Bi serhevdaanîna serhatîya xwe, Castîn hîvî ji bavê xwe kir, ku eger ew careke mayîn bimire bila ew paşda gazî wî neke. Wextê ku

Grêg derheqa vê yekêda minra gilî kir, ew yek tê bêjî minva çawa tiştekî eşq hate texmînkirinê. Ezman bi wê derecê ji dinîyayê baştir e, wekî çawa min da zelalkirinê, ew merivên ku ew yek tam kirine, her dem bi dijwarî paşda veger*îyane*.

Pawlos jî rûyê wê yekêda nava şerkarîyêda bû. Ew derheqa wê yekêda civîna Fîlpîyara dinivîse: "Ez hizretim ku dûrkevim, ji vê dinîyayê azabim, herim û tevî Mesîhbim, minra eva hê gelekî qenc e" (Fîlîpî 1:23, AMP). Ne tenê awqasî qenc e, lê gele-gelekî qenctir e. Pawlos bajarê Xwedê dîtibû û dixwest paşda vegerîya li wir, lê ewî qirar kir bona kara padişatîya Xwedê bimîne.

Paşê Castîn bavê xwera gilî kir, wekî wextê ku ew li Ezmana bû, ew dehsalî nîbû. Qalibê wî yê mêrê gihîştî bû. Gelek meriv, usa jî Cast*în*, bawar dikin, wekî bi ketina nava qalibên rûmetbûyî, em hemû jî wê bibine sîûsêsalî. Ew yek nêzîkî aqila ye, çimkî wî yaşîda Îsa hate xaçkirinê û Xebera Xwedê dibêje: "Belê, delalno, niha em êdî zarên Xwedêne û hela hê eyan nîne, emê bibine çi wextê ku Mesîh paşda vegere. Lê em v*ê yekê zanin*, wekî çaxê Îsa eyan bibe, emê bibine mîna Wî" (A Yûhenna 3:2, NLT).

Awa serpêhatîke ji wan gelek serpêhatîya, ya ku min dikaribû wera gilî bikira. Usa jî Xebera Xwedê wê dide kivşê, wekî Ezman rastî ye. Ewên ku bi aminayî qulixî Îsa dikin, wê bikevine wî bajarî, wextê ku ew ji vê dinîyayê herin.

## Xilazbûna ruh, şexs û bedenê

Çawa ku min îdî da kivşê, ruhê mêriv wî çaxî dibe merivekî nû, wextê ku ew Îsa çawa Xudan qebûl dike. Ew carekêra ji nûva tê çêkirinê, dibe mînanî Îsa. Yûhennayê Şandî wê yekê îzbat dike: "Çawa ku Ew e, usa jî emin *li vê dinîyayê*" (A Yûhenna 4:17). Çawa ku hûn dibînin, Yûhenna berbirî bawarmenda dibe, yên ku li ser vê dinîyayê ne, lê ne ku li ser ya wana, yên ku êdî çûne heqê xwe bistînin. Ew merivê ku bi rastî ji nûva bûye, li vir û niha bi Ruhê Xwedê kamil dibe.

Carekêra piştî xilazbûna ruhê me, xilazbûna şexsê me destpê dibe. Çawa ku me êdî daye kivşê, şexs ji fikirê, xwestinê û texmînkirinê hatîye çêkirinê. Şexsê me bi Xebera Xwedê û bi gurêdabûna Xebera Xwedêda yan xilaz dibe, yan jî tê werguhastinê. Aqûbê şandî vê yekê îzbat dike û dibêje: "Zanibin, xwîşk û birayên

mine delal, bira her meriv bihîstinêda ser xwebe, lê xeberdan û hêrsketinêda giranbe... hemû mirdarîyê û her xirabîyê ji xwe dûrxin, bi milûktîyê *wê xebera nava weda çandî* qebûlkin, ya ku dikare *ruhên (*yan jî şexsên*) we xilazke.* Xeberê *biqedînin*, ne ku tenê bibhên û usa xwe bixapînin" (Aqûb 1:19,21,22). Ew yek girîng e bidine kivşê, wekî Aqûb bi xebera xweye derheqa xilazbûnêda berbirî *birayên* bawarmend dibû, lê ne ku bêbawera. Ewî guhdarî diatanî li ser bihîstin û qedandina xeberê.

Şexs parçekî mêriv e, dereca kîjanîye xilazbûyî em qirar dikin. Em dikarin şuxulkarîya şexsê xwe bidine lezêxistinê, wextê ku em Xebera Xwedê dibhên û gurê dikin. Feqet, em dikarin usa jî wê şuxulkarîyê bidine hêdîkirinê, wextê ku em wê yekê hesab hilnadin, çi ku Xwedê gotîye. werguhastina şexsên me gelekî girîng e, ku em şuxulkarîya bawarîya xwe bi açixî ser hevda bînin.

Bi kutasî parçek jî heye, yê ku gerekê xilazbe, ew jî bedenên mene. Bi guhdarî wê yekê bixwînin, çi ku Pawlos derheqa wê yekêda dinivîse.

> "Çimkî em zanin, wekî wextê ku ev konê li ser dinîyayê xirab bibe, kîjanîda em dijîn (wextê ku em bimirin û bedenên xwe bihêlin), mala me wê li Ezmîn hebe, bedena heta-hetayê, ya ku ji alîyê Xwedêda bona me çêkirîye, lê ne ku bi destê meriva. Em nava van bedenên (qalibên) xweda diwestin û em hîvîya wê rojêne, wekî kengê emê bedenên (qalibên) xweye ezmana, mînanî kinca xwekin. Çimkî emê nebine ruhên bêyî beden, lê emê bedenên ezmanaye nû xwebikin. Bedenên meye ku dimirin, me def didin, ku em binelin, lê usa nîne ku em dixwezin bimirin û tu cara bedena me tunebe. Em naxwezin bikevine nava qalibên nû, bo ku ev bedenên ku dimirin, bi jîyana heta-hetayê betavebin. Xwedê bi xwe em bona wê yekê hazir kirine û Ruhê Xwe çawa bihê ji ber sozê xweva da me. Awa, em her dem gumanin, em zanin, heta em vî qalibîda dimînin em ji Xudan dûrin, çimkî em bi bawarîyê dijîn, lê ne ku bi dîtinê. Û gumana me heye, û meyê diha zêde bixwesta ji vî qalibî derketana, çimkî wî çaxî emê tevî Xudan bûna (B Korintî 5:1-8, NLT).

Ev gotin gumanê didine me û serbara serda şexsên me paqij dikin. Guhdarbin, wekî Pawlos tenê wê yekê nade kivşê, wekî bedenên me wê yê heta-hetayêbin, lê gotinên xwe li ser wê yekê dide hîmdanînê. Beşeke mayînda ew dinivîse: "Çimkî gerekê evî dêris ne dêrisîyê li xwe wergire û evî mirî nemirîyê li xwe wergire"

(A Korintî 15:53, NIV). Bedenên me wê bi rastî bibine mînanî bedena Îsa, çimkî nava Xebera Xwedêda nivîsar e: "... Mînanî rabûna Wî... mînanî mirina Wî" (Romayî 6:5), û "Delalno, niha em zarên Xwedêne û hela hê eyan nîne, emê bibine çi. Lê em vê yekê zanin, ku çaxê Îsa eyanbe, emê bibine mîna Wî, çimkî emê Wî usa bibînin, çawa heye (A Yûhenna 3:2).

Em binihêrin, ku piştî rabûnê, bedena Îsa çi cûreyî bû. Wextê ku xilazbûna bedena me biqewime, hemû cudatîyên bedena Wî wê hebin. Werin em ji wê yekê destpêkin, ku hema li ber mexber, wê şebeqê çi qewimî, wextê ku Ew ji nava mirîya rabû. Meyrema Magdalênayê ya ewlin bû wekî mexberê vala dît û girîya, fikirî, wekî bedena Xudan dizîbûn.

> "[Ew]... li pişt xweva vegerîya û dît, ku Îsa li wêderê sekinîye, lê ewê nizanibû ku ew Îsa ye. Îsa gote wê: "Evdê tu çima digirîyî? Tu li kê digerî?" Meyremê tirê qeyî ew rezvane û gote Wî: "Ez xulam, eger te ew hildaye, minra bêje te ew danîye kîderê, wekî ez Wî ji wêderê hildim?"" (Yûhenna 20:14,15).

Îsa ji merivê sade cuda nedibû. Ew mînanî wan merivên nava fîlmên fantastîkda nîbû. Meyremê Ew nas nekir, çimkî ewê bawar nekira, wekî Îsa sax bû. Ewê dît, ku Îsa bi barbarî kuştin û paşê hed kirin. Tenê wî çaxî, wextê ku Îsa bi xwe wêra xeberda, ewê bawar kir, wekî li ber wê Xudan sekinîye. Ewê Îsa rezvanra şaş kir. Dêmek, bedena Wî gelekî mînanî bedena me ye. Bedena Îsa bi cûrê xweva ji bedena merivê sade cuda nedibû. Qerez, em gerekê bipirsin, Meyremê bi dîtinê ruhê Wî didît, yan bi rastî bedena Wî hebû? Bersiva vê pirsê nava serhatîke mayînda tê gotinê, kîjanêda Îsa li şagirtên xwe eyan bû. Ewî got: "Hûn çima şaşmayî mane û dudilîne? Awa li dest-pîyên Min binihêrin ku ez xwexwame. Û destê xwe bidine Min û bibînin, çimkî goşt û hestûyên ruh tunene, lê çawa ku hûn dibînin, yên Min hene (Lûqa 24:38,39).

Beden û hestûyên Îsa hebûn! Dêmek, yên me jî wê hebin. Feqet guhdarîyê bidine ser, wekî Îsa tu tişt derheqa xwînêda negot. Menî ew e, wekî xwîna Wî li ber textê Kerema Xwedê rijîya. Niha, bi fikira min, tamarên Wî da jîyana Xwedêye bi rûmet dikişe.

Îsa usa jî dikaribû xwerin bixwera. Nivîsar e: "Û hê ji şabûna bawar nedikirin, heyr-hijmekar mabûn, Ewî wanra got: "Qet tiştekî

xwerinê li cem we heye?”. Wana çîtî mesîyê pijandî da wî. Ewî hilda û li ber çavê wan xwer” (Lûqa 24:41-43).

Tenê carekê nîne, wekî Îsa li ber şagirtên xwe xwer. Du qewimandinên nivîsare mayîn jî hene: yek li mala merivekî, yê ku li ser rîya Êmmaûsê rastî Wî hat û ya mayîn, wextê ku Ewî li ber behrê taştê bona yanzdeh şagirtên xwe hazir kir. Usa dertê, wekî emê jî bi bedenên xweye rûmet xwerinê bixun.

Îsa bi bedena Xweye rûmetbûyî, mînanî merivê sade, dikaribû xeberda, bistira, bigirîya, tişt hildana destên xwe û tiştên mayîn bikira, lê Ew dikaribû nava dîwarara derbaz bûya û carekêra betave bûya.

Diqewime hûn bipirsin: “Goşt û hestûîyên Wî hebûn û ew dikaribû nava dîwarara derbaz bûya û betave bûya?”. Bêguman: bixwînin, ku Yûhenna çi dinivîse: “Wê êvarê, roja yekşemê, şagirt li piş derîyên girtî civyayî bûn, çimkî ji rêberên cuhîya ditirsîyan. Nişkêva Îsa hat nava wanda sekinî” (Yûhenna 20:19, NLT).

Wextê vê rasthatina tevî şagirta, Îsa hîvî ji Tûma kir, ku pêçîya xwe dayne ser kefa destê Wî, û destê xwe jî bike nekisa Wî. Em careke mayîn zelal dibînin, wekî goşt û hestûyên Îsa hebûn. Wî çaxî ew yek çawa bû, ku Ew nişkêva nava wanda sekinî, nenihêrî wê yekê, wekî derî girtîbûn? Ew nava dîwêrra derbaz bû û li wir eyan bû. Xêncî wê yekê, Ew bi hêsanî betave dibû, derheqa çida dîsa nivîsîye. Nivîsar e, wekî Ewî tevî wan meriva nan ker kir, yên ku li ser rîya Êmmaûsê rastî wî hatin: “Hingê çavên wan vebûn, û Ew nas kirin. Û Ew ber çavên wan betave bû” (Lûqa 24:31).

Emê jî wî cûreyî, li cîhekî mayîn, bi bedenên xweye rabûyî, bikaribin eyanbin û paşê betavebin. Ev yek şirove dike, wekî emê çawa bikarbin dûrayên mezine nava ezmanê nûda û wedê nûda derbazbin. Ev karebûn wê bona me pêwîstbe, çimkî bajarê Xwedê bi dirêjaya xwe dighîje 2250 kîlomêtrî û beraya wî jî awqas e, û xêncî wê yekê hewcetîya me wê hebe, ku em rêwîtîyê berbi galaktîkayên mayîn mîyaser bikin.

Emê jî bikaribin nava hewêda bifirin: bîr bînin, wekî piştî mayîna çil rojên tevî şagirtên Xwe, Îsa çû berbi Ezmîn. Ji wan tişta yek jî, derheqa kîjanîda, Castîn bavê xwera gilî kiribû (mrivên başqe jî, yên ku çûne Ezmana û paşda vegerîyane, û kîjana ez nas dikim,

dîsa wî cûreyî gilî dikin) ew bû, wekî meriv dikare bigere, bifire, yan jî carekêra cîguhastî cîhekî mayîn bibe. Wextê gera xwe Castîn carna digerîya, lê carna jî difirî ku ji cîhekî bighîje cîhekî mayîn.

## Padişatîya Mesîhe hezarsalî

Em gerekê derheqa cîguhastina bajarê Xwedêda xeberdin, lê berî her tiştî em derheqa qewimandinên pêşîya wêda bêjin. Dewrana civîna wê bi qezîya hevtsaleye Mezinva ser hevda bê. Merivê neheq, yê dijî Mesîh, wê xwe eyanke û geleka bike nava şaşîyê. Ewê dijî wî hemû tiştî derê, çi ku çawa Xwedê tê navkirinê û hebandinê dest bîne, û ewê xwe mezin bike, pesinê xwe bide. Ewê pîroza bizêrîne û wê nava tarîstana mezin û serhildana dijî Xwedê rêberîyê li gelek mileta bike.

Nava vî wedeyîda Xudanê bê peyî pîrozên Xwe. Hinek bawar dikin, wekî ewê destpêka wê qezîya hevtsale biqewime, hinek jî dibêjin nîveka wêda, lê hinek jî dawîya wêda. Nava vê kitêbêda ezê derheqa wê yekêda xeber nedim. Ya girîng ew e, ku gelo em hazirin?

Peymana Nûda Pawlos çend cara derheqa “rahiştina” Civînêda dibêje. Ji wan beşa yekêda niîsar e:

> “Xudanê xwewe bi elametîke fermanî, bi dengê serekmilyaket û lêxistina borîya Xwedê ji ezmên bê xwarê û ew mirîyên ku Mesîh bawar kiribûn, wê pêşîyê ji mirinê rabin, paşê ku em sax mane, tevî wan ewira bêne rahiştinê, hewêda rastî Xudan bên û bi vî awayî emê heta-hetayê tevî Xudan bin” (A Têsalonîkî 4:15-17).

Li vir gilî derheqa hatina Mesîhe dudada nîne, çimkî vê carê Mesîhê neyê li ser dinîyayê, lê wê aminên Xwe nava ewrada bibîne. Hatina duda wê dawîya qencîya hevtsaleye mezin biqewime, wextê ku Îsa bi hespê boz vegere, rêberîyê eskerên dinîyayê yan jî elaleta pîrozên Xwe bike (binihêre Cihûda 14).

Yê dijî Mesîh, pêxemberê derewîn, rêberên hemdinîyayê û eskerên mileta wê berevbin bona ku dijî Xudan û eskerê wî şer bikin. Nava wê şerkarîya yekrojeda Îsayê bi dilê Xwe wan bixe û teyredên ezmana wê bedenên wan bixun. Ev qewimandin çawa Harmegedon tê navkirinê, çimkî ewê li deşta Mêgîdoyê biqewime,

ya ku ji çîyayê Karmêxosê destpê dibe û diçe dighîje Orşelîmê (binihêre Eyantî 16:16 û 19:11-21).

Nava temamîya dinyayêda wê gelek meriv hebin, yên ku wê nava wî şerîda dijî Xudan serî hilnedin û ne jî wê xwe pêşkêşî yê dijî Mesîh bikin. Gelek xwedêzan bawar dikin, wekî ewê sax bimînin û wê nava wedê mayînda bijîn, yê ku çawa padişatîya Mesîhe hezarsale tê navkirinê. Ewê li welatên xwe bimînin û wê bin serwêrtîya Mesîhe hemdinîyêda bin. Bedenên wanê wê yên tebyetî bin û ewê jîyana li ser dinîyayê berdewam bikin.

Dêmek, bi texmîn, li ser dinîyayê wê du cûrên meriva hebin, yên ku wê piştî şerê Harmegedonê sax bimînin û usa jî bi pîrozava, yên ku wê tevî Îsa paşda vegerin. Bedenên wan pîroza wê mînanî Îsayê Padişa rûmetbûyî bin, û ewê li ser dinîyayê tevî Wî serwêrîyê bikin. Ew yek dijwar nîne fem bikin, wekî ev herd cûrê meriva wê çawa bi hevra xeberdin. Ewê jî wî cûreyî biqewime, çawa ku Îsa piştî rabûna Xwe wanra xeber dida, yên ku peyî Wî diçûn. Pîrozên rûmetbûyî wê bikaribin xeberdin, bigerin, bixun û tevî merivên bi bedenên tebyetî bikevine nava heleqetîya.

Încîl dide kivşê, wekî nava wî wedeyîda aşîtîya hemdinîyayê wê hebe, yan jî, diha rast, aşîtîya ezmana, çimkî mîrêcin û milyakên wîye xirab wê bi hezar sala bên girêdanê. Şer wê tunebin, usa jî sêrbazî, hiznekirin, xirabkarî, nexweşî û tiştên mayîn wê tunebin, çimkî hemû milet wê li Xwedê vegerin. Mîkîyayê pêxember dinivîse:

> “Nava rojên dawîda paristgeha Xudane li Orşelîmê wê li ser dinîyayê bibe cîhê herî girîng. Ji temamîya dinîyayê merivê bona hebandinê bêne wira. Gelek miletê bên û wê bêjin: “Werin em hilkişne li çîyayê Xudan, berbi paristgeha Xwedêye li Îsraêlê. Li wir Ewê me hînî rêyên Xwe bike, bona ku em gura Wîda bin”. Çimkî nava wan rojada hînbûna Xudan û Xebera Wî wê ji Orşelîmê derên. Xudanê pirsên navnetewî hel bike. Hemû milet wê şûrên xwe bikine gîsin û wê tîrên xwe bikine kêlendî. Hemû şer wê bisekinin û wê terka telîmên eskerîyê bidin. Her kes wê edil mala xweda bijî, bi aşîtîyê û gulvedanêva mijûl bibe, çimkî tu tiştên tirsê wê tunebin. Xudanê ku hemû tiştî dikare bike ew yek soz daye” (Mîkîya 4:1-4, NLT).

Li ser temamîya dinîyayê gulvedanê destpêbe: sîstêma fînansîye navnetewî wê serkarîkirîbe, çimkî miletê qanûnên Xwedê xweykin. Ewê bibe wedekî ecêb.

## Dîwana textê sipîyî Mezin

Piştî hezar sala mîrêcin wê bi wedê kurt ji hebsê bê azaberdanê. Ewê îzina xapandina hemû mileta bistîne. Eva wê derheqa wan pîrozada nîbe, bedenên kîjana wê rûmetbûyîbin, lê derheqa wan miletadane, bedenên kîjana yên tebyetîne, yên ku piştî Harmegedonê mane, û ew meriv yên ku nava padişatîya Hezarsaleda hatine dinîyayê.

Ewên ku serî hildin, wê bicivin û wê bona şer dora bajarê Orşelîmê bigrin, û wî çaxî agirê Xwedê wê ji ezimên bibare, wana hûfî xwe bike. Mîrêcin wê bê avîtinê nava gola agirê kirkûtê û wê şev û roj, heta-hetayê bizêre. Ewê îdî aza neyê berdanê (binihêre Eyantî 20:7-10).

Peyî wê yekêra, carekêra wê dîwana textê sipîyî Mezin bibe. Dojeyê (Hadês) wê mirîyên hemû nisileta bide, yên ji rojên Adem destpêkirî hetanî wî şerê dawîyê. Ewên ku hêna peymana Kevin neketine nava Peymana Yêhova û peyî wê yekêra teslîmî serwêrîya Îsa nebûn, wê li ber padişê bisekinin û hesab bidin, çawa ku me wextê dîwanên Serbest, Xapyayî û dilê Gumanbir dît. Her merivek, navê kîjanî kitêba Jîyanêda nivîsar nîne, wê bê avîtinê nava gola Agir, tevî mîrêcin û milyaketên wîye xirab.

## Ezmanê nû û dinîya nû

Çawa ku ezman û dinîya niha bi êgir paqijbin (binihêre B Pestrûs 3:10-13), wê ezmanê nû û dinîya nû pêşda bên. Yûhennayê şandî dinivîse: “Û min ezmanekî nû û dinyake nû dîtin, çimkî dinîya ezmanê ewlin û dinîya ewlin derbaz bûn” (Eyantî 21:1).

Yûhennayê şandî gotina xwe berdewam dike û dibêje, wekî Orşelîma nû wê ji jorda bê û wê heta-hetayê li ser dinîyayêbe. Ev bajar çawa jin tê navkirinê, yan jî dergîstîya Berx, çimkî ewê bibe mala hemû xilazbûyên Xudan, ji Adem destpêkirî hetanî wan meriva, yên ku wextê hatina Mesîhe duda nava rûmetêda hatine qebûlkirinê. Yûhenna bi cûrê tomerî Orşelîma Nû tîne ber çava:

> “Û ewî ez bi Ruh birime ser çîyayekî mezinî bilind û bajarê pîroz, Orşelîm nîşanî min da, ku ji ezmên Xwedêda dihate xwerê. Ew bi rûmeta Xwedêva tijî bû û mîna kevirê qîmetlû şewiq dida, mîna

> kevirê yaspîs zelal bû. Sûrên wî mezin û bilnid bûn, bi donzdeh dergeheva, yên ku ji alîyê donzdeh milyaketada dihatine parastinê... ji her alîya, ji rohilatê, ji bakûr, ji başûr û ji roavayê sê dergeh hebûn...
>
> Ew milyaketê ku minra xeber dida, dêstda bona çapkirinê qamîşekî zêrîn hebû, wekî bajêr, dergehê wî û sûra wî çapke. Wextê ku ewî çap kir, eyan bû, wekî ew çargoşe bû û çiqasî ber bû, awqasî jî dirêj bû. Bi rastî cûrê wê çargoşe bû, çimkî dirêjaya wî û beraya wî û bilindaya wî ji her alîkîva 2250-î kîlomêtr bû. Peyî wê yekêra ewî sûr çap kirin û eyan bû, wekî qalinaya wana 65 mêtr bûn (milyaket çapnîşên merivatîyêye sade didane xebatê).
>
> Ew sûr ji kevirê yaspîs hatibû çêkirinê û bajar xwexwe ji zêrê xasî mîna şûşe zelal bû. Sûra bajêr li ser kevirên bingehê hatibû çêkirinê, yên ku bi 12 kevirên qîmtlûva hatibûne xemilandinê... Her donzdeh derge dur bûn, her derîk ji durekî bû. Soqaqa sereke ji zêrê xasî mîna şûşê zelal bû (Eyantî 21:10-21, NLT).

Ev bajar gelekî balkêş e: ew ecêb e û bajarê mînanî wî bajarî me li ser dinîyayê tu cîhî nedîtîye. Ewê bajarekî bedew, têda sibeh û xemilandîbe. Wî bajarîda wê heramî tunebe, çimkî ew bi temamî paqij e.

Yûhenna şiovekirina xwe berdewam dike:

> “Û wî milyaketî çemekî paqij, yê bi ava jîyanê, mînanî şûşe zelal, nîşanî min da, yê ku ji textê Xwedê û Berx dikişîya û di navbera soqaqa serekera derbaz dibû. Li her alîkî çêm dareke jîyanê dighîşt, ya ku donzdeh ber dianîn, her meh rezên teze didan. Belçê wê, çawa derman bona qenckirina mileta didane xebatê. Îdî titên nifirlêbûyî li wir wê tunebin. Çimkî textê Xwedê û yê Berx wê li wirbe û xudanên Wî wê xizmetkarîya Wî bikin. Û ewê rûyê Wî bibînin û navê Wî wê li ser enîya wan nivîsarbe. Û li wir wê şev tunebe: hewcetîya ronahiyê û royê wê tunebe, çimkî Xudan Xwedê wê li wan ronahî bike. Û ewê heta-hetayê padişatîyê bikin” (Eyantî 22:1-5, NLT).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, Încîl zelal eyan dike, wekî emê rûyê Xwedê bibînin. Emê wê yekê bibiînin, çi ku Mûsa hîvîyê bû û ji çi ew hate înkarkirinê. Gelo ev yek çiqas tiştekî ecêb û ruhdarkirinê ye!

Dîsa guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî belçên dara jîyanê wê qncbûnê *miletara* bînin. Ev gotin cêrge pirsên hewaskar pêşda tîne. Gelo ev miletana wê ji çi merivabin, çimkî pîrozê li Orşelîma Nû bijîn? Pîroz wê serwêrîyê heta-hetayê li kê bikin? Gelo nava vî

wedeyîda merivên ku bi cûrên tebyetî tên dinîyayê, wê hebin? Bersiva vê pirsê Îşaya dide.

> “Awa Ez ezmanê nû û dinîya nû çê dikim, awqas baş, wekî tu kesê derheqa yên berêda nefikire. Şabin: heta-hetayê nava efrandarîya Minda şabin. Û awa Ezê Orşelîmê çêkim, çawa cîhê bextewarîyê. Cimeta wî [pîrozên xilazbûyî] wê bibine kanîya şabûnê. Ezê li Orşelîmê şabim û bona cimeta xwe bi şabûnêva tijîbim. Vir hada îdî ezê dengê girî nebihêm” (Îşaya 65:17-19, NLT).

Niha Îşaya derheqa merivada dibêje, yên ku ji Orşelîmê derin:

> “Zarokên çendrojî wê îdî nemirin. Mezin jî îdî bêyî temamkirina roja wê îdî nemirin. Merivê îdî sedsalîyêda kal yan jî pîr neyêne hesabê. Tenê gunehkarê wî yaşê cahilda bimirin. Wan rojada merivê li malên xweye bi xwe çêkirî bijîn û wê ji rezê baxên xweye tirîya bixun. Wê mînanî berê nîbe, wextê ku zeftçî mal zeft dikirin û baxên tirîya ji wana bi destê zorê distendin. Çimkî cimeta Min mînanî dara wê dirêj bijî û wedê wî wê hebe, ku feydayên xebata xwe bibîne. Ewê badîhewa nexebitin û zarokên wana wê teslîmî bêbextîyê nebin. Çimkî ew cimeta ji alîyê Xudanda duakirîne û zarokên wana jî wê wî cûreyî duakirîbin. Ez bersiva wan jî bidim, hetanî gazîkirina wana. Hetanî ku ew derheqa hewcetîyên xweda bêjin, Ezê bersiva duayên wana bidim. Gur û berx wê tevayî bêne têrkirinê. Şêrê mînanî ga gîhê buxwe. Marên bi jehrê wê îdî meriva nexin. Wan roja tu kes wê zyanê nekeve û wê li çîyayê Minî pîroz unda nebe. Ez, Xudan, Min got” (Îşaya 65:20-25).

Gelek meriv, bi şaşî, vê beşê padişatîya Mesîhe hezarsalîva didine girêdanê. Feqet, li vir zelal derheqa wî wedeyîda nivîsar e, wextê ku *ezmanê nû û dinîya nû* hene. Bi lêkolînkirina xeberên him Yûhennayê şandî û him jî Îşayayê pêxember, em dibînin, wekî nava vî wedeyîda ji bajarê Xwedê der meriv hene. Ew nava heta-hetayêda, aşîtîîya ezmîn û qewilên gulvedanêda malên xwe çê dikin. Ev meriv nikarin pîrozbin, yên ku li bajarê pîroz dijîn, çimkî îdî malên wan hene, yên ku xût ji alîyê Îsada hatine çêkirinê (binihêre Yûhenna 14:2-4).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî zarokên van meriva wê hebin. Ev yek jî nikare derheqa pîrozên rûmetbûyîdabe, çimkî Îsa zelal got, wekî merivên bi bedena rûmetbûyî wê zaroka neynin, çimkî ewê nezewicin. Ewî got: “Çimkî roja rabûna mirîya ne wê

bizewicin, ne jî wê mêrkin, lê ewê mîna milyaketên Xwedêye li Ezmîn bin” (Metta 22:30). Eva jî şedetîk bû, ya ku Castîn piştî gera xweye li Ezmîn îzbat kir.

Ev miletana, wê dinîya nû şên bikin û dewlemend bikin, bi çandinê, bi çinînê û çêkirinê. Ewê bêyî dijwarî zêdebin û dinîyayê tijîkin, mînanî Adem û Hêwayê, eger ketina wan nîbûya.

Meriv çawa dikare vê yekê şirove bike. Cûrek heye, kîjanîra hemû kes nikare qayîlbe: piştî destpêka padişatîya Hezarsalî jîyana sade wê meriva têr bike, çimkî dijminê meyî dawî, mirin, wê undabe (binihêre A Korintî 15:26). Îsayê nifira mirinê unda bike, him ya ruhanî, him jî ya matêryalî. Bo wê yekê jî merivatî dikare hetanî dawîya padişatîya Hezarsale bijî.

Dawîya padişatîya Hezarsalî diqewime merivên bi bedena tebyetî pêşkêşa jîyana heta-hetayê bistînin, eger ew nava wî wedê kurtda, wextê ku mîrêcin aza bê berdanê, dijî Xwedê serî hilnedin. Zebûr dinivîse: “Bona wê yekê miletê heta-hetayê Te rûmetkin (Zebûr 45:17, NLT). Ev cûrê fikirdarîyê dikare nêzîkî aqilabe, eger ev meriv usabin, çawa ku Adem û Hêwa hetanî ketinê bûn. Adem bona mirinê nehatibû çêkirinê, lê bona jîyana heta-hetayê. Ev pêşkêş rûyê gurênedabûna wîda unda bû: rûyê wîda eşîra wî kete bin nifira mirinê û undabûnê.

Tenê ewên ku bi Mesîhva xilaz bûne, bedenên kîjana rûmetbûyîne, wê li Orşelîma Nû bijîn. Qerez, ji Xebera Xwedê tê kivşê, wekî merivên bi bedena tebyetî wê bikaribin li wî bajarî biqesidin, rezê wî tam bikin û Xudan bihebînin. Derheqa vê yekêda Yûhenna dinivîse:

> “Miletên dinîyayê wê ronahiya [Orşelîma Nûda] bigerin, û padişên dinîyayê wê bên û rûmeta xwe bînine nava wî. Dergehên wî tu cara dawîya rojê nayêne girtinê, çimkî şev tune. Û hemû milet wê rûmet û hurmeta xwe bînine nava wî bajarî” (Eyantî 21:24-26, NLT).

Destpêkêda însan ket û cîh da guneh. Cezayê wê yekê mirin bû, him ya matêrîyalî û him jî ya ruhanî, ya ku bi mirina heta-hetayêva ser hevda dihat. Qerez, ketina mêriv, progirama Xwedêye destpêkêye heta-hetayê, bi kîjanê meriv gerekê li ser vê dinîyayê bijî, neda sekinandinê.

Gelo progirama Xwedê dikare rûyê gurênedabûna mêrivda bê teribandinê? Na. Dewsa wê yekê Xwedê bi rîya xilazbûna Mesîh binketina mêriv werguhêzî dua kir, ji merivatîya ketî *cimeta ezman-aye rûmet* çê kir, ya ku wê li dinîya nû *serwêrîyê* li merivatîyê bike. Ev yek alî me dike, ku em xeberên Îsaye derheqa xulamê aminda fem bikin: "Eferim, Xulamê qenc! Tu nava wî tiştê hindikda amin mayî: serwêrîyê deh bajara bike" (Lûqa 19:17). Gelo diqewime, wekî wextê padişatîya Hezarsalî û nava wedê dinîya nûye heta-hetayêda bajar*ê hebin?*

Eger merivatî neketa, klasa meriva, ya Xwdêye rûmetbûyî wê tunebûya, ya ku îro wê alî Wî bikira, ku heta-hetayê serwêrîya vê dinîyaê û ezmana bikira. Ewî bi serwaxtîya Xweye heta-hetayê ev yek pêşda texmîn kir. Awa bo wê yekêye, ku Îsa tê navkirinê "Berx... wekî piştî destpêka dinîyayê serjêkirîye" (Eyantî 13:8).

Progirama Xwdêye destpêkê ew bû, ku vê dinîyayê bi merivên tebyetîva bide jîyînê, û ewê ji destpêka padişatîya Hezarsalî û nava wedê dinîya heta-hetayêye nûda wê bê mîyaserkirinê. Gotinên Îsa wê bi temamî mîaserbin: "Padişatîya Te bê, emirê Tebe, çawa li Ezmên, usa jî li ser erdê" (Metta 6:10). Li ser dinîyayê wê usabe, çawa ku Castîn li Ezmîn dît: rengên bedewe nû, şînayî û kevirên sax, yên ku pesinê Xwedê didin, arxîtêktûra kamil, avên sax û tiştên mayîn. Bi gilîkî, dinîyake raste kamil.

Îşaya kitêba xweye pêxembertîyê ser hevda tîne û derheqa wedê ezmanê nûda wa dinivîse:

> "Çawa ku ezman û dinîya Min ya nû wê bimînin, usa jî hûnê her dem hebin, cimeta Min bi wî navî, yê ku wê tu cara betave nebe"",– Xudan dibêje.– "Temamîya merivatîyê wê ji hevtê hetanî hevtê û ji mehê hetanî mehê bê û pesinê min bide. Û wextê ku ew derên, wê bedenên xweye mirî bibînin, yên ku dijî Min serî hildane. Çimkî kurmên ku wana dixun, wê tu cara nemirin, û agirê ku wana dişewitîne, wê tu cara netemire. Ewên ku rex wanra derbazbin, wê bi tirseke mezin wana binihêrin"" (Îşaya 66:22-24, NLT).

Ev fikira meriva zû tîne ser hişê wan, lê nava temamya wedê heta-hetayêda emê herine cîhekî usa, ji kîderê wê bê kivşê, ku mîrêcin, milyaketên wî û ew merivên ku dijî Xudan serî hildan, layîqî yazîya çi cûreyîye xirab bûne. Diqewime eva serwaxtîya

Xwedêye ku encamên serhildanê û gunehêye xirab li pêşîya yên nû çêkirî xweyî bike. Derheqa wê yekêda bifikirin: mîrêcin serî hilda, nenihêrî wê yekê, ku tu kesî ew berbi wê yekê def neda. Eger Xwedê vê yekê nava temamîya heta-hetayêda li ber çavê efrandarîya Xwe xweyî bike, ewê bi cûrê berk û kardar hemûya ji ketina nava gunehê Lyûsîfêr û milyaketên wî zeft bike.

Çawa ku îdî hate kivşkirinê, pîrozên rûmetbûyî wê li bajarê Xwedê, li Orşelîma Nû bijîn. Hetanî destpêka padişatîya Hezarsalî, ewê li ber dîwana Mesîh bisekinin, bona ku heqê xwe û tabîyên qulixa heta-hetayê bistînin, bona qulixkirina bo Padişê Heta-Hetayê. Emê diha bi kûrayî dîwana Mesîh serê kitêbêyî mayînda lêkolînkin.

## SERÊ 10-A

# Dîwana Mesîh

*"Îdî tu çima loma birê xwe dikî, yan tu çima birê xwe bêhurmet dikî: çimkî em hemûyê jî li ber dîwana Mesîh bisekinin... awa ji me her kesê bona xwe cabê li ber Xwedê bide".*
— Romayî 14:10,12

Em hemûyê jî li ber dîwana Mesîh bisekinin. Gelo Pawlos nava vê beşêda berbirî kê dibe, bawarmenda, yan bêbawara? Bi dîtina van xebera, ew bi hemtêksta xweva dide dîyarkirinê, wekî ew berbirî bawarmenda dibe. Pawlos derheqa wê yekêda dibêje, wekî bi çiqasîva xirab e, wextê ku mesîhî birê xwe loma dike, yan jî bêhurmet dike û dibêje, wekî ewên ku usa dikin wê hesab bidin.

Dêmek, çawa ku me serên kitêbêye mayînda dît, ne tenê bêbawar wê li ber dîwana Xwedê bisekinin. Mesîhî jî wê li ber textê Xwedê bisekinin, bona ku bona jîyana xweye li ser dinîyayê hesab bidin. Ev rastî usa jî nava nama Pawlosê şandîye dudada, ya bona Korintîya, hatîye dîyarkirnê, ya ku me serê kitêbêyî derbazbûyîda lêkolîn kir:

> "... Meyê hê zêde bixwesta ku ji vî qalibî derketana, çimkî wî çaxî emê li cem Xudan bûna. Dêmek, meremê me ew e ku her dem li Wî xweş bên, yan ji qalib derketî, yan jî derneketî, çimkî em hemû jî gerekê bona dîwanê li ber dîwana Mesîh bisekinin. Ji me her kesê weke wan emelên qalibê xweda kirî bistîne, çi ku kiribe, qencî yan xirabî. Awa em ku haj ji xofa Xudan hene, dikin ku meriva bînine rayê" (B Korintî 5:8,11, NLT).

Em careke mayîn bêjin, wekî Pawlos derheqa dîwana neheqada nabêje, lê ya Mesîhîyada. Nivîsar e: "Meyê diha zêde bixwesta, ku ji van qaliba derketana, çimkî wî çaxî emê tevî Xudan bûna". Ev beşa nivîsarê zelal dide kivşê ku Pawlos berbirî kê dibe. Tu bêbawerek wê tevî Xudan nîbe, wextê ku ew ji qalibê xwe dûrkeve. Ewê carekêra cîguhstî dojê bibe, lê mala wîye heta-hetayê jî wê gola Agirbe.

Çawa ku me îdî got, merivên bêxwedê û bêbawar wê li ber dîwana textê sipîyî Mezin bisekinin. Ew dîwan wê ji dîwana bawarmenda derengtir bibe, derheqa kîjanêda beşa jorinda nivîsar bû.

Werin em lez wî hemû tiştî carekê jî lê binihêrin, çi ku em serê kitêbêyî derbazbûyîda hînbûn. Îsayê tevî eskerên ezmana vegere dinîyayê, Ewê himberî yên dijî Mesîh serkeve, wê mîrêcin bigre bike hebsê û bi hezar sala wê padişatîya Xweye li Orşelîmê îzbat bike. Peyî wê yekêra mîrêcinê aza bê berdanê û bi wedekî kurt ewê îzina xapandina hemû mileta bistîne. Agirê ji ezmana bibare û wana hûfî xwe bike, yên kö dijî Xwedê serî hildin, lê mîrêcin wê heta-hetayê bê avîtinê nava gola Agir. Peyîra hemû merivên bêxwedê û bêbawar wê ji dojê rabin bona ku li ber textê sipîyî Mezin bisekinin. Îsa vê yekê çawa “rabûna dîwanê” nav dike (binihêre Yûhenna 5:29). Navên kê kitêba Jîyanêda nivîsar nînin, wê bêne avîtinê nava gola Agir.

Dîwana bawarmenda wê diha zû bibe, ne ku dîwana textê sipîyî Mezin. Wedê wê hela hê nava Xebera Xwedêda zelal nehatîye dîyarkirinê. Feqet, em zanin, wekî ewê piştî hinek wede, piştî rahiştandina civînê û pêşîya padişatîya Mesîhe Hezarsalî biqewime. Dêmek, di navbera van herdu dîwanên mezinda wedeyê bighîje nêzîkî hezar salî (ev yek nava alêgorîya Afabêlêda nehatîye kivşkirinê). Bi wekilandina nivîsara nava kaxeza Romayada, B Korintî 5:10 dibêje: “Çimkî em hemûyê li ber dîwana Mesîh eyanbin”. Û beşa Romayaye 14-da û B Korintî 5-da xebera “dîwan” ji xebera yûnanîye “bêma”-ê hatîye tercimekirinê. “*Dîyalêkta (zaravê) Strong*” vê xeberê vî cûreyî şirove dike: “derece, dika dîwanê [ dika bilindkirî], dêmek dîwan”. “Anegorî berevoka Şirovekirinên Hevaltîya Încîlêye Navnetewî”, “Dîwan, kursîya mehkemê bû, ya li mehkemên bajarê împêratorîya Romayê. Pawlos vê himberîhevkirinê wî çaxî dide xebatê, wextê ku derheqa şuxulkarîya Mesîhe dîwanêda xeber dide”. Li ser hîmê vî hemû tiştî emê gotina *dîwana Mesîh* bidine xebatê, wextê ku em derheqa dîwana bawarmendada xeberdin.

Şirovekirina dîwana Mesîh hema dîwana Xwedê ye. Încîl eyan dike, wekî Bavê temamîya dîwanê teslîmî Kur kirîye (binihêre Yûhenna 5:22). Îsa Mesîh ne tenê Xilazkirê me ye, lê ew Hakimê me ye û Ewê zûtirekê dîwana mala Xwe bike. Bona bi cûrê herî zelal

xebera “dîwan” şirove bikin, meriv dikare bêje, wekî ew qirar e, ya ku li ser lêpirsînê hatîye hîmdanînê, feydayê kîjanê wê yan alî wê yekê bike, yan jî dijî yekê be.

Li civînê gelek meriv haj pê tunene, wekî ewê bona kirinên xweye wextê mayîna xweye kurte li ser dinîyayê hesab bidin. Gelek şaş difikirin, wekî ewê tu cûreyî neyêne dîwankirinê, çimkî ew îdî xilazbûyîne. Bêguman, xwîna Îsa me ji wan guneha paqij dike, yên ku wê îzin nedana me, ku em biketana padişatîya Xwedê: feqet ew yek me ji dîwanê aza nake, wextê kîjanê kirinên meye baş û usa yên xirab wê bêne lênihêrndinê, yên ku me pêşîya xilazbûnê kirine.

## Biryarên heta-hetayê

Ew dîwan yan jî qirar, yên ku wê derheqa meda li dîwana Mesîh bên qebûlkirinê, wê yên heta-hetayê bin: ewê her dem usa jî bimînin û wê tu cara neyêne guhartinê.

Qasekê bisekinin û serên kitêbêye pêşin bîr bînin, kîjanada me dicêriband bi fikira xweye heta-hetayî fem bikira. Aqûb dibêje, wekî jîyana meye wedelûye li ser vê dinîyayê hulm-gulme, ya ku betave dibe (binihêre Aqûb 4:14). Eva ew cûrê alêgorîayê ye, bi kîjanê ew jîyana meye ji 80-yî hetanî sed salî himberî jîyana heta-hetayê dike. Eger zanebûnên wîye matêmatîkî hebûna, çawa ku roja îroyîn yên me hene, ewê gotina xwe diha zelal bida raberkirinê. Wextê hînbûna êtapa matêmatîkayêye ewlin, ez pê hesîyam, wekî eger her tiştekî pareveyî ser heta-hetayê bikî, encamê wê sifire.

80 sal÷heta-hetayî=0

100 sal÷heta-hetayî=0

Eger em her reqemekê parevekin, yan jî himberî heta-hetayê bikin, feydayê wê wê bibe sifir. Ew yek girîng nîne, ku hûnê li dinîyayê çend sala bijîn. Eger hûn 150-î sala jî bijîn h etanî mirinê, yeke jîyana li ser vê dinyayê sifir e, eger em wê himberî heta-hetayê bikin. Ew yek dide kivşê, wekî ev hemû tişt, çi ku em, bawarmendên Îsa Mesîh, nava vî wedê sifirda dikin, wê qirarke ku emê çawa heta-hetayê derbaz bikin. Bîr bînin, ku me caba çawa da xaçê Îsa, kerema Wîye xilazkirinê. Ew yek qirar dike, ku emê heta-hetayê *li* kîderê

derbazkin. Feqet, ew ku em çawa jîyana xweye mesîhîtîyê dijîn, wê qirarke, ku jîyana meye heta-hetayêye nava padişatîya Wîda wê çawa bibe.

Tê bîra we, wekî nava serhatîya meye alêgorîkda Xwehiz û yên mayîn, yên ku ewî nava cêrgên sera Mezine piştêva dîtin, poşman bibûn, wekî wana wedê xweyî kurte li Êndêlê badîhewa derbaz kiribûn. Wana piranîya jîyana xwe li ser xwestinên xwe û kara xwe xerc kiribûn, dewsa wê yekê, ku wana xwe pêşkêşî emirê Cêylon bikira. Bi vî cûreyî, hetanî dawîya jîyana xwe ew mecbûr bûn, ji qewata xweye rast diha nimiztir bijîtana, çimkî mecala her kesê ji wan hebû bixebitîyana û diha nêzîkî Cêylon bûna, yan jî li rex Cêylon bajarê wîda padişatî bikirana. Nenihêrî wî hemû tiştî, mecala wan piştî mektebê jî hebû, lê niha pêşeroja wan îdî qirarkirî bû. 130 salên jîyana wane pêşerojê wê bibûna encamê (feydayê) pênc salên kurt. Derheqa wê yekêda bifikirin:130 sala himberî pênc sala bikin. Eva wedekî gelekî dirêj e. Li ser vê dinîyayê hindik meriv dikarin bighîjine wî yaşî. Xwezî Xwehiz û ên mayîn ev yek fem bikirana, çimkî wedê wanî li Êndêlê hela hê ser hevda nehatibû. Wî çaxî jîyana wana bi texmîn wê cûrekî mayîn çêbûya.

Mesela alêgorîya me bi çiqasîva jî ya hişyarkirinêbe, wê yekê meriv nikare himberî têma meye guvtugokirinê bike. Em meseleke mayîn bînine ber çava. Bînin ber çavên xwe, wekî rojek dane we û hûn wan 24 seheta çawa derbaz bikin, ewê jîyana weye nava hezar salîda qirar bike. Bicêribînin fem bikin, ku hezar sal çi ye. Hezar sal pêşda Ştatên Amêrîkaêye Yekbûyî hela hê tunebû: Krîstofêr Kolûmbos hela hê rê neketibû ku dinîya nû eşkere bikira: zeftkirina Anglîyayê ji alîyê normandîyada hela hê neqewimîbû.

Hezar sal wedekî gelekî dirêj e. Feqet ew roja tek-tenê wê heqê we qirarke, wê tabîyê, kîjanêda hûnê cîhê xwe bigrin, wê xebatê, ya ku hûnê bikin, wan meriva, tevî kîjana hûnê bixebitin, ew ku hûnê maleke çawada bijîn û heta dîmenên ku pencera wera tên kivşê, û her tiştekî hûre nava jîyana weda bi hezar sala.

Bi fikira we, weyê bicêribanda bi cûrê herî baş bişuxulyana? Weyê ew roja çawa bijîta? Ewê ji jîyana weye niha cuda bûya? Weyê pirsên xweye here girîng biguhartana? Meriv dikare bêje, wekî kirina gura X1dan wê bibûya pirsa weye here girîng. Gelo weyê bi

guhdarîya mezin Xebera Wî bixwenda û weyê bicedanda, ku diha bi aktîvî gura Wîda bûna? Bona padişatîya Wî weyê bicedanda hukumî ser meriva bikira? Hûnê bi cûrekî mayîn nêzîkî wana bûna? ... Navnîşa guhartina jîyana we bêsînor e. Feqet, vê yekê meriv nikare himberî wê yekê bike, derheqa çida em niha xeber didin, çimkî bi parevekirina 365 hezar roja (hezar sal) li ser yekê emê reqemekê bistînin, lê ne ku ewê sifirbe.

Werin em diha pêşda herin. Niha jî bînin ber çavên xwe, ku hûnê çawa wê roja xwe derbazkin, ya ku wê jîyana weye nava mîlîyonek salîda qirarke, ew ku hûnê bibine xweyê çi, xebata çawa, kîjanê hûnê bikin, ew meriv, tevî kîjana hûnê bixebitin, li kîderê û li maleke çawa hûnê bijîn, avtomaşîneke çawa hûnê biajon û tiştên mayîn. Bicêribînin wî wedeyî bînin ber çavên xwe. Em nikarin wê yekê bikin, çimkî merivatî nêzîkî şeş hezar sala ye ku li ser vê dinyayê ye. Dêmek ewê 150-î cara zêdetir bûya, ne ku jîyana temamîya merivatîya li ser topa dinîyayê. Ew yek bi xwe femdarî nîne. Feqet, ew jî tu tişt nîne himberî wê yekê, derheqa çida em xeber didin, çimkî bi parevekirina 365000000 roja (mîlîonek sal) li ser yekê emê reqemekê dîsa bistînin, lê ne ku sifir. Eger em meseleke bona mîlîyard yan tirîlîyon bianîya û ew himbrî rojekê bikira, meyê dîsa reqemek bistenda.

Dêmek, nenihêrî wê yekê, ku em çiqasî li ser vê dinîyayê dijîn, wedê meyî li vir himberî heta-hetayê sifir e. Diqewime hema ev e menî, wekî Pawlosê şandî bi firnaxbûna mezin ber dilê meda tê, ku em usa bijîn, ku em bighhîjine heqê xweyî herî bilind. Nava nama xweda ew Korintîyara dinivîse, wekî her sportsmênek bona serkevtinê dikeve nava lehcê, lê paşê Pawlos berbirî me hemûya dibe:

> "Hûn jî gerekê usa birevin, bona ku serbikevin. Hemû sportsmên xwe bi cûrê berk didine sînorkirinê. Ew wê yekê dikin, bona ku xelata wedelû bistînin, lê em wê yekê bona xelata heta-hetayê dikin. Dêmek, ez raste-rast berbi merem direvim û her gaveke min diçe berbi wî meremî. Ez mînanî wî boksyorî nînim, derbên kîjanî nagihîjine merem. Ez mînanî sportsmên bedena xwe hîn dikim ku ew gerekê çi bike" (A Korintî 8:24-27, NLT).

Bi gotina Pawlos, meremê jîyana me heye, ya ku stendina xelata heta-hetayê ye. Nava vê jîyanêda em gerekê bona serkevtinê

birevin. Bona ku em serbikevin, gerekê terbyetdarîya berk û xwekontrolkirina me hebe, usa jî jîyana me berbi meremekî here.

Bi sala ser hev ez sportêva mijûl bûme. Wextê ku ez tevî lîstikên asosîyasîya Tênîsê, ya Ştatên Yekbûyî, lîstikên xortaye bona fîncana Dêvîsê û asosîyasîya cahilaye sportê dibûm, ez gelekî telîm dibûm. Deşta lîstikêda ez her roj nêzîkî şeş seheta dimam û carna min bi seda derbên mexsûs tevî hînkirê xwe û endamên koma xwe dikirin. Min li deşta lîstikê bona xweyîkirina qewînbûna fikirdarîyê kitêb dixwendin. Ez ji deşta lîstikê der jî hîn dibûm: bi giranîbilindkirinê, revê, banzdana bi şirîtê, başkirina sîstêma desta û çavava û gelek tiştên mayînva mijûl dibûm. Min meremekî usa danîbû pêşîya xwe û bona wê yekê min awqas tişt dikirin, wekî dayîka min gef xwerin, ku wê cî-nivînê min cîguhastî li deştên tênîsêye li nêzîkî mala me bike. Ez tiştekî mayînva, yan jî cûrê sportêyî mayînva mijûl nedibûm, yê ku dikaribû bona pêşketina min dijwarî pêşda bianîya. Min usa dikir bona ku ez serkevtama, bona ku ez bibûma çêmpîyon, bona ku ez bibûma yê herî baş û min bona bûyîna yê herî baş heq bistenda.

Nava padişatîya Xwedêda hemû tişt hinekî cûrekî mayîn e. Em tevî merivên başqe nakevine nava lehcê, lê tenê tevî xwe, û meremê me ew e, ku em nava hemû karên xweda li Îsa xweş bên (binihêre B Korintî 5:9). Bi guhdarî xwendina Xebera Xwedê, em xwestinên Xudan nava wê yekêda dibînin, ku emê çawa nêzîkî wan merivabin, emê berbi çi bicedînin, wedê xwe pêşkêşî çi bikin, nava jîyana kêda emê bona heta-hetayê hukum bihêlin, emê çawa bona padişatîya Xwedê pêşkêşa bidin, çawa alî meriva bikin, çawa bibaxşînin û tiştên mayîn. Vî hemû tiştî emê paşê diha bi kûrayî guvtugo bikin. Fikira wê yekê ew e, wekî em gerekê bona serkevtinê bijîn.

## Dorana heqdayînaye berfireh

Încîl dide kivşê, wekî heqdayînên heta-hetayêye bona bawarmenda wê cûre-cûrebin. Xêncî wê yekê wê dorana heqdayînaye berfireh hebe. Hene meriv karên kîjana wê li ber çavên wan bên şewitandinê û undabûnê, lê yên mayîn wê heta-hetayê tevî Mesîh padişatîyê bikin (binihêre A Korintî 3:15, Eyantî 3:21).

Gelek ecêbmayî dibin, wextê ku pê dihesin, ku heqdayîna wan dikare *unda bibe*, lê karên wan *bişewite*. Ew bawar nakin, wekî li Ezmana dikare tiştekî usa biqewime.

Feqet Încîl zelal derheqa wê yekda dibêje:

Hetanî xwendina van xebera, îzinê bidin bêjim, wekî gelek cara nava Încîlêda çêkirin çawa alêgorîya tê xebitandinê û ew derheqa çêkirina jîyana mêrivdane. Carên mayîn Încîl derheqa civînêda çawa avayî yan jî paristgeh dibêje. Nava her du alîyada jî em çawa çêkirçî tên kivşkirinê, yên ku li ser jîyana me hukum dihêlin, yan jî li ser jîyanên merivên başqe, yan jî bi tomerî hildayî li ser civînê. Hetanî dawîya (xilazîya) vê kitêbê ezê gelek cara derheqa vê alêgorîyayêda bêjim. Bi vî cûreyî Pawlos zelal derheqa vê yekêda dide kivşê:

> "Hûn jî avayê Xwedêne... Lê belê, bila tenê her kes haj ji xwe hebe ku çawa çê dike. Çimkî Xwedê îdî çawa bingeha tek-tenê Îsa Mesîh danî û tu kesekî mayîn nikare bê danînê. Hinekê zêr û zîv û kevirên giranbiha bidine xebatê, ku li ser wê bingehê çê bikin: yên mayîn wê dar û gîhê, yan jî kayê bidine xebatê. Û xebata her kesî wê wî çaxî eyan bibe, wextê ku roja Mesîh wê yekê eşkere bike. Çimkî wê Rojê agirê kirên her kesî bide eyankirinê: agirê wan kira bicêribîne û wê bide kivşê, ku ew bi rastî çawa ye. Eger ew yek çi ku li ser bingehê hatîye çêkirinê, li ber êgir teyax bike, çêkirçî wê heq bistîne. Feqet eger şuxulê yekî bişewite, ewê wê yekê unda bike, lê wê bi xwe xilazbe, çawa yekî nava êgirra derbazbûyî" (A Korintî 3:9-15, TEV).

Em qirar dikin ku emê bona çêkirina her alîkî nava jîyana xweda çawa çê bikin, û du bijartinên meye hîmlî hene. Ya ewlin ew e, ku em dikarin berbi tiştên wedelû bicedînin û ew jî tenê li bedenê xweş tê (dar, gîha û ka). Ya duda ew e, wekî em dikarin anegorî xwestina ruhê meyî ji nûva bûyî bijîn û peyî Xebera Xwedêye heta-hetayê herin (zêr, zîv û kevirên qîmetlû). Em çawa çê dikin, yan jî jîyana xwe çawa derbaz dikin, wê ewê qirarke, ku li pêşîya me çiye, wextê ku agirê hazirîya Xwedê karê me bicêribîne.

Ne tenê kirên me wê bêne lênihêrandinê: fikirên me, menî û meremên me jî wê bêne eyankirinê. Awa bona wê yekê jî bona bawarmenda girîng e ku Xebera Xwedê guhdar bikin, guhdarîyê bidine ser û dilên xweda veşêrin, çimkî ew her dem "eşkere dike û elekê dixe û guvtugo dike, nêt û fikirên dil gotûbêj dike" (Îbranî

4:12, AMP). Tu tişt nikare wî cûreyî bikeve kûraya dilê me, çawa ku Xebera Xwedê ye. Eger *em guhdarîya xwe bidin ser fikirdarîya, logîka, psîxoloc*îya, yan jî serwaxtîya mêriv, nêt û fikirên dilên me wê herine berbi tiştên wedelû û gelek cara emê wê yekê qet fem jî nekin, çawa ku Xwehiz difikirî hetanî çûyîna li sera Dîwanê. Bo vê yekê Îsa eşaretîyê dide:

> "Ew çi ku veşartî ye, wê eyan bibe û ew çi ku pêçayî ye, wê bê dîtinê û bê eyankirinê. Dêmek, guhdarbin ku hûn çawa dibihên, çimkî ewên ku tiştekî wan heye, wê bona wan zêde bê dayînê, lê ewê ku tu tiştê wî tune, heta ew tiştê biçûk jî, yê ku ew difikire ku heye, wê ji wî bê stendinê" (Lûqa 8:17,18, TEV).

Îsa dibêje me, wekî ew çi ku em *dibihên* yan jî ew çi ku em *guhdarîyê didine ser,* derbazî dilê me dibe û nêt-fikirên me çê dike, yên ku sirîya xweda qirar dikin, ku em çawa jîyana xwe çê dikin. Em gerekê bi guhdarî guhê xwe bidine ser Xebera Xwedê, çimkî ew li ser rîya me ronahî ye. Bêyî wê yekê emê hema wî cûreyî bixalifin, çawa ku meriv nava tarîstana şevêda ji rîya xwe bixalife. Diqewime piştî hinek wede hûn rast gavên xwe biavêjin, lê bi kutasî hûnê bixalifin.

Wextê ku em dixalifin, em destpê dikin jîyana xwe li ser qîmetîyên wedelû çêkin, bidine hîmdanînê. Ewê eşkere nebe, hetanî ku îşiqa Xebera Xwedê ew yek ronahî nekirîye. Pawlos vê fikira xwe berdewam dike: "Feqet wextê ku tiştek eşkere dibe tê ber ronahîyê, ew tê kivşê û zelal dibe" (Efesî 5:13, AMP).

Eger em bixalifin, du tişt dikarin biqewimin: cûrê ewlin û yê herî baş ew e, ku em guhdarîya Xebera Xwedê bikin (bi terîfa, bi xwendinê, yan jî bi bihîstina ji hevalê xwe, yan jî ji rêberê ruhanî) û ewê rû bi rû li ber wijdanê me bisekine. Bo wê yekê jî gelekî girîng e ku em Xebera Xwedê her dem bixwînin. Eger em serwaxtin, emê lez tobe bikin û emê bona fikir, menî yan jî meremê xwe baxşandinê hîvî bikin. Feqet eger wijdanê me ji kirina şaşîya gêjbe, wê bona me gelekî dijwarbe, ku em guhdarîya Xebera Xwedê bikin, lê eger wijdanê me bişewite, wî çaxî ewê îdî tiştê bûyînê nîbe. Bo wê yekê Încîl derheqa girîngîya paqij xweykirina wijdanê meda dibêje (binihêre Gotinên Silêman 4:23, B Tîmotêyo 1:3). Eger em wijdanê xwe biparêzin û paqij xweyî bikin, emê bi hêsanî hukumê Xebera Sax dilê xweda texmîn bikin.

Cûrê duda, yê ku ne tiştê herî baş e, ew e, wekî menîyên me wê li ber textê Dwîanê bêne eşkerekirinê. Eger ew biqewime, emê wî heqî unda bikin, yê ku me dikaribû bistenda. Dêmek, hûn gerekê ji xwe pirs bikin, ku gelo hêja ye dijî lêhilatinên Xebera Xwedê derkevin. Her car, wextê ku hûn wê yekê bikin, dilê we wê diha berk bibe û wê bikeve nava xapandina diha mezin. Emê halê xwe fem nekin û ewê tenê bin ronahiya rûmeta Xwedêda, textê Dîwanê, bê eşkerekirinê.

## Bona pêşeroja meye heta-hetayê hazirbin

Wextê dîwana me tu tişt wê veşartî nemîne. Hemû tiştê eyanbe û wê bê eşkerekirinê. Bo wê yekê Pawlos textê Dîwanê çawa "tirsa Xudan" nav dike. Wextê dîwanê menîyên me, fikir, merem, xeber, kirên me û tiştên mayîn hûre-hûr wê bêne lênihêrandinê. Anegorî tercima Încîlêye "Mêsîc"-ê, nava xebera A Korintî 3:9,12-15-da xeberên Pawlose derheqa çêkirinê û dîwanêda gelekî hukumdarin.

> "Yan jî bi gilîkî mayîn gotî, hûn mala Xwedêne... Guhdarîya mezin daynine ser bijartina matêrîyalên çêkirinê. Xilazîyê (dawîyê) lênihêrandin wê derbazbe. Eger hûn qinyat, matêrîyalên arzan û bêkêr bidine xebatê hûnê bêne girtitnê. Lênihêrandinê gelekî hûre-hûr û berkbe. Hûnê nikarbin tu kêmasîkê veşêrin. Eger karê we lênihêradinêra derbaz bibe, wî çaxî wê başbe, lê eger derbaz nebe çêkirina we wê bihedime û careke mayîn bê çêkirinê, lê hûnê unda nebin: hûnê bimînin, lê bi cûrekî".

Ez nizanim hûn çawa, lê ez naxwezim bi cûrekî li ber dîwana Mesîh sax bimînim, çimkî li wir wê yazîya meye heta-hetayê bê qirarkirinê (biryarkirinê).

Hûn tînin ber çavên xwe, ku gerekê çi cûreyî zendegrtî bimînin? Nava alêgorîya meda her merivek ji birîyara dîwana xwe zendegirtî ma, xêncî Xêrkirê, ya ku îdî hazir bû. Yên mayîn guh nedabûne hînbûnên prîmîtîv, derheqa kîjanada ew hema ji destpêkêda gerekê haj pê hebûna.

Ez her dem dibînim, ku merivên vê dinyayêye serwaxt çi cûreyî bona pêşeroja xwe hazir dibin. Ew li mektebê baş hîn dibin, bona ku bikaribin karîyêra açix çê bikin. Ew carekêra derbazî xebatê dibin, diçine malê û lez bona wê yekê heq didin. Ew jî hesabên

banka û destên pênsyayêye şexsî dest tînin. Hinek parên xweye zêde învêstîsîya dikin, ku ew pare bona wana bixebitin. Ewana wî hemû tiştî bona wê yekê dikin, ku bona pêşeroja xwe hazirbin: ew naxwezin nava hewcetîyêda bin, bi taybetî wextê ku ew yaşê xweda îdî mezinin. Eger wan meriva xwe bona pênsîyayê wî cûreyî hazir bikirana, çawa ku bawarmend xwe bona heta-hetayê hazir dikin, ewê rastî dijwarîyên mezin bihatana. Himberî geleka ew li civînên geleka xemgîn û tirsyayîne.

Niha bînin ber çavên xwe, wekî meriv roja ewlin derbazî pênsyayê bûye û ew rastî vê yekê hatîye. Berê ewlin sîstêma pênsyayê bin dikeve û mecal tunene ku her meh bona yaşê mezin pênsyayê bidnê. Xêncî wê yekê, ew banka, li kîderê hemû parên wîne tê girtinê û şuxulkarîya xwe dide seknandinê. Hemû îdarên wêye li bankê unda dibin. Hema wê rojê ew meriv nava agirda hişyar dibe: mala wî dişewite. Ew ji malê direve û xêncî kincên li ser xwe tu tiştî nikare hilde. Li ber çavên wî agir bi temamî wî hemû tiştî unda dike, çi ku yên wî bûn.

Tragêdyake çawa ye! Feqet, Pawlos dide kivşê, wekî eva yeka li ber textê Dîawanê wê bê serê hinek mesîhîya. Careke mayîn van xebera guhdar bikin: “Eger kar bişewite, çêkirçî wê zyaneke mezin bibîne. Çêkirçî wê xilazbe, lê ewê merivekî usabe, yê ku bi dijwarîya ji agirê mezin xilaz bûye (A Korintî 3:15, NLT).

Nava padişatîya Xwedêda merivên serwaxt fem dikin, wekî em pêşeroja xwe bona salên mezinaya yaşê xwe çê nakin: em bona heta-hetayê xwe hazir dikin. Merivên serwaxt, derheqa kîjanada ez dibêjim, ew in, yên ku pêşeroja xweye heta-hetayê program dikin. Jîyana wana merkezkirî ye, û ew zanin, wekî yazîya wane heta-hetayê bi wê yekêva tê qirarkirinê ku ew çawa li vê dinîyayê dijîn. Ewê bi cûrê rûmet, bikevine padişatîya Xwedê, lê ne ku bi cure dijwar bikevinê, ew jî piştî wê yekê, wextê ku hemû karên wan bişewitin û unda bibin. Bixwînin, ku Petrûs derheqa vê yekêda çi dinivîse:

> “Dêmek, birayên min, hê zêde bikin, ku wê gazî û jibarebûna testîq bikin. Çimkî eger hûn van tişta bikin, hûnê tu cara nekevin û hûnê bi germayî nava padişatîya Xudan û Xilazkirê me Îsa Mesîhe heta-hetayêda bêne qebûlkirinê” (B Petrûs 1:10,11, NIV).

Qebûlkirina germ ew e, wekî Xudanê bêje me: “Eferim, xulamê qenc û amin! Tu nav tiştên hindikda amin mayî, ezê te daynime ser gelek tişta. Bikeve şaya Xudanê xwe” (Metta 25:21).

Van axirîya Xudan dîtinokek nîşanî min da. Min serkevtîyên padişatîya Xwedê dîtin, yên ku bi cêrga diketine bajarê Xwedê. Ew bi kûçên zêrînva derbaz dibûn, lê elaletên li ber kevîya rê sekinî şa dibûn. Îsayê Padişa li ser dikeke bilind rûniştî bû: temamîya bajêr dîna xwe dida Wî. Leşkerên amin diçûn û rezê Îsa Wîra dianîn, lê elalet şa dibû. Nava wê dîtinokêda min texmîn dikir, wekî Xudan digote leşkerên xwe: “Bijîn!”.

Xudan dilê minra xebrada: “Tu dixwezî bibî yekî ji wan leşkera, yên ku rezên bona Min çandî tînin, yan dixwezî bibî yekî ji wan meriva, yên ku li ber rê sekinî, şa dibin?”. Min diha zêde qirar kir, ne ku çawa berê, ku gazî û bijartinê testîqkim. Min fem kir, wekî ez dixwezim, ku li ser sifetê Xudanê min kenê razîbûnê hebe, wextê ku Ew jîyana min lê binihêre, lê ne ku medekirî binihêre, wekî ew qewata, ku Ewî dabû min, unda bûye.

Meremê min heye, ku ez vê rastîyê temamîya nisileta xwera eyan bikim, yên ku Xwedê hiz dikin, ku ew bi wan reza bikevine nava hazirîya Wîye bi rûmet, layîqî kîjanê ye Ew û ew kenê Bavê meyî rûmet bibînin. Em bi xwe qirar dikin, ku gelo emê li Ezmana, bi rîya qulixa li ser dinyayê mîyaserkirî, layîqî qebûlkirina germbin, yan na? Menîya sereke, ya nivîsara serên kitêbêye mayîn hema ev rastî ye.

## Serên kitêbêye mayînda

Serên kitêbêye mayînda emê wan govekên sereke gvtugo bikin, anegorî kîjana emê yan bêne gunehkarkirinê, yan jî bo me heqê bê dayînê. Nenihêrî wê yekê, wekî emê nikaribin bi hûrgilî hemû tiştî guvtöeugo bikin, lê emê derheqa hemû pirsên girîngda xeberdin. Emê qîmetê baş daynin, li ser kîjanê hûnê bikaribin jîyana bi kemala heta-hetayê çêkin.

Çawa tomerîkirin xeberên Petûrs hêdî-hêdî bixwînin. Îzinê bidin, ku em wan rastîya bînin bîra we, derheqa kîjanada hûn nava vî serê kitêbêda pê hesîyan. Xeberên vê beşêye kilît û usa jî gotin,

wê diha zêde nava jîyanêda bangî we bikin, çi ku me hûn hîn kirin. Xeberên Petrûs wê me bona wê matêrîyalê hîn bikin, kîjanê emê serê kitêbêyî mayînda lêkolîn bikin.

“Ew hemû tiştê, ku bona jîyana Xwedêhizîyê lazim e, bi cûrê ecêb bona we hatîye dayînê, bi saya Teglîfkirê li cem Xwedê û bi nêzîkayî naskirinê... Dêmek wede unda nekin, û destpêkin çêkin li ser wî tiştî, çi ku wera hatîye dayînê, bi zêdekirina bawarîya weye hmîlîye bi xeysetê baş, femdarîya ruhanî, terbyetdarîyê, sebirê, qedirgirtina bi xofê, hevalhizîya germ û hizkirina merdanî, û bila ji vana her tiştek, yê mayînra bê qayîlkirinê û ew hev bidine pêşxistinê. Wextê ev cudatî nava weda bişuxulin û zêdebin, nava jîyana weda tu tiştê derengî nekeve: tu rojek wê bêyî heqdayîn derbaz nebe, hetanî ku hûn bi naskirina Xudanê me Îsa dighîjin... Dêmek hevalno, teglîfkirina Xwedê testîqkin, ya hindava weda û wê yekê, wekî Ewî hûn bijartin. Wê yekê paşda neyêxin: hema niha wê yekê bikin. Wê yekê bikin û jîyana we wê îzbatbûyîbe û hûnê raste-rast, bi rîya vekirî bikevine nava padişatîya Xudan û Xilazkirê me Îsa Mesîhe heta-hetayê. Çawa ku qezîya gelekin, nenihêrî wê yekê, wekî hûn ha ji vê rastîyê û jîyanê hene, ezê qet deqekê jî nesekinim, ku guhdarîya we biînime li ser van tişta. Eva qulixa mine, kîjanêda ez hatime kivşkirinê, ku bi van bîranînava we hişyar xweyî bikim, û ezê wê yekê bikim, hetanî ku ez dijîm” (B Petrûs 1:3,5-8,10-13, MSG).

# PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

## BEŞA ÇARA, SERÊN 8-10

1. Bawar bikî, beşên dîwana welatîyên Afabêlêye here berbiçav ew bûn, wextê ku wana navên text distendin. Derheqa wê yekêda bifikirin, ku hûn kî bûn, û hetanî qebûlkirina Mesîh hûn çi cûreyî bûn û Îsa çawa jîyana we guhart. Bi fikira we û bi hesabhildana tiştên qewimîye nava jîyana weda, hetanî roja îroyîn, serhatîya navê we çi cûreyî dikare guhartîbe?

2. Bi fikira we ezman bona çi cîhê şabûnê ye, li kîderê hemû hêsirên meriva ji çavên wan tên paqijkirinê, nenihêrî wê yekê, wekî bawarmend dikarin rûyê jîyana xweda zyanêkevin?

3. Bi xeberên xwe şirove bikin, ku wextê dîwanê bi saya çi Xêrkir ji hevalên xwe hate cudakirinê. Ji mesela wê hûn dikarin hînbin?

4. Serê kitêbêyî nehada derheqa wê yekêda niîvsar bû, wekî anegorî Încîlê Ezman çi cûreyî ye. Gelo nava wê şirovekirinêda tiştekî usa hebû, ku we zendegirtî hişt û ew tişt kîjan bû?

5. Serê kitêbêyî dehada nivîsar e: “Bêguman, xwîna Îsa me ji wan guneha paqij dike, yên ku îzin nedidane me, ku em bikevine padişatîya Xwedê: feqet ew me ji dîwanê aza nake, wextê kîjanê kirên meye baş û kirên meye xirab wê bêne guvtugokirinê, yên ku me pêşîya xilazbûna xwe kirine”. Fikira weye pêşin hindava vê gotinêda çi cûreyî bû? Piştî xilazkirina vê beşê hûn niha çi difikirin?

# Beşa Pênca

SERÊ 11-A

# Mala Xwedê

*“...Hûn jî bi hevra têne avakirinê, çawa xana Xwedê...”*
— Efesî 2:22

Emê dîwana bawarmend pareveyî ser du beşa bikin. Ya ewlin tevbûna meye tevî çêkirina padişatîya Xwêdê ye, anegorî tabî û pêşkêşên me. Ya duda, çêkirina jîyanên meriva ye û jîyana me jî dikeve nava wê. Çi ku derheqa çêkirina jîyanên merivadane, ew hukumê bê hesabhildanê, yê ku me li ser wan hiştîye. Çi ku derheqa çêkirina jîyana medane, ewê bê hesabhildanê, ku me bi çiqasîva tevî kerema Xwedê hevkarî kirîye, bona ku nava xweda em xeysetê mînanî mesîhîtîyê çêkin. Ya dawî, bêyî şik, feydayê dayîna bersiva Xebera Xwedê, bawarkirinê û gurêkirinê ye. Kirin û karên me, xeber, fikir û menîyên me çawa jî hebe wê bêne guvtugokirinê.

Berê ewlin emê derheqa wê yekêda xeberdin, ku tevbûna meye nava çêkirina padişatîya Xwedêda wê rastî dîwana çawa bê, peyî çira emê derheqa jîyana şexsîda xeberdin.

## Hûn bona Min çi dikarin bikin?

Em tenê bi gurêkirina Ruhê Pîroz dikarin padişatîya Xwedê çê bikin, çimkî bêyî kerema Îsa Mesîh em nikarin tu tiştekî bi qîmetê heta-hetayê bikin. Xebera Xwedê dibêje: “Eger Xudan malê çê neke, wî çaxî çêkirçî badîhewa dixebitin (Zebûr 127:1). Ev xeber zelal dide kivşê, wekî em dikarin bêyî Ruhê Pîroz çêkin, lê çêkirina me wê bin ronahîya heta-hetayêda bêqîmetbe. Ewê li ber textê Dîwanê bişewite. Ew gelekî girîng e ku em wê yekê fem bikin.

Peymana kevinda Xwedê temîyê dide komeke meriva, yên ku bi qulixkirina bona Wî mijûlin:

> “Ezman textê Min e û dinîya stûna bin lingê Min e. Çi malê hûn dikarin bona Min çê bikin, çi cîhî, wekî Ez li wir bijîm? Min bi

Xwe temamîya ezman çê kirîye. Ew meriv li Min xweş tên, yên ku şikestîne û tobe dikin, yên ku ji Min ditirsin û gura Mindanin” (Îşaya 66:1,2, TEV).

Zelal gotî, Xudan dibêje: “Ez Xwedê me. Hûn bi temamî fem dikin, ku bi rastî Ez kîme? Bi fikira we, hûn çi dikarin bona Min bikin?”. Fikira derheqa wê yekêda, wekî em dikarin tiştekî usa çêkin, çi ku Xwedê lazimbe, tiştekî mînanî wê yekê ye, wekî komeke morîstanga bêjine merivekî: “Emê bona te malê çêkin”. Tiştekî gelekî kenandinê ye. Em tu tiştî nikarin bi qewatên xwe, bona qulixkirin û lêxweşhatina Xwedêyê meyî bilind bikin. Bi rastî, Ew hewcê me nîne.

Qerez, Xwedê dide kivşê, ku kî dikare li Wî xweş bê û bona Wî kardarbe. Ew merivên ku şikestîne û tobe dikin, yên ku ji Xwedê ditirsin û gura Wîdanin, Xwedê mecala çêkirina padişatîya Wî dide wana. Hûn çawa dikarin bona Xwedêyê wî cûreyî bêsînor kardarbin? “Ne ku bi qewatê, ne jî bi zorayê, lê bi Ruhê Minva,– Xwedêyê Xudan dibêje” (Zakarîya 4:6). Ew xebata kardar e, kîjanêda meriv tevî Ruhê Pîroz hevkarîyê dike. Tenê wî çaxî ye, wekî xebata karkir badîhewa nîne.

## Hevkar

Rastîke usa heye, ya ku mêriv ecêbmayî dihêle: bi çiqasîva jî Xudan Xwedê mezin û ecêb be. Ewî bi qirara Xwe cabdarîya şuxulkarîya xweye li ser vê dinîyayê hema destpêkêda da sînorkirinê, wextê ku Ewî serwêrtî li ser dinîya me da mêriv. Usa dertê, wekî îzin heye Xwedê bidine sînorkirinê.

Diqwime ew yek we zendegirtî bihêle, lê Încîlêda gelek mesele derheqa wê yekêda hene. Peyîhatîyên Birahîm “Pîrozê Îsarêlê dane sînorkirinê” (Zebûr 78:41, NKJV). Beşeke mayînda Îsa dibêje rêberên ruhanî, yên dinîya Wî: “Bi vî cûreyî, bi edetê xwe, hûn Xebera Xwedê[qedirê Xebera Xwedê] dikine sifir û vala, û bêfeyda dikin” (Marqos 7:13, AMP). Em gerekê tevî Xwedê hevkarîyê bikin, bona ku meremê Wî mîyaser bikin. Ew merem bi tomerî hildayî ev e: heyîna cimeteke usa, ya ku anegorî şikilê Îsa û mînanî Wî be, tevî kîjanê ew bikaribe nava temamîya heta-hetayêda bijî. Awa bona çi em çawa hevkarên Xwedê tên navkirinê:

> “Em hevkarên (piştgir û xebatkarên tevayî) Xwedê ne û bona Xwedê ne: hûn baxçê Xwedê ne, baxê tirîya û deşta bêcerkirî [hûnin] avayê Xwedê” (A Korintiî 3:9, AMP).

Her car, wextê ku peymana Nû derheqa karên bi qîmete hetahetayê dibêje, wana himberî xebata deştê û avayîçêkirinê dikin. Alêgorîya çawa xebata deştê tê xebitandinê, çimkî ew deşt e, li kîderê niha zêdaya padişatîya Xwedê diqewime. Temamîya Ezmîn bi wê yekêva şa dibe, wextê ku dîna xwe dide ku pîroz çawa li ser vê dinîyayê padişatîya Xwedê çê dikin. Alêgorîya avayîçêkirinê tê xebitandinê, çimkî Xwedê mala hertimî digere, û em jî ew kevirên saxin, ji kîjana Ew mala Xwe çê dike.

Petrûs dinivîse: “Niha Xwedê bi we paristgeha Xweye ruhanî çê dike, çawa bi kevirên sax” (A Petrûs 2:5, NLT). Pawlos dinivîse: “Em bi tevayî mala Wî ne... nava Wî da gîhandine hev” (Efesî 2:20,21, NLT). Dêmek, em li ser vê dinyayêne bona ku paristgeha Xwedêye bi rûmet yan jî *malê* çêkin, bi anîna meriva bona xilazbûnê, hînkirinê, qulixkirinê û karên wî cûreyî. Rola her kesî çawa kevirê saxî paqij, û çawa çêkirçî heye, bi saya kîjanî kevirên sax anegorî wê yekê tên danînê, yên ku dighîjine hev û bona Xwedê dibine mala rûmet. Ev alêgorîya borcdarîyên nava jîyana meda û padişatîya Xwedêda şirove dike, bona kîjana em hemûyê hesab bidin.

## Mala bi projeya şexsî

Eger ez avayîçêkir bim, ezê pêşîya destpêkirina kar projeya wê malê hazirk bikim, kîjanê gerekê çêkim. Li ser projeya hazir wê bê kivşkirinê, ku çawa gerekê wê malê çêkin û matêrîyalên çawa gerekê bêne xebitandinê. Feqet eva hela hê xilazîya wê nîne. Her çêkirçîk zane, wekî beşeke here girîng, ya karê wî, teşkîlkirina xebatêye rast e. Ew gerekê pêşda wan merivara pevkeve, yên ku rikinê malê didine sekinandinê, yên ku şuxulê bêtonê dikin, yên ku xeta avê dikişînin, yên ku xetên êlêktrîkî dikişînin, yên ku selika cîwar dikin û gelek merivên başqe. Hema ev merivin malekê çê dikin. Eger ev xebat rast peyî hev neyêne teşkîlkirinê, hemû tiştê navhevkeve. Mesele bînin ber çavên xwe, eger xebatên cîwarkirina gîpsakartonê pêşîya derbazkirina xetên êlêktrîkî bêne kişandinê.

Eger nava van xebatada kirêkirîk xirab bixebite û xebatê derengî bêxe, çêkirçî wê gazî merivekî mayîn bike, ku xebata wî mîyaser bike. Xebatkarê tezekivşkirî gerekê nava wedekî kurtda bê û bi texmîn ewê mecbûr bibe xebata pêşda şaş kirî xirab bike. Û eger ji van xebatkara yek xebata xwe pêra negihîne, çêkirçî wê hemû tiştî bike, ku xebata xwe ser hevda bîne.

Min usa jî dîtîye, wextê ku çêkirçî *malê bona xwe çê dike*, ew bi dilêşî kirêkirîyên here baş dibîne. Ew bi matêrîyalên başva xebatê dide çareserkirinê û hemû tiştên pêwîst dest dixe, ku xebat rast bê mîyaserkirinê. Ew bi guhdarîke mezin temamîya xebatê kontrol dike. Xwedê Çêkirçîyê *mala Xw eye*, lê mala Wî bajar e, yê ku ji meriva ye.

Malên mexsûs tên navkirinê. Mesele mala padişa Anglîyayê çawa palata Bûkîngêmîyê tê navkirinê. Mala serokê Ştatên Yekbûyî çawa mala Sipî tê navkirinê. Hene malên usa jî, derheqa kîjanada diqeime we nebihîstîye. Mala Fîlîs Kalvêrtaya artîst tê navkirinê çawa Mala li ser gir. Mala artîst û rêjîsîor Çarlz Ayvên Wêns çawa Mala Darên Gûza tê navkirinê. Mala romannivîs Çarlz Dayêr çawa konê pîrêyî Kevin tê navkirinê. Meselên vî cûreyî gelekin. Qerez, Xwedê mala Xwe hê zû nav kirîye, hela hê pêşda, wekî merivek derheqa wê yekêda nefikirîye. Ewî mala Xweye heta-hetayê çawa Sîyon nav kirîye, ya ku hela hê nava prosêsa çêkirinêda ye. Nivîsar e:

> "Çimkî Xudan Sîyon bijart û bona çêkirina mala Xwe ew begem kir. Ev e rihetîya Min, ya heta-hetayê, Ezê li vir bijîm, çimkî Min ev begem kir" (Zebûr 132:13,14).

Eger we mecal stendîye, ku mala xiyala xwe çêkin, hûn zanin ku bi ruhadrîke çawa û bi hêvîdarîke çawa hûn hîvîyêne, wekî hûnê çawa xilazkin. Hûn dixwezin li malê hêsabin, li wir şabûnê û aşîtîyê bibînin. Min û Lîzayê, me bi projeya şexsî nîveka salên 1990-î mecala çêkirina malê stend. Wextê ku em hela hê li bajarê Orlandoyê, li ştata Florîdayê dijîtin, çêkirçîkî eyanî bi navê Robêrt, yê ku qulixa me hiz dikir, li me qesidî û got: "Ez dixwezim bona we malê çê bikim". Wî çaxî mala me gelekî biçûk bû û em fikirîn, wekî bahê wê malê wê gelekî bona me bilind bûya. Wextê ku me pêşnîyara wî înkar kir, ewî got: "ezê wê malê bi bahê Xwedê çê bikim". Paşê eyan bû, wekî ji çêkirina wê malê ewî qet sêntek jî qazanc nekiribû.

Hetanî wî çaxî me du mal îdî çêkiribûn. Ew her du mal jî biçûk bûn, yên ku li ser projeyên hazir hatibûne çêkirinê: dêmek tu eleqeteke me projeyên wanva tunebûn. Ezê tu cara bîr nekim, wextê ku piştî qisa me çend roj derbaz bibûn, Robêrt hat mala meye biçûk, em dora sivirê rûniştin û ewî kaxezê vala raxiste ser sivirê û ruhdarbûyî gote me: “Şikilê mala xiyala xwe bikişînin”.

Em ecêbmayî bûn: me nikaribû bianîya ber çavên xwe, wekî meriv dikaribû tiştekî usa bikira. Kevanîya min carekêra destbi kar kir û destpêkir şikil bikişîne. Ewê bi sala ser hev derheqa wê mecalêda fikirîbû û dikete nava xiyala. Piştî çend deqa ez jî ketime nava prosêsa wê xebatê. Me bi şabûn ew yek dikir û me diha zêde fem dikir, wekî em dikarin projeya mala xwe hazirkin, çawa ku me dixwest. Bi vê yekêva ruhdarbûna me diha zêde dibû. Tu tiştî em nedidane sînorkirinê.

Peyî wê yekêra mala xiyala me li ser kaxez kişandî bû û ew şandine li cem arxîtêktora û hazirkirê projeyaa. Pştî çend roja Robêrt projeya dawî nîşanî me da. Em bêsebir hîvîya destpêka çêkirina avayî bûn.

Ji wî çaxîda, wextê ku koma Robêrte avayîçêkirinê destpêkir erdê bikole û xebat destpê bûn, em her roj diçûne li cîhê çêkirina avayî û me dîna xwe didayê. Carna jî em rojê du cara diçûne wir. Em gelekî lez diketin: me dijwar sebir dikir, hetanî beşeke malê jî dihate çêkirinê. Ew çend mehên ku derbaz bûn, mera tê bêjî çawa sal derbaz bûn û ew roj, yan jî ew hevtya tê bêjî bona me meh bûn, çimkî em hîvîya xilazbûna xebatên li ser malê bûn. Paşê em hîvîyê bûn, ku emê kengê cîguhastî li wir bibin. Me, ecêbmayî, dîna xwe dida wê yekê, ku çawa xiyala me, ya ku li ser kaxezê vala hatibû kişandinê, li ber çavênê me dihate mîyaserkirinê.

Ew halê meyî wî çaxî meriv dikare hinekî himberî texmînkirinên Xwedê û hîvîyêsekinandina xilazbûna çêkirina mala xiyala Wî bike, lê Ew ji meha zêdetir hîvîya wê yekê ye. Ew ji efrandina dinîyayê wêdatir hîvîya xilazbûna çêkirina mala Xwe ye. Nivîsar e: “Xudan Sîyon çêkir” (Zebûr 102:16) û “Ji nava Sîyonê ji wê bedewîyê û kamilîyê Xwedê dibriqe” (Zebûr 50:2).

Xwedê îdî çend hezar sale, ku li ser mala Xwe dixebite. Ewî hela hê pêşîya çêkirina mêriv ew proje hazir kirîye. Bi saya serwaxtîya Xwe, Ewî zanibû, wekî merivê bikeve, nenihêrî wê yekê, wekî ew yek

progirama Wî û karê Wî nîbû. Dêmek, bi zanebûna Xwe Ewî qirar kir Sîyonê çê bike, yê ku wê bi merivatîya xilazbûyî bê çêkirinê.

Xwedê gerekê ji bingehê destpê bikira, ji kevirê enîşkêyî sereke, yê ku bi xwe Îsayê Xilazkir e. Bav derheqa Wîda dibêje: "Binihêre, ez kevirekî li Sîyonê datînim, kevirê cêribandî, çawa bingeha qewîn, kevirê enîşkêyî qîmetlû" (Îşaya 28:16, NIV). Çawa ku Bavê pêşîya efrandinê mala Xwe program kir, projeya wê kişand, Îsa tê navkirinê "Berx... yê ku ji wextê efrandina dinîyayêda serjêkirî ye" (Eyantî 13:8). Petrûs dinivîse: "Yê ku berî destpêbûna dinîyayê kivşkirî bû" (A Petrûs 1:20).

Îsa ne tenê hîm û kevirê enîşkêyî sereke ye, lê usa jî xebatkarê sereke ye. Nava wê xebatêda, ya ku teslîmî Wî kiribiûn, Îsa bêkêmasî ew yek kir. Pêşîya xaçkirina Xwe Ewî li bavê Xwe dua kir: "Min ew kar *xilaz kir*, yê ku Te dabû Min ku Ez bikim" (Yûhenna 17:4 NKJV).

Bav Xwedê projeya mala Xweye tam destpê kir, û wede bona xebata Îsa qirar kir" binihêre Galatî 4:4). Peyî wê yekêra, Ewî xebatkarên mayîn kivş kirin me hemûyara. Feqet, çawa ku me îdî da kivşê, em gerekê bibine ne tenê xebatkarên mala Wî, lê usa jî matêrîyalên çêkirinê. Çawa Pawlos dinivîse: "*Berî efrandina dinîyayê* [Ewî] em yektîya Wîda bijartin, wekî em pîroz û bêqisûrbin li ber Wî" (Efesî 1:4). Ew yek dide kivşê, wekî em matêrîyalên çêkirina mala Wî ne, kevirên wê malêye saxin.

Xwedê em usa jî çawa xebatkar bijartin, çimkî nivîsar e: "Çimkî em hevkarên Xwedêne, yên nava Îsa Mesîhda çêkirî, *bona ku em wan karên qenc bikin, yên ku Xwedê pêşda bona me hazir kirîye*" (Efesî 2:10, NIV). Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Ewî pêşda xebata bona me dayî qirar kirîye. Încîlêda nivîsar nîne, wekî teslîmkirinên me piştî hîmdanîna dinîyayê hatine dayînê, nenihêrî wê yekê ku ew yek dikare bibe. Bêguman em zanin, wekî "...Ji destpêka dinîyayê ew kar kirî bû" (Îbranî 4:3). Qerez, çi ku derheqa teslîmkirinên meye şexsîdane, tiştê tek-tenê wekî em dibînin ew e, wekî ew pêşîya bûyîna me hatine dayînê. Dawid dibêje: "Te ez hetanî bûyîna min dîtim. Her rojeke jîyana min kitêba Teda nivîsar e. Her deqîqek progiramkirî bû, wextê ku ji rojên min tu rojek nebibû" (Zebûr 139:16, NLT).

Karê jîyana me hela hê pêşda hatibû qirarkirinê, pêşîya ku em zikê dayîka xweda çêbûn. Ev rastî kitêba Yêrêmîyada nivîsar e: "Min

tu naskirî pêşîya ku Min te zikê dayîka teda çêkir. *Hetanî bûyîna te Min tu başqekirî û Min tu kivşkirî çawa baylozê Minî li dinîyayê*" (Yêrêmîya 1:5, NLT). Pawlosê şandî jî usa dinivîse: "Lê gava Xwedê xwest, Yê ku ez bijartim, çaxê ez zikê dîya xweda bûm û bi kerema Xwe kivşkirim..." (Galatî 1:15,16). Ev şedetî tenê gotinên Dawid îzbat dikirin, wekî hetanî bûyînê em hemû kes başqekirî bûne, ku bona Xwedê karê mexsûs bikin.

Dêmek rastîke ecêb heye: Xwedê derheqa weda, hetanî bûyîna we kitêb nivîsîye, her deqeke jîyana we qirar kirîye, wextê ku rojên we hela hê rojek nebibû. Pirs ew e, ku gelo emê wî hemû tiştî bikin, çi ku bona me hatîye qirarkirinê. Silêman dinivîse:

> "Ez zanim, wekî ew hemû tişt, çi ku Xwedê dike wê heta-hetayê bimîne. Tu tişt wê ser wê yekêda ne zêdebe, ne jî bê kêmkirinê. Xwedê wê dike, wekî meriv li ber Wî bitirsin. Ew, çi ku heye, îdî bûye, lê ew tiştên ku gerekê bibin, îdî bûne: û Xwedê bona tiştên derbazbûyî dewa hesab dike" (Zanebûn 3:14,15, NKJV).

Nava van xeberada gelek tişt nivîsarin. Berê ewlin porgirama Xwedê heye. Tu tişt nikare bona mîyaserkirina wê programê dijwarîya pêşda bîne, û merivatî tu tiştî nikare serda zêde bike. Silêman xeberdana xwe berdewam dike û dibêje, wekî ew hemû tiştê ku niha dibe, gelekî zûva fikira Xwedêda hebûye. Ew hemû tiştên ku wê pêşerojêda bibin, dîsa gelek zûva bernama Xwedêda hebûne. Qerez, em gerekê bona wî hemû tiştî hesab bidin, çi ku me îdî kirîye. Gelo me gav avîtine berbi wî hemû tiştî, çi ku Xwedê bona me hazir kiribû? Diqewime me îdî hemû tişt xirab kirîye, yan jî nava karê meda kêmasî hebûye? Diqewime Xwedê mecbûr bûye bona kirina wî karê nava progirama Xweda merivekî mayîn kivş kirîye, bona kîjanî em hatibûne gazîkirinê?

Ez niha gerekê elametîke girîng belakim. Nava jîyana hemû merivada navê xwedêtîyê heye. Ji me her merivek beşeke progirama mala Xwdêye girîng e. Dêmek, wê baş bibe ku em vê rastîyê bizanibin.

> Çi ku derheqa navê wedane hûnê bona wan kara neyêne gunehkarkirinê, yên ku we kirine, lê bona wan kara hûnê li ber dîwanê bisekinin, bona kîjana hûn gazîkirî bûne.

Îzinê bidin ez meselekê bînim. Li ber textê Dîwanê Îsa dikare bêje:

– Andêrsonê terîfkir, Min gazî te kiribû, bona ku tu nêzîkî gelek meriva bibî. Pêşda were û bona wana hesaba bide.

Ew meriv dikare tevîhevbûyî û navhevketî, bi tirs pêşda bê ber Îsa û bêje:

– Xudan, Te dixwest bigota Andêrsonê hesabdar, ne usa ye? Hevaltîya mine hesabdarîyê hebûye. Ew xebata min bû. Ez tevî gelek civîna û teşkîletên usa dixebitîm, yên ku peyî karê nediketin. Gelek bi saya van qulixdarîya ketine padişatîya Te. Te ez yekî mayînra şaş kirime?

Xudan dikare vî cûreyî bêje:

– Na xêr. Min hetanî bûyîna te tu bijartibûyî ku tu li Asîyayê gelek meriva bona Min qazanc bikî. Niha derheqa wê yekda hesab bide, ku ew li kîderêne. Eger te gura Min bikira, teyê heqê mezin bona wî rezî bistenda, yê ku te bona padişatîya Min berev bikira. Lê niha karên te wê bişewitin, çimkî te gura Min nekirîye.

Dikare vî cûreyî jî bibe. Îsa dikare bêje:

– Consê hesabdar, Min bona karê mexsûs gazî te kiribû. Pêşda were û bona wê yekê hesab bide.

Ew meriv jî dikare navheketî pêşda bê û bi lerizandin bêje:

– Xudan, Te dixwest bigota Consê serwêr, rast e? Ez serwêrê civîna ji 900 merivî bûme. Min ew civîn ji sifirda çêkirîye.

Xudan dikare bêje:

– Na xêr Min gazî te kiribû bona goveka bîznêsmênîyê. Te gerekê hevaltîya hesabdarîyêye mezin sazkira, ya ku wê alî geleka, yên ji civîn û qulixdarîyên Min bikira, ku wana ew hemû tişt bikirana, bona çi Min gazî wan kiribû. Eger te bi kel û ced Ez bigerîyama, Minê nîşanî te bida. Wî çaxî ew hemû meriv, jîyana kîjanada wan qulixdarîya hukum bihiştana, wê li ser te bihatana hesabê: teyê bona her merivekî heq bistenda. Lê niha tê bona karê xwe tu tiştî nestînî, çimkî te gura Min nekirîye.

Min usa jî te li civînekê çawa serkarê qulixa qeyde-qanûna kivş kiribû, ya ku li beşa bajêre mayîn bû, li kîderê te civîna xwe destpê kir. Nenihêrî wê yekê, wekî reqema endamên wê civînê ji 500-î hinekî zêdetir bû, feqet ew li wî bajarî nêzîkî geleka bû. Eger te gura Min bikira, hemû bîst hezar meriv, yên ku wana anîne nava heta-hetayê wê li ser te bihatana hesabê, çimkî tê bibûyayî beşa wê

civînêye sereke, li kîderê Min tu bijartibûyî. Tu ne li wê civînê bûyî û tê bona wan bîst hezar merivî heq nestînî.

Îzinê bidin, ku ez serhatîke rast wera gilî bikim. Endamekî şêwira qulixa me, yê ku hevalê minî nêzîk e, li başûr-rohilata Ştatên Yekbûyî, li civîneke gulvedayî serwêrîyê dike. Ewî civîna xwe sala 1991-ê, bi bîstdu merivava destpêkir û niha ew civîn dighîje çar hezara. Civîna wî ji wan civîna ye, li kîderê ez gelekî hêsa terîf dikim, çimkî li wir meriv hewcê ruhanîyêne. Wê civînê gelek meriv anîne bona xilazbûnê û hînkirinê.

Civîna ku min da kivşê, bi cûrê lez, bi saya duakirina terîfên hukumdar û xebata mezin pêşda diçû. Wana avayîkî bedewî mezin çê kirin ku gelek meriv li wir cîhûwarbin. Piştî çend sala, hevalê min merivekî berbiçav dît, yê ku yaşê xweda mezin bû, kincê wî gelekî baş bûn û ew wextê qulixa hazir bû. Ewî jî texmîn kir, wekî wextê her qulixekê ji çavên wî hêsir dihatin û ewî texmîn kir, wekî ew hêsir ne yên şabûnê bûn.

Paşê, ew meriv nêzîkî alîkarekî serwêr bû û gilî kir, wekî sala 1981-ê Xudan zelal gotibû wî, wekî ewî gerekê li wî bajarî civîn destpê bikira. Piştî çend roja ewî xewinêda ew avayî dîtibû, li kîderê civîna wî gerekê berevbûn derbaz bikirana. Xewina wî awqasî rengîn û berbiçav bû, wekî ewî şikilkêşekî profêsîonal dîtibû, yê ku alî wî kiribû, ku şikilê avayê ku wî xewinêda dîtibû bikişîne. Ewî bajarên mayînda bi wedê kurt qulix kiribû, lê paşê bi bîznêsmênîyêva mijûl bibû.

Peyîra ew kaxezeke qetkirî vedike û dibêje alîkarê serwêr, wekî li ser kaxezê ew avayî ye, yê ku şikilkêş sala 1981-ê kişandibû. Bi dîtina wî şikilî, alîkarê serwêr zendegirtî dimîne. Ew hema ew avayî bû, yê ku hevalê min piştî çend sala çêkiribû, li kîderê wana berevbûn derbaz dikirin. Ji wî çaxîda hevalê min ber dilê wî merivîda hatîye, lê ew dibêje, wekî bona wî gelekî dijwar e wê yekê alt bike. Bêguman, Xwedê naxweze, wekî ew nava gunehkarîyêda bijî, lê hîn bibe, bighîje û fem bike, ku ew çawa dikare bi cûrê kardar hetanî dawîya (xilazîya) jîyana xwe qulixî Xwedê bike.

Çend sal pêşda, min bi vê têmayê wextê civîneke mezin terîf dikir. Piştî qulixê serwêrek, bi xemgînî û hinek jî bi nerazîbûyî, nêzîkî endamekî koma me bû û pirsî:

– Ewî bi dilê xwe derheqa wê yekêda nedigot, ne usa ye?

– Fikira wîda çi hebû, ewî ew jî got,– endamê komê got:– eva nava Xebera Xwedêda nivîsar e. Çi qewimîye?

Wî serwêrî, yê ku ji 50-î salî derbaztir bû, gotê:

– Wextê ku ez cahil bûm, min xewinek derheqa wê yekêda dît, wekî ez li Fîlîpîna dimam û min qulixî wê cimetê dikir. Ew xewina awqasî nêzîkî rastîyê bû, wekî ez li ser wê fikirê bûm, wekî ezê cîguhastî wî welatîbûma. Feqet ew yek nebû û ez îdî sî sale ku serwêrê civînême.

Endamê koma me rih’et bersiva wî da:

– Lê niha hûn hazir dibin, çi bikin?

Wî serwêrî tu tişt negot, tenê hişt û dûrket.

Piştî salekê endamê koma me behsek ji wî merivî stend. Ew îdî serwêr nîbû. Ewî civîn teslîmî alîkarekî xwe kiribû û niha jî bi hizkirin li Fîlîpîna dijî. Ew serwêrê berê dinivîsî: “Cara ewlin ez nava jîyana xweda texmîn dikim, wekî hema wê yekê dikim, bona çi ez hatime çêkirinê”.

Îzinê bidin ez serhatîke mayîn gilî bikim, ya ku vê rastîyê îzbat dike. Wedekî kurt pêşda, hevalekî min rasthatina tevî qulixçîkî leşkerî, yê esekrê Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyî berê teşkîl kir. Wextê nivîsara vê kitêbê ew meriv nava qulixa leşkerîda bû. Dêmek, bona xweyîkirina navê wî ezê navê wî biguhêrim û ezê wî çawa Pol nav bikim. Du seheta ser hev min bi xof şedetîya wî guhdar dikir.

Bîst salîya xweda Pol mekteba Încîlêye dusale xilaz kiribû û nava qulixa civîneke cahilada praktîka derbaz dibû. Wextê havîna praktîkayêye duda, Pol nava wê yekêda gunehkar kirin, ku ewî xwe gîhandibû keçeke civînê û wêra ketibû nava heleqetîyên bedenî. Pol gote min:

– Con, ez tevî wê keçê neketibûme nava heleqetîya. Min serbara serda jî ew keç çawa keçeke bedew hesab nedikir. Feqet, rêberên civînê ne tenê bawarîya xwe li wê behsê anîn, lê usa jî ew yek bîr nekirin û min hemû tişt unda kir. Tu kes aminaya xwe min nedianî. Wana navê min xirab kirin û hîvî ji min kirin (bi rastî mecbûr kirin) ku ez dûrkevim.

Pol xeberdana xwe berdewam kir:

– Ez usa Xwedê digeryam, wekî tu cara ez usa negerîyabûm. Carekê, wextê duakirinê, min bihîst ku Xwedê zelal gote min: “Min bona qulixa li civînê gazî te nekirîye, min tu bijartîyî nava qulixa leşkerîda”.

Pol berbirî merkezên qewatên li ser erdê, yên behrê û hewêye leşkerî bû, lê ew tu cîhî qebûl nekirin. Tenê mabû eskerê behrê.

Wextê ku Pol berbirî eskerê behrê bû, ofîsêrê ku ew qebûl kir, destpê kir navê ştatên xebata bide. Pol gelekî nerazî ma, çimkî ji wana tu xebatek dilê wîda cîh negirt, çawa rêberîya ji alîyê Xwedêda. Bi cedandina wê yekê, ku wî merivî ji destê xwe bernede, ofîsêr usa jî bernameke mayîn nava doranên eskerê behrêda pêşnîyar kir. Wextê ku Pol derheqa wê yekêda bihîst, ewî femkir, ku gerekê hema wê yekê jî bibijêre. Wî çaxî ewî peymana bona qulixa leşkerî îmze kir.

Ofîsêr cêriband Pol bîne ser wê fikirê, wekî ew yek bona wî wê dijwarbe, çimkî hindik meriv wê bernamêra derbaz dibûn. Ewî gote Pol, wekî tu kes wê bernamêra derbaz nebûye û li temamîya dinîyayê hazirîya leşkerîye wî cûreyî ya here giran e. Feqet, Pol bi ruhdarbûn texmîn dikir, wekî gerekê gava ewlin berbi rîya Xwedêye qirarkirî biavîta. Ewî got, wekî gerekê ew nava wê komêdabe.

Feqet, li ser wê rê du dijwarîyên çetinayên mezin hebûn. Ya ewlin ew bû, wekî Pol nikaribû xwe li avê xista. Ew mecbûr bû bona wê yekê dua bikira û paşê ew bi xwe hînî xweavêxistinê bû. Ya duda, ew bû, ku hema ew yek serhatîya wî diha hewaskar dike. Gilî derheqa wê yekêdane, wekî wextê ku ew zarok bû, guhê wîda lûlên doxtirîyê gelek cara diatanîn: ewî gelek emelyet dîtibûn, bona vekirina guhên xwe. Rûyê wê yekêda, wextê ku ew îdî xort bû, wextê ku hundurê guhên wîda hinekî şil dibû, ew gelekî diêşîyan û peyîra gelek cara wê êşê dirêj dikişand. Nenihêrî wî hemû tiştî, ewî bi dil bawar dikir, wekî banga Xwedê wê tiştekî usa nîbûya, ya ku ewî dikaribû bi qewatên xwe bighîştayê.

Pol bi xwe destpê kiribû hînî xweavêxistinê bûya û bi kel û ced dua bikira ku guhên wî qencbûna. Telîmên avêye herroje guhên wî diêşandin, lê ew teslîm nedbû. Çar meha ser hev ewî teyax kir û piştî wan êşa, Pol îdî karibû ne tenê xwe avêxista, lê usa jî niqoyî li ser kûrayên mezin bûya. Ew qenc bibû û îdî hazir bû tevî wê bernama hazirkirinê bibûya.

Wextê derbazbûna progirama hazirkirinê, Pol rastî gelek dijwarîya hat, lê bi kutasî ew derbazbûn gihîştîye biratîya ku nava şerara derbaz bibû. Ew îdî qulixçîyê leşkerîyî çardeh sala bû. Ewî nikaribû gelek serhatîyên derheqa wê yekêda gilî bikirana ku çawa

Xwedê tevî mîsîyayên wane leşkerî bûye û ew jî bi cûrên usa ecêb, wekî wextê guhdarkirinê sizû minda diçû.

Wê êvarê min zanibû, wekî ez li rex qulixçîkî Xwedêyî mezin rûniştibûm, yê ku bona sekinandina li ser dikê nehatibû gazîkirinê. Ew hatibû gazîkirinê, ku bighîşta leşkera û bona milet qulix bikira. Roja îroyîn Pol fermandar e, leşkerekî sade nîne. Ewî îzin da Xwedê ku Ew şuxulkarîya wî rast bike, bona ku ew biketa nava wan karên qenc, yên ku bona wî progiramkirî bûn.

Min gelek mesele ji meriva bihîstine, yên ku himberî Pol ew qirarên derheqa xweda nekirine. Min bi xwe jî meselên usa dîtine. Ji 20 salî zêdetir ez li temamîya dinîyayê, li gelek civîna bûme. Min serwêrên mezin dîtine, yên ku, çawa ku min dilê xweda zanibû, bona alîkarên serwêr hatibûne gazîkirinê. Min merivên bîznêsmên dîtine, yên ku çawa ku min zanibû, gerekê nava qulixêda bûna, lê usa jî serwêr dîtine, yên ku bona bîznêsmênîyê hatibûne gazîkirinê. Min gelek merivên serkar yan jî bîznêsmên dîtine, yên ku cîhên şaşda bûne: ew li cem merivên başqe dixebitîn, çimkî ditirsîyan ku wê şaş bûna, eger îşên xwe destpê bikirana. Min usa jî merivên usa dîtine, yên ku hindava serkarên xweda amin nîbûne, çimkî dixwestin îşên wane şexsî hebûna.

Min merivên usa jî dîtine, yên ku dijî xwestina Xwedê zewicîne, rûyê çida bijartina xwe mîyaser nekirine. Yên mayîn ketine bin hukumê hevalên xwe, yan jî rûyê wanda ketine nava pirsgirêka û dîsa borcdarîyên xwe neqedandine. Min usa jî meriv dîtine, yên ku ketine tela hêsabûnê, sportê, pera, yan jî cedandina berbi serwêrtîyê. Gelek mesela meriv dikare bîne, lê fikira wê yekê ew e, wekî wan bawarmenda nava bernama çêkirina mala Xwedêda bijartina xwe neqedandine.

Ev xeber me hişyar dikin, lê behsa qenc ew e, wekî ji me tu kes gerekê ji rê nexalife, ya ku Xwedê danîye pêşîya me. Xwedê xudanê dîroka (tarîqa) me ye û Ew dikare rêberîyê li me bike, kîjanê emê bînine sêrî. Em gerekê vê pirsê bidine xwe: ez çawa bizanibim, ku bona çi hatime bijartinê, çawa kirêkir? Emê bersiva vê pirsê serê kitêbêyî mayînda bidin. Emê dîsa derheqa wê yekêda xeberdin, ku em çawa paşda vegerin, eger em ji rîya rast xalifîne.

SERÊ 12-A

# Jİ ALÎYÊ XWEDÊDA GAZÎKIRÎ

"Çimkî pêşkêşên Xwedê û banga
Wî tu *cara nayêne hildanê*".
— Romayî 11:29, NLT

Gelek meriv ji wê fikirê ditirsin, wekî meriv dikare ji progirama (bernama) Xwedê bixalife, eger ew peyî tiştên usa jî herin, yên ku çawa yên qenc yan jî xwedêprêz tên texmînkirinê. Bersiva vî cûreyî meriv dikare fem bike. Qerez, bîr bînin, wekî em bona tirsa ji teribandinê, yan cezakirinê nehatine gazîkirinê, bona ku tirsa Xwedê li cem me hebe. Xofa Xudan me nava şêwira Wîda xweyî dike, derheqa Kîjanîda nivîsar e: "Guhên te wê Wî guhdar bikin. Carekêra peyî te dengekê bêje te: "Ev e ew rê, bi kîjanê tu gerekê herî berbi milê rastê, yan jî çepê"" (Îşaya 30:21, NLT). Dêmek werin em derheqa wê yekêda xeberdin, ku em çawa nava çêkirina mala Xwedêda cîhê xwe bizanibin.

## Ya ewlin: hûn bi kel û ced Xwedê gerîyane?

Eger ji we bipirsin, ku gelo hûn wê yekê diqedînin, çi ku bona we hatîye qirarkirinê, diqewime hûn bifikirin: "*Minê bixwesta wekî usa bûya. Feqet ez nizanim, ku bona çi ez hatime gazîkirinê*". Pirsa ewlin, ya ku gerekê hûn bidine xwe ew e, ku gelo hûn bi kel û ced Xwedê gerîyane? Nivîsar e, wekî Xwedê heq dide wana yên ku bi kel û ced û bi bawarîyê Wî digerin (binihêre Îbranî 11:6), lê ne ku wana, yên ku car-carna wî digerin, bi pirs û şikberîyên xweva. Eger kesek bi kel û ced Xwedê bigere, bi temamî gumanbe, wekî wê bersivê bistîne, Xwedêyê nîşan bide, ku li vê dinîyayê navê wî kîjane.

Peyî wê yekêra, wextê ku ez li zanîngeha (ûnîvêrsîtêya) Pûrdyûyê, li cîhê jîyana xorta xilaz bûm, min destpêkir Xwedê bigerim. Min li fakûltêya înjênêrîyê dixwend û her nîveka sala xwendinêye duda ez li hevaltîya "AyBîÊm"-ê dixebitîm. Ji wan

faktora (menîya) yek, yên ku ez pêşda birim ku ez bi xwestina gurêdabûna Xwedê derheqa navê xweda pê bihesîyama, qewimandinek bû, ya ku piştî xilazbûna min, dîsa piştî çend meha qewimî. Ez tevî nêzîkî deh înjênêrên mayîn li ofîsekê bûm, kîjana 38-salîya hevalkarekî xweyî li wê hevaltîyê didane kivşê. Me bi hevra qise dikir û ewî merivî gote me hemûya:

– Nava van 38 salada ez her roj bi hiznekirin hatime li ser xebatê.

Înjênêrên mayîn wîra qayîl bûn, yan jî bi sivikayî kenîyan, xêncî min. Ez zendegrtî mabûm.

Ez nava wan pêşekzanên cêribandîda xebatkarekî nû bûm û zendegirtî mam, ku tu kesî dijî wî tu tişt negot. Min pirsî:

– Bona çi hûn 38 sala li vir xebitîne, eger hûn vî karî hiz nakin?

Ew zivirî, berê xwe da min, li min nihêrî û got:

– Eva awqasî tenê xebat e.

Min bi xwe jî destpê kiribû bi hiznekirin bême xebatê. Bavê min jî înjênêr bû: ewî digot, wekî eva pêşekî baş e û bona wê xebatê parên baş didin. Feqet wê qewimandinê fikira min guhart. Ez fikirîm: “*Ne pare, ne çareserî û ne jî tiştekî mayîn wê bona min dijwarîya pêşda neynin, ku ez wê yekê bikim, bona çi ez hatime li vê dinîyayê*”. Min li wê ofîsê qirar kir, ku ez pê bihesim, wekî bona çi hatime gazîkirinê û gava bi sirêye berbi navê min kîjan e.

Min eyan kir, wekî Xwedê wê şikilê tomerî, yê nava jîyana we nîşan bide, eger hûn wextê destpêka şuxulkarîya xweye ruhanî Wî bigerin. Bi gilîkî mayîn gotî, Ewê dawîyê (xilazîyê) ji destpêkê bide kivşê. Xortanîya Ûsivda Xwedê eyan kir, wekî ewê bibe rêberekî mezin, û usa jî bav û birayên wî wê qulixî wî bikin. Feqet, sal derbaz bûn, hetanî ku ew yek bû. Mûsa hela hê 40 sal pêşda zanibû, wekî ewê rêberîya li cimeta Îsraêlê bikira. Dawid pê hesîya, wekî wê bibûya padişa, wextê ku ew hela hê berxvanekî xort bû, lê gelek sal derbaz bûn, wextê ku ewî destpê kir rêberîya Îsraêlê bike. Tiştên wî cûreyî usa jî rastî gelek merivên başqe hatine.

Min têra didît, ku min dereca bakalavrîyê li ûnîvêrsîtêya Pûrdyûyê bistenda, çawa înjênêr, xwendina xwe berdewam bikira û li ûnîvêrsîtêya Harvardê dereca magîstrê serkarîkirina êkonomîkî bistenda, paşê jî nava goveka serkarîkirina hevaltîyên amêrîkîye mezinda bixebitîyama. Ezê bizewicîyama, salê çend cara biçûma

hêsabûnê û minê yek dehanîya kara xwe bida Xwedê. Min qulixa bona Wî usa dianî ber çavên xwe.

Bi çiqasî zêde ez Xwedê digerîyam, bi awqasî zêde min texmîn dikir, wekî ez bona qulixê hatime gazîkirinê. Ew yek jî li min xweş nedihat, lê ez serwaxt bûm û min fem kir, ku eger ez gura Xwedê bikim, ezê nava jîyanêda pêşbikevim û ji jîyana xwe razîbim. Çawa ku min gote Xwedê, ezê gura Wî bikim, çi ku Ew bêje. Xwedê destpê kir şikilê tomerî, yê navê min nîşanî min bide.

Hela hê destpêka salên 1980-êyî, Xwedê nîşanî min dabû, wekî pêşerojêda ezê bi Xebera Xwedê hukum li ser gelek mileta bihêlim, eger gura Wîda bimînim. Hewce nîne bê gotinê, wekî ew yek bona min çawa tiştê nebûyînê hate texmînkirinê. Min nedianî ber çavên xwe, ku ewê çawa biqewimîya. Ez li bajarekî biçûk mezin bibûm û min tu qulixçîkî bi hukumê miletîyê, yan jî navnetewî nas nedikir.

Mînanî Ûsiv û Dawid, Xwedê şikilê dawîyê nîşanî me dide, lê ne ku wan gava, kîjana gerekê em biavêjn, bona ku bighîjine wê yekê. Ew usa dike, ku bi bawarîyê bilivin, lê ne ku bi fikirdarîya xwe. Em gerekê bicedînin, gura gotina Wî bikin û berbi merem herin. Feqet, gelek cara wextê avîtina gava bi sirê, em texmîn dikin, ku em ne ku berbi meremê xwe, lê lap li alîkî mayîn diçin. Ûsiv derheqa bûyîna rêberê mezin xewin dît, peyî kîjanêra ew çawa xulam hate frotanê û deh sala ser hev çawa xulam ma. Peyî awqas tiştîra, xewina wî, fikira wî ne nêzîkî aqila bû. Awa ku bona çi nivîsar e: “Bi temamîya dilê xwe li Xudan gumanbe: gumana xwe nede ser fikira xwe. Xwestina Wî nava temamîya karên xweda bigere û Ewê rêberîyê li rêyên te bike” (Gotinên Silêman 3:5,6, NLT).

Piştî çend meha, sala xilazkirina ûnîvêrsîtêyê, ez li cîhê jîyîna ûnîvêrsîtêyê mam, lê xwendikarên mayîn girêdayî cejina Razîbûnêra çûne hêsabûnê. Min rojî digirtin û bona gera rêberîya Xwedê û xwestina Wîye nava jîyana minda, dua dikir. Piştî du meha bona gava mayîn min rêberî stend û dihate texmînkirinê, wekî ew dijî wan gava bû, kîjan min dikaribû berbi qulixê biavîtana. Cûrê fikirdaryêyî tek-tenê ew bû, ku biçûma mekteba Încîlê, lê Xudan rêberî li min kir, ku ez erza xwe bona stendina xebata înjênêrîyê raber bikim. Awa ew e menî, ku bona çi Xwedê temîyê dide me, ku gumana xwe nedine ser fikira xwe.

Li ûnîvêrsîtêyê min nasîya xwe dabû gelek hevaltîya û tê bêjî min carekêra fem kir, wekî ez gerekê li hevaltîya Rokvêlê, ya li bajarê Têxasêye Dallasê bixebitim. Ew yek tê bêjî ne nêzîkî aqila bû, çimkî li Dallasê mektebên Încîlê tunebûn, derheqa kîjanada ez haj pê hebûm. Min 13 pêşnîyar ji bajarên cuda-cuda stendin, ji kîjana li çend bajara mektebên Încîlê hebûn û hemûya jî aylixa (miaşa) diha bilind pêşnîyar dikirin, ne ku li Rokvêlê. Feqet min gura wê yekê kir.

Çawa ku ez gihîştime Dallasê, ez çûme civînekê û Xudan nîşanî min da, wekî ez gerekê li vir bême nikandinê. Li wê civînê, bi rîya qulixê, ez bi ruhanî gihîştim. Qulixkirina li wê civînê ew destpêk danî pêşîya min, ya ku ez danîme li wir, li kîderême ez niha.

## Ya duda: hûn nava mala Xwedêda hatine nikandinê?

Awa menîya duda, ku bona çi gelek meriv xwestina Xwedêye bona xwe nizanin. Ew li civînên cîh nayêne nikandinê. Xebera Xwedê li me eyan dike: "Ewên ku nava mala Xudanda hatine nikandinê, wê li serayên Xwedêyê me şîn bibin" (Zebûr 92:13).

Ew mervên ku nava mala Xwedêda tên nikandinê (ya ku roja îroyîn civîn e), wê li *serayên Xwedê* şîn bibin, yan gulvedin. *Serake Xwedê* dîwana Mesîh e. Dêmek emê him niha û him jî wextê Dîwanê gulvedin, bijîn, eger bên nikandinê û koka xwe li civîna cîh bidin. Ev e progirama (bernama) Xwedê.

Civîn ji alîyê Xudanda hatîye kivşkirinê, lê ne ji alîyê merivada. Îsa dibêje: "...Ezê civîna Xwe çêkim û qewata mirinê wê pê nikaribe" (Metta 16:18). Guhdarîyê bidine ser xebera "çêkim". Îsa çawa dikare civîna Xwe çêke, eger Ew bi fîzîkî li vir nîne. Bersiva vê pirsê ev e: bi bedena Xwe, dêmek bi me. Careke mayîn ev e menî, wekî em hevalkarên Wîne (yan jî kirêkirî). Ew kerema Xwe, karebûnên Xwe, pêşkêşên Xwe û qewata Xwe dide me. Feqet, em gerekê gurêdabin û ber daxun, bona ku karê Wî mîyaser bikin. Pirs ev e, gelo em civîna Wî, bi hevkarîya tevî Wî bilind dikin, yan bi progiramên xweva tên rêberkirinê?

Îsa civîna hemdinîyayê daye hîmdanînê, ya ku pareveyî li ser civînên cîh bûye. Meseleke van gotina hema xeberên Wîne nava kitêba Eyantîda, yên ku bona hevt civînên cudane, yên ku li Efesê, Simîrnayê, Pergamayê, Tîyatîrayê, Sardeysê, Filadelfîyaê û Lawdikîyaê bûn.

Nava Încîlêda civîn çawa bedena Mesîh tê navkirinê. Û çawa ku civîna tomerî pareveyî li ser civînên cîh bûye, usa jî bedena Mesîhe tomerî pareveyî li ser bedenên cîh bûye.

Xudan bi Xwe nava bedena Xweda cîhê cimeta Xwe qirar dike. Pawlos dibêje me: "Lê niha Xwedê ew endam yeko-yeko bedenekêda cîh kirin, çawa Wî xwest" (A Korintî 12:18). Diqewime ev gotina we zendegirtî bihêle, lê *em qirar nakin, ku herine kîjan civînê, Xwedê wê yekê qirar dike*.

Bisekinin û qasekê derheqa wê yekêda bifikirin. Gelek meriv dibijêrin, ku herne kîjan civînê, û tê bêjî gilî derheqa dikanên xurekdane, dewsa wê yekê ji Xwedê bipirsin, ku Ew kîjan civînê dixweze, ku ew herin. Hûn çawa dikarin bighîjin navê xwe, eger hûn nava bedena Wîda cîhê rastda nînin? Her beşeke bedena mêriv anegorî karên wî, anegorî progirama Xwedê hevvakirîye. Destê mêriv wê rastî dijwarîya bihata, eger ew çokê wîva kirîbûya. Hema bi wî cûreyî jî em gerekê xwestina Xwedê bigerin, wextê em hazir dibin cîguhastî bajarekîbin, yan jî bighîjine civîneke cîh.

Li civîna cîh rola me her yekî heye. Nivîsar e:

> "Awa hûn bedena Mesîhin, û her yek ji we endamekî bedena Wî ye. Û Xwedê pêşîyê hinek civînêda kirine şandî..." (A Korintî 12:27,28).

Peyî wê yekêra Pawlos li civîna cîh navê cêrge qulixdarîyên sereke dide. Nenihêrî wê yekê, wekî nava vê beşêda ew navnîşa tam nade me, lê em ji beşên peymana Nûye başqe zanin, wekî her bawarmendek endamekî bedena Mesîh e û her kes rola girîng dilîze, ya ku ji rola endamên bedena me cuda nabe. Eger em nava wê bedenêda naşuxulin, kîjanêda em kivşkirîne, civîna cîh seqet dibe, çawa ku wê bedena we seqetbûya, eger endamkî bedena we (mesele nig, çav yan jî gurçik) ji kontrolê der bişuxulîya, yan jî qet nexebitîya, yan jî ji bedenê cuda bûya.

Tiştê herî bi keder ew e, wekî qulixa Îsa Mesîh li gund û bajarên me nayê mîyaserkirinê, çimkî civînên cîh seqetin. Menî kîjane? Gelek cara menîya wê yekê ne ku rêberên nekardarin, lê ew bawarmendin, yên ku dixwezin serbestbin. Hûn dikarin bînine ber çavên xwe, eger çav, nig, yan jî endamên bedenêye mayîn qirar bikirana, ku wê çi bixwezin bikin? Tiştê ecêbmayînê ye, ku Xwedê

wê çi karibûya li Amêrîkayê bikira, eger em halê civînên meye cîh hesab hilda.

Menî kîjan bû, wekî civîna ewlin himberî rojên me lez dighîşt. Werin em binihêrin:

> “Ew giîştine bawarmendên başqe û xwe pêşkêşî hînkirinên şandîya kirin, li hev dicivîyan, nan ker dikirin û dua dikirin... Hemû bawarmend bi hevra bûn û her tiştên wan yek bûn... Her roj tevayî diçûne paristgehê, malada nan ker dikirin û eşq-şa, bi dilê sax xwerin dixwerin, şikirîya xwe li Xwedê dianîn, temamîya cimetê qedirê wan digirt. Xudan jî roj bi roj hesabê xilazbûyîya li ser koma wan zêde dikir” (Karên şandîya 2:42-47, NLT).

Hûn dibînin, wekî bawarmend bedena cîhda nikandî bûn. Wana tevayî pesinê Xwedê didan, hema ew bang guhdar dikirin û yekbûyî bûn. Nava feydayê wê yekêda gihîştina civînêye saxlem hebû. Meriva bi civîna xweye cîh qulixî Xudan dikirin û ewê qulixê hukumî li ser jîyana wane malbetî dikir.

Bûyîna parçekî civîna cîh bona bawarmendên civîna ewlin jîyana wan bû. Piştî hinek wede pirsgirêk pêşda hat, wextê ku xwerin nedidane jinebîya. Şandîya bedena bawarmendên cîh berev kirin (kom kirin) û gotine wana, wekî baş nîne, ku rêber qulixa bona Xebera Xwedê bona dayîna xurek bihêlin: “Birano, nava xweda binihêrin,– şandîya got,– û hevt mêra bibijêrin, yên ku tên qedirgirtinê bi Ruhê Pîroz û serwaxtîyêva tijîbûyîne. Emê wana bona vî karî kivşkin” (Karên Şandîya 6:3, NLT).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî rêbera negotin: “Bona me rezedilvan lazimin. Gelo kesek dikare wede baqe bike, bona ku qulixî li wan jinabîya bike?”. Na xêr, hemû bawarmenda jî xwe pêşkêşî qulixê kiribûn, çimkî ew li civîna cîh hatibûne nikandinê. Ez bi xwe bawar dikim, wekî gumana her endamekî hebû, wekî ewê bona qulixê bihata bijartinê. Hevt mêr hatine bijartinê:

> “Evana ber şandîya dane sekinandinê, şandîya jî dua kirin û destên xwe dane ser wan. Û Xebera Xwedê pêşda diçû, elaleta şagirta Orşelîmêda gelekî zêde dibû û ji kahîna jî geleka bawarî qebûl dikirin” (Karên Şandîya 6:6,7).

Şandîya ev hevt meriv rûn kirin. Ew rûnkirina ku wana derbazî ser yên mayîn dikirin, bona wê yekê nehatibû têradîtinê, ku ew ji

dikê qulix bikirana, li komên malada hînkirana, yan jî rêberîya rûmetkirin û pesindayînê, qulixa çûyîna rêwîtîyê bikirana. Ew bona wan jinebîyên civînê, bona xurekdayîna wana têra hatibûn dîtinê. Tiştekî ecêb e!

Feqet, guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî çawa ku ew hevt mêra qulixa xwe nava bedena Mesîhda hildane ser xwe, bi çiqasîva jî ew qulix ya girîng nehata ber çava, *Xebera Xwedê bela bû*, û reqema şagirta li Orşelîmê gelekî *zêde bû*. Li vir em tiştekî ecêb dibînin. Ji serê ewlin hetanî serê pênca, yên nava kitêba Karên Şandîyada xebera "zêdebûn" çend cara bona şirovekirina pêşdaçûyîna civîna Orşelîmê tê xebitandinê. Awa hinek mesele:

> "...Û wê rojê nêzîkî sê hezar merivî li ser wan *zêde bûn*" (Karên Şandîya 2:41, NKJV).
>
> "Û Xudan roj bi roj hesabê xilazbûyîya zêde dikir" (Karên Şandîya 2:47).
>
> "Û bawarmend bere-bere bi elaletên Xudane him mêra, him jina *zêde dibûn*" (Karên Şandîya 5:14, NKJV).

Hetanî vî çaxî tenê şandîya li civîna cîh karê qulixê mîyaser dikirin û Petrûs terîfkirê tek- tenê bû, derheqa kîjanîda nivîsar e. Qerez, demek hat, wekî bawarmenda fem kir, ku du borcdarîyên girînge ji wana her kesî hene. Ya ewlin ew bû, ku merivên başqera Mizgînîyê belakin û hînkin. Ya duda jî ew bû, ku karekî li civîna cîh bikin.

Karên Şandîya 5:42-6:1-da nivîsar e ku çi qewimî, wextê ku bawarmenda fem kir, wekî gerekê serhatîya ecêbe derheqa rabûna Îsaye ji nava mirîya gilî bikirana: "Û temamîya rojê ew nedisekinîn li paristgehê û li mala hînkirana derheqa Îsa Mesîhda belakirana. Û wan roja, wextê ku şagirt zêde bûn...". Petrûs tu cara nikaribû li her malekê terîf bikira, çimkî wî çaxî ne radîyo, ne têlêvîzyon, ne jî xeta întêrnêtê hebûn. Ji vê derê em dibînin, wekî hemû bawarmenda Mizgînîya Îsa Mesîh hema cînarên xwe hîn dikirin û bona wana bela dikirin. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî niha şagirt pir' dibûn, gelekî zêde dibûn. Eva cara ewlin e, ku kitêba Karên Şandîyada nivîsar e, wekî gelekî zêde dibûn.

Qerez, bi vê yekê pirbûn ser hevda nayê. Çawa ku bawarmenda qulixên xweye li civînê hildane ser xwe (mesela kîjanê hema qulixçîyên wan jinebîya bûn) nivîsar e, wekî reqema bawarmenda

ne ku zêde dibû, lê *gelekî zêde dibû*. Zêdebûna gelekî dide kivşê *pêşdaçûyîna mezin*.

Îzinê bidin, ku ez firqîya zêdebûnê û gelekî zêdebûnê bidime kivşê. Bînine ber çava, wekî serwêrek heye, yê ku her meh 10000 meriva bona Xudan qazanc dike. Weyê hesab bikira, wekî qulixa wî kardar e? Bi texmîn, weyê bigota belê. Feqet hûn zanin, wekî çiqas wede wê lazim bûya, ku ew bighîşta temamîya dinîyayê. Bersiva vê pirsê jî ev e, 50-î hezar sal wê lazim bûna û ew jî, eger nava wî wedeyîda tu kes nehata dinîyayê, yan jî nemira. Dêmek, ji jîyana merivatîyêye li ser vê dinîyayê heyşt cara zêdetir. Ew yek tiştê bûyînê nîne.

Niha îzinê bidin, ku ez meseleke derheqa zêdebûnêda bînim. Mesele, hûn du meriva qazanc dikin û wana dikine tevî civîna cîh. Meha mayîn, ji wan meriva jî her yek du meriva tîne civînê. Meheke mayîn ew her çar jî dîsa usa dikin. Lê meheke mayîn îdî ji heyşt meriva her yek dîsa du meriva dighîne civînê. Eger vî cûreyî berdewam bibe, hûn zanin, wekî çiqas wede wê lazimbe, ku Mizgînîyê bighînine temamîya binelîyên dinîyayê? Bersiva vê pirsê jî 33 mehin. Belê, ji sê sala hindik wede wê lazimbe. A hema eva zêdebûna gelek e.

Niha hûn fem dikin, ku ev yek nava Încîlêda çawa dikaribû biqewimîya?

> "Vê yekê du sala berdewam kir, hetanî ku *hemû* binelîyên [wîlayêta] Asîyayê, cuhîya, usa jî yûnana Xebera Xudan bihîstin..." (Karên Şandîya 19:10, AMP).

Hemû binelî! Eger Încîlêda nivîsar e *hemû*, usa ye gilî derheqa her kesîdane. Li vir ne ku derheqa bajarekîda, lê derheqa temamîya rêgîonekêda nivîsare. Wî çaxî spûtnîkên wan, têlêvîzyon, radyo, torên sosîyalî û hetanî çerxesîyarên wana jî tunebûn. Eva zêdebûna berbiçav e.

Bona zêdebûna gelekî bedena bawarmendaye saxlem lazim e. Bedena saxlem ji bawarmendên li civîna cîh nikandî ye û ew jî dide kivşê, wekî ew li wê civîna cîh qulix dikin (xwerinê didine jinebîya, qeyde-qanûna xweyî dikin, cîhê sekinandina avtomaşîna kontrol dikin, meriva silav dikin, li hebsa Mizgînîyê terîf dikin, qulixî zaroka dikin û tiştên mayîn). Ew merivên qulixçî jî Mizgînîyê digîhnine xebatkar û cînarên xwe û wana dighînine civîna cîh. Bîr bînin, wekî Îsa temî da,

ku hemû mileta hîn bikin, lê ne tenê wana paşda vegerînin. Em gerekê wan meriva bînine civînê, hemû tiştî, çi ku em terîf dikin, bona ku ew wî hemû tiştî hînbin, çi ku Îsa temî da me (binihêre Metta 28:20).

Bedena civîna cîhe tam lazime, kîjanêda hemû pêşkêş dişuxulin, ku meriv nava Mesîhda bighîjin. Li vir kilît ew e, ku civîna cîhda nikandîbe, çimkî li wir em gulvedidin. Fîlîpo yekî ji wan hevt mêra bû, yê ku bijartin ku bona sivirên wan jinebîya qulix bike. Feqet, paşê nava kitêba Karên Şandîyada navê wî îdî Fîlîpoyê mizgîndar e. Qulixa wî berfireh bû û gelek bajar kirine nava xwe “Rojtira mayîn em ji wir rê ketin, çûne Qeyserîyê mala Fîlîpoyê mizgîndar, ew ji wan her hevt komekdarê kivşkirî bû. Em li cem wî man” (Karên Şandîya 21:8).

Nenihêrî wê yekê, wekî Fîlîpo îdî mizgîndarekî mezin bû û Xudan ew cîguhastî bajarekî mayîn kiribû, lê ew çawa ji wan heft komekdara nas dikirin, yên ku xwerin didane jinebîya. Qulixa li civîna cîh bona Fîlîpo roleke kivş lîst, alî wî kir, ku ew bikeve nava gazîkirina jîyana xwe. Ez vê yekê dibêjime meriva: “Diqewime navê weyî mezin heye, lê ewê bi cûrê rast negihîje, eger destpêka wê ji nikandina li civîna cîh destpê nebe”.

Îzinê bidin ez xeberên Zebûra biwekilînim: “Ewên ku mala Xudanda nikandîne wê li serayên Xwedêyê meda şînbin” (Zebûr 92:13). Derheqa xebera “*nikandî*”-da bifikirin. Bona ku fem bikin, ku padişatîya Xwedê çawa dişuxule, hûn gerekê derheqa qanûna bêcerkirinê û çandinêda bifikirin. Îsa gote şagirtên Xwe, wekî eger wana prînsîpên toxim, axê û çandinê fem nekirana, wanayê tu meseleke Wî fem nekirana (binihêre Marqos 4:13). Bi gilîkî zelal gotî, temamîya padişatîya Xwedê usa ye.

> “...merivek toxim direşîne nava erdê. Û radizê-radibe. Şev û roj toxim şîn dibe, bilind dibe û xwexwe pê nahese ku ev çawa dibe. Erd ji xwe ber dide, pêşîyê zîl, paşê simbil, peyîra genimê gihîştî simil da. Gava ku ber dighîje, meriv îdî desê diavêjê, çimkî dema nandirûnê pêra gihîştîye” (Marqos 4:26-29).

Em hesabkin ku kulmeke toxmên cûre-cûre li cem min heye û ew hemû toximên darên fêkîyane, lê ez wanara nenasim. Mecala tek-tenê, bi kîjanê ez dikarim pê bihesim, ku çi toxim li cem min hene, wana gerekê diaçikînim. Piştî danîna nava xwelîyê, hinek wede şûnda, ezê bizanibim, ku ew çi toxim bû.

Di nava me hemûyada ji alîyê Xwedêda navê pêşda qirarkirî heye û usa jî pêşkêş hene bona ku wî navî mîyaser bikin: “Ewî em nava Îsa Mesîhda careke mayîn çêkirin, bona ku em wan hemû tiştên qenc bikin, yên ku Ewî zûva bona me qirar kirine” (Efesî 2:10, NLT), û “Çimkî Xwedê kîjana dibijêre û pêşkêşa dide kê, wê yekêda ne poşman e” (Romayî 11:29). Bi gotina Îsa, navê min û pêşkêşên min bi cûrê toxim nava mindanin. Eger ez li civînê bême nikandinê, ezê bighîjime wî navî, yê ku Xwedê daye min. Eger usa nîbe, wî çaxî ez dikarim pêşkêşên xwe usa nedime xebatê, çawa ku çêkirçîyê min têra dîtîye. Dêmek, bi açixîya anegorî normên vê dinîyayêva nexapin. Diqewime hûn bi saya wan pêşkêşa bighîjine açixîke mezin, lê hûn wana bi cûrê gurênekirinê, ne anegorî progirama Xudan, bidine xebatê.

Îzinê bidin ez meselekê bînim. Li vê dinyayê gelek dengbêj hene, dengên kîjana gelekî başin û ew bi stiranên xwe dikarin meriva bighînine derecên usa ku ew bigrîn. Ew pêşkêş bona wan hatibû dayînê, bona ku wana Xwedê rûmet bikirana û meriv usa bikirana, ku ew dil û xwestinên Wî bigerîyana. Qerez, wana usa jî ew tiştên bona wan qirarkirî mîyaser nekirin, çimkî ew xilaz nebûn û li tu civîneke cîhda nehatine nikandinê.

Ez dikarim gelek mesela derheqa wan merivada bînim, kîjana nava jîyana xweda Îsa qebûl nekirine. Feqet hene meriv, yên ku dilê xwe pêşkêşî Îsa kirine, lê her dem naçine civînê. Ew navê xweyî bilind nava padişatîya Xwedêda mîyaser nakin, çimkî nikandî nînin. Diqewime ew hatine gazîkirinê, ku ji civînê der li ser meriva hukum bihêlin, û diqewime ew wê yekê pirî-hindikî dikin, lê hukumê wana wê diha mezin bûya, eger ew li civînê nikandî bûna.

Meriv dikare texmîn bike, wekî hinek pêşkêş hene û bi fikira wî ew wana baş dide xebatê. Feqet hûn nikarin bizanibin ku darê çi cûreyîbe, çimkî ew hela hê bi cûrê toxim e, bo wê yekê jî hûn nikarin bizanibin, ku Xwedê navê çawa daye we, hetanî ku hûn li civîna cîh neyêne nikandinê. Eva progirama Xwedê ye, lê ne ku ya mêriv e.

Pirsa mayîn ew e, wekî bawarmend diçine civîneke mayîn, wextê ku li civîna wana pirsgirêk pêşda tên. Roja îroyîn meriv gelekî hêsa ji civînê dûr dikevin, eger şaşîkê dibînin, xwezima li cem rêbera. Diqewime pirsgirêk ew e, ku rêber çawa serwêrtîyê li civînê dikin,

ew çawa wê alîkarîyê berev dikin, yan jî wan para çi cûreyî xerc dikin. Eger ew tiştê, ku serwêr terîf dike li meriva xweş nayên, ew dûr dikevin. Diqewime serwêrra wê dijwarbe nêzîkbe, yan jî ew bi cûrê aza nêzîkî meriva dibe. Yan jî problêm ew e, wekî meriv ji alîyê endamên ola xweda guhdarîya hindik distîne. Vê navnîшê meriv hema usa dikare berdewam bike. Dewsa wê yekê ku ew dijî dijwarîya şerkarîyê bikin û gumanê dilê xweda xweyî bikin, meriv direvine li wan cîha, li kîderê tê texmînkirinê, ku miqabilî wana tu tişt tune.

Werin em rast xeberdin. Îsa serwêr û endamê civînêyî tek-tenêyî kamil e. Eger usa ye, wî çaxî bona çi em, merivên kûltûra roavayê, ji pirsgirêka direvin, dewsa wê yekê ku em wê yekê qebûlkin û wana bidine rastkirinê? Em destpê dikin ji civînekê herine civîneke mayîn û li wan dera rêber û endamên civînêye bêkêmasî bigerin.

Lê bîr bînin, wekî mîrêcin dicêribîne me bêhurmet bike û ji wî cîhî dûrbixe, li kîderê Xwedê em kivş kirine. Dijminê me dicêribîne meriva ji wî cîhî ji kokêva rabike, li kîderê Xwedê ew nikandine. Eger ew bikaribe we dûrbixe, usa ye progirama wî li hev hatîye. Eger hûn wextê dijwarîyên mezin jî qewîn bimînin, hûnê progiramên mîrêcin biteribînin û hûnê progirama Xwedê mîyaser bikin.

Em careke mayîn biwekilînin: “Ewên ku nava mala Xudanda *nikandîne*, wê li serayên Xwedêyê mezin şînbin”. Gelo halê wê şînayê wê çawabe, eger sê hevtîya carekê wê şînayê cîguhastî bikin? Koka wê şînayê wê sistbe û ewê tam negihîje û mezin nebe. Eger şînayîkê her dem cîhên cûre-cûre binikînin, ewê bimire.

Gelek meriv ji civînekê diçine civîneke mayîn, dicêribînin navê qulixa xwe bidine pêşxistinê. Eger wana li wir qebûl nakin, li kîderê ew hatine kivşkirinê, xeyd gelekî rihet û hêsa, serê xwe bilind dike. Eger tiştekî usa tê kirinê, kîjanêra ew qayîl nînin, ew dixeyîdin û dûr dikevin. Ew rêberên civînê gunehkar dikin û diçin. Ew meriv mînanî kora kêmasîyên xeysetê xwe nabînin û fem nakin, wekî Xwedê bi rîya hukumê wî cûreyî wana paqij dike. (Ev rastî tenê bi qulixêva nayê sînorkirinê, lê ew usa jî derheqa zewacê, xebatê û heleqetîyên mayîndane).

Werin em bi mesela dara û şînayê hînbin, kîjanê Xwedê nîşanî me dide. Wextê ku dara fêkîyaye biçûk nava azayêda tê nikandinê, ew gerekê li ber baranên gur usa jî bayê qalin û tava germ teyax

bike. Eger wê darê bikaribûya xeber bida, ewê bigota: “Ez hîvî dikim, min ji vêderê dûrbixin, min bibine li wir, li kîderê germa vî cûreyî û bayê qalin tunene”. Eger rezvan gura wê darê bikira, bi rastî ewê ziyan bigîhanda wê darê. Dar li ber tava germ, bayê qalin û baranên gur, bi rîya kûrkirina koka xweye axêda teyax dikin. Dijwarîyên wana hema kanîya teyaxkirinê ye. Berkbûna tebyeta dora wan wana mecbûr dike ku ew kanîke jîyanêye mayîn bigerin. Kokên wana awqas kûr diçin, wekî bagerên here gur jî nikarin zyanê bidine rezdayîna wana. Bi zanebûna derheqa vê yekêda, em gerekê dijî wan dijwarîya dernekevin, yên ku Xwedê îzinê dide ku nava navê meda me îzbat bike.

## Ya sisîya: nava jîyana weda tiştên usa hene, ku we paş dixin?

Me’nîya dawîyê, ku meriv bona çi navê xwe eşkere nakin û wê yekê mîyaser nakin, ew e ku tiştên usa hene, yên ku wana paş diêxin. Giranîyên wî cûreyî îzinê nadine meriva, ku ew wê şuxulkarîyêra derbazbin û ser hevda bînin.

Pawlos derheqa xweda dinivîse: “Lê ez hesab dikim, wekî jîyana min bona min bêqîmet e, tu tişt nîne: ez tenê dixwezim mîsîya xwe û wî karê xwe ser hevda bînim, yê ku Xudan Îsa daye min” (Karên Şandîya 20:24 TEV). Pawlos derheqa mîsîya jîyana xweda baş zanibû. Karê wî hebû, yê ku gerekê ewî ser hevda bianîya û ewî zanibû, wekî ew hela hê ser hevda nehatibû. Gelo ewî çawa dikaribû derheqa wê yekêda bizanibûya? Hema wî cûreyî jî, mînanî Îsa, mînanî Petrûs (binihêre B Petrûs 1:14), û mînanî yên mayîn, yên ku Xwedê digerin, civînêda tên nikandinê û jîyanê berdewam dikin. Xudan wê yekê wanara eyan dike, yên ku jîyana xwe ji qirara Xwedê girîngtir hesab nakin. Awa hema ev e qewilê xilazîyê (dawîyê): eger em bi temamî jîyana xwe pêşkêşî mîyaserkirina progirama Xwedê bikin û emê ne tenê navê xwe pê bihesin, lê emê usa jî wê yekê mîyaser bikin.

Mesela derheqa vê yekêda em nava Mizgînîyada dibînin. Carekê, wextê ku Îsa ji bajarekî diçû bajarê mayîn, ev yek qewimî: “Û çaxê ewana rê diçûn, yekî Wîra got: “Tu kuda jî herî ezê peyî te bêm”” (Lûqa 9:57).

Ev merivê ku ev xeber gotin, merivekî bêqelp û bi bawarîya mezinva tijîbûyî bû. Ewî dixwest hetanî xilazîyê (dawîyê) peyî Îsa biçûya. Feqet, Îsa menî û ew telên dilê wîye rast didîtin, yên ku piş wê bawarîyê veşartî bûn. Ewî ew yek dît, çi ku ew meriv didane sekinandinê û îzin nedida, ku ew navê xwe mîyaserke û gote wî: “Rûvîyara qul hene, teyredên ezmînra jî hêlîn, lê bona Kurê însan cîhek tune, ku serê xwe lê dayne” (Lûqa 9:58).

Bi texmîn, vî merivî anegorî normên vê dinîyayê jîyaneke baş û çareserkirî derbaz dikir. Diqewime xebata wîye baş hebû, ewî îdî pir’anîya krêdîta xwe dabû û bona pênsîya xwe jî çi lazim bû dest anîbû. Îsa ne bi cûrê dufikirê derheqa çareserîya vê dinîyayêda nîşan da û got, wekî bona Wî cîhek tune ku serê Xwe lê dayne.

Ez, bawar bikî, dibînim kö çawa Ew û merivên nava elaletêda hêdî-hêdî paşda çûn û paşê dûrketin. Diqewime wî merivî dixwest bigota: “Îsa, ezê wî qeyde-qanûnî wextê civînên Te xweyî bikim, Ezê koma rûmetkirinêda sazbendîyê bikim û avtomaşînên merivên yaşên xweda mezin bibim bidime sekinandinê, yên ku wê li bajarê me bêne civîna Te”. Feqet, nişkêva ew şewiqa çûyîna li peyî Îsa tê bêjî ket û meremên wîye derheqa qulixkirina bo Wî lez unda bûn. Dêmek, ew meriv, mînanî geleka dûr ket, çimkî meremê wî hebû alî Îsa bikira, lê meremê wî tunebû, ku bi temamî xwe pêşkêşî Wî bikira.

Îsa li merivekî mayîn nihêrî, yê ku hazir bû, û gote wî: ““Peyî Min were”. Ewî jî got: “Xudan, îizinê bide min, ku ez pêşîyê herim bavê xwe definkim”.

> Lê Îsa wîra got: “Bira mirî mirîyê xwe definkin. Tu here p’adişatîya Xwedê dannasîn bike”” (Lûqa 9:59,60).

Bersiveke çawa berk e! Diqewime hinek bifikirin, wekî Îsa gelekî berk û hinekî jî hişk caba wî da. Feqet, em gerekê kûltûra wî çaxî fem bikin. Xwedêzan dibêjin, wekî anegorî edet, wextê ku bavê malbetê wefat dibû, zaroka mezin borcdar bû ew defin bikira. Wextê ku ewî borcê xwe biqedanda, ew himberî kurên mayîn mîrata dubare distend. Qerez, eger kurê mezin borcdarîya definkirina bavê xwe neqedanda, ew borcdarî derbazî ser kurê duda dibû.

Ew meriv li ser para hatibû merkezkirinê. Bi texmîn, wî jîyana baş hiz dikir û wê yekê wê îzin neda wî ku peyî Îsa biçûya. Ewê paşê

bixalifîya û wê qirarên usa qebûl bikirana, nava hîmê kîjanada wê ne ku progirama Xwedê, lê wê pare bûna.

Ez li ser wê fikirême, wekî bi stendina bersiva Xudan ew meriv tevî geleka paşda çû. Bersiva wî dikaribû vî cûreyî bihata gotinê: “Îsa, ezê li bajarê me, li civînên Te qulix bikim. Ezê nava koma stiranada bistirêm, yan jî sazbendîyê bikim. Ez wê yekê dikarim. Ezê bi hizkirin wî hemû tiştî bikim û dewsa qulixa xwe ezê dewa tu tiştî nekim”. Ruhadarîya çûyîna li peyî Îsa tê bêjî bona wî û bona gelek meriva hijmekarîya xwe unda kir.

Guhdarîyê bidine li ser wê yekê, wekî wî merivî negot, ku wê li peyî Îsa neçe. Ewî got, wekî wê li peyî wî here, lê kilîta binketina wî xeberên *“emir bike...”* bûn. Meremê wî hebû pêşîya xwepêşkêşkirina jîyana xweye bona Îsa, ew yek mîyaser bikira, çi ku ewî dixwest. Eger em dixwezin progirama Xwedê, ya bona jîyana me bizanibin û wê yekê mîyaser bikin, em gerekê emirê Wî himberî hemû tiştên mayîn diha girîngtir hesab bikin. Min gelek bawarmend dîtine, yên ku terka kirina gura Xwedê dane, çimkî wana qirar kirîye berê ewlin bi pirsên xweva mijûlbin. Telebextra wana navê wî mîyaser nekirîye û wî çaxî jî lazim e merivekî mayîn bibînin bona serhevdaanîna karê wan. Gelo li ber textê Dîwanê halê wan wê çawa bibe?

Em paşda vegerine berbi serhatîya xwe. Elalet diha sêrek dibû, lê rezedilvanek jî pêşda hat:

> “Yekî din jî got: “Ezê peyî te bêm, Xudan, lê tenê îzinê bidine min, ku ez pêşîyê xatirê xwe ji neferê mala xwe bixwezim”. Îsa got: “Kî ku destê xwe datîne ser kotanê û piş xweva dinihêre, ew ne hêjayî padişatîya Xwedê ye” (Lûqa 9:61,62).

Careke mayîn guhdarîyê bidine ser xebera “*pêşîyê*”. Ber cava ye, wekî ew meriv nêzîkî malbeta xwe bû, hevalên wî hebûn, yan jî dergîstîya wî hebû. Ewî awqasî dixwest tevî wan meriva qirara xweye derheqa çûyîna li peyî Merivê ji Galîlêyê guvtugo bikira. Dêmek, ew merivên nêzîkî wî wê qirar bikirana, ku ewê qulixî Îsa bikira, yan na. Xudan carekêra dijî wî derket û gotê, wekî ew meriv bona qulixkirina bo padişatîya Xwedê dest nade.

Ez, bawar bikî, dibînim ku ew meriv çawa tevî komeke merivaye mayîn dûr dikeve. Ez tînim ber çavê xwe, ku ew dibêje: “Îsa, ez dikarim tevgirêdanên civakî sazkim û rêsûrsên meriva dest bînim.

Ez dikarim bibime şêwirmendê qulixa Te û bi rastî xebatkarên baş bona Te bibînim. Ez jî dikarim sera civînên meye cîh kirê bikim, wextê ku Tu li bajarê me civîna derbaz bikî. Wextê ku Tu bêyî, ezê xebata komên qeyde-qanûna û silavkirinê teşkîl bikim. Ezê bi xwe qulixî Te bikim, eger tu bixwezî. Ez hazirim qulixî Te bikim".

Bi texmîn, wî çaxî elaleta wan meriva li ber çavê Îsa sêrek bû û gihîşte nêzîkî 70 merivî. Diqewime pêşda li wir bi hezara meriv hazir bûn, lê Ewî fikira Xweye derheqa wê yekêda got, ya ku meriva paş diêxe. Gilî derheqa jîyana çareserkirî, para û heleqetîyadane. (Lê menîyên başqe jî hene, yên ku meriva digrin, paş diêxin, mesele tiştên razîbûnê, cedandinên berbi tiştên usa, yên ku ne anegorî qirara Xwedêne, lê nava salên min wên cêribandîda minda dîtîye, wekî ev hersê menî yên serekene).

Bi xwedina Mizgînîya, gelek meriv gotina Lûqaye bi sirêye bêhesab girîng hesab hilnadin, çimkî ew dikeve nava beşa mayîn. Feqet, îzinê bidin, ez bînime bîra we, wekî kitêba Lûqa bi temamî nama dirêj e. Paşê civînê serî û gotin serda zêde kirin, ku bi hêsanî berbirî meriva bibin. Awa guh bidinê, ku Lûqa çi dinivîse:

> "Peyî vê yekêra Xudan hevtê du şagirtên din jî kivş kirin û ewana dudu-dudu pêşîya xweva şandin wan cîh û bajara, li kîderê xwexwe gerekê biçûya û wanra got: "Nandirûn gelek e, lê pale hindikin..."" (Lûqa 10:1,2).

Ev xeber gelek tiştî dibêjin. Berê ewlin guhdarîyê bidine ser xeberên "peyî vê yekêra". Em gerekê bipirsin, peyî çira? Bersiva vê pirsê peyî wî tiştîra ye, wextê ku li ber çavê Îsa elalet sêrek bû, hetanî ku komeke meriva ma, yên ku hela hê fikira xweda gotin: "*Girîng nîne, ku bihakî çawa gerekê bidin, ku peyî Wî herin. Ez dixwezim û ezê wê yekê bikim*". Wana bersivên Îsaye derheqa çareserîya jîyanê, para û heleqetîyada bihîstin û qirar kirin, wekî tu tiştê bona wan dijwarîya pêşda neyne, bona ku ew qirara Xwedê mîyaser bikin.

Peyî wê yekêra Îsa endamên koma nû *kivş kirin*, yên ku bi texmîn ew merivên li wir mayî bûn. Peymana Nûda xeberên "kivşkirin" û "bijartin" çawa sînonîm tên xebitandinê. Merivê kivşkirî hatîye bijartinê, lê merivê bijartî jî hatîye kivşkirinê. Îsa nava her du beşên Mizgînîya Mettaye cudada tiştekî dibêje, eger Ew bi cûrekî gotina Xwe nava beşên cudada diwekilîne, usa ye em gerekê guhdarîya mezin

bidine ser wan xebera. Awa ev gotin: “Çimkî gelek hatine gazîkirinê, lê hindik hatine bijartinê” (Metta 20:16, 22:14).

Gelek hatine gazîkirinê. Lê çiqas? Wê diha rast bibe bêjin, wekî hemû jî hatine gazîkirinê. Nava jîyana hemû bawarmendada bang heye û pêşkêşên wane lazim hene, ku wê yekê mîyaser bikin. Feqet (ev jî dikare me zendegrtî bihêle), tenê hindik meriv hatine bijartinê, yan jî kivşkirinê, bo ku vê bangê mîyaser bikin. Bona çi hindik hatine kivşkirinê? Çimkî tenê hindik meriv wê hemû xwestinên xwe, çareserîyê, cedandinên hindava parada, heleqetîyên ku çetinaya pêşda tînin û tiştên mayîn bihêlin, bona ku banga xwe mîyaser bikin.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Îsa got: “Nandirûn geleke, lê pale hindikin” (Metta 9:37). Ew yek neheqîya Xwedê nîne, wekî nisileta me xilazbûyî nîne, çimkî Xwedê “dixweze, ku hemû meriv xilazbin û rastîyê nas bikin” (A Tîmotêyo 2:4). Em ew in, yên ku gerekê li ber dîwana wî bisekinin û hesab bidin, ku nisileta me bona çi xilaz nebûye. Eger em navê xwe, banga xwe mîyaser bikin, emê neyêne gunehkarkirinê. Feqet, eger em îzinê bidin, wekî menîyên li vê dinîyayê, ku me paş diêxin, dijwarîya bona me pêşda bînin, wî çaxî dîwana me wê ya gunehkarkirinê be.

Diqewime hûn bêjin: “Ez nava gelekada merivekim”. Wê çawa bûya, eger cegera we bigota: “Ez endamekî bedenêyî girîngim û tu kes min û xebata min nabîne. Dêmek ezê wê yekê bikim, çi ku dixwezim, lê ne ku wê yekê, bona çi ez hatime çêkirinê”. Çawa hûn zanin, bêyî cegerê pirsgirêkên bedenêye mezin wê hebin. Gelo wê çi bûya, eger endamên bedenêye mayîn, mesele, pişik, nig, yan jî parçên bedenêye mayîn jî usa bigotana? Her endamkî civînê mînanî hemû endamên civînêye mayîn girîng e.

Tiştekî mayîn jî heye: Îsa dibêje me, wekî tenê hindik merivê qirara derheqa xweda, çawa beşên Xwedê mîyaser bikin. Her bawarmendek bona çêkirinê hatîye gazîkirinê, lê hindik merivê navê xwe, banga xwe mîyaser bikin. Ev yek dide kivşê, wekî piranîya bawarmendên ku wê li ber dîwanê bisekinin, wê zyanêkevin û wê heqê rûmet nestînin.

Ez zanim, wekî eva ne behsa şabûnê ye. Feqet, behsa qenc jî heye: hûn dikarin hema niha jî destpê bikin. Hûn dikarin çok bidin, dua bikin û bona wê yekê hîvî ji Xwedê bikin, çi ku we qebûl kirîye

û bi çi menîyê hûn gura Wîda nîbûne, lê peyîra gav bi gav pêşda bilivin. Smît Vîglsvort, yê ku mizgîndarekî sedsala 20-ye mezin bû, qulixa xwe wî çaxî destpê kir, wextê ku ew ji 50-î salî derbaztir bû û ew yek tu cara gelekî dereng nîne.

Bîr bînin, wekî qewilên bona çêkirina bi cûrê kardar hene. Qewilê ewlin, bi bawarîyê Xwedê bigerin. Yê duda li wê civîna cîh werine nikandinê, ya ku Xwedê nîşan dide û gura rêberên civîna cîhda bin. Qewilê sisîya, ji wî hemû tiştî azabin, çi ku we dide paşêxistinê. Wextê ku Xwedê wan giranîya nîşan bide, yên ku we paş dêxin, hîvî bikin, wekî şûrê Wî wan eleqeta bibire, yên ku şexsê we bedenêva didine girêdanê. Kerema Wî bes e ku we bide azakirinê.

## Heqdayîna tam

Ezê derheqa tiştekîda jî xeberdim, hetanî ku em derbazî serê kitêbêyî mayînbin. Hene meriv, yên ku usa jî destpê nekirine mala Xwedê çêkin, yan jî terka çêkirinê dane. Ew bi tiştên wedelûva, bi hebûna vê dinîyayê, bi hukum, bi cedandina berbi serwêrtîyê, yan jî razîbûnê, usa jî bi razîkirina meriva, xalifîne. Ev hemû tiştê hîç bibin. Nexapin, nexalifin û unda nebin! Her dem merkezbûyî bin, karê weyî kirinê nava Mesîhda heye û karê we gerekê bighîje dawîyê.

Merivê hebin, karên kîjanaye nava beşeke jîyana wanda, yan jî temamîya jîyana wanda wê nemînin. Ewê xirabbin û wê nebine beşeke mala Xwedêye heta-hetayê. Hûn dikarin wê yekê bînin ber çavên xwe?

Bona ku ez alî we bikim, ku hûn girîngîya van gotina fem bikin, îzinê bidin ez paşda vegerime li ser prosêsa çêkrina mala me. Hûn zanin, wekî ez her roj diçûme li meydana çêkirina avayî, kirêkar ez baş nas dikirim û wana ez çawa “terîfkir” nas dikirim.

Her car, wextê ku avtomaşîna min nêzîkî meydana avayîçêkirinê dibû, dengê rok-mûzîka xebatkara ditemirî. Wana çawa ez didîtim, lez direvîn û dengê magnîtofona xwe ditemirandin. Nava fikira xweda ez dikenîyam, çimkî xofa wane hindava rastîyên xwedêtîyêda hebû. Me hinekî qise dikir. Qisên gelek hewaskar tevî wan meriva derbaz bûne, û usa jî çend mecalên baş hebûne ku ez qulixî wana bikim.

Tê bîra min, wekî wextê qisekê kirêkara derheqa wan malên bedewda minra gilî dikirin, kîjana wana çêkiribûn. Ew bi şabûn derheqa

xebata xweda gilî dikirin. Meriv dikaribû razîbûn û şabûna wane bi saya tevbûna wane tevî wan xebata bidîta. Nava wanda şermeke biçûk jî tunebû: ew tenê bi wê xebatêva şa dibûn, ji kîjanê malbetên başqe kar stendine, û yên ku hizkirîyên malên bedewva eyanin.

Îzinê bidin, ez gavekê pêşda herim. Hûn dikarin bînine ber çavê xwe, ku ew merivê ku li Waşîngtonê mala Sipî çê kirîye, xwe çawa texmîn dike? Wê rojê bînine ber çavên xwe, wextê ku zaroka wî ji mektebê tê malê û gilî dike, wekî ew derheqa mala welête here eyanda hîn bûye û bi şabûn elam dike, wekî dersxana wana wê here êkskûrsîyayê, ku wê malê bibîne.

Hûn tînin ber çavên xwe, wekî ew merivê çi cûreyîbe, wextê ku ew kurê xwe yan keça xwera bêje, wekî ew tevî çêkirina wê malê bûye? Hûn texmînkirinên wî tînin ber çavên xwe, wextê ku ew tevî dersxana zaroka xwe berbi adrêsa soqaqa Pênsîlvanîya 1600 diçe? Hûn tînin ber çavê xwe, ku ew çi texmîn dike, wextê ku wî çaxî ruhdarbûn û firnaxbûna zaroka xwe dibîne, wextê ku zarokên dersxanê pê dihesin, wekî ew jî tevî çêkirina wê malê bûye, li kîderê serokê Ştatên Amêrîkaêye Yekbûyî dijî.

Tiştekî usa jî em dikarin derheqa mala meda bêjin, lê em li ser maleke usa naxebitin, ya ku rojekê wê xirab bibe û dewsa wê yekê tiştekî mayîn bê çêkirinê. Em li ser wê malê dixebitin, ya ku wê merkeza guhdarîya temamîya hemûyadabe. Belê. Xeberên Mîkîyayê pêxember bîr bînin: “Û gelek milet gerekê herin û bêjin: “Werin em herine jor, li ser çîyayê Xudan û *mala* Xwedê yê Aqûb, ku Ew me hînî rêyên Xwe bike û em rêyên Wîva herin, çimkî qanûn gerekê ji *Sîyonê* derkeve” (Mîkîya 4:2).

Temamîya şuxulkarîya ezmîn wê dora wê malê bizvire. Ew serwaxtîya û qanûnên ku wê serwêrtîya temamîya ezmîn bikin, wê ji wir derên. Û tiştê ecêbmayînê ew e, wekî ewê piştî deh trîlîon sala jî awqasî bedewbe, çiqasî wê rojê, wextê ku çêkirina wê xilazbe.

Carekê ez li civîneke mezin, li rojava Amêrîkayêye navîn bûm. Serwêrê rûmetîya wê civînê minra gilî kir, wekî Xwedê xewinek nîşanî wî dabû. Wê xewinêda ew çûbû Ezmana, li kîderê ewî qulixçîkî mezin dîtibû û wîra qise kiribû. Ew yek piştî salekê, piştî mirina wî qulixçîyî qewimîbû û wî merivî ji 60 salî zêdetir qulix kiribû, amin mabû, û destpêka hezarsalîya meda berbi heqdayîna

xwe çûbû. Ewî bi ken gotibû serwêrê civînê: “Li vir diha baştir e, ne ku min ew yek dianî ber çavê xwe”.

Wana dora pirsên cûre-cûre qise kiribû, lê paşê wî qulixçîyî ew kar nîşanî wî dabû, çi ku ewî li Sîyonê kiribû. Ew karekî gelekî mezin bû. Hukumê aminaya wî diha zêde bû, ne ku ew fikirî bû û ew hemû tişt li ber çavê wî bû. Ewî dikaribû ew kar nîşan bida, mînanî wan karkira, kîjana derheqa karên xweda minra gilî dikirin. Eva heqdayîneke heta-hetayêye çawa ye!

Bînin ber çavên xwe, wekî nava temamîya heta-hetayêda hûnê bikaribin beşa xwe, ya nava çêkirina mala Wîda ne tenê nîşanî peyîhatîyên xwe bikin, lê usa jî nîşanî bêhesab meriva bikin, yên ku wê bên Sîyonê, mala Xwedêye rûmet, bibînin. Hûn tînin ber çavên xwe, wekî nava temamîya heta-hetayêda merivê nêzîkbin û wê dîna xwe bidine bedewîya mala Xwedê, wê derheqa wê yekêda xeberdin, ku we emekê çawa kirîye nava wê yekê?

Em careke mayîn binihêrin. Bînin ber çavên xwe, wekî karê we li wir nehatîye raberkirinê, çimkî we bi açixî ser hevda neanîye. Hûn tînin ber çavên xwe, wekî miletê bên, bona ku bibînin ku we çi kirîye û tu tiştê tunebe, ku hûn nava heta-hetayêda nîşandin, çimkî ew beşa ku we gerekê ji alîyê xweda çêkira, hedimandîye û dewsa we yekî mayîne? Niha xeberên Pawlose ji tercima Încîlêye “Mêsîc”-ê bîr bînin:

> “Eger karê we kontrolê derbaz bibe, gelekî baş e. Eger na, piranîya wê çêkirinê wê bihedime û careke mayîn bê çêkirinê” (A Korintî 3:14,15).

Eva bi rastî zyana heta-hetayê ye. Telebextra eva rastî ye. Feqet hevalê giranbiha, ezê nexwezim, wekî ev yek rastî we bê. Xwedê jî wê yekê naxweze. Û niha hûn dikarin qirarê qebûl bikin, wekî tevî we wê tu tişt neqewime. Xwedê kerem daye we, ku hûn Sîyonê çêkin. Yûhennayê şandî dinivîse:

> “Fesalbe, ku tu *wê rewayê* unda nekî, bona kîjanê em awqasî xebitîne. Xebathiz be, wekî tu *temamîya heqdayînê* bistînî” (B Yûhenna 8, NLT).

Xudan usa kirîye, ku ji zarokên Wî her yek mecala wî hebe, ku bona çêkirina mala Wî temamîya heq bistîne. Xebata we wê tu cara derbaz nebe, wê kevin nebe û wê tu cara hewcê guhartinê nîbe. Eger hûn gumana xwe bidine ser kerema Xwedê û bi kardarî çêkin, milyaket û meriv wê heta-hetayê bi karê weva hijmekarbin.

# PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

## BEŞA PÊNCA, SERÊN 11-12

1. Em zanin, wekî Xwedê hewcê wê yekê nîne, ku em bona Wî tiştekî bikin, lê Ew dixweze, ku em tevî Wî bişuxulin. Ev yek derheqa Wî, padişatîya Wî û meda çi li me eyan dike?

2. Zebûr 139:16 eyan dike, wekî pêşîya bûyîna me, Xwedê derheqa temamîya jîyana meda kitêb nivîsîye. Em çawa dikarin bizanibin, ku Xwedê nava serhatîyên meda çi nivîsîye?

3. Diqewime jîyana me bi kirina karên qenc derbazbe, lê em wê yekê nekin ku bona çi hatine gazîkirinê. Gelo govekeke usa nava jîyana weda heye, ya ku rûyê tirsê û acizîyêda we nîvcî hiştîye? Gelo lazim nîne Xwedê bigerin û hîvî bikin, wekî Ew wê govekê çê bike?

4. Serê kitêbyî 12-da me derheqa sê qewilada xeberda, bi kîjana em dikarin jîyana xwe anegorî qirara Xwedê çêkin: bi kel û ced Wî bigerin, mala Wîda bên nikandinê û ji wan menîyên ku me paş diêxin, azabin. Ji van her sê qewila, kîjan diha gelekî derheqa wedane? Hûn çawa dikarin nava wanda bighîjin?

5. Nava heta-hetayêda em dikarin heqê bi temamî bistînin, yan jî beşeke heq bistînin, lê dikarin tu heqî jî nestînin. Bi fikira we heqdayîna bi temamî çi ye?

# Beşa Şeşa

SERÊ 13-A

# ÇENDBAREBÛN

*"Yên ku didrûn heqê baş distînin, û ew rezê ku ew didrûn merivin, yên ku berbi jîyana heta-hetayê hatine anînê. Gelo şabûneke çawa hîvîya wan e, him bona yê ku didrû û him jî bona yê ku diçîne! Hûn metelokê zanin: "Yek diçîne, lê yê mayîn didrû". Û ew yek rast e".*
— Yûhenna 4: 36,37, NLT

*"Yê ku daçikand, û yê ku av dide, tevayî çawa komek, bona meremekî dixebitin. Feqet, ewê weke xebata xweye giran heqê xwe bistînin".*
— A Korintî 3:8, NLT

Ew merivên ku bi aminayî nava padişatîya Xwedêda qulix dikin, mala Wî çê dikin, wê heqê heta-hetayê bistînin. Emê anegorî karê xwe, kirên xwe heq bistînin. Borcdarîyên me her kesî hene, lê navên meye cûre-cûre feydakî didin, ew jî merivin, yên ku xilazbûna heta-hetayê distînin.

Gelek meriv bawar dikin, wekî tenê qulixçîyên ku nêzîkî bi mîlîyona jîyanane, wê cêrgên Ezmîne ewlinda bisekinin û wê heqên mezin bistînin. Feqet ew yek rast nîne. Xwedê wî cûreyî heq nade, çawa ku meriv didin. Ew anegorî kirên bi heqî, yên li ser gurêdabûnê hîmdanî, heq dide. Eger Ewî anegorî normên merivatîyê heq bida, qulixa bona Xwedê wê mînanî destanînên bîznêsê bûya. Çawa ku we her du serên kitêbêye pêşinda dît, hemû tişt lap cûrekî mayîn e. Xwedê anegorî navê me heq dide, bona wî karî, bona kîjanî Ewî qewat daye me.

## Bi kerema qewatbûyî

Sala 56-a, deh sal pêşîya serhevdaanîna şuxulkarîya xwe, Pawlos nivîsî, wekî ew "ji şandîya yê herî paş e" (A Korintî 15:9). Evê bona wan meriva tiştekî ecêb be, yên ku dîroka civînê lêkolîn kirine.

Pawlos li ser dinîya wî çaxî hukum hiştibû û bona padişatîya Xwedê gihîştibû destanînên diha mezin, ne ku merivekî mayînî wan roja. Bêyî şikberî ew şandîyê wê demêyî herî mezin bû. Wî çaxî ewî çawa dikaribû tiştekî usa bigota? Diqewime ewî gilîyê xwe zêde dikir? Ew jî tiştê bûyînê nîne, çimkî wextê nivîsara kitêbên Pîroz, meriv nikare derewa bike. Ruhê Pîroz tenê wî çaxî wê îzin bida ku ev gotin bihata nivîsarê, eger Pawlos bawarîya xwe li gotinên xwe bianîya.

Bersiva vê pirsê nava dûmayîkêdane: "Lê *ez bi kerema Xwedême, çi jî heme û* kerema Wî ku bi minra ye, boş-betal nîbû. *Lê serda ez ji wan hemû şandîya zeftir xebitîm û ne ku ez bûm, lê kerema Xwedêye ku bi minra ye*" (A Korintî 15:10).

Tiştekî hewaskar e, wekî Pawlos xwe mikur dihat, wekî destanînên wî diha zêde bûn, ne ku yên şandîyên mayîn, lê ewî xwe çawa yê herî baş hesab dikir. Gotinên wî vê yekê şirove dikin: "Lê ez bi kerema Xwedê me, çi jî heme". Pawlos xwe ji wî hemû tiştî cuda dikir, çi ku kerema Xwedê bi destî wî dikir. Ewî baş zanibû, wekî ewî nikaribû tu tişt li ser wî navî zêdekira, yê ku Xwedê dabû wî, û ji wê karebûnê zêdetir bikira, çi ku bona wî hatibû dayînê. Ev hemû tişt bi xebera "*kerem*"-êva tê tomerîkirinê. Û ev yek derheqa hemû bawarmendadane, navê çawa jî li ser wan be.

Îzinê bidin ez bi cêribandina xweye qulixdarîyêva şirove bikim. Kitêbên ku ji alîyê minda hatine nivîsarê, bi ji nodî zêdetir zimana hatine wergerandinê û bi mîlîyona mesela li temamîya dinîyayê hatine belakirinê. Me şedetîyên bêhesab derheqa wê yekêda stendine, wekî ew kitêb jîyanên meriva diguhêrin.

Gelek cara meriv nêzîkî min dibin û dipirsin, ku sura nivîsara kitêbên min kîjan e. Ez xweda dikenim û bîr tînim, ku çiqas xirab min nivîsara înglîzî zanibû, hetanî ku kerema Xwedê jîyana minda hate kivşê. Bona nivîsara du rûpela min nîvê bloknota xwe xirab dikir, hetanî ku min beşeke biçûk dinivîsî. Niha, wextê ku ez dinivîsim, xeber ji devê min dipekin. Ez diha baş zanim, lê ne ku merivekî başqe, ku Kî kitêbên min dinivîse. Bi rastî ez merivê ewlinim, yê ku wana dixwîne.

Ez carekê li kanaleke têlêvîzîyonêye miletîyê çawa mêvan hatibûme dewatkirinê û xeberdan derheqa bangên kitêbên minda bû. Feqet, wextê wê hevpeyvînê, xebatkarê progiramê destpêkir

diha gelekî derheqa min û destanînên minda xeber bide, lê ne ku derheqa bangên minda. Min halekî gelekî bêfesal li ser xwe texmînkir û min destpêkir rêberîya Ruhê Pîroz nava xweda bigerim, bona ku berê qisa me bihata guhartinê.

Piştî çend deqa navbirî bû, peyî kîjanêra ew wedê bêfesal bû, derheqa kîjanîda gerekê bihata gotinê, çi ku Ruhê Pîroz da min. Min xeberên Silêman anîne ber çava: “Ez derheqa wê yekêda pê hesîyame, wekî çi ku Xwedê dike, yê heta-hetayê ye: li ser wê wê neyê zêdekirinê û wê ne jî bê kêmkirinê û Xwedê kirîye, ku ji Wî bitirsin. Çi ku heye îdî hebû, çi wê bibe, ew îdî bûyî ye û Xwedê wê yê derbazbûyî bigere” (Zanebûn 3:14,15).

Min xeberdana xwe berdewam kir:

– Gelek serwêr û qulixçî hene, yên ku wê yekê dikin bona çi Xwedê gazî wan kirîye. Hinek li civînên gundaye ji sed merivî serwêrîyê dikin, yên mayîn nava merivên undabûyî û zêrandî, miletên ku pêşda diçin, qulix dikin. Wana jîyana xwe nava deştên mîsyonêrîyêda çandine, yên mayîn her roj li merkezên bajarên mezin dixebitin: ew jîyanên xwe datînin bona ku alî wan meriva bikin, yên ku ji alîyê yên mayînda çawa yên nehêja tên hesabê. Hinekên mayîn jî li deşta Xwedêye karkirinê bi aminayî qulix dikin. Bi texmîn ew meriv wê tu cara bona hazirîya li vê progiramê (bernamê) neyêne dewatkirinê, lê ji wana gelek wê li cêrgên ezmîne ewlin bisekinin, çimkî ew nava wî karîda şikestîne, bona kîjnî hatine gazîkirinê û wana ew yek bi menîyên paqij kirine.

Min xeberdana xwe berdewam kir:

– Çi ku derheqa mindane, Xwedê gazî min kirîye, ku ez xebata mexsûs bona Wî bikim û ew xebat gihîştîye gelek meriva. Awa bona çi we ez dewatî li vê progiramê kirime. Feqet ez nikarim tu tiştî li ser vî hemû tiştîda zêde bikim, bona çi ez hatime gazîkirinê. Ez nikarim vê xebatê bi karebûna xwe bidime berfirehkirinê, başkirinê, yan jî diha zêde belakirinê. Tiştê tek-tenê, ku ez dikarim bikim, navhevxistina hemû tiştî ye û ew yek nava minda xofê pêşda tîne.

Xeberdana me carekêra werguhêzî cûrê heyteholî bû. Ewê ku program derbaz dikir, yê ku bi xwe jî serkarekî qulixa navnetewî bû, gotinên min fem kir û alîyê xeberdanê cerekêra guhart û xeberdan bire alîyê qulixa meriva.

Ev gotin derheqa her kesîdanin. Diqewime hûn çawa jin û dayîk hatine gazîkirinê, bona qulixa li beşa civînêye zaroka. Eger hûn bi aminayî hetanî dawîyê wê yekê bikin, hûnê bona wê yekê heqê mezin bistînin. Diqewime hûn hatine gazîkirinê, ku hûn nava qulixa civîna xweda, ya bona hebsa qulix bikin, yan jî nava merivên goveka bîznêsê û qulixa karê pêşkêşdayînêda mîyaser bikin. Eger hûn bi aminayî wê yekê hetanî dawîyê bikin û qulixa xwe bi dil bona Xudan jî mîyaser bikin, hûnê wî cûreyî heq bistînin, mînanî wî Mizgîndarî, yê ku elaleta mezin bona xilazbûnê anîye.

Meselên vî cûreyî meriv dikare gelekî bîne. Ez bi xwe bawar dikim, wekî nava cêrgên Ezmîne ewlinda emê gelek dayîka, merivên bîznêsê, xebatkarên sade û gelekên mayîn bibînin, yên ku wê ji Xudan heqên mezin bistînin.

## Eskerê Xwedê, yê li ser vê dinîyayê

Civîna Îsa Mesîh li ser vê dinîyayê eskerê Xwedê ye. Em hemû jî bona mîyaserkirina mîsîya xwe, emê tabîya û pêşkêşa bistînin. Berî çend sala Xudan jina min hişyar kir û nava Ruhda eskerekî mezin nîşanî wê da. Şev sehet çar bû, ewê ez hişyar kirim, bona ku minra gilî bikira, ku ewê çi dîtibû. “Con,– ewê got,– ew yektîke leşkerî bû, li kîderê her kesî navê xwe, tabî û borcdarîyên xwe zanibûn. Wana bi qeydê herî baş gav diavîtin û nava hemû qulixada cîhên vekirî hebûn, yên ku çawa ku min dît, bi merivên nûva dihatine tamkirinê. Hewce nîbû, ku kesek yekî mayîn binihêrîya, bona ku fem bikira, ku ewê kî alî herin. Hemû kes nava yektîke kamilda bûn, çimkî berê wan li ser Xudan bû”.

Ewê xeberdana xwe berdewam kir û tiştekî usa got, ku bala min kişande ser xwe: “Tu kesî tabîya yê mayîn nedixwest. Hemû jî razî bûn, ku li wî cîhî qulix dikirin, yê ku Xudan bona wana çêkiribû”.

We ev yek fem kir? Nava eskerda tu kesî bona qulixa yê mayîn hevsûdî nedikir. Her kes razî bû û bextewar bû, ku tabîya xweda dişuxulî.

Bi bîra xweda xweyîkirina vê yekê, werin em paşda vegerine li ser mesela proyêkta malêye şexsî. Wê yekê bîr bînin, ku Încîlêda çi nivîsar e: “Malê bi serwaxtîyê bê çêkirinê” (Gotinên Silêman 24:3). Du cûrên serwaxtîyê hene, bi kîjana em dikarin çêkin, yek ji Xwedê ye, lê yê mayîn na.

> “Nava weda kî serwaxt û aqil e? Bila ew bi pergalîya xweye qenc, kirên xwe, bi milûktîya serwaxtîyê bide kivşê. Lê eger dilê weda hevsûdîya xirab û çavnebarî hene, kubar nebin û rastîyê derew dernexin. Eva serwaxtîya nedayîna jorin e, lê ji dinyayê ye, ya merivayî ye û ji cina ye. Çimkî li kîderê hevsûdî û çavnebarî hene, li wir bêterbyetî û her kirinên xirab jî hene” (Aqûb 3:13-16).

Nenihêrî wê yekê, ku em çi dikin û bi çiqasîva ew yek baş tê texmînkirinê, eger kirinên me bi cedandinên hevsûdîyê û xwehizîyêva tijîne, usa ye em bi menîyên bedenî, yên ne nivîsarên pîrozî û cina çê dikin, kîjanê tu cara heq nestînin.

Vêbstêr hevsûdîyê çawa “texmînkirina nerazîbûnê û timayê girêdayî açixî, pêşdaçûyîn û hebûna yekî mayînva” şirove dike. Eger em bi çavên vê dinîyayê dîna xwe bidine banga Xwedê, hevsûdî wê ese hebe. Terîfkir hebûn, yên ku hindava banga Pawlos hevsûdî dikirin. Ew dinivîse: “Rast e hinek mesîhî terîf dikin, lê ew ji *hevsûdîyê* û konkûrênsîyayê dibe, feqet merivên başqe wê yekê ji xêrxwezîyê dikin. Evên xilazîyê wê yekê bi hizkirin dikin, çimkî zanin, wekî ez bona parstina Mizgînîyê li virim. Yên ewlin Mesîh *bi cedandinênn xwehizîyê* terîf dikin” (Fîlîpî 1:15-17, NIV).

Ev qulixçî ji wî navî razî nîbûn, yê ku Xwedê dabûne wan: wana dixwest, ku açixîya Pawlos ya wanbe. Ew *hevsûdî* ji *cedandinên* wane *xwehizîyê* pêşda hatibû. Cedandin xwestineke qewîn e û bi kel û ced e, ku bighîje tiştekî. Wextê ku cedandinên me yên xwehizîne, em li ser xwe merkez dibin, lê ne ku bona kara merivên başqe. Menîya vî cûreyî tenê bêterbyetîyê û hevraqayîlnebûnê pêşda tîne û derî bona her tiştekî xirab vedike.

Serwxatîya Xwedê, ya himberî cedandinênn xwehizîyê, ne ku *cedandinên meye xwehizîyê* gur dike, lê nava meda *aktîvîya meye hindava padişatîya Xwedê* gur dike. Ew anegorî xwestina Çêkirçîyê projêyî Sereke û xwestina dilê wî çê dibe. Derheqa vê serwaxtîyêda nivîsar e: “Lê serwaxtîya jorin berê ewlin paqij e, paşê edil e, milûk û berbihêr e, bi rehmê û berên qencîyêva tijî ye, bê tagêr û bê hilekarîye” (Aqûb 3:17).

Serwaxtîya Xwedê pîroz e. Bi gilîkî mayîn gotî, ew ne ya durûtîyê ye: cûrê wêyî xwedêparêzîyêyî bi menîyên hevsûdîyê û xwehizîyê tune. Menîya serwaxtîya Xwedê ew e, ku hindava Xudan û teslîmkirinên Wî da qebûlkirina bi şabûnê hebe. Meremê

serwaxtîya Xwedê ne ku bûyîna yê herî mezin e, lê ew e, ku gura banga Wî da bin. Ewê alî we bike, ku hûn bi pêşdaçûyîna padişatîya Xwedê şa bibin, nenihêrî wê yekê, wekî ew yek bi destî me yan bi destî merivê başqe diqewime.

Serwaxtîya Xwedê her dem li ser kara merivên başqe merkez dibe, lê ne ku kara şexsî. Ew edil e, şera çê nake, kubar nabe, rexne nake û meriva nake bin destê xwe. Meremê wêyî hîmlî ew e, wekî meriv bi xwedêparêzîyê pêşda herin û navê xwe mîyaser bikin. Hene meriv, yên ku qulixê hiz dikin û meriva qebûl dikin, lê hene meriv, yên ku meriva hiz dikin û qulixa xwe çawa mecala bona qulixkirina bo wana hesab dikin. Merivên cûrê xilazîyê bi serwaxtîya Xwedêva tên rêberkirinê.

Cudatîke serwaxtîya Xwedê jî milûktî ye. Wextê ku em ji navê xwe razîne, wî çaxî em gura serwêrtîya Xwedê da nin. Em şikilê tomerî, yê çêkirna mala Xwedê dibînin, yê ku tenê ji alîyê Arxîtêktor û Çêkirçîkîda tê kontrolkirinê. Ewî serwêrtîya Xwe, karebûn û teslîmkirinên Xwe teslîmî merivên civînêye cuda-cuda kiribûn. Ew meriv wê li ber textê Dîwanê heqê mezin bistînin, yên ku wê gura rêberên xweda bimînin. Ew alîkarên serwêra, yên ku civîn pareve kirine, ew xebatkarên ku ji serkarên xwe heq stendine, lê karê xwe li ser hîmê karê wana çê kirine û hemû merivên wî cûreyî wê li ber dîwanê zyaneke mezin bibînin, eger ew gihîştibine feydayên mezin jî.

Îzinê nedin ku feyda we bixapînin. Em dikarin bighîjine feydayê mezin, lê bi wê yekêva tevayî gura serwêrtîya Xwedêda nîbin. Mûsa bîr bînin. Xudan gote wî, ku zinara ra xeberde, bona ku av bi cûrê ecêb bikişe. Ewî gura Xwedê nekir. Dewsa wê yekê ewî bi hêrsketin zinar xist. Av kişîya û ew awqasî hat, ku li qûmistanê têra sê mîlîon merivî kir. Diqewime meriva digotin: “Bêguman, Xwedê gura Mûsa dike. Ew çi zorayî ye!”.

Feqet wextê ku wana vexwer û xilaz kir, Xwedê gazî Mûsa kir û gotê, ku ewê rûyê gurênekirina wîda nekeve welatê Sozdayî. Mûsa gihîşte feyda, ew jî feydayê ecêb. Feqet dereca açixîyê ne ku feyda ye, lê gurêdabûn e. Serwaxtîya xwedêtîyê nava tirsa Xudanda cîhê xwe girtîye, bona kîjanê qirara Xwedê ji her cûre halî bilindtir e. Ew merivên ku li cem wan xofa Xudan heye, bi cûrê tam gura serwêrtîya Wîdanin.

Werin em paşda vegerine ser xewina jina min. Ewê wê şebeqê gote min: “Con sifetên hemû leşkera mînanî hev bûn”. Bi gilîkî mayîn gotî sifetê wî eskerî tune bû. Ev yek dide kivşê, wekî li cem Xwedê bona merivên cuda tabîyên cuda tunene. Wextê ku em vê yekê fem bikin, emê îdî tabîya merivekî başqeye li civînê nexwezin û emê dijî rêberên xwe dernekevin, bona ku tabîya diha bilind da bin. Pêşdaçûyîna me wê ji ezmîn bê, eger em tenê nikandî bimînin.

## Derecên cuda

Mizgînîyada du metelokên mînanî hev nivîsîne, ji kîjana her yek rastîya başqe derheqa textê Dîwanêda raber dike. Ji wan meteloka yek derheqa telantadane, lê ya mayîn derheqa zêrada. Ya derheqa telantada wê rastîyê dide kivşê, wekî navê hemû bawarmenda û usa jî pêşkêşên wan li ser derecekê nînin.

> “Merivek, yê ku wê derketa rêwîtîyê, gazî xulamên xwe kir û hebûka xwe sparte wan. Pênc telant dane yekî, du telant dane yekî û telantek jî da yekî, her kesîra weke qewata wî û zû rê ket çû” (Metta 25:14,15).

Merivê ku diçû rêwîtîyê Îsa dide kivşê, lê xulam jî emin. Telant çapeke para ye, lê eger em metelokê dinihêrin diqewime ew tiştekî mayîn dide kivşê.

Ji van cûra yek, kîjanê ez bwarîya xwe lê tînim ew e, wekî telant sîmvola nav û pêşkêşên li ser derecên cuda-cuda ye. Mesele qulixa hinek meriva li ser dereceke usa ye, ku ew digîjine mileta, yên mayîn dighîjine bajara, lê hinekên mayîn jî dighîjine komên mala, yan jî civînê. Hinek nivîskar dighîjine mîlîyona meriva, yên mayîn dighîjine hezara meriva, lê yên mayîn seda. Kesê ku pêşkêşa rêberîyê stendîye, dikare civîna bi hezara meriva çê bike, lê yên mayîn dikarin tenê li civînên navîn, yan jî biçûk bixebitin. Hene merivên bîznêsmên, karebûnên kîjana îzinê didin hevaltîya çê bikin, bi rîya kîjana ew bi hezara dolara didin bona padişatîya Xwedê. Hevaltîyên yên mayîn, kara kîjana dighîje bi mîlîyona dolara, lê yên mayîn çend hevaltîya çê dikin, bi saya kîjana ew bi mîlîyona, yan jî bi mîlîyarda dolara karê didine padişatîya Xwedê.

Werin em paşda vegerine ser meteloka xwe. Guhdarîyê bidine ser du gotinên girîng. Ya ewlin, wekî hemû xulam tişt stendin. Ew

yek dide kivşê, wekî civînêda merivekî usa tune, ku navê wî tune be (yan jî pêşkêşa wî tune be). Ya duda, anegorî karebûnên wana nav û pêşkêşên li ser derecên cûre-cûre hatine dayînê. Feqet, em gerekê bîr bînin, wekî Xwedê karebûnê dide me. Nava jîyana meda tiştekî usa qîmetlû tune, ku me nestendîye, çimkî Încîl dibêje: "Kî te ji xeliqê firqî dike? Çî te heye, ku te pêşkêş nestendîye? Lê wekî te stendîye, çima payê xwe didî, çawa te nestandibe?" (A Korintî 4:7).

Nava vê meselêda merivê ku nav û pêşkêşa pênc telantê stendibû, emekê nava xweda kirî dubare kir. Merivê du telantê jî usa kir. Ez nava vê yekêda li ser vê fikirê me: nenihêrî wê yekê, wekî Xwedê pêşkêşên Xwe dane me her yekî, em gerekê tevî merivên başqe hevkarîyê bikin, ku em bighîjin wî feydayî, kîjanî Ew dixweze.

Feqet merivê bi navê telantekî dikare hesab bike, wekî emekê nava wîda hindik bû, nedihate kivê. Bi fikira wî, axayê wî merivekî ne zelal bû, bêaqil bû û berk bû. Ew dikaribû wa bifikirîya: *"Bona çi min ji* yên mayîn hindiktir stend? *Bona çi hukumê wanî hemmiletîyê û hembajarîyê heye? Bona çi karebûna wane terîfkirinê, stiranê yan jî nivîsarê heye, lê ya min tune? Bona çi hevaltîya min usa pêşda neçû, çawa yên mayîn*?" Û vî cûreyî ser hev em dikarin mesela bînin. Dêmek ewî telantê xwe veşart. Ewî navê li ser xwe mîyaser nekir. Ewî pêşkêşa xwe bona xwe da xebatê, yan jî govekên mayînda da xebatê, yên ku kar nedane padişatîya Xwedê.

Êpêce wede şûnda axayê wan xulama paşda vegerîya û xwest tevî wan hesaba bike. Her du xulamên ewlin, yên ku hebûna li wan spartî dubare kiribûn, bi gotinên pesindayînêva heq stendin: "Axayê wan got: "Eferim, xulamê qenc û amin! Tu nav tiştên hindikda amin mayî, ezê te daynime ser gelek tişta. Bikeve şaya axayê xwe!". Xulamê pênc telantê xeberên pesindayînêye diha mezin ji xulamê du telantê zêdetir nestendin. Çimkî ew her du jî amin û xebathiz bûn. Ev yek careke mayîn îzbat dike, wekî Xwedê tenê ji me dewa wê yekê dike, ku em nava wî hemû tiştîda aminbin, çi ku Ewî daye me.

Merivê telantekê rastî berkbûnê hat û axayê wî emir kir, ku tiştê cem wî hildin û bidine yên mayîn. Xulamê bêamin zyana mezin ket, lê yê amin diha zêde stend.

Ez sala 1992-a bîr tînim, wextê ku Xwedê temî da min, ku ez kitêbê binivîsim. Wextê duakirinê ez kenîyam, çimkî min bawarîya xwe li wê yekê nedianî, çi ku min dilê xweda bihîstibû. Min nivîsara însglîzî qet hiz nedikir. Eger yekî minra bigota, ku ez gerekê kitêbê binivîsim, ezê usa bikenîyama, wekî ewê şaşbûyî paşda biçûya.

Feqet, piştî deh meha du jin hatine cem min, di navbera hatina kîjanada firqîya du hevtîya hebû û ew gotina pêxembertîyê dîsa dane min: "Con, eger tu wê yekê nenivîsî çi ku Xwedê daye te, Ewê wê berbirîbûnê bide merivekî mayîn, lê tê bêyî gunehkarkirinê". Ez lerizîm û min bi bawarîyê gav avît, lê tiştê mayîn îdî paşerojêda ma. Eger min gurê nekira, yekî mayîn wê ev berbirîbûn binivîsîyana, lê minê jî ew telantê ku li min amin bibûn, unda bikira.

## Tiştên dayî çendbare bikin

Me bi berfirehî ew yek guvtugo kir, wekî hûn nikarin tu tiştî li ser navê xwe, yan jî pêşkêşên xwe zêde bikin. Niha guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî her bawarmendek gerekê tiştê ku bona wî hatîye dayînê, çendbare bike. Ev rastî zelal nava mesela derheqa zêrada tê kivşê, ya ku nenihêrî wê yekê, wekî mînanî mesela telantadane, lê ew gelekî ji hev cuda dibin. Îsa dibêje:

> "Mrivekî esilzade çû welatekî dûr, ku padişatîya xwe bistîne û vegere, gazî deh xulamên xwe kir, deh zêr dane wan û got: "Hanên vana bidine xebatê heta ku ez vegerim"" (Lûqa 19:12,13).

Zêr jî mînanî telant çapa para ye. Nava vê meselêda jî her yekî zêrek stend, qasî hev. Bo wê yekê jî zêr, mînanî telanta, dereca nav û pêşkêşên me nade kivşê. Li vir zêr rastîyên Xebera Xwedê dide kivşê, bingehên bawarîya me, hizkirina Xwedêye nava dilên meda raxistî, û wan dua dide kivşê, yên ku bona her bawarmendekî tên dayînê, bona heyîna peymana tevî Xwedê. Her merivekî weke yên mayîn stendîye: tu kesî bona destpêkê ji yê mayîn zêdetir nestindîye.

Ev mesele derheqa wê yekêdane, ku çi tiştê her bawarmendekî nava Mesîhda heye. Încîlêda nivîsar e: "De bila îdî tu kes pê meriva nefire! Belê, her tişt jî para wene" (A Korintî 3:21,22). Û careke mayîn: "Şikir ji Xwedêra, Bavê Xudanê Îsa Mesîh, ku pê hemû dua-

dirozgên ruh'anîye li dîyarê ezmana yektîya Mesîhda dua li me kirin" (Efesî 1:3). Ev dua-dirozgên nava Mesîhda yên mene, lê ew bi rîya bawarîya me li vê dinîyayê tên qebûlkirinê û raberkirinê. Û ew bi milûktîya me, bi duakirin û qurbanîyên meva çendbare dibin. Awa ku bona çi merivê esilzade, yê ku sîmvola Îsa ye, dibje xulamên xwe (yên ku sîmvola me ne): "Bidine xebatê hetanî ku ez têm". Em gerekê wî tiştî hildin, çi ku mera hatîye dayînê û bona rûmeta Xwedê wê yekê çendbare bikin.

Em niha binhêrin, ku ew xulamana gihîştine feydayên çawa:

> "Û gava ewî padişatîya xwe stend û vegerîya, gazî wan xulama kir, yên ku ewî pare dabûne wan, wekî bizanibe, ka her yekî çiqas kirîye kar. Yê pêşin hat gotê: "Ez xulam, zêrekî te deh zêr kire kar". Axayê wî jêra got: "Eferim, xulamê qenc! Tu nava wî tiştê hindikda amin mayî, serwêrîyê li deh bajara bike". Yê duda jî hat û got: "Ez xulam zêrekî te pênc zêr kire kar". Axayê wî jêra got: "Tu jî ser pênc bajara be". Paşê yekî din hat û got: "Ez xulam vaye zêrê te, min destmalêda pêçayî hildabû"" (Lûqa 19:15-20).

Ev merivê esilzade bi cûrê berk vî merivîra xeberda û ew zêrê ku dabû wî jê stend û da wî merivî, yê ku ji deh zêra para dehê mayîn stendibû. Axa gotê: "Ez wera dibêjim, yê kê ku heye wîra wê bê dayînê, lê yê kê ku tune, çi heye jî wê jê bê stendinê" (Xeber 26).

Nava vê meselêda Îsa ji deh xulama tenê tevî sisîya xeber dide. Em careke mayîn bêjin, wekî firqîya vê meselêye girîng ew bû, wekî her yekî wekehev destpê kirin, lê yekî hebûna xwe dehbare zêde kir, yê mayîn pêncbare, lê yê sisîya tu tişt zêde nekir. Em usa jî dibînin, wekî heqdayîn bi wê yekêva cuda dibe, wekî her xulamek bi çiqasîva kardar e. Ewî açixîya wan qirar kir, ku ewê li ser çend bajara serwêrîyê bikin.

Ew yek, wekî em çawa tiştê dayî çendbare dikin, wê qirar bike, ku çiqas serwêrî wê wextê padişatîya Hezarsalî li me bê spartinê, usa jî wextê dinîya nû û ezmanê nû. Yên amin wê tevî Mesîh serwêrîyê bikin, lê serwêrîya hemûya wê mînanî hev nîbe. Yê amin padişatîya meye li vir wê qirar bike, ku emê çawa tevî Wî nava heta-hetayêda serwêrîyê bikin. Ji me her yek jî wî cûreyî, bi zêrekî destpê kirîye: dêmek jin yan jî dayîka amin, ya ku bi kel û ced li civînê qulix dike dikare awqasî bistîne, çawa ku mizgîndarê bistîne, yê ku rêberîya bi seda hezara merivaye berib Mesîh kirîye.

Ev mesele dide kivşê, wekî her yek dikare gelek cara tiştê xwe çendbare bike. Nava jîyana meye şexsîda em dikarin padişatîya Xwedê awqas gelek yan hindik belakin, yan jî çêkin, çiqasî em bixwezin: em bi xwe qirar dikin. Bi rastî, nava hinek pirsada em bi temamî bêsînorin. Diqewime hûn vê yekê qebûl nekin, lê îzinê bidin, ez bi rîya mesela nîşanî we bidim. Ez dikarim gelek mesela bînim, lê çend heb dikarin bona vê prînsîba ruhanî derê dilê we vekin. Feqet, hetanî derbazbûna li ser wê pirsê werin em pêşda xeberên Petrûsê şandî bixwînin:

> “De bira kerem û edilayî bi wê zanebûna Xwedê û Xudanê me Îsa li ser we zêde bibe. Qewata xwedêtîya Wî her tiştê, ku li jîyana Xwedênasîyê dikeve, pêşkêşî me kir. Bi wê zanebûna meye hindava Wîda, Yê ku rûmetê û qencîyêra gazî me kir...” (B Petrûs 1:2,3).

Kerem nava jîyana meda dikare *zêde bibe*, yan çendbare bibe. Aqûb dinivîse: “Lê Ew zêde û zêdetir keremê dide me” (Aqûb 4:6, AMP). Tenê bi kerema Wî em dikarin karên usa bikin, yên ku wê nava padişatîya Xwedêda qîmetlû bin. Ev karebûn bi saya ji nêzîkva naskirina Xwedê zêde dibe. Awa bo wê yekê jî her bawarmendek gerekê wedekî baş tevî Xwedê derbaz bike. Ew gerekê dua bikin, Xebera Xwedê û kitêbên ji Xwedêda ruhdarkirî bixwînin, terîfên rûnkirî guhdar bikin, û nava wî wedeyîda Ruhê Pîroz binhêrin û guhdar bikin, hîvîya eyantîya Wî bin. Wextê ku em vî cûreyî bikin, keremê nava jîyana meda zêde bibe û emê diha kardarbin.

Min eyan kirîye, wekî ez çiqasî Xwedê û rêyên Wî nas dikim, awqasî zêde ez kardar dibim. Eger baltê ku li cem minbe, bona min wê rojeke tam lazimbe, ku ez darê bibirim. Feqet eger ez balte tûj bikim, ez dikarim rojê pênc dara, lê dîsa bi wê qewatê, bibirim. Bo wê yekê jî, wextê ku kerem nava jîyana meda zêde dibe, yan jî çendbare dibe, ev tişt diqewime. Em wî çaxî diha kardar dibin.

Tê bîra min, wekî çend sal pêşda li bajarê ştata Têxasêyî Dallasê me li ber tevbûyên berevbûna homosêksûalîsta şedetî dida. Du seheta ser hev min tevî wan merivên undabûyî derheqa Îsada xeber dida, lê wana usa li min dinhêrîn, tê bêjî ez ji dinîyake başqe bûm. Hineka wextê xeberdana min rexda bi beşên Încîlê bersiv didan. Min texmîn dikir, wekî li pêşîya min dîwarekî usa sekinîbû, ku

meriv nikaribû derbaz bûya. Ew yek mînanî wê yekê bû, çawa ku tu li ser bêtonê toxim bireşînî.

Nişkêva Xudan bi dengê nimiz minra got: "Li Min binhêre, û Ezê nîşanî te bidim, ku tu çi bikî". Nava sî deqên mayînda Xwedê, wextê xeberdana tevî çend meriva, rêberî li min kir û xeber dane min, ku min tevî wan xeberda. Vê carê meriva gotnên min qebûl dikirin, û sê meriva jîyana xwe teslîmî Îsa Mesîh kirin. Wextê ku min destpê kir peyî Ruhê Pîroz herim û guhdarîya wê yekê bikim, çi ku Ewî dilê minda digot, karebûna kardarîya min zêde bû.

Ev yek min nava hemû govekên jîyana xweda dîtîye. Li rex zêdebûna nava Xebera Xwedêda min dikaribû diha zêde bikira, lê nava wedê diha kurtda. Min rêyên rastîyê dîtin, kîjana sehet, roj û meh bona min xweyî kirin. Duakirin diha bi qewat derbaz dibin, hazirîya Xwedê diha bi qewat tê kivşê û ez dikarim diha kardar nava jîyana merivada bixebitim.

Încîl vê yekê soz dide:

> "Xofa Xudan destpêka serwextîyê ye. Naskirina pîrozîyê telantê dide. Serwaxtî wê rojên te zêde bike û wê salên jîyana te zêde bike" (Gotinên Silêman 9:10,11, NLT).

Nava vê beşêda du soz hene: salên zêdebûyî, dêmek jîyana dirêj û rojên zêdebûyî. Sozê duda eynî ew nîne, çi ku salên zêdebûyîne, çimkî ew yekê bibûya wekilanda nelazim. Ew yek dide kivşê, ku dîsa nava wî wedeyîda tu hê zêde pêra bighînî bikî. Nava beşeke mayînda hema ev yek tê navkirinê "rojên dirêj": "çimkî ewê rojên dirêj û salên saxîyê û edilayê bona te zêdekin (Gotinên Silêman 3:2). Xudanê vê xeberê derheqa guhdarkirina Xebera Xwedêda dinivîse, çawa ku Petrûs nava beşeke nivîsarên pîrozda anîye ber çava. Guhdarîyê bidine ser, wekî ne tenê salên dirêj bona mêriv tên dayînê, lê usa jî rojên dirêj tên dayînê. Guhdarkirina Xwedê û çûyîna peyî Wî wedê me zêde dike.

## Çendbarekirin bi rîya qurbankirinê

Ewê ku ji nêzîkva Xwedê nas dike, ew dibe merivekî eşq û bi merdanî qurban dike, çimkî Ew pêşkêşên mezin dide. Ewî pêşkêşa here mezin da Kurê Xwe. Bona Xwedê ji Îsa bihatir tu tişt tune.

Xudan tu cara pêşkêşên ne girîng û bêqîmet nade. Ewî Îsa da, çimkî hîvîya dirûna mezin bû, ya gelek lawa û keça, yên ku wê biketana malbeta Wî û ew dirûtin hela hê berev dibe.

Qurbankirina bi bawarîyê dîsa mecalek e, ku hebûna xwe çendbare bikin. Qurbankirinên me wê yekê çendbare dikin, çi ku yê me ye û hukumê heta-hetayê li ser meriva dihêlin, usa jî wî çaxî, wextê ku Bavê Îsa bona me qurban kir. Îsa dibje me: "Ez wera dibêjim, hebûka vê dinîyayê bidine xebatê wekî hevala destbixin, bona ku wextê hebûk îdî tunebe we li malên ezmîn qebûl bikin" (Lûqa 16:9, NIV). Eger em bi cûrê layîq parên xwe bidine xebatê, ewê wî çaxî hukumî li ser jîyana meye li Ezmîn û Orşemîla Nû bike, wextê ku ew pare îdî tunebin. "Çawa nivîsar e, Ew [xêrkir] bela dike: Ew dide kesîba: karên Wîye heq, qenc, dilsoz û xêrkir wê berdewam bibin û heta-hetayê bimînin" (B Korintî 9:9, AMP).

Meriv dikare ne tenê bi fînansî kesîbbe, lê usa jî bi ruhê xweva. Yek dikare xweyê mîlîona dolarabe, lê bi ruhê xweva kesîbbe. Meseleke kivş hema ya Zakêos e. Îsa got û mîsîya Xwe şirove kir: "Ruhê Xudan li ser min e, çimkî Ewî ez bi rûnkirinê kivş kirim, wekî Mizgînîyê bidime *feqîra*..." (Lûqa 4:18). Diha dereng Ew dikeve bajarekî, li wir merivê herî dewletî dibîne û li ber elaleta mezin berbirî wî dibe, dibêje: "Ez îro gerekê li mala te mêvanbim" (Lûqa 19:5, NLT). Nenihêrî wê yekê, wekî Zakêos merivê wî bajarîyî herî dewletî bû, lê paşê eyan bû, wekî ew yê herî kesîb bû. Bi gilîkî mayîn gotî, ewî ji yêd mayîn zêdetir fem dikir, ku çiqasî hewcê Xwedê ye. Îsa qulixî gelek merivên dewletî kir, yên ku baş fem dikirin, wekî hewcê Xebera Xwedê bûn.

Qulix bilind dibin, ku karên Îsa bikin, ku Xebera Xwedê elamî kesîba bikin û wana hîn bikin. Bi pêşkêşkirina fînansaye bona karê Xwedê, em nava jîyana feqîrada diçînin, û karên me wê heta-hetayê bimînin. Wextê ku toximê we heye,– lê Xwedê dibêje, wekî Ewê toxim bide we,– hûn dikarin cedandinên xwe çendbare bikin, bona çêkirina padişatîya Xwedê.

Pêşkêşa çawa tê çendbarekirnê? Mesele, eger hûn toximê sêva daçkînin, rojekê hûnê wan sêva berev bikin. Feqet tiştê diha girîng ew e, wekî nava wan hemû sêvada toximên nû wê hebin. Eger ew toxim bêne reşandinê, berevkirin wê diha zêdebe û wê hema usa

berdewam bibe. Ev yek hema usa jî nava fînansada ye. Binhêrin, ku Pawlosê şandî korintîyara derheqa qurbankirinên wanda çi dinivîse:

> "Çimkî vê yekê ez dibêjim, ku yê dest dide ber çandinê, wê hindikî jî bidrû, lê yê dest nade ber çandinê, wê gumreh jî bidrû. Dilê her kesîra çiqas derbaz dibe, bira awqasî jî bide, ne ku bide, lê dilê wî peyî be, yan bi borcdarîyê be, çimkî Xwedê yê bi dil û eşq dide, hiz dike" (B Korintî 9:6,7).

Dirûtina meye çendbarebûyî wê himberî çandina mebe. Guhdarîyê bidine ser, wekî Xwedê çandina me qirar nake: em qirar dikin, ku em çiqasî dixwezin bidin. Eger em ji bawarîyê û hizkirinê qirarkin, ku merdbin, pêşkêşên me jî wê zêdebin: "Ewê ku toxim dide wî, yê ku diçîne û nan dide bona xwerinê, wê usa jî *toximê* we *bide* û *zêde bike* û *dirûna weye heqîtîyê* bide zêdekirinê" (B Korintî 9:10, NIV).

Xudanê toxmê meyî bona çandinê mînanî mesela sêva bide zêdekirinê. Eger em çi ku heye biçînin, paşê emê diha gelek toxim bistînin. Evê awqasî berdewam bibe, hetanî ku usa gelek berev bibe, ku em bikaribin, bi mezinayî dua li meriva bikin.

Bi rîya qurbankirinê Xwedê wê dirûna meye heqîtîyê zêde bike. Ev yek bi rastî tiştê ruhdarkirinê ye. Ev yek dide kivşê, wekî dirûna heqdayîna meye heta-hetayê wê zêde bibe: emê usa jî bona wan meriva heq bistînin, bona kîjana me qurban kirine. Dêmek em vî cûreyî hebûna xwe çendbare dikin, mînanî xulamên nava mesela meda.

## Hevkarî

Wextê em alîkarîyê didine meriva, bi taybetî feqîra, yên ku nikarin dewsê tiştekî bidine me, wî çaxî em nava vê jîyanêda û usa jî wextê dîwanê heq distînin. Xêncî wê yekê, wekî dikarin cedandinên xweye bona çêkirina padişatîya Xwedê çendbare bikin û bi wê yekê bona belakirina Mizgînîyê *dibine hevkar*. Awa Pawlos bona wan bawarmendên Fîlpîyê dinivîse, yên ku bi fînansî piştgirî didane qulixa wî:

> "Lê tiştekî rast û layîqî pesin e û tiştekî bilind e, wekî we mecal pêşkêşî tengasîya min kirin û tevî min dijwarî nîvî kirin. Û belê,

> hûn jî zanin gelî fîlîpîya, wekî rojên pêşinda ku min dannasînîya Mizgînîyê dikir, wextê ku ez ji Mekedonîyaê derketim, tu civînek (olek) tevî min hevkarî nedikir û xêncî we hesab venedikir [krêdît û dêbêt] bona dayîn û stendinê. Çimkî heta Têsalonîkîyê jî we bona tengasîyên min şand [piştgirî bona min], û ew jî ne tenê carekê, lê du cara" (Fîlîpî 4:14-16, AMP).

Pawlos derheqa wê yekêda dibêje, wekî bawarmendên fîlîpî nava qulixa wîda *hevkar* bûn. Hevkarî çawa "heleqetîyên nava şexsa û komada, ya ku bi hevkarîyava didome, bona ku bighîjine meremekî" tê şirovekirinê. Hevkarîya saxleme ji alîyê Xwedêda dayî her dem îzinê dide, ku merivên nava wêda diha zêde bikin, ne ku awqasî bikin, çiqasî ew tenê bi xwe nikarin bikin.

Çawa ku min got, Îsa teslîmî me kir, ku em li temamîya dinîyayê bigerin û hemû mileta *hîn bikin*, lê ne ku paşda vegerînin. Ev temî derheqa hemû bawarmenda da ne. Feqet, eger hemû barwarmend bi çûyîna mîsîonêrîyê bona ku ev yek mîyaser bikirana, wî çaxî Mizgînî wê awa bihata fînansekirinê (Eva dîsa menîke ji wan menîya ye, ku bona çi Ewê nav û pêşkêşên cûre-cûre bide her merivekî). Xudan tu cara têra nedîtibû, wekî qulixçî mecalên paraye lazim bi navçîgarîya (orteçîtîya) milyaketa, yan jî bi rîya parên ji ezmîn bistînin. Dewsa wê yekê Ewî mecala qurbankirinê daye bedena Xwe û hevkarî çê kirîye.

Xwedê gazî hinek meriva kirîye û bona qulixê pêşkêş dane wana, ku ew bighîjine elaleta. Çawa ku me da kivşê, Ew pêşkêşa, karebûnê û rûnkirinê bona mîyaserkirina vî meremî dide. Ewî li civînê ev teslîmkirin nedaye hemûya, lê daye hinek meriva (binihêre Efesî 4:11). Ewî beşeke bernama Xwe teslîmî merivên civînêye mayîn kirîye. Ew gerekê bixebitin, karê û aylixê bistînin û nava dorana hukumê xweda bi Mizgînîyê bighîjine wan meriva. Feqet, eger hûn bi wedê tam dixebitin, hûn çawa dikarin bihîjine elaleta. Bersiva vê pirsê hevkarî ye.

Eger eşîyakî weyî usa hebûya, yê ku dikaribû jîyanên meriva biguharta, lê we bikaribûya her meh tenê du mesele çê bikirana, ew yek wê tiştê bûyînê nîbûya, ku we ew bigîhanda bajarê we, welatê we, yan jî temamîya dinîyayê. Feqet, eger hevaltîk hebûya, dezgehên kîjanêye mexsûs hebûna, ku bikaribûya mehê hezar

mesele çê bikirana, hûnê bibûna hevalkarê wan, ku xebata xwe bikira. Wî çaxî hûnê mehê negihîştana tenê du meriva, lê hûnê bighîştana bi hezara meriva û ew hevaltî jî wê alî bikira. Bi saya hevkarîya sade, weyê telant û cedandinên xwe bi kardarî çendbare bikirana.

Xebera Pawlose bona fîlîpîya hema derheqa wê pirînsîbêda ye. Ew xerdana xwe berdewam dike: "Ez ne ku berbi pêşkêşê [ya we] dicedînim, yan jî hîvîya wême, lê berbi wî *berî* dicedînim û hîvîya wîme, *yê ku tê ser hesabê we* [dirûna duakirî, ya ku li ser hesabê we berev dibe]" (Fîlîpî 4:17, AMP).

Guhdarîyê bidine ser gotina "wî berî, yê ku tê ser hesabê we". Bawarmendên Fîlîpîyê cedandindinên xweye bona gihîştina meriva û hînkirina wana çendbare dikirin: wana mecalên fînansî nava jîyana Pawlos û qulixa wîda çawa hevalkar, diçandin. Wana tiştên wedelû didan û ew werguhêzî yê heta-hetayê dikirin, nava feydayên wêda jî hemû tişt çendbare dibû.

Pawlos dinivîse, wekî bi hevkarîyê "çandina duakirî, ya ku ser hesabê we berev dibe" wera wê bê dayînê. Gilî derheqa hesabê weyî ezmanada ye. Wextê ku hûn li ber dîwana Mesîh bisekinin, hûnê ne tenê bona wan meriva heq bistînin, tevî kîjana hûn li cîhê xebata xwe, li cîhê jîyanê, li cîhê xwendinê û cîhên mayîn nava heleqetîyada bûne, lê hûnê usa jî bona wan bi hezara, yan jî bi mîlîyona meriva heq bistînin, bi rîya hevkarîya, bi kîjana hûn gihîştine wana. Awa bona çi Încîl bangî me dike: "Bi merdanî bidin, çimkî pêşkêşên we wê paşê paşda vegerine cem we. Pêşkêşê gelekara belakin" (Zanebû 11:1,2, NLT). Eger hûn her dem pêşkêşa bidine qulixdarîyên ji alîyê Xwedêda kivşkirî (nava wanda usa jî civîna weye cî), hûnê bi saya wê şuxulkarîyê merivara bik'evine nava heleqetîya. Para we wê ji hemû karên wan hebe, çimkî hûn hevkarê wanin. Awa behseke ruhdarkirinê: bi çiqasî zêde hûn daynin, bi awqasî zêde heqê we wê mezin bibe.

Wê yekê bizanibin, wekî Xwedê pêşkêşdayîna we ne bi çapa para qîmet dike, lê bi çandina amin. Bav Xwedê pêşkêşên ku ji dil dertên digere. Ew tabîya wî dilî hiz dike û dua dike, lê ne bi çapa parên dayî. Mesele, kesek dikare nava dayîna sî dolarên her meh aminbe, lê bona wî merivî ew pare mezin e. Xwedê wê pêşkêşê wê ne ku

çawa çapa para lê binihêre, çimkî ew bona xercê wî merivî ye, yê ku pêşkêş dike. Diqewime merivekî mayîn mehê hezar dolara pêşkêş bike, lê ew mecal ji parên wîye zêde bên dayînê: ew pêşkêşkirin bona wî merivî wê parê berbiçav nîbe û ew wî çaxî tu tiştî qurban nake, wextê wê yekê dike. Her du jî bona Xwedê bihane, lê Xwedê hesab dike, wekî diha zêde dide wî merivî, yê ku sî dolarî pêşkêş dike. Ev fikira bi mesela jinebîya, ku du lûmayê xwe qurban dike, tê şirovekirinê (binihêre Marqos 12:41-44).

Em usa jî gerekê bîra xweda xweyî bikin, wekî Xwedê nava jîyana vê dinîyayêda pêşkêşên me çendbare dike û ew yek îzinê dide me, ku em pêşkêşên diha mezin bidin. Încîl dibêje: "Hene meriv, yên ku [bi merdanî] direşînin, lê diha zêde distînin" (Gotinên Silêman 11:24, AMP). Derheqa vê yekêda bifikirin. Învêstîsîyayên we ne tenê nava heta-hetayêda zêde dibin, lê usa jî nava dinîya tebyetîda ew yek dibe. Bi vî cûreyî jî mecala we diha zêde dibe, ku hûn bighîjine gelek meriva. Eva demeke usa ye, ya ku tê kontrolkirinê û berfirehkirinê.

22 sal pêşda komeke merivên bîznêsmên, kîjana ez nas dikim, bûne yek û qirar qebûl kirin, ku pareke kara xwe bidine belakirina Mizgînîyê. Destpêka wana biçûk bû, lê her sal învêstîsîyayên wana zêde dibûn. Nava pêşkêşdayîn û hevkarîya xweda ew qewîn man. Pêşkêşdayînên wana awqasî mezin bûn, wekî nava deh salên ewlinda ew gihîştine ji 120 mîlîon dolara zêdetir para. Wana para xwe hildabû û ew bona padişatîya Xwedê çendbare kiribûn. Heqê wan wê mezinbe.

Civînêda gelek merivên bîznêsmên hene, hevaltîyên kîjanaye mezin hene: feqet, gelek ji wana bona padişatîya Xwedê kareke hindik didin. Nenihêrî wê yekê, wekî bi fikira civakê ew gelekî açixin, gelo Xudanê çawa nêzîkî jîyana wan bibe? Eger wana bi mîlîyona dolar qazanc kirîye, gelo ewê neyêne gunehkarkirinê, çawa ew meriv, yê ku zêrê xwe veşart? Wana ew çi ku bona wan hatibû dayînê çendbare nekirin, bona padişatîya Xwedê çendbare nekirin. Merivên, ku bi vî cûreyî dijîn, *bi heta-hetayêva nalivin.*

Van axirîya min tevî bîznêsmênekî golf dilîst, yê ku carna pêşkêş didane qulixa me. Peyî lîstikêra ewî ez birime mêvanxana xwe. Li ser rê ewî gote min:

“Con, ez bawar bikî îdî pêncî salîme. Ez gelekî xebitîme bona ku zivira hevaltîya xwe bighînime neh mîlîon dolara. Hemû tişt baş e, hevaltîya min normal dixebite, jin û zarokên min nava temamîya jîyana xweda çareserkirîne. Bona çi ez gerekê nava deh salên bi sirêda her roj bixebitim, ku zivira hevaltîya xwe bighînime ji sîyî hetanî çil mîlîyon dolara?

Min fem kir, wekî ewî xwe çawa beşeke girîng, ya çêkirina mala Xwedê, hesab nedikir. Ewî ez nava padişatîya Xwedêda çawa şexsekî girîng hesab dikirim, lê ewî girîngîya xwe nedidît.

Min bi lez bi pirsê bersiva wî da:

– Bîne ber çavê xwe, wekî min bigota te: “Ez gelekî xebitîme: min 17 kitêb nivîsîne, 11 mîlîyon kîlomêtr rêwîtî kirîye û min bi hezara berbirîbûn terîf kirine. Jîyana min çareszerkirî ye, qulixa min baş pêşda diçe, jin û zarokên min nava temamîya jîyana xweda çareserkirîne. Bona çi ez gerekê bi kel û ced bixebitim, bona ku kitêbên nû binivîsim, berbirîbûnên nû terîf bikim û rêwîtîyê bikim? Bi fikira te Îsayê bersiveke çawa bida min?

Ew kenîya û got:

– Minê nexwesta ku ez dewsa te bûma, wextê ku ez li ber Wî bisekinîyama.

– Te hema hêja bersiva pirsa xwe da,– min gote wî.

Min îzin da wî, wekî ew qasekê bifikire û paşê min xeberdana xwe berdewam kir:

– Ew pêşkêşên ku Îsa bona çêkirina padişatîya Xwe dane min, terîfkirin û nivîsar in. Ew pêşkêşa ku Îsa daye te bona çêkirina padişatîya Wî, qazanckirina para ye, ku tu daynî nava padişatîya Wî. Tu şikilê tomerî nabînî. Ez nava qulixa bona Îsa bi gurêkirin yan gurênekirina te sînorkirîme, çawa ku devê min wê nikaribûya bona wan meriva t’erîf bikira, bona kîjana lazim bû, eger nigên min qirar bikirana nexebitîyana û ez nebirama li cem wan.

Ew meriv ecêbmayî bû. Piştî şeş meha min jêra têlêfon kir û min jê pirsî ku çawa ye. Ewî got:

– Con, ew xeberên ku te şeş meh pêşda gotine min, her roj bi fikira baş ji serê min dernayên. Ez bi kel û ced dixebitim, bona ku bikaribim kara diha mezin bistînim û diha gelekî qurban bikim. Şikestîbûna wî gelekî li min xweş tê.

Jina min û ez bîznêsmênekî mayîn nas dikin, yê ku li civîna me îzbat bû û destpê kir bi qwata mezin qulix bike: ewî li wir qulix dikir, li kîderê hewcetî hebû. Ewî nizanibû, ku bona qulixa ne wedê tam hatibû gazîkirinê, yan bona goveka bîznêsê. Ewî qirar kir, ku bi deh selefê kara xwe bijî, lê 9O jî pêşkêş bide. Ew gihîşte meremê xwe, lê bi wî deh selefî jî avtomaşîna wîye bedew û mala wîye bedew hebûn.

Hevkarîya wîye tevî padişatîya Xwedê şuxulê wî da berfirehkirinê û deh selefê wî zêde bû. Ewî prînsîba Îsa da xebatê: ewê ku nava hindik tiştîda amin e, wê usa jî nava gelek tiştîda aminbe.

Bona hevkarîyê menîke başqe jî heye. Em dikarin bidine wan qulixdarîya jî, yên ku nava jîyana meda tevî me nava heleqetîyada bûne. Pawlos dinivîse: "Eger me nava weda tiştên ruhanî [toximên tiştên ruhanî] çandiye, [gelo awqasî] tiştekî mezin e, eger ji hebûna weye matêrîyalî bidrûn. Eger yên mayîn bi heqî ji we hîvîyêne, ne em jî [hêvîdarin]?" (A Korintî 9:11,12, AMP).

Li vê dinîyayê prînsîbên mînanî hev dişuxulin. Eger ji hevalên we kesek pêşkêşekî bide we, hûnê nivîsara derheqa razîbûnêda hevalekî mayînra neşînin. Hûnê razalixîyê elamî wî bikin, yê ku ew yek kirîye û bi wê yekê hûnê heleqetîyên xwe diha qewîn bikin. Xwedê bi meremê mexsûs hevkarî kire wî cûreyî: bi çiqasî zêde qulixa başqe tevî gelek meriva dikeve nava heleqetîya, awqasî zêde hewcetîyên qulixdarîyêye fînansî diha mezin dibin. Dêmek, eger ewên ku hukumê qulixekê li ser xwe dîtine, çawa bersiva wê yekê ewê bi temamî bona hemû xercên xweykirin û berfirehkirina wê qulixê bicedînin.

Pawlos xebera xweye bona fîlîpîya bi vê yekêva ser hevda tîne:

> "Lê min [dayîna we bi temamî] û zêde jî stendîye: hemû tiştên min hene, çi ku min lazimin, û niha jî ew tiştên ku we bi destê Êpopradîtos minra şandine, min qebûl kirine û besî minin. [Ew] dayîna we bêhneke xweş e, hemîya qebûl û li Xwedê xweş e. Û Xwedêyê min wê hemû kêmasîyên we pê wê xizna xweye rûmete ji Mesîh Îsa [hetanî dawîyê] tijî bike" (Fîlîpî 4:18,19, AMP).

Sozê derheqa wê yekêda, wekî Xwedê wê hemû tiştî anegorî hebûna Xwe bide, bona hevalkarên qulixdarîyên cuda-cuda ye. Eger

hûn yek dehanîyê didin û hevkarekî qulixdarîkêne, hûn dikarin li ser vî sozî bên hîmdanînê: hûnê tu cara nava feqîrîyêda nîbin.

## Çendbarekirin bi rîya duakirinê

Bona çendbarekirina cedandinên xwe mecalek jî duakirin e. Mînanî mecalên meye matêrîyalî, wextê ku em didine qulixdarîyên cuda-cuda, em dikarin hukumê heta-hetayê nava jîyana gelek merivada bihêlin, kîjana emê tenê li ezmîn bibînin. Ewê wî çaxî biqewime, wextê ku em bona meriva, malbeta, civîna, bajara, mileta dua bikin. Em jî dikarin nêzîkî meriva bibin, wextê ku em bona qulixên wana dua bikin. Hevkarên qulixa meye him fînansî û him jî duakirinê hene. Hevkarê duakirinê ew merive, yê ku hildide ser xwe, ku her roj bona qulixdarîya “Mêsîncêr întêrnêyşinil”-ê dua bike.

Meriv gelek cara nêzîkî min dibin û dibêjin: “Ez her roj bona we dua dikim”. Ez dibînim, ku ew helekarîyê dikin, yan jî bêqelpin. Ez dibêjime wan meriva, yên ku bi rastî dua dikin: “Duayê we tiştê herî mezin e, yê ku hûn dikarin bona alîkirina me bikin”, û ew yek rast e. Wextê ku meriv dua dikin, hukumê qulixê diha bela dibe û dighîje gelek meriva. Xêncî wê yekê, bi rîya duakirinê, Xwedê dilên meriva ji cî dileqîne bona ku ew bo karê Wî pêşkêşa bidin. Dêmek, eger ez mecbûr bûma, ku ji navbera hevalkarê duakirinê û hevalkarê fînansîda bibijarta, minê yê ewlin bibijarta. Qerez, herdu jî lazimin.

## Çendbarekirina bi rîya qulixkirinê

Mecaleke çendbarekirina cedandinên me jî qulixkirina bona qulixdarîyên cuda ye. Nava teşkîleta meda gelek alîkar û xebatkar hene, kîjanara Lîza û ez her dem dibêjin, wekî li ber textê Dîwanê jîyana her merivekî wê li ser wan bê nivîsarê, yê ku qulixdarîya me dighîjê.

Ez derheqa wê yekêda ji gotinên Dawid zanim, wextê ku ewî gote hemû leşkerên xweye ji şêr paşdavegeryayî. Nava serê sîyîda yê A Padişatîda nivîsar e, wekî Dawid peyî wan çû û ew hemû tişt paşda vegerandin, çi ku ji Îsraêlê hatibû dizînê. Wextê ku Dawid û

merivên wî paşda vegerîyane cîhê xwe, çend leşkerên ku tev Dawid çûbûn, nedixwestin tiştên anî wanara nîvî bikirana, yên ku mabûne li wir, ku hebûn xweyî bikirana. Feqet bersiva Dawid guhdar bikin:

> ““Em weke hev pareve dikin, him bona wana, yên ku çûne şêr û bona wana, yên ku hebûna me xweyî kirine”. Ji wî çaxîda Dawid bona temamîya Îsraêlê ew yek kire qanûn û hetanî roja îroyîn meriv li peyî wî diçin” (A Padişatî 30:24,25, NLT).

Dawid şikilê Mesîhî sîmvolîk bû. Dêmek, eger nivîsar e: “Ji wî çaxîda Dawid bona temamîya Îsraêlê ew yek kire qanûn û meriv hetanî roja îroyîn li peyî wî diçin”, usa ye ev prînsîb hetanî roja îroyîn derheqa Îsa û civîna Wî da ye. Çi ku ji alîyê qulixdarîkêda hatîye kirinê, li ber textê Dîwanê wê tenê ser navê serkarê qulixdarîyê neyê nivîsarê, lê li ser wana wê bê nivîsarê, yên ku bi aminayî qulix kirine, qurban kirine û dua kirine, eger ew qet deşta şêrda jî nîbûne.

## Nêzîkbûn girîng e

Me îdî daye kivşê, wekî qewilekî girîngî bona stendina heqê dewsa qulixa me, nêzîkbûna me ye. Ne tenê karên me wê bêne hesabhildanê, lê menîyên piş wan jî wê bêne lênihêrandinê, yên ku bi nêzîkbûna weva çê dibin. Xwedê dibêje: “Eger hûn qayîlbin û guhdar bikin, hûnê rezê dinîyayê bixun” (Îşaya 1:19).

Ez wedekî tînime bîra xwe, wextê ku min nava jîyana xweye ruhanîda kêmasî texmîn dikir. Tê bêjî min ji qulixdarîyên civîna me tu tişt nedistend, xwezima ji terîfên serwêrê min. Li cem min nûbûn tunebûn.

Ez li civîna heyşt hezar merivê dixebitîm û min serwêrra h’esab dida, lê min destpê kiribû wî rexne bikim. Rojekê, şebeqê, Xwedê minra got: “Pirsgirêk ne nava serwêrda ye, lê nava teda ye”.

Ez zendegirtî mambûm. “Pirsgirêka min kîjan e?”,– min pirsî.

Xudan ji min pirsî, ku nava Îşaya 1:19-da çi nivîsar e. Min xebera li dor raberkirî got, çawa ku dihate bîra min, û Ewî xeberdan berdewam kir: “Awa ev e pirsgirêk. Tu her dem dibêjî, wekî nayêyî têrkirinê, û ew yek rast e, çimkî tu rezê dinîyayê naxwî.

Ez ber gilîyê Wî da hatim: “Ez milûkim. Ez wî hemû tiştî dikim, çi ku serwêr minra dibêje”.

Xudan got: “Min negot, wekî eger tu milûkbî, tê rezê dinîyayê bixwî, min got, eger tu qayîl û milûk bî”. Ewî serda zêde kir: “Milûktî karên teva girêdayî ye, lê *qayîlî* nêzîkbûna teva. Lê ji nêzîkbûna te bêhna xirab tê”.

Xudan nîşan dida, wekî ez milûk bûm û ji dûrva jî cûrê min usa dihate kivşê, lê min rexne dikir, bin pozê xweda digot û gunehkar dikir: nêzîkbûna min hukumî li ser menîyên qulixa min dikir.

Min carekêra tobe kir û wextê qulixa bi sirê Ezman vebû. Min dîsa ji Xwedê distend. Wextê ku serwêrê min terîf dikir, ji çavên min hêsir dikişîyan. Ez difikirîm, ku bi meha ser hev min çiqas tişt tê berdabûn û ew jî rûyê nêzîkbûna minda. Piştî wedekî kurt bona min ev xeberên Pawlos zelal bûn, yên ji Ruhê Pîroz ruhdarbûyî: “Çimkî ev bû meremê nivîsara min, ku nêzîkbûna we bicêribînim û bighînim, ku gelo hûnê wê cêribandinêda teyax bikin, milûkbin û nava hemû tiştîda yekbûyîbin [nava qedandina t’emîyên minda]?” (B Korintî 2:9, AMP).

Min fem kir, wekî Xwedêyê bicêribîne lê binhêre ku em çi cûreyî nêzîkî qirara Wî dibin. Ez derheqa wê yekêda nabêjim, wekî gerekê em êrîşên mîrêcin qebûl bikin, çimkî Îsa baha daye, ku ji wan yeka xilaz bike. Em gerekê her dem bi rîya bawarîyê, duakirinê û gotina Xebera Xwedê dijî dijmin derbikevin. Ez derheqa wê yekêda dibêjim, ku em çawa nêzîkî wê rê dibin, ya ku Xwedê bona me bijartiye. Pawlos derheqa wê yekêda dinivîse: “Nêzîkbûna we gerekê eynî wî cûreyîbe, çawa ya Mesîh Îsa bû” (Fîlîpî 2:5, NLT). Îsa ne tenê ji wê fîncanê vexwer, ya ku Xwedê bona Wî çêkiribû, lê bi razîbûn ew yek kir. Awa bona çi Pawlos temîyê dide: “...û bi ruh û fikirên xweda nûyejîyîn bin [nêzîkbûna bi fikirê û ruhanîye teze]” (Efesî 4:23, AMP).

Em gerekê vî cûreyî bikin, çimkî nêzîkbûna me wê hukumî li ser menîyên me bike, lê li ser textê Dîwanê emê ne tenê bona karên xwe heq bistînin, lê usa jî bona menîyên li piş wan veşartî. Em careke mayîn xeberên Pawlos bixwînin:

> “Çimkî gerekê em hemû jî li ber dîwana Mesîh bisekinin û bêne kivşê, çawa ku em hene, wekî her kes weke wan emelên qalibê

> xweda kirî [heqê xwe] bistîne, çi ku kiribe, qencî yan xirabî [bi hesabhildana meremên wî û menîyên wî, ku çi destanînên wî hebûne, çiva mijûl bûye, xwe pêşkêşî çi karî kirîye û guhdarîya wî]" (B Korintî 5:10, AMP).

Ez xemgîn dibim, wextê ku dibînim meriv bi talayê qulixî Xwedê dikin. Merivên wî cûreyî êdî jîyanê ji alîyê heta-hetayêda nanihêrin. Ew dîsa qulix dikin, lê diwestin, hevsûdîyê dikin û dibine xwehiz. Geleka bi hizkirin destpê kirine, lê bi açixyê ser hevda neanîne. Nêzîkbûna wî cûreyî û usa jî menîyên wî cûreyî bûne menîya ketina gelek meriva. Awa bo wê yekê Xebera Xwedê eşaretîyê dide me: " Ha ji xwe hebin, nebe ku ji we yek destê xwe ji kerema Xwedê bike û nebe ku yek nava weda bibe rawekî tal, tengasîyê bide û *geleka* jehrdadayî bike" (Îbranî 12:15).

Guhdarîyê bidine ser, wekî anegorî vê xeberê gelek dikarin bên jehrdadayîkirinê. Min gelek cara ev tişt dîtine, nava van 30-î salên qulixa xweda. Tercima Încîlêye "Êmplîfayd"-ê bi vê xeberê mera dibêje, ku em "dûrdîtîbin û fesal peyî hev herin". Em gerekê bi hevra nava heleqetîyadabin, ku ev talayî nikaribe nava meda hêlînê dayne, çimkî em naxwezin, wekî hizkirîyên me biteribin, yan jî rûyê nêzîkbûnekêda heqê xweyî tam nestînin, ya ku koka xwe dilê wanda avîtibû û usa jî nehatibû dûrxistinê.

Nava vê pirsêda jina min û ez hindava çar zarokên me û xebatkarên meda gelekî guhdarin. Em bona rêwîtîya bi wedê tam hatine gazîkirinê û zarokê mera kerem hatîye dayînê, ku cûruê jîyana mera qayîlbin. Feqet, em naxwezin, wekî ew wê keremê unda bikin. Em dibêjine wana, ber dilên wanda tên, ku nêzîkbûna rast nîşan bidin û qewatbin.

Tê bîra min, wekî carekê, wextê ku ez tevî çar kurên xwe rûniştî bûm, min gote wana:

– Lawikno hûn baş zanin, wekî pir'anîya mehê ez li malê nînim, dayîka we jî nava mehêda çend roja malda nîne. Menî ew e, wekî Xwedê navê usa daye me. Ewî qirar kirîye, wekî em gerekê wî cûreyî nêzîkî meriva bibin bona rûmeta Wî, û padişatîya Wî çê bikin.

Min xeberdana xwe berdewam kir:

– Hûn dikarin ev banga Xwedêye nava jîyana meda bi du cûra lê binihêrin. Hûn dikarin bifikirin, wekî hûn bêyî dê û bavê xwe dimînin û jîyana waye malbetêye sade tune. Yan jî hûn dikarin vê yekê çawa qulixa *xwe*, lê ne tenê ya dê û bavê xwe lê binhêrin. Eva bi wê fikirê qulixa we ye, wekî hûn dê û bavê xwe diçînin û wana dighînin ku bighîjine bi hezara meriva, bona mîyaserkirina meremên Xwedêye nava jîyana wanda. Eger li cem we nêzîkbûna vî cûreyî hebe, hûnê li ber dîwana Mesîh bona her merivekî heq bistînin, nava jîyana kîjanîda me hukum hiştiye. Eger hûn bifikirin, wekî tiştekî unda dikin, wî çaxî hûnê bona wan meriva heq nestînin, yên ku nêzîkî qulixa me dibin. Dêmek, lawikno, gotina min meriv bi xeberekê, bi xebera *nêzîkbûn* dikare bide tomerîkirinê.

Kurên min gotinên min qebûl kirin: nava feydayê kîjanêda ew tu cara rûyê rêwîtîyên meda xemgîn nedibûn. Bi rastî gelek cara wextê ku ez û Lîza bona qebûlkirina teglîfkirinekê dudilî bûn, kurên me piştgirî didane me, ku em qayîl bûna. Heleqetîyên meye tevî wana cuda ne. Ji wana her yek Xwedê hiz dike û hemû nava qulixa meda tevî me qulix dikin. Şikir ji Xwedê bona kerema Wî, kurên me ji zarotîya xweda kirên xwe çendbare dikin.

Ez wê yekê usa jî xebatkarên mera dibêjim:

– Hûn dikarin hesab bikin, ku hûn li vir dixebitin: wî çaxî hûnê axirîyê biwestin û acizbin û hûnê li ber dîwana Mesîh heq nestînin. Lê hûn dikarin bifikirin, wekî hûn hatine bijartinê bona gihîştina jîanên mîlîyona meriva. Her kitêbek, kîjanê hûn bi postê distînin, her nameke êlêktronî, kîjanê hûn alî dikin bersivê bidin, her merivek, alîkarîya kîjanî hûn bi torên sosîyalî dikin, her berevbûnek, ya ku hûn teşkîl dikin, û her karekî mayîn, ku hûn dikin, we dikine nava wê para şuxulkarîyêye girîng, ya ku Xwedê bi rîya qulixdarîyê mîyaser dike. Hûn li ser wan meriva hukum dihêlin, kîjana Xwedê qirar kirîye bi rîya qulixê nêzîkî Xwe bike. Hûn mînanî leşkerên Dawidin, yên ku mabûn ku hebûn xweyî bikirana".

Ew vê rastîyê qebûl dikin û nêzîkbûna rast li cem wan heye. Çawa rêber, ez gerekê xeberên jîyanê bêjim, yên ku wê alî bikin, ku vê nêzîkbûnê xweyî bikin, nenihêrî wê yekê, wekî her merivek bona nêzîkbûna xwe cabdar e.

Heyîna nêzîkbûna rast alî me dike, ku em kirên xwe çendbare bikin û şuxulkarîya xwe bi açixî ser hevda bînin. Xwedê mala Xwe çê dike: gelo bûyîna hevkarê Wî tiştekî çawa mezin e! Dêmek ew yek girîng nîne, ku li ber çavên we karê we biçûk e: bîr bînin, wekî her parçekî biçûk gelekî girîng e. Hûn wê yekê dibijêrin, ku gerekê kardarbin, yan kardar nîbin. Gumana min jî bona we wî cûreyî ye, çawa ku ya Yûhennayê şandî ye: “Hûn ha ji xwe hebin, wekî hûn keda xwe unda nekin, lê heqê xwe tam bistînin” (B Yûhenna 8).

SERÊ 14-A

# HUKUMÊ ŞEXSÎ

*"Lê tu zanî… ku ez çawa dijîm, û kîjan e meremê jîyana min. Tu bawarîya min zanî û zanî ku çiqas wext ez çerçirîme. Tu hizkirin û sebira min zanî"*
— B Tîmotêyo 3:10, NLT

Nava heta-hetayêda emê usa jî rûyê wê yekêda heq bistînin yan jî zyanêkevin, ku me hukumekî çawa nava jîyana merivada hiştîye. Ev yek ne tenê derheqa qulixa medane, lê usa jî derheqa jîyana şexsîdane (ya ku dîsa girîng e/: dêmek ew yekê bê qîmetkirinê, ku em çawa jîyane û çi cûreyî nêzîkî meriva bûne.

Ew yek, ku em çawa meriva dinihêrin, nêzîkbûna me yan bi cûrê çêkirinê, yan jî bi cûrê xirabkirinê, hindava wanada çê dike. Eger em hesab bikin, wekî yên mayîn ji me nimiztirin, emê wî cûreyî jî nêzîkî wanbin. Emê hewcetîyên wan hesab hilnedin û wanra mezin-mezin xeberdin. Eger em meriva qîmet bikin, emê bicedînin çê bikin û wana qewat bikin, bi hesabhildana rehmê û hizkirinê.

Eger em meriva çawa mecalekê binhêrin, emê wana bidine xebatê, xwezima (bi taybetî/ wî çaxî, eger em xiyalên xwe, hewcetî û xwestinên xwe diha zêde qîmet bikin, ne ku yên wan. Eger em meriva çawa bi şikilê Xwedêva çêkirî binihêrin, yên ku bêhesab bihane û qîmetlûne, menîya me wê bibe dukirina wana, eger ew yek kîsî mebe jî. Ev yek tê hesabê pergala mînanî mesîhîtîyê.

## Qewînbûnên xwehizîyê

Hetanî naskirina Îsa ez şexsekî gelekî xwehiz bûm. Sala 1979-a, piştî vegera min, Ruhê Pîroz mecbûr bû êrîşê bîne li ser qewînbûnên mine xwehizîyê. Dehsalîya mine ewline nava Mesîh da wedê şerkarîyên qewîn bûn.

Qewînbûneke jîyana min jî xwestina bedenî bû. Min nikaribû li ber hijmekarîya pornografîyayê dijî derketama. Nava feydayê

rojîyên çilrojeda ez aza bûm. Ew yek sala 1985-a qewimî, piştî şerkarîya şeş sala. Peyî azabûnêra çêkirina fikira min destpê bû.

Nava çend salên mayînda min koka wê xwestinê eyan kir. Hizkirina Xwedê her dem dilê minda zêde dibû û min destpê dikir meriva diha baş qîmet bikim. Min fem kir, wekî nava bingeha xeysetê berêda xwehizîya li ser dereca bilind bû. Temaşekirina pornografîyayê, yan nihêrandina li ser jinaye bi xwestina mezin, dide kivşê ku tu wana bêqedir dikî û çawa ku tu nêzîkî parçekî goşt bibî. Nava wededa, nava minda hindava tiştên wî cûreyîda medelihevketin pêşda hat.

Nava minda destpê kir eyantîya derheqa wê yekêda diha zêde îzbat bibe, wekî jin bi şikilê Xwedê hatine çêkirinê û ew jî bi rûmet û qedir îzbat bûne. Min zûva ev rastî zanibû, lê eva zanebûna fikirê bû, lê ne ku çawa beşeke heyîna min. Nava wededa min eyan kir, wekî çiqas tiştekî rast e, wextê ku Xwedê destpê dike te biguhêre. Dema ku li ber min şikilên pornografîk li ser afîşa, kovara, yan jî êkranên têlêvîzyona dihatine kivşê, min texmîn dikir, wekî ew yek êrîşa dijî min bû. Ez gelekî hêrs diketim, wekî ew şexsê, bona kîjanî Îsa xwîna Xwe rêt, hetanî parçê goşt hatîye nuxsankirinê. Nêzîkbûna mine hindava jina hate guhartinê, wextê ku nava minda ev eyantî zêde bû.

Ez bi wê yekêva zendegirtîme, ku mêr çawa nêzîkî jina dibin, heta hinek mêrên civînê jî. Ew wana çawa tiştê bêqîmet, kêm grîng, hesab dikin, û carna jî bendî tu tiştî hesab nakin. Ev yek bêaqilîye. Mêr û jin peyîhatîyên padişatîya Xwedêye wekehevin, û çawa qalibên diha qewat, mêr gerekê qedirê jina diha zêde bigrin, ne ku yên xwe. Mêr gerekê qedirê jina bigrin, qîmet bikin, biparêzin û her car bicedînin wana bilind bikin. Mêr û jin, hûn rêberên yekîtîya xwene, lê rêberîya nava padişatîya Xwedêda dide kivşê, wekî hûn bi rîya qulixkirinê, jîyana xwe bona malbeta xwe datînin. Ew yek nade kivşê, wekî hûn gerekê serwêrîyê li jin û zarokên xwe bikin. Eger hûn hesab dikin, wekî rêberî serwêrtî ye, wî çaxî nêzîkbûna we wê ewê yekê xirab bike, lê ne ku jîyana wê çê bike. Û hûnê wextê dîwanê bona wê yekê hesab bidin.

## Xwestina qebûlbûnê

Tiştekî xwehizîyêyî mayîn jî, yê ku Xwedê nava minda eşkere kir, hê zêde tiştê xapînok bû. Nîveka salên 1980-yî ez li cîvnekê dixebitîm, teşkîla xebatkaraye kîjanê dighîşte nêzîkî çarsid merivî, lê endamên wê ji heyşt hezara zêdetir bûn. Hukumê wê civînê li ser bi hezara civînên welatê me hebû.

Wî çaxî min tu cûrekî pevçûyînên rû bi rû qebûl nedikirin, û bi her awayî ez ji wê yekê direvîm. Ez hindava hemûyada gelekî qenc û terbe bûm. Her dem min xeberên qenc digotine meriva, heta ku min zanibû, wekî gotina min rast jî nîbû. Meriva hesab dikir, ku ez nava teşkîla xebatkarên civînêda xebatkarê herî baş bûm. Min carcarna derheqa wê yekêda ji meriva dibhîst û wê yekê razîbûneke mezin dida min.

Carekê nava duakirinêda Xwedê ji min pirsî: "Nava A Korintî 13-da Min li kîderê tera gotîye, wekî hizkirin tiştekî baş e?".

Min nişkêva bersiva Wî da: "Li tu cîhî Te negotîye".

Xwedê gote min: "Kurê min, tu zanî, wekî tu bona çi tenê tiştên baş dibêjî meriva, wextê ku ew yek wî çaxî nerast e".

"Na, ez derheqa wê yekêda nefikirîme",– min gotê.

Ewî carekêra gote min: "Tu ditirsî, wekî ewê te înkar bikin. Hizkirina te berbi kê ye, berbi te, yan berbi wana? Eger tu bi rastî meriva hiz bikî, tê rastîyê bêjî wan, nenihêrî wê yekê, ku tê li wana xweş bêyî yan na. Tê bona halê wan xemgînbî, ku alî wana bikî, hema bi wê menîyê jî, eger ew te înkar bikin".

Min xwehizîya xwe zelal dît, ya ku bin terbyetdarîyêda hatibû veşartinê: ew rastîya bi êş bona min vebû. Min meriv didane xebatê, bona ku min hewcetîya xweye bona qebûlbûnê tijî bikira. Min alîkirina meriva girîng hesab nedikir, awqasî min dixwest ku ez ji alîyê wanda qebûlkirî bûma.

Ev e menî, wekî gelek qulixçî tenê alîyê Xebera Xwedêye "baş" terîf dikin. Ew ji eşaretîdayînê, rastkirinê û dijîderketinê direvin. Ew difikirin, wekî bi wê yekê ewê endamên civînê bidine xeyîdandinê, û nava encamê wê yekêda reqema endamên civînê wê kêm bibe, lê bi rastî ew olên xwe hiz nakin.

Merkeza hizkirina wî cûreyîda kî ye, yên mayîn, yan “ez”? Eger me bidîta, wekî yekî çavê xwe girêdaye û beribi kevîya zinar diçe, gelo meyê nekira gazî, ku me ew ji qezîyayê xilaz bikira? Qerez, min bihîstîye, ku “ji wan qulixçîyên ku hiz dikin” hinek çi dibêjin, wextê ku merivên başqe wana nabînin: derheqa wê yekêda ku ew çawa derheqa merivada xeber didin, nava wanda tevhevbûn çê dibe. Ew wî cûrey nêzîkî xebatkara, yên govekên cûre-cûre, dibin, tê bêjî ew welatîyên dereca dudane. Gelo bawarmendên wî cûreyî hukumê çawa li ser meriva dihêlin, wextê ku tu kes tu tiştî nabîne. Ewê bona wî hukumî hesab bidin, yê ku wana li ser meriva hiştîye, tevî kîjana ew nava heleqetîyada bûne.

## Ji milahîmtîyê berbi berkbûnê

Wextê ku min ev eyantî stend, giranî tê bêjî derbazî alîyê miqabil bû. Ez bûme terîfkirekî berk. Dilê minda hela hê hizkirina Xwedê tune bû. Ez diha gelekî derheqa rastbûnêda difikirîm, ne ku derheqa xweşhalîya merivaye heta-hetayêda. Carna, ew civînên ku min li wir terîf dikir, rûyê minda diketine nava halekî xirab. Ez hela hê li ser “ez”-ê xwe merkezbûyî bûm, lê xwehizîya min cûrekî mayîn dihate kivşê. Ew yek hema mesela klasîk, ya beşa nivîsarên pîroz bû: “Hûn difikirin, wekî hemû kes gerekê zanebûna weye kamilra qayîlbe. Nenihêrî wê yekê, wekî em dikarin bi saya zanebûnê xwe girîng texmîn bikin, lê hizkirin e ku bi rastî civînê çê dike” (A Korintî 8:1,2, NLT).

Ez roja îroyîn vedigerim û paşda li ser salên xweye qulixêye pêşda dinihêrim û rûyê wê yekêda xwe nava halekî usa bêfesalda texmîn dikim, wekî hinek serwêr mecbûr dibûn, piştî çûyîna min, li civîna hal bidana rastkirinê. Eger ez wî çaxî serwêr bûma, minê tu cara Con Bîvêr bona qulixkirina li civîna xwe dewat nekira. Ez ji wan rêbera usa razîme, yên ku didîtin, ku nava minda xwestina qulixkirina bêqelpe bona Xwedê û cimeta Wî hebû, lê hela hê hewcetîya gihîştina ruhanî jî hebû.

Min îdî lefekî nedikirin, ku min begemîya meriva bistenda û ji înkarbûnê dûrketama. Min rastî digot û dijî meriva derdiketim, lê dîsa bi wan menîyên xwehizîyê, min ew yek dikir, yên ku hela hê ji min veşartî bûn, ji kîjana Xwedê ez paqij dikirim.

Piştî çend sala serwêrekî eyan li ber rêberên hukumdar ez gelekî rexne kirim. Xeberên wî ji sê parçên dinîyayêye cuda-cuda gihîştine min. Pêşda ez gelekî hêrs ketim û gumanbir bûm, lê min zanibû, wekî xeydê tenê min ji Xwedê dûrbixista. Êşa wî merivî li ser min bû, ya ku ez mecbûr kirim ku ez gazî Xwedê bikim, hizkirina Wî usa hîvî bikim, wekî pêşda min usa hîvî nekiribû. Min bi kel û ced hîvî ji Xwedê dikir, ku Ew diha gelekî dilrehmî bida min. Bêyî femkirina min, Xwedê nava wededa dilê minda hizkirina Xweye hindava cimeta Xwe mezin kir.

Nava vî wedeyîda Xudan eyantîk da min, ya ku qulixa min guhart. Diqewime hûn bifikirin, wekî hûnê niha tiştekî gelekî kûr bibhên, lê na, ew gelekî zelal e. Diqewime hûn usa jî bifikirin, wekî eva çawa tiştekî gelekî sivik tê bihîstinê, hetanî ku hûn dora wê bifikirin. Ew eyantî ev e: “Kevçîk şekir alî dike derman vexun”. Min fem kir, wekî hukumê derman sist (zeyîf) nabe, wextê ku şîrinayê serda zêde dikin. Meriv derman diha hêsa dixun yan vedixun û çawa qanûn ew carna jî li mêriv xweş tê.

Roja îroyîn gelek rêber dibêjine min: “Con ez zendegirtî dimînim, ku te çawa em hemû nava wî wedeyîda dane kenandinê, wextê ku Xebera Xwedê dilê me paqij dikir. Te dora wê têmayê hemû ruhdar kirin”. Gava ku min cara ewlin xeberên usa bihîstin, min fem kir, ku ez bi kerema Xwedê dighîjim. Ez gelekî ji Wî razîme!.

Bi texmîn, ew serwêrê, ku ez li ber rêbera rexne kirim, nedixwest li min dua bikira, lê ew nava jîyana minda bû dukirineke here mezin. Hûn gerekê bîr bînin, wekî carna Xwedêyê meremên merivaye xirab bide xebatê, bona ku em bikevine nava qirara Wî. Ewî xayîntîya Cihûda da xebatê, bona ku xaçkirina Îsa mîyaser bûya, ya ku pêşda bona Wî hatibû qirarkirinê. Ewî meremên birayên Ûsive xirab dane xebatê, bona ku xewina wî mîyaser bûya, ya ku dabû wî û gelek tiştên başqe.

## Armanc hizkirina Xwedê ye

Bi tomerî hildayî pirs ew e, ku em meriva çawa dibînin. Eger em îzinê bidin, ku hizkirina Xwedê û dilrehmî nava jîyana meda zêdebin, emê meriva bêhurmet nekin. Eger em hesab bikin, wekî yên mayîn ji me nimiztirin, emê wana rexne bikin, gunekar bikin,

hindava wanda hişkbin û tiştên mayîn. Niha bixwînin, ku Pawlos bawarmendên r'omayîra çi dinivîse:

> "Tu çima birayên xwe rexne dikî û loma lê dikî? Yan jî bona çi tu ji jorda birayê xwe dinihêrî û wî bêhurmet dikî? Çimkî em hemûyê jî li ber dîwana Xwedê bisekinin…Dêmek, ji me her kes gerekê bona xwe hesab bide (bona lomekirina emê cabê bidin) Xwedê" (Romayî 14:10, AMP).

Eger bawarmend guhdarîyê nedine ser temîya dudaye mezin, ya ku hevhizkirin e, emê bikevine wê telê, derheqa kîjanêda Pawlos dinivîse, ya ku me li jorê anî ber çava, û emê destpê bikin meriva bêhurmet bikin. Fikirdarîya vî cûreyî anegorî wan meriva ye, yên ku zanebûnên Încîlê stendine, lê li cem wan berê ewlin Ruhê Pîroz tune.

Încîl li me eyan dike, wekî Xwedê hizkirin e. Tişekî girîng e bidine kivşê, wekî hizkirin Xwedê nîne. Nava van her du gotinada firqîya mezin heye. Şexsê Xwedê, rê û fikir bi wê yekêva nayêne sînorkirinê ku em çawa hizkirinê şirove dikin, çimkî tu kes hizkirinê nas nake heta ewî Îsa nas nekirîye. Ew e heyîna hizkirina rast.

Usa jî tu Încîlekêda nivîsar nîne: "Hizkirina Xwedê heye". Qewata Wî, pêşkêş, serwêrî û gelek tiştên Wîye mayîn hene, lê Îsa heyîna hizkirinêye rast e. Eger usa ye, em jî gerekê ji Wî cuda nebin, çimkî em careke mayîn, anegorî tebyeta Wî hatine. Awa Pawlos bona çi dinivîse:

> " Eger min bikaribûya bi her zimanekî dinîyayê, yan jî ezmîn xeber bida, lê min meriv hiz nekirana, minê tenê dengê bêfikir derxista, yê mînanî şingîna bolmên sifir, yan jî mînanî zengil bikira zingîn. Eger pêşkêşa pêxembertîyê minra hebûya û ser hemû suraa vebûma, lê meriv hiz nekirana, çi kar ji wê tê? Eger pêşkêşa bawarîyê minra hebûya, wekî min çîyara xeber bida, yan jî ew cîh biguhartana, lê hizkirin tunebûya, minê dîsa tu kar neda tu kesî. Eger hebûka xwe pêva belayî belengaza bikira, û bedena xwe jî bida der bona şewitandinê, ez dikaribûm bi wê yekê firnax bûma, lê eger min meriv hiz nekirana, qîmetê min wê tu cara tunebûya" (A Korintî 13:1-3, NLT).

Hizkirin ji xeberên me nayê. Em dikarin bêjin, wekî em derheqa kesekîda difikirin, lê karên me dikarin tiştekî lap başqe bidine kivşê. Hizkirin usa jî ji karên me nayê. Nava xebera Pawlose ku me anî ber çava, ew dibêje, wekî em dikarin tiştên usa bikin, kîjana tenê

wî çaxî dikin, wextê ku hizkirina mezin heye (belakirina hebûkê û derdayîna bedenê), lê ew yek dikare ji hizkirina Xwedê başqe bê kirinê. Em dibînin, wekî hizkirina rast ji dilê mêriv tê.

Wextê ku em hiz bikin, emê hindava merivada bi sebir û qencbin. Emê hevsûdîyê li açixîya wana nekin, çimkî emê bi dil bixwezin ku ew bighîjine serkevtina. Emê tu cara bona xwe firnax nebin û emê ji kubarîyê û firnaxbûnê dûrkevin. Emê dewê nekin, wekî hemû tişt bi xwestina me bibe. Emê rûyê bêsebirîya xweda hêrs nekevin. Emê wê yekê bîr neynin, wextê ku meriv hindava meda şaşbin, lê emê bibaxşînin û hemû deyna berdin. Emê tu cara bi dîtina neheqîyê nekevin, lê emê berbi rehmê û rastîyê bicedînin. Emê tu cara ji tu kesî paşda nesekinin û bawarîya xweye hindava merivada unda nekin, lê emê her dem bona tiştê baş bawarîya xwe li wan bînin. Emê her dem meriva bêsûc hesab bikin wî çaxî, eger neheqîya wan nehatîye kivşkirinê, arzurukirinê û eger eyanbe, wekî ew neheqin, gumana wan wê hebe, wekî wê tobe bikin û wê bên dasekinandinê. Emê bi wê gumanêva tijîbûyîbin û nava her tengasîkêda teyax bikin, boy padişatîya Xwedê, yan jî pêşdaçûyîna merivekî mayîn. Bi gilîkî, meremê jîyana me wê bibe çêkirina merivaye nava Xwedêda, ya ku tenê wî çaxî dikare bibe, eger ew mînanî Mesîhbin û qirara Wî nava jîyana xweda mîyaser bikin.

## Rêberê ku li ser geleka hukum hişt

Çend sal pêşda ez tevî heytehola şîna hevalekî xweyî nêzîk bûm. Navê wî Cêk Wolês bû. Ewî li bajarê ştata Mîçîganêyî Dêtroytê civîna bi navê “Mizgîndarîya Dêtroytêye hemdinîyayê” hîm danîbû. Ev civîn, endamên kîjanê ji miletên cûre- cûre bûn, nava deh salada gihîştibû çar hezara. Cêk diçû Zîmbabvê, bona ku wextê berevbûneke Mizgîndarîyê terîf bikira, lê piştî peyabûna ji teyarê li cem wî krîzîsa dil pêşda hat û ew wefatbûyî ket.

Bi hezara meriv, wextê şîna wî hazir bûn, Serkarên qulixdarîyên temamîya Ştatên Yekbûyî, nevsên dewletêye resmî, cîgirên serkarên hevaltîyên mezin, usa jî gelek xebatkarêd sade, merivên bêmal, dayîkên ku bi alîkarîya dewletê dijîn. Ew meriv nava dorana hukumê civîna wîda bûn. Gelek meriv jî, yên ku Îsa çawa Xudan nas nedikirin, dîsa tevî şîna wî bûn. Diketine nava wan endamên

admînîstrasîyayên mêvanxana û rêstorana û merivên başqeye li wî bajarî, nava jîyana kîjanada ewî hukum hitibû.

Hazirîya merivên ku ne ji civîna Cêk bûn, ez ecêbmayî nehimtim. Ez û Cêk gelek cara, tevayî ji civînê der, me wede derbaz kirîye û ez awqasî bi wê yekêva dukirîbûm, wekî ew çawa nêzîkî meriva dibû. Ew usa nêzîkî her kesî dibû, çawa meriv nêzîkî şexsekî qîmetlû û bihabe. Ewî xebatkarên rêstorana û mêvanxanara pare dihiştin. Ez carna hinekî dudilî dibûm û difikirîm, wekî diqewime ew yek tiştekî zêdekirîbû, lê ew fikirdarîya bêaqil carekê hate rastkirinê, wextê ku Cêk gote min, wekî ew meriv bona Xwedê çiqasî qîmetlû û biha bûn. Wextê ku hûn tevî Cêk bûn, ewî tu cara wera nedigot, wekî hûn merivê herî girîngin: lê bi rastî, hûn bona wî merivê herî girîng bûn. Heytehola şînê çar sehet û nîv kişand. Ji gelek heval û qulixçîyên wî hîvî kirin, ku ew bi çend deqa bi fikirên xweva nîvîbin. Peyî wê yekêra, wextê ku ji me çar yan pênc meriva derheqa wê yekêda xeberdan, ku bi çiqasîva Cêkra nêzîk bûne û ew bona me çiqas biha ye, qulixçîkî eyan sekinî û got: “Ez difikirîm, wekî ez bûm hevalê wîyî herî baş”. Hemû kenîyan.

Me hemûya jî zanibû, wekî Cêk hesab dikir, ku ji me her yek hevalê wîyî herî nêzîk bû û ew wî cûreyî jî nêzîkî me dibû. Ew rêberê mezin ne tenê li ser mileta bi berevbûnên xweye Mizgîndarîyê û programên têlêvîzyonê hukum hiþt, lê usa jî li ser wan meriva hukum hişt, kîjanara ew nava heleqetîyada bû. Bona wî girîng nîbû, ku hûn serkarê hevaltîke mezinin, yan alîkarîya dewletê distînin. Cêk zanibû çawa wera xeberbida û çawa we çawa meriv hiz bikira. Cêk ne tenê nava nav û pêşkêşên xweda amin bû, lê pêra jî hemû kirinên xwe nava hemû govekên jîyanêda çendbare dikirin.

## Qerewilê ku hukum li ser geleka hişt

Hûnê tu cara hinek meriva li piş dikê nebînin, yêun ku hukumekî mezin nava jîyana minda hiştine. Ji wan miriva yek jî Mayk e, yê ku li hevaltîya “Rokvêl întêrnêyşinil”-ê xebatkarê beşa fînansî bû. Du sal pêşîya qebûlkirina mesîhîtîyê, min nasîya xwe da wî. Li cîhê xebatê, cîhên rûniştandina me nêzîkî hev bûn, û me

wextê navbirîya xebatê, yan jî dema xwerinê, derheqa Xwedêda qise dikir. Paşê me destpê kir bi seheta yan li mala min, yan jî li mala wî, usa jî li civînê bi hevra xeberdin. Bêqelpîya Mayk û serwaxtîya wîye praktîke li ser hîmê xebera Xwedê hukumekî mezin nava jîyana minda hiştin. Ez jî bi wê yekêva hijmekar mabûm, ku ewî çawa qedirê jina xwe, zarokên xwe digirt û hiz dikir û usa jî qedirê wan meriva digirt, rastî kîjana ew dihat.

Ez ji “Rokvêlê” dûr ketim û bûme qulixçî. Piştî wedekî kurt Mayk jî ji xebatê dûr ket û hevaltîya xweye hesabdarîyê vekir, ya ku hetanî roja îroyîn dixebite. Karê wî gelekî açix bû. Ewî alî ji 12 hezar merivî zêdetir kiribû, ewî ew dokûmêntên bacdayînê û yêd hesabedarîyêye mayîn dinivîsin ku meriv karê xwe mîyaser bikirana, ji kîjana pênc hezar meriv îdî bibûne mişterîyên wîye hertimî. Ewana Maykra bi salên dirêj xebitîbûn, bi saya bêqelpî û paqijîya wî.

Van axirîya min ji Mayk pirsî, ku ewî bona çend mişterîyên xwe Xebera Xwedê terîf kirîye? Ewî got:

– Con, eger em usa nerm hesabkin, ew hesab dighîje nêzîkî 90 selefî.

Usa ye ewî bona ji deh hezara zêdetir merivî terîf kirîye. Ez zendegirtî mabûm. Min xeberdana xwe berdewam kir û jê pirsî, ku ewî rêberîya çend merivaye berbi xilazbûnê kirîye? Ewî got:

– Bi seda meriva. Mesele hevtîya derbazbûyî mişterîkî min, yê ku ji Kûbayê ye, Xudan qebûl kir û min dua kir, ku ew ji nexweşîya penceşêrê qenc bûya.

Mayk usa jî alî gelek qulixdarya kirîye, ku ew hesabdarîya xwe rast çê bikin. Mayk alî qulixdarîya me jî dikir, wextê ku ew hela hê êtapa sazbûnêda bû. Ewî fem kir, wekî Xwedê gazî min kiribû û bi sala ser hev dêklarasîyayên mine bacdayînê belaş (bêyî dayîna para) hazir dikirin. Mayk nava jîyanên gelek merivada bi cûrên cuda-cuda hukum hiştîye.

Tê bîra min, wekî wextê qisên meye dirêj Mayk derheqa qerewilkîda gilî dikir, yê ku nava jîyana wîda ji hemû merivî zêdetir hukum hiştibû. Van axirîya min wîra têlêfon kir û careke mayîn derheqa wî merivîda jê pirsî. Mayk girîya û got:

– Con, ji neh xatî û xalên min, şeşa îdî jîyana xwe li nexweşxana pisîxolocîk ser hevda anîne, û dayîka min jî nava wanda. Her du kalikê min bi gulekirinê hatine kuştinê. Jîyana malbeta min navhevketî bû, û yazîya min jî wê mînanî ya wan bûya.

Qerez, rûyê dijwarîyên fînansîda dayîka min ez şandime malbeteke başqe, bona ku wana ez xweyîkirama. Ez hevt sala tevî wan meriva mam. Bavê wê malbetê li fabrîka kaxeze cî dergehvan bû. Navê wî Çarlî bû. Bêqelpî û xwepêşkêşkirina hindava Îsa û hizkirina hindava merivada ew nifira nava jîyana minda xirab kirin. Her hevtê ewî ez dibirime civînê û ez hînî rêyên Xwedê dikirim. Hukumê wî alî min kir, ku ez usa bibim çawa ku îro ez heme. Carekê, keça min tiştek nivîsîbû û sernavê wê danîbû "Merivê herî mezin, yê ku min tu cara nas nekirîye". Ew nivîsar derheqa Çarlîda bû.

Diqewime hûn tu cara derheqa Çarlîda pê nehesîyana, eger ev kitêb nîbûya. Qerez, hukumê wî berbi bi hezara meriva bela bû, bo kîjana Mayk qulix kir. Bi destî Mayk ewî usa jî li ser jîyana min hukum kir. Dêmek bi mîlyona meriv, bona kîjana ez qulix dikim, yên ku bona Xwedê hatine qazanckirinê, usa jî hukumê Çarlî navda heye. Hûn dibînin, ku dergehvanekî (qerewilekî) sade çawa hesabê xwe dane çendbarekirinê. Ewê rojekê bona wê yekê heqê mezin bistîne.

## Hukumê li ser nivşên pêşerojê

Ev yek serpêhatîke rast tînie bîra min, ya ku xebatkarekî me bona min van axirîya xwend. Ew derheqa atêîstekîda bû, navê kîjanî Maks Cûks bû û usa jî derheqa merivekî xwedêxofda bû, navê kîjanî Conatan Êdvards bû. Awa ew serhatî:

> "Maks Cûks atêîst bû û merivekî neheq bû. Ewî keçeke neheq stend. Nava encamê yektîya wanda merivên ku hatine dinîyayê, 310 meriv çawa parsekçî mirin, 150-î çawa xirabkar, hevt jî çawa merivkuj, sed jî çawa îçikexur: ji nisileta wana ji nîvî zêdetir jina xwe difrotin. Ewê ştata li kîderê ew hatibû dinîyayê, mecbûr bû bi tomerî hildayî 250-î hezar dolara li ser 540 pyîhatîyên wana xerc bike.
>
> Feqet şikir ji Xwedêra, ev prînsîb dualî ye. Protokola malbeteke mayîn heye, ya ku derheqa nivşên qulixçîkî amêrîkîyî mezin

> Conatan Êdvardsda gilî dike. Jîyana wî jî hema wî çaxî bûye, wextê ku ya Maks Cûks bûye. Lê Êdvards keçeke xwedêparêz stend. 1394 meriv hatine eyankirinê, yên ku peyîhatîyên Conatan Êdvards bûne. Ji wana 13 meriv bûne serokên zanîngeha, 65 meriv bûne profêsorên zanîngeha, sê meriv bûne snatorên Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyî, 30-î bûne hakim, sed bûne hiqûqzan, 60 bûne doxtir, 75 bûne ofîsêrên leþkerên behrê û li ser erdê, dîsa sed bûne terîfkir û mîsyonêr, 60 meriv bûne xudanên nivîsaraye eyan, merivek bûye cîgirê serokê Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyî, 80 bûne nevsên dewletêye resmîye cuda-cuda, 295 meriva îdarên xwendinêye bilind demam kirine, usa jî nava wanda bûne serokên qeza û wezîrên li welatên başqe. Ewê ştata, li kîderê ew hatibû dinîyayê, qet sêntek jî li ser peyîhatîyên wî xerc nekiribû".

Eva jî mecaleke başqe ye bona çendbarekirina kirên xwe. Van merva, Çarlî, Mayk û Conatan Êdvards nava jîyanên gelek merivada hukum hiştine. Hukumê wana ji nivşekê derbazî nivşeke mayîn bûye. Qerez, ew nêzîkî gelek meriva bûne, derheqa kîjanada me ne bi qulixdarîya massayê, lê hema bi jîyana wane şexsî xeberda.

Xwedê vê mecalê dide me hemûya. Lê hûn çawa nêzîkî xebatkarê polîsîyayê dibin, hûn çawa serwêrê xwera xeber didin, hûn çawa nêzîkî zarokên xwe dibin, hûn çawa serwêrtîyê li mecalên xwe dikin, hûn çawa derheqa merivada xeber didin û tiştên mayîn, hukumê xwe li ser merivên dor- bera dihêlin. Bi vî cûreyî, hûnê jîyanên meriva çê bikin, yan hûnê bibine kevirê, ku gulor dibe?

> "Awa ji me her kesê bona xwe bersivê li ber Xwedê bide. De îdî em loma hevdu nekin, lê hûn xwera bidin ber hesaba, çawa bikin ku nig nedine li ber bira, ku nelukumin, yan pişk nebin. Awa em hindava hevda ser nêta edilayê û bawarîavakirinê bin" (Romayî 14:12,13,19).

Pawlos vê yekê raste-rast textê Dîwana Xwedêva dide girêdanê. Li wir wê bi cure hûre-hûr temamîya hukumê meyî li ser meriva bê guvtugokirinê. Eva tiştekî gelekî girîng e ku em wê bîra xweda xweyî bikin, bona ku bighîjine serkevtina, lê ne ku her dem derheqa xweda bifikirin.

Rêbêka Rûtêr Sprîngêr sedsala 19-da jîyan dikir. Pêşîya çûyîna wêye ji vê jîyanê, wêra seredana wededirêje li Ezmîn hatibû dayînê bona stendina heqê heta-hetayê. Wextê ku ew paşda vegerîya,

ewê kitêba xweye klasîk nivîsî, sernavê kîjanê “Întra Mûros”-e. Wê kitêbêda ewê xeberên merivekî xwe nivîsîbû, tevî kîjanî ewê li Ezmîn êpêce wede derbaz kiribû. Ewê dinivîsî, wekî ew meriv birê malxwê wê bû, yê ku Xudanra gelekî nêzîk bû. Wî merivî wa gotibû:

“Xwezî wextê ku em hela hê li dinîyayê bûn, me fem bikira, wekî em roj bi roj bona heta-hetayê çê dikin. Wî çaxî jîyana me wê gelek alîyava bihata guhartinê. Her xebereke milahîm, her fikreke baş, her kirineke xwepêşkêşkirinê wê jîyana pêşerojêda bibe stûna heta-hetayêye bedew”.

## Rêberkirina merivaye berbi Îsa

Hukumê herî mezin, yê ku emê nava jîyana merivada bihêlin, rêberkirina li wane berbi Mesîh e. Bi femkirina wê yekê, ku dîwanên heta-hetayê wê çi cûreyîbin, hûnê bicedînin merivara derheqa progirama xilazbûnêda gilî bikin. Nivîsar e: “Ewê ku serwaxt e, meriva berbi xwe dikişîne. [Bona Xwedê çawa masîgirê meriva: ew berev dike û distîne bona *heta-hetaya* wan]” (Gotnên Silêman 11:30, AMP).

Wextê ku bawarîya min teze destpê bibû, min li ser xwe hukumekî usa texmîn dikir, wekî ez difikirîm ku min gerekê bona wan meriva Mizgînî terîf bikira, rastî kê ez dihatim. Qerez, paşê ez hîn bûm nava wê pirsêda gumana xwe bidime ser rêberîya Ruhê Pîroz, ku kengê û çi gerekê ez bêjim. Min fem kir, wekî Îsa jî got, wekî Ew tenê wê yekê dike çi ku dibîne, çaxê Bavê Wî dike. Tevî Xwedê nava şuxulkarîya meda tiştekî usa heye, ya ku mêriv mecbûr nake, çimkî mecbûrkirin li cem meriva nerazîbûnê pêşda tîne û meriva ji me dide dûrxistinê. Qerez, xwestina rêberkirina merivaye li berbi jîyana heta-hetayê wê her dem mera be, hetanî çûyîna mala li Ezmana. Hizkirina Xwedê vê xwestinê dide gurkirinê. Wextê ku hûn rêberîya kesekî berbi Mesîh dikin, hemû milyaket, usa jî Xwedê bi Xwe, bi şabûneke bêhesab şa dibin. Îsa dibêje: “Ewên ku didrûn heqê baş distînin, û ew berê ku ew didrûn, merivin, yên ku berbi jîyana heta-hetayê hatine anînê” (Yûhenna 4:36, NLT).

Wextê hevdîtina ewlin, ya min û jina min, mecal bona min hate dayînê, ku ez rêberîya jina xwe bikim û bibime berbi Xudan. Piştî qebûlkirina Îsa hinek wede derbaz bibû, wekî min qirar kir (biryar

kir), ku hetanî Xwedê jina min neyne cem min, ezê rastî tu keçekê neyêm. Min zanibû, wekî Xwedê Hêwa anî cem Adem û ez fikirîm, wekî Ewî dikaribû ew yek bona min jî bikira.

Hetanî ez bibûma mesîhî, ez rastî gelek keçika dihatim. Piştî qebûlkirina Xudan, ez çend keçên mesîhîra pev ketim, rastî wan hatim û min fem kir, wekî wê yekê nava şuxulkarîya mine tevî Xwedê dijwarî pêşda dianîn. Her car, wextê ku min heleqetîyên xweye tevî keça bi sirê diteribandin, nava me herduada êş pêşda dihat. Piştî wedekî kurt min fem kir, wekî ew yek bona min kardar nîbû. Dêmek, min qirar kir pêşîya pevketina tevî keçekê ez duk bikim.

Wî çaxî jina min keçeke bi xeysetê sivik bû. Xwendikarekî jî gote min, wekî ew li temamîya zanîngehê keça here sivik e. Nizanim gelo ew yek bi temamî rast bû, lê tê bêjî nêzîkî rastîyê bû. Wextê ku min destpê kir rastî Lîzayê bêm, ew îdî salek bû, ku ez rastî tu keçekê nehatibûm û ew jî ji alîkîva bi wê menîyê, wekî her car, çaxê min ji Xudan dipirsî, Ewî digote min ku ez neçim. Qerez, paşê min rêberîya Ruhê Pîroz texmîn kir, wekî min gerekê Lîza dewatîî li berevbûna lêkolînkirina Încîlê bikira, û ew jî qayîl bû.

Piştî wê berevbûnê, ez û Lîza paşda vegerîyane zanîngehê û min hetanî nîvê şevê Mizgînî bona wê terîf kir. Ewê gotinên min dane teribandinê û paşê hîvî kir, ku ez rêberîya wêye berbi xilazbûnê bikim. Hinek wede peyî wê yekêra, me herduya jî zanibû, wekî zewaca me qirara Xwedê bû. Ez dikarim bi bêqelpî bêjim, wekî min bi rastî ji vê zewacê qazanc kir. Ezê nebûma wî cûreyî, çawa ku îrome, eger ew li rex min nîbûya.

Lîza jî nêzîkî bi mîlîona jîyana bûye. Ew xudana nivîsarên kardar e û şerkara dijî neheqîyê ye. Ew li gelek hemcivîna terîf dike, yên ku li temamîya dinîyayê tên derbazkirinê. Gelo wê çawa bûya, eger min mecala rêbrkirina wêye berbi Xwedê neda xebatê? Wê çawa bûya, eger ez bitirsîyama, wekî ewê qerfê xwe li min bikira, û eger min derheqa Îsada wêra gilî nekira? Ez gumanim, wekî Xwedê wê yekî mayîn bişanda. Minê bijartina Xwedêye here baş tê berda û minê ew para bona wan meriva nestenda, jîyana kîjanada ewê hukumê heta-hetayê hiştîye. Şikir ji Xwedêra bona pêşkêşên Wî!

Bîra xweda xweyî bikin, toxim wê çendbarebe, lê toxim gelekî biçûk tê texmînkirinê. Tu cara bi sivikayî nêzîkî rêberîya Ruhê Pîroz

nebin: serbara serda usa nekin k Wî hesab hilnedin. Tiştên here “biçûk”, yên ku Xwedê şandine minra, nava jîyana minda werguhêzî faktorên çendbarebûnê bûne. Xwedê dixweze, ku nava jîyana weda çendbarebûn hebe û dixweze bona wê yekê heq bide we.

## Berdildahatina dawîyê

Awqas tişt hatine danînê li ser karta lîstikê! Em nikarin bi cûrê sivik nêzîkî wî wedeyî bibin, yê ku li ser vê dinîyayê mera hatîye teslîmkirinê. Heta-hetaya meriva wê yekêva girêdayî ye, ku gelo emê gura bernama Xwedê bikin. Xwestina Wî ew e, ku hemû xilazbin û mînanî Îsabin. Ew naxweze ku kesek paşbikeve.

Nivşeke tam, piştî derketina ji Misirê, li qûmistanê unda bû. Rêberê wedeyî herî mezin ew dibirin, lê çi jî hebe, ew teribîn. Rêberên gelekî baş dikarin hebin, lê nava nivşa meda mîyaserkirina bernama Çêkirçîyê Sereke meva girêdayî ye. Ewî got: “Û ev Mizgînîya padişatyê wê li nav temamîya dinîyayêda bê dannasînkirinê, ku hemû miletara bibe şedetî û hingê xilazî wê bê” (Metta 24:14). Werin em xebata li me teslîmkirî tê bernedin: niha ye wede. Ew nêzîk bûye, û Ew li ber derê me ye. Eger em navê xwe mîyaser nekin, Xwedê wê mecbûrbe nivşên mayîn bilind bike, çawa ku nivşta Îsa bû, bona ku mala Xwe xilaz bike, çimkî Ewî îdî elam kirîye, wekî mala Wî wê tijîbûyî be.

Em para xwe, ya bernama Xwedê mîyaser dikin, wextê ku em wê yekê çendbare dikin, çi ku Ewî teslîmî me kirîye. Gumanbir nebin! Karê xwe çawa yê negirîng hesab nekin! Aktîvîya xwe unda nekin: berê xwe ji dîtina peymana ezmanaye Nû dûr nexin, ya ku nava vê kitêbêda zelal hate nîşankirinê, merivên nivşa we hîvîya wene, hinek bi gumanbirî hewcene, ku hûn Îsa li wana eyan bikin, lê yên mayîn hewcene, ku ji we piştgitrîyê û qewata Wî bistînin. Qirara weye heta-hetayêye pêşda jî hîvîya we ye. Hûnê bighîjine açixîyê, eger hûn bi temamî gumana xwe bidine ser kerema Wî. Ew amin e!

Ez berbirî we dibim çawa hemwelatîyê padişatîya Xwedê. Navê xwe mîyaser bikin û bijartina xwe îzbat bikin. Şuxulkarîya xwe bighînine hetanî dawîyê (xilazîyê). Piştî deh mîlîyon sala hûnê paşda binhêrin û hûnê şa bibin, wekî we rast kirîye. Hûn nikarin ji

çapê zêdetir xwe pêşkêşî xwestina Xwedê bikin. Dêmek, birevin ku hûn serbikevin.

Çawa piştgirîya dawîyê (xilazîyê), ez duakirineke Pawlos, ya bona temamîya pîroza raber dikim:

> "Bila Xudan zêde û diha zêde hizkirina we hindava hev û hemû merivada bighîne û hizkirina we awqasî mezin bibe, çawa ya me jî hindava weda wa ye. Bi vî cûreyî Ewê we qewat bike û hûnê nava hazirîya Xwedê û Bavê meda kamil pîrozbin, wextê ku Xudanê me Îsa tevî wan bê, yên ku yên Wî ne" (A Têsalonîkî 3:12,13, TEV).

*Nava Încîlêda gelek gotinên derheqa heqdayînên heta-hetayêda nivîsarin û ew diha gelekin, ne ku vê kitêbêda meriv dikare cîh û war bike. Hûn dikarin cêrge beşên dîwanên heta-hetayê û heqdayînaye hîmlîda bibînin, eger hûn bi vê lînkê DrivenByEternity. com/EternalRewards pêşda herin (bi zimanê înglîzî).*

# PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

## BEŞA ŞEŞA, SERÊN 13-14

1. Nava jîyanên weda govekên usa hene (diqewime ji govekên here serekebin jî), yên ku hûn hesab dikin çawa yên ne girîng, yan jî ne hewask'ar? Derheqa wanda bi fikira ezmîn bifikirin. Bona çi aminaya we ya nava van govekên ku hûn hesab dikin çawa yên ne girîng, bona Xwedê dikare girîngbe?

2. Ji me gelek meriv merivara tê bêjî dikevine nava konkûrênsîyayê, yan tên himberîhevkirinê. Nêzîkîbûna meye hindava padişatîya Xwedêda çawa tê guhartinê, wextê ku em xwe himberî yên mayîn nakin?

3. Gelo nava jîyana weda çendbarebûn heye? Gelo hûn dikarin diha baş serwêrîyê li wede, duakirina, telant û mecalên xwe bikin?

4. Destpêka vê kitêbêda me xeberên A Yûhenna 4:17 anîne ber çava, kîjanada nivîsar e, wekî em dikarin li ber dîwana Mesîh gumanbin. Hûn dikarin vê gotinê bi zanebûnên xweye nihava şirove bikin?

5. Hûn çawa dikarin merem daynine pêşîya xwe û jîyana bi kemala heta-hetayê çê bikin, hema ji nihada destpêkirî?

# ZÊDEKIRIN:
# Çawa Xilazbûnê Bistînin

*“Eger tu bi devê xwe îqrar bikî, ku Îsa Xudan e û dilê xweda bawar bikî ku Xwedê Ew ji nava mirîya rakir, tê xilazbî, çimkî bi bawarkirina dilê xweda ye, wekî tu li ber Xwedê xwe afû dikî, û bi îqrarkirina devê xwe ye, wekî xilaz dibî”.*
— Romayî 10:9,10, NLT

Xwedê dixweze, ku hûn bighîjine açixîya heta-hetayê. Ew bi dil derheqa weda difikire û dixweze, ku hûn bernama (progirama) Wî mîyaser bikin. Qerez, tenê rêyek berbi progirama jîyana weye pêşda qirarkirî heye: hûn gerekê bi destî Kurê Xwedê Îsa Mesîh xilazbûnê qebûlkin.

Bi saya mirin û rabûna Îsa, Xwedê rê çê kir ku hûn bikevine padişatîya Wî çawa Kur yan keça Wîye hizkirî. Qurbankirina Îsaye li ser xaç jîyana heta-hetayê û dewlemend pêşkêşî we kir. Xilazbûn pêşkêşa Xwedê ye bona we: hûn nikarin tu tiştî bikin, wekî xilazbûnê qazanc bikin, yan jî layîqî wê bin.

Bona stendina vê pêşkêşa biha, berê ewlin hûn gerekê gunehê jîyana ji Efrandarê Xwe cuda xwe mikur bên (çimkî eva koka hemû gunehên we ye). Tobekirin qewilê herî berk e bona stendina xilazbûnê. Petrûs nava kitêba Karên Şandîyada zelal ev yek da kivşê, hema wê rjojê pênc hezar meriv xilazbûn stendin: “Awa tobe bikin û berbi Xwedê vegerin, ku gunehên we bên resîtkirinê (Karên Şandîya 3:19). Încîl eyan dike, wekî ji me her kes çawa xulamê guneh hatîye dinîyayê. Ev xulamtî ji gunehê Adem destpê bûye, yê ku bi zanebûn gura Xwedê nekir. Bi tobekirinê hûn qirar (biryar) dikin, wekî hûnê îdî gura “ez”-ê xwe û mîrêcin nekin, yê ku bavê derewê ye, lê hûnê gura Xudanê

xweyî nû, Îsa Mesîh bikin, Yê ku jîyana Xwe bona we qurban kirîye.

Hûn gerekê serwêrtîya jîyana xwe teslîmî Îsa bikin. Qebûlkirina Îsa çawa Xudan dide kivşê, wekî hûn îzinê didine Wî, ku Ew serwêrîya jîyana we (ruh, şexs û qalib/ û hemû tiştî, çi yê we ye, bike: Ew nava jîyana weda serwêrtîya here mezin distîne. Hema wî çaxî, wextê ku hûn wê yekê bikin, Xwedê wê we ji tarîstanê aza bike û wê we cîguhastî nava ronahî û rûmeta padişatîya Xwe bike. Zelal gotî, hûnê ji tarîstanê derbazî ronahê bibin û hûnê bibine ewledê Wî.


Eger hûn dixwezin bi destî Îsa xilazbûnê bistînin, vî duayî biwekilînin:

> *"Xwedêyê Ezmana, ez fem dikim, wekî ez gunehkarim û ez ji norma heqîtîya Te ketime. Bona gunehên xwe ez layîqî dîwana heta-hetayême. Spas, ku min nava vî halîda nahêlî, çimkî ez bawar dikim, wekî Te Kurê Xweyî Tek-Tenê, Îsa Mesîh, Yê ku ji Meyrema qîz hate dinîyayê, şand, ku ew bona min bimira û li ser xaç cezayê Xwe bistenda. Ez bawar dikim, wekî Ew roja sisîya ji nava mirîya rabû û niha jî li alîyê milê Teyî rastê rûniştîye, çawa Xudan û Xilazkirê min. Îro ez tobe dikim, wekî ji Te cuda bûme û ez jîyana xwe teslîmî serwêrîya Îsa dikim.*
>
> *Îsa, ez îqrar dikim, ku Tu Xudan û Xilazkirê minî. Bi Ruhê Xweva were nava jîyana min, û min bike ewledê Xwedê. Ez karên tarîstanê ji xwe dûr dixim, kîjan wextekê nêzîkî min bûn, û ji roja îroyînda ezê îdî bona xwe nejîm. Ezê bi kerema Te bona Te bijîm, çimkî Te emirê Xwe bona min daye, ku ez heta-hetayê bijîm.*
>
> *Spas, Xudan. Niha jîyana min bi temamî destên Teda ye, û anegorî Xebera Te, ezê tu cara şerm nekim".*

Tu bi xêr hatî malbeta Xwedê! Ez piştgirîyê didime we, ku evê behsê bawarmendekî mayînra gilî bikin. Usa jî ew yek girîng e, ku hûn bighîjine civîneke cî, ya ku Încîlê bawar dike, û merivên mayînra bikevine nava heleqetîya, yên ku wê nava bawarîyêda piştgirîya we bikin. Hûn dikarin aza tevî qulixdarîya me tevgirêdanê îzbat bikin

(Herine malpera MessengerInternational.org)-ê, û emê alî we bikin, ku hûn li cîhê jîyana xwe civînê bibînin.

We hema hêja nigê xwe danî li ser rîya here ecêb. Ez bona we gelek eyantîya, keremê û hevaltîya weye tevî Xwedê, ya nava jîyana weye herrojeda, dixwezim.



Armanca qulixdarîya “Mêsîncêr întêrnêyşinil”-ê ew e ku alî şexsa, malbeta, civîna û mileta bike, ku ew qewata Xebera Xwedê fem bikin û li ser xwe texmîn bikin.

Bi saya vê femdarîyê, him meriv, him cîhên jîyanêye tam wê bêne guhartinê, û civakê bi aktîvî dijî vê neheqîya ku dinîyayê dizêrîne şerkarîyê bike

---

Sayta CloudLibrary.org-ê dikeke zindî ye, ya ku îzinê dide serwêr û rêberên li temamîya cîhanê, ku ew bi zimanên xwe matêrîyalên êlêktronîye belaş bistînin.

Herine sayta **CloudLibrary.org-**ê û cêrge matêrîyalên Con û Lîza Bîvêra bixwînin, yên ku bi ji 80-êyî zêdetir zimana wergerandî hene.

**Kitêbên êlêktronî, dersên aûdîo û vîdêyo, kitêbên aûdîo, Mizgînîya...**

CLOUD LIBRARY

**Hûn diha zêde dixwezin? Şikil pêlkin.**

# QENCÎ, *YAN* XWEDÊ?

## BONA ÇI QENCÎ BEYÎ XWEDÊ BES NINE?




Eger tiştek qencîye, wî çaxî ew ji Xwedêye, ne usaye?

Nava rojên meda xeberên "qencî" û "Xwedê" tê bêjî sînonîmin. Em bawer dikin, wekî ew çi ku bi tomerî çawa qencî tê hesabê gerekê anegorî xwestina Xwedê be. Merdayî, şikestîbûn, heqîtî qencin. Xwehizî, krêtî, bexofî xirabin. Tê bêjî ev firqî gelekî sadeye.

Gelo hemû tişt awqas zelale? Eger qencî awqas zelale, bo çi Încîl dibêje, wekî bona naskirina wê pircûretî pêwîste?

Kitêba "Qencî, yan Xwedê?" banga bi sirê ya bona wê yekê nîne ku hûn bi xwe pirsên xwe hel bikin. Ev kitêb wê hîvî ji we neke ku hûn awqasî nêzîkbûn û kirinên xwe biguhêrin. Ewê hê zêdetir bike. Ewê karebûnê bide we, bi kîjanê hûnê tevî Xwedê bighîjine asta heleqetîyên usa, ya ku wê her govekeke jîyana we biguhêre.

Hûn dikarin vê dersê, usa jî xebatên Con û Lîza Bîvêraye mayîn bi hatina li sayta întêrnêtêye belaş, ya "Mêsîncêr întêrnêyşinil"-ê, temaşe bikin û ji întêrnêtê der bînin:

CloudLibrary.org

Hûn dikarin matêrîyalên zêde jî bi gelek zimana li saytên YouTube.com, Youku.com, usa jî li saytên wî cûreyîye mayîn temaşe bikin û ji întêrnêtê der bînin.

# Gelo jîyana heta-hetayêye çawa hîvîya we ye?

Bînine ber çavên xwe,wekî hûn tevî cêribandinekê dibin, bi saya kîjanê 24 sehetê cûrê jîyana we peyî wê yekêra wê bê guhartinê.Ew cêribandin wê hemû tiştî hesab hilde, ji xebata we destpêkirî hetanî wê mehelê û malê, li kîderê hûn dijîn, bona ku biryar bike ku hûn ewê roja xwe çawa derbaz dikin. Weyê nêzîkbûna çi cûreyî hindava wê rojê bida kivşê? Kirinên we wê bona wî meremî bûna, yan weyê usa bihişta û gumana we hebûya, wekî hemû tişt wê açix bûya?

Diqewime ew fikira li ber çavên we tiştê bûyînê nîbe, lê ew usa jî li ber xwe derxistî nîne. Bi vî cûreyî qirarên meye îroyîn wê hukumî li ser jîyana heta-hetayê bikin.

Nava kitêba *"Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin"* xudanê kitêbayî eyan Con Bîvêr fikirên usa û gelek beşên Kitêba Pîroz dide xebatê, zelal wê yekê tîne ber çava ku çawa jîyana li ser vê dinîyayê jîyana heta-hetayê qirar dike.

Ew jîyana ku peyî xatirxwestina vê dinîyayêra hîvîya me ye, cîhekî usa nîne, li kîderê emê ji nûva bixuliqin, lê tiştê hê zêde ye. Hîvîyê nesekinin, hetanî ku gelekî dereng bibe.Wê yekê eşkere bikin, ku hûnê çawa bijîn, bona ku kemala jîyana weye îro û heta-hetayê hebe.



Con Bîvêr û jina wî-Lîza hîmdarên qulixdarîya "Mêsîncêr întêrnêyşinilê"-ne. Con terîfkir e, usa jî nivîskarekî bi nav û deng e. Bêyî berdaxustin, bi serxwebûn û cedandinê, ew rastîyê terîf dike. Ew dixweze piştgirîyê bide civînên xwe û serwêra, bi matêrîyalên mesîhîtîyêva bide çareserkirinê, nenihêrî wê yekê ku ew li kîderê dijîn, zimanê wan kîjan e, yan jî halê wanî fînansî çawa ye.Hetanî roja îroyîn matêrîyalên wî ji 9O-î zêdetir zimana hatine wergerandinê û bi mîlîyona mesela ew li temamîya dinîyayê pareveyî li ser serwêr û rêbera kirine. Wextê ku Con li malê ye ew her dem dicêribîne tevî Lîzayê golfê bilîze, ew tevî her çar kurên xwe, bûk û nebîyên xwe dikeve nava heleqetîya.

Van matêryala û yên mayîn hûn dikarin li vê malperê dest bînin:
**CloudLibrary.org**

MESSENGER INTERNATIONAL
MessengerInternational.org

Ev kitêb ji alîyê xudanê wêda pêşkêş e û bona frotanê nîne.

Hûn diha zêde dixwezin? Şikil pêlkin.